# ŞEVA ÇARAN

**Feyzi Yetkin - Mehmet Tanboğa**

**ŞEVA ÇARAN**

**Feyzi Yetkin - Mehmet Tanboğa**

**WERGER JI TIRKÎ : HACER HÎLAL**

**REDAKTASYON: AYTEN AMED**

**Mîzanpaj û Bergê Pirtûkê:**

**Rêvan Mehmûd**

**Weşanxana Şilêr**

**Qamişlo - 2018**

**weshanashiler@gmail.com**

**weje.vejin@gmail.com**

## Li ser wergerê çend gotin:

Beriya wergerê min ev pirtûk nexwendibû. Li ser pêşniyarê hevalan min dest bi wergera pirtûkê kir. Di dema wergerê de hin caran ez keniyam, hin caran giriyam. Hin caran jî bi demjimêran min li pirtûkê nerî, wê li min nerî. Di nav ken, grî û hestên aloz de wergera ku min kir, ez hêvîdarim ku bi dilê we xwendevanên hêja ên vê pirtûkê be. Ez di vê baweriyê de me ku her yek ji we dema ku dest bi xwendina vê pirtûkê bike, dê heman hestên ku min jiyî, bijî.

Di dema xwendina pirtûkê de hûn ê ji cih û demê tê de derkevin, ber bi bajarê dilan cih û warê Ferhat- Mazlûm û Çiyageran ve bikevin nava rêwîtiyekê. Dibe ku di vê rêwîtiyê de nav û dem cuda bin, lê lehengî, egîdî û berxwedanî dê heman bin. Hûn ê jî mina min ber bi dîroka borî ve bikevin nav rêwîtiyekê, rêwîtiya ku bûye sedema vejîn û serhildanê. Hûnê hem fêrî rastiya dîroka Tevgera APO'yî bibin, hem jî fêrî çanda berxwedana çaran bibin ku, têkoşîna bi çaran despêkir îro bi çilhezaran didome.

Hevalên hêja ji bo vê pirtûkê pêwîstî bi vegotinê nîne, bixwînin û hûn bi xwe vebêjin; vebêjin da ku hestên we jî mîna yê min ber bi deryaya evîndariya welat ve biherike.

Di wergerê de hinek peyvên ku di nav pirtûkê de hebûn min hewce nedît ku wergera wan bikim. hem adi pirtûka Tirkî de çawa bû min wiha hişt. Hinek ji wan dujînên celadane ku wergera wan ji bo zimanê Kurmancî zêde guncaw nebûn. Hêvîdarim ku hevalên hêja hûn di vê mijarê de min mafdar bibînin. Lê bi qasî ji dest min hat, min hewl da ku bi reseniya pirtûkê ve girêdayî bimînim. Navê pirtûkê yê Tirkî “Dörletin Gecesi” ye. Min xwest weke Berxwedana Şeva Çaran bi nav bikim, lê ji ber ku ji navê wê yê resen dûrdiket, min weke Şeva Çaran hişt. Ji bo kêmasî û nebesiyên çavkaniya xwe ji wergerê digre lêborîna xwe dixwazim.

## Feyzi Yetkin

Di sala 1961’an de li Riha navçeya Hilvanê gundê Bahçecikê hatiye dinê. Dibistana seretayî û navîn li Akçekale, amadeyî jî li Hîlvanê xwendiye.

Di sala 1980’î de ji ber sedemên siyasî hate girtin, cezayê îdamê lê hat birîn. Bi giştî 24 sal di girtîgehên cur be cur de ma.

Di vê navberê de ji kovar û rojnameyan re mekale nivîsand. Di vê demê de, xebata Berxwedana Şeva Çaran û Parastina Çaran nivîsand.

Ya din jî romana nivîskar ya “Gundê Şahê” ku hatiye weşandin heye.

Di temeneke biçûk de yê ku nasî û hemû temenê xwe jê re veqetandî xebatên xwe yên nivîskî û siyasî didomîne.

## Mehmet Tanboğa

Di sala 1957’an de li gundê Leylekê yê girêdayî merkeza Amedê hatiye dinê. Dibistana seratayî, navîn û amadeyî li derve xwend û qedand.

Di sala 1978’ an de tevlî nava tevgera azadiyê dibe. Di sala 1980’î de tê girtin. Ji doza PKK’ê de tê darizandin.

Di 23.5.1983’yan de di encama biryara ku dadgehê dayî bi 35 hevalên xwe re cezayê îdamê lê tê birîn. Ji ber pêşkeftinên siyasî û qanûnî nayên îdamkirin. Di sala 1996’an de tê berdan. Hîna jî li Awrûpa dijî.

# BERXWEDANA SERKEFTINA ÇARAN

## Pêşkêşî:

Ev pirtûk, tenê bi bîranîn û tiştên me dîtine re derneketiye holê.

Dema ku me ev xebat dimeşand hinek hevalan derbazî dexdîloyê dikir, hinek hevalan yên ku me dinivîsandin sererast dikirin, hinekan jî di mijarên ku em ser ne serwerbûn me ronî dikirin, dîsa yek du heval jî tiştên ku me nivîsandine zimaneke wêjeyî didanê û dibûn alîkar. Ji hemû hevalên ku ked di ber vê xebatê de dane sipas dikin û ev belgefilma romana bîranînan diyarî zarokên gelê xwe yên ku li ber xwe didin dikin.

## Pêşgotin:

Zehmetiyên nivîsandina girtîgeha Amedê ya leşkerî gelek zêde ne.

Nivîsandina wê pêvajoyê, tê wateya paşeroja xwe ji nû de jiyankirin, bîranîn zindî hiştin û bi awayeke objektîf danina pêşiya xwendekaran e.

Heta wan bîranînan ji nû ve zindî hiştin jî tirs û xofek mezin dixe hindurê ew kesê ku dide nivîsandin. Kesê ku ev roj dinivîsîne çendî wêjevan be jî, bi lênûs, firçe û zimanê xwe wê nikaribe wê demê bi awayeke ku tê xwestin vebêje.

Yek din jî yê ku di Girtîgeha Leşkerî ya Amadê de mabe, nivîsên di derbarê wê de, gotûbêjên di derbarê wê de dixwîne, guhdar dike, di vebêja herî baş de jî bêguman wê kêmaniyan bibînin.

Nivîskarê vê xebatê jî dema berhema xwe ya wê demê vedibêje xwend, wê bikeve ferqa ku tiştên negotine ji yên gotî zêdetir mane. Nivîskarên ew pirtûka di destê we de Fevzî Yetkin û Mehmet Tanboga ji sala 1981 ve di qawûşa 33. de diman.

Îşkenceya Ferhat Kurtay û hevalên wî, dema ji bo protestokirina pêkanînên din xwe şewitandin jî şahidên bûyera bûn. Di cewher de nivîskarên ku ev

bûyer û bûyera qawûşa 33'yan nivîsandine, di heman demê de hemû bûyerên li girtîgehê qewîmîne girtine dest û ronî kirine.

Hema piştî darbeya 12 Îlonê şûnde Girtîgeha Leşkerî ya Amedê anîn rewşa navenda îskenceyê. Di Mijdara1980' î de kesê bi navê Mevlût Akkoyunlu ku hatî ser erkê dest bi gotina ku divê di hêjmartina 'Gestapo' yê de, ji niha û şûnde girtî bibin yek rêz, li ser lingan bisekinin, yê ku van quralan pêk neyîne wê bê lêxistin. Ango lêdanê bixwe.

Copê xwe nîşan dida û digot; ev "xiltê min e(kösteğim), " zincîra xwe ya situr nîşan dida digot; ev "tezbihê min e." Hema piştê vê ferz kir ku por û simbêlên girtiyan mîna yên askeran bêne jêkirin û duhaya xwarinê bê xwendin.

Kesên ku nû dihatin girtin bi awayeke bi pergal îskence li wan dikir, kesên ku di korîdoran de îskence didîtin dengê wan digirtin banda teyîbê û bi girtiyan didan guhdarkirin da ku nikaribin razin. Yên ku li hember vê derdiketin lêdixistin diavêtin hucreyê. Ji bo dev ji van sepandinan bê berdan hinek girtiyan di 2'yê Kanuna 1981'ê de ji derveyî hinek koman dest bi rojiya birçîbûnê kirin.

Û ji bo şikandina rojiya birçîbûnê ya duwazde rojan bi înzîbatên ku ji Kolordiya heft anîn dest bi îşkencekirina girtiyên di rojiya birçîbûnê de bûn kirin.

Girtiyên li hember îşkenceyê derdiketin, hêjmareke mezin ya girtiyên ku rojiya birçîbûnê bi biryarbûneke mezin dimeşandin bi erdê re xişikandin û dibirin hûcreyên wan.

Îşkencekar, yên ku li ber xwe didan li hûcreyan kom dikirin, yên di qawûşan de diman jî dixwestin teslîm bigirin.

Di dawiya peyîkandin û neqandinên ji 24 Sibatê heya 1981'ê didomiya, piraniya wan berxwedêran girtin hûcreyan. Bi vî rengî têkiliya bi pêşengên şoreşger û girseya gel a li ber xwe didan re qut bibû.

Di vê qonaxê de Gestapo, erka xwe dewrî Esat Oktay Yıldıran kir.

Esat Oktay, heya ku quralên xwe yên weke (dua xwendin, sirûda tirkan ya îstîklalê xwendin, di çûyîna hevdîtinê de bi meşa leşkerî çûyîn û hatin, dema diçin derve ku hewayê bigirin li gor sirûd (marş) meşîn, di hêjmartinê de bûna yek rêz, dema di qawûşê de gava ku asker û subay tên gel wan rabûna ser xwe û hwd.) bi girtiyan da qebûlkirin û bi ser wan de çû.

Berxwedêrên ku hêjmara wan 500-600 bû nedihatin van quralan. Ji derveyî van herduyan yên din hemû PKK'yî bûn. Ji bo ku Esat, van mirovan teslîm bigire, di salonên hûcreyan de dezgehên îşkenceyê ava kir.

Tezgeha îşkenceyê ya ku di salona qowuşa 35'an a ku tê zanîn, seat di 05.00' an de dest bi kar dikir, êvarî seat di 17.00' an de diqedand. Girtiyên bi rêzê tanîn salonê li wan îşkence û teslîmyet ferz dikirin.

Yên ku teslîmbûn qebûl nedikirin, heya ku nikarîban li ser lingan bimînin li wan dixwistin û piştre diavêtin hûcreyên wan.

Girtiyên di beşa hûcreyên qawûşa 37. de dihat zanîn, dema ji wan re dihat gotin ku "bikevin rista lêdanê" dest û piyên xwe di şibakeyên hûcreyan re dirêjî derve dikirin, 24 demjimêrên rojê bi qasî ku gardiyanan dixwestin bi cop û befşên dar îşkence li girtiyan dikirin.

Dema îşkence û berxwedanî bivî rengî didomiya di roja 4'ê Adara 1981'ê' de di bin pêşengatiya Kemal Pîr û Xeyri Durmuş de komek şoreşger dest bi rojiya birçîbûnê kirin.

Di roja 23' ya rojiya birçîbûnê de girtiyên di qawûşa 37'an de cî digirtin, ji wir 110 berxwedêr li qawûşa 35'an kom kirin. Ji bo di roja 30. ya rojiya bûrçîbûnê de

Alî Erek ji ber xwîn avêtina mîdê şehîd dikeve, komek din ya girtiyan dest bi rojiya birçîbûnê dikin. Bi yên nû beşdarî rojiya birçîbûnê bûn re hêjmara wan gihişt 28'an.

Piştî 43 rojên rojiya birçibûnê bi gotîna Esat OktayYıldıran a ku gotibû"ez ê dev ji hemû îşkenceyên li ser we berdim, hûn jî vegerîn qawûşên xwe "dawî lê hatibû. Esat Oktayê ku li ser soza dabû nesekinî, di demeke kin de dîsa dest bi îskeceyê kir. Yên ku di hûcreya 35. de diman, heya 26'ê meha Gulana 1981'ê ji bo quralên wan pêk neyênin li ber xwe dan.

Piştre gotin ku em ê rêzikên we qebûl bikin.Yanê teslim bûn. Ev teslîmkarî, bi ti awayî ne teslîmkariya di fikir û baweriyê de bû. Di fikir de her kesî dizanî ku teslîmbûn tişteke xirab e, di pratîkê de jî rewşa ku diketê lanet dikir.

Ev rewşa di fizîkî de teslîmiyet, di vê di fikir de jî mîna berxwedanê bê nirxandin. Bêguman ev rewş nakokiyek bû. Jixwe di dawiyê de yan wê di fikir de teslîmiyetê biparêzin yan jî wê dawî li teslîmiyeta fizîkî banîban.

Ji derveyî PKK'yî yan, komên din ji bo him di fikir de û him jî ji aliyê fizîkî ve teslîm bibûn, nedikarin li ber xwe bidin. Lê PKK' yî yan teslîmyeta di fikir de qebûl

nekirin û li ber xwe dan. Di pirtûkê de helwesta Ferhat Kurtay mînaka vê ya herî li berçave.

Dema berxwedêrên di qawûşa 35. de binkeftin, Esat Oktay, di hemû qawûşan de dest bi terorê kir, jiyan veguherand cehenemê û hemû kêliyên jiyanê veguherand îşkenceyê. Êdî girtîgeh, tûneleke tirsê bûn.

Her kêliya ku wan bibizdîne, îşkenceyên dilê mirovan bide sekinandin, bi rêbazên îşkenceyê yên herî xirap re rû bi rû bûn. Ji bo ez vê demê bidim vegotin, dixwazim rojeke girtîgehê bi kurtî şirove bikim.

Demjimêr di pêncan de girtiyên di qawûşê de nobet digirtin sê caran bi dengê “qawûş rabe” girtî ji xew radibûn. Bi lezgînî cilên xwe li xwe dikirin. Ji bo pêwîstiyên xwe yên çûyîna destmêjê derbas bikin û rihên xwe kur bikin li ber deriyê tuwelêtê dibûn yêk rêz.

Ji ber av û neynik nebû rihên xwe kur bikin, girtî herî kêm di 15 çirkeyan de pêwîstiyên xwe yên rih kurkirinê û destmêjê derbas dikirin şûnde di nivê qawûşê de kom dibûn, bi awayeke rêk û pêk diketin rêzê. Dema ku her kes diçû cihê jê re hatî diyarkirin şûnde, berpirsyarê qawûşê, emrê “raweste, amedebe” dida.

Dema girtî tiştên berpirsyar digot dikirin şûnd, berpirsyar digot, “di cihê xwe de bêjmêre, lingên xwe bibe valetiya zikê xwe, dema digot bêjin Sirûda Qeredenîzê, girtî hemû bi yek dengî dest pê dikirin û lingên xwe bi hev re li erdê dixistin.”

Heya ku xwarina sibêhê dihat, (heta demjimêr 07.00) sirûd digotin û di cihê xwe de dihêjmartin. Dema ku karavana dihat ber derî navber didan sirûdê. Ji bo ku berpirsyar karavana bigire hûndir, dibezî derî. Girtî diçû pêşiya gardiyan silava panî dida, digot: “Ez dikarim karavanayê bigirim”hûndir.

Li gor emrê gardiyan bide yan karavan digirt hûndir yan jî nedigirt. Ger ku gardiyan bigotiba: “Bigire” berpirsyar karavanayê digirt bi bez diçû qawûşê. Girtiyên ku di rewşeke rawestandinê de bûn piştî gardiyan digot: “Raweste, amedebe” şûnde bi wan duaya xwarinê dida gotin.

Dema ku dûa xilas dibû ji bo ku gardiyan bêje “noşîcan be!”Girtiyan digot emirke fermandarê min.” Ger ku gardiyan şêwazê dûa xwendinê ne ecibandiba: Digot; “dayîka we A… bibe” yan jî “ya …serê we bibe.” Çi bigotiba girtî neçarbûn bêjin “saxbî.”

Gardiyan bi vê re jî sînordar nedima, xwarina ku dianî dirijand tuwalêtê, yan jî cezayê “dirêjî bintext

bibe” dida girtiyan. Girtî neçarbûn di nava 15 çirkeyan de xwarina xwe bixun, cixareya xwe bikişînin.

Piştî xwarina sibehê û şûnde girtî dibûn yek rêz carna hêjmartina wan yek demjimêr, carnan jî du demjimêran dirêj dikir. Heya ku xebata hêjmara girtiyan nehatiba girtin, girtiyan di pişt hevdu de nekiribana yek rêz, berpirsyarê qawûşê yê rêza pêşi ku li ser pehniya xwe silav nedaba, bi kinahi kunya xwe nedaba û bejna xwe netewandiba, girtiyê dawiya rêzê negotana ‘dawiye fermandarê min!’ dawî li vê bagera bi êş nedihat.

Ji bo girtiyan her sibê bi sedan caran vê bi xwe re dûbare dikirin loma ev mîna iskenceyê ji wan re gelek giran dihat. Fermandar û subayên ku ji bo hêjmartina girtiyan dihatin qawûşê heya ku derbas dibûn darên di destê xwe de didanin ser bedena girtiyan, ew girtiyê ku dar didanî ser bedana wî neçarbû ku hêjmara xwe bide.

Di her hêjmartinê de lêdan li hemû girtiyan dihat kirin. İskenceyên mîna “girêmezin! û dirêjî bin ranzê bibe!” dikirin. Di hêjmara êvarê de heman sepandin dihat kirin. Girtiyên ku rûniştina wan hebû ji bo bibin dadgehê ji qawûşê derdixistin dikirin yek rêz, her derê wan kontrol dikirin. Carna gardiyanên qawûşan derpê

girtiyan, kîlotê wan didanin û fener li quna wan digirtin.

Dema ku lêgerîn li ser wan bi dawî dibû û şûnde girtiyan bi sirûda leşkerî dibirin korîdora lê sekinandinê.

Li wir bi seatan li ser lingan didan sekinandin, bi meşa leşkerî sirûd bi wan dida gotin. Destê wan di kelepçê de, zincîr jî li lingê wan dihat xistin, ji bo kesê nebînin serê wan ditewandin, her tim jop lê didan.

Bi vî rengî dixistin seyareyên termê mirovan. Seyareya girtî tê de bûn li ber deriyê dadgehê dihiştin û ‘‘îskenceyeke taybet ya seyareyê’’ li wan dikirin. Dîsa heya digihiştin seyarê her tim cop li wan didan, bi kulm û zelan wan bê hêz dihiştin. Girtiyên ji îşkenceya seyarê rizgar dibûn ev car jî îşkenceya rûniştina dozê li wan dikirin.

Girtiyên ku dibirin salona rûniştinê bi awayeke serê wan rakirî, berê wan li pêş, dest li ser çokê, bêyî ku li hawirdora xwe binêrin, çi dibe bila bibe divê ji cihên xwe nelivin, bêyî ku pêwîstiyên xwe yên mîna çûyîna destmêjê, av, nan bi cî bînin diviyabû mîna putan di şûna xwe de bisekiniban.

Girtiyên ku van quralan bê kêmanî bi cî neanîban di vegera dadgehê de beriya bixin qawûşê hemû şêwayên îskenceyê li wan dikirin.

Bi kinayî ji Girtigeha Leşkerî ya Amedê çûyîn û hatina dadgehê, mîna ku di pira siratê yan jî di tûnala tirsê ya cîhanê re derbas bibe bû. Girtiyên dernakevin dadgehê, yên di qawûşan de diman piştî hêjmartinê hema şûnde dikirin yek rêz. Berpirsyarê qawûşê pirtûkeke digirte destê xwe, heta ku jê dihat bi dengeke bilind û bi kitekit dixwend.

Girtiyên din jî bi heman rêbazî bi hev re lê vedigerandin. Ev şêwazê pirtûk xwendina herî balkêş ya cîhanê bi saetan berdewam dikir. Gardiyanên ku bi jop ve dihatin qawûşê, qontrola dengê girtiyan dikir, ji girtiyên ku dengê wan kêm re digotin: "Kuro îbne çima dengê te dernakeve?'' Ji girtiyên ku dengê wan kêmnebûyî re jî digotin; ''diyare te qet qêr nekiriye''li ser vê îşkence bi wan dikirin. Yanê tu dixwazî baş bixwîne, tu dixwazî baş nexwîne, yek yek yan jî bi komî bi dehan carî di îşkenceyan re derbas dikirin.

Piştî xwendina pirtûkê ji bo girtiyan derxistana hewa kişandinê bi rengê yek rêzî tekmîl û kurte kunye digirtin. Li wir girtiyan bi awayî du kesî yan jî çar kesî dixistin rêzê, piştî emrê ''raweste, amede be'' girtiyan

didan meşandin. Di esnayê meşê de çong kişandina valehiya zikê xwe, dest hejandin, naçar bûn ku singê wan jî di pêş de ba.

Piştî ev merşa sirûdê ya ku bi seatan didoma û şûnde girtiyan bi erdê re dixişikandin, dixistin ser hevdu, di navbera 5-10 deqîqeyan carek de li falakayê didan razandin, yan jî 30-40 jop li destê wan didan.

"Kocatepe, kule" bi dehan şêwayên îskenceyê re derbas dikirin piştre dibirin qawûşên wan. Piştî behnvedana xwarina nîvro ya nîv demjimêrê şûnde, heman sepandin li wan dikirin. Girtiyên ku diçûn qawûşê di hindir de heya hêjmartina êvarê xebata hêjmarê didomandin. Di xwarina êvarê de, piştî xwendina dûayê û hêjmartinê bi misogerî bi lêdanê derbas dibû.

Yanê bi temamî 12 demjimêrên rojê(him jî her roj) li ser lingan, bêtaqet dihiştin, piştî meşeke nîzamî ya perwerdê û gelek îskenceyan û şûnde bidawî dikirin. Şevê piştî demjimêr heftan şûnde her girtiyek li ser cihê xwe bêyî ku xwe bilivîne li ser piştê xwe dirêj dikir û bi ti awayî nedikarin biçin ciyê pêwîstiyên şexsî. Yanê ev jî şêwayeke yê îşkenceyê bû.

Li her qawûşê û li gor mezinahiya qawûşê girtî herî kêm didu herî zêde jî pênç kes neçarbûn ku nobetê

bigirin. Şevê her tim basqina qawûşan dihat kirin. Nobedarên ku di nobeta xwe de li hawirdora xwe meyze bikiriba, bi awayeke nîzamî nemeşiyaban, dema ku kuna mazgalê vebûba bi dengeke bilind tekmîla xwe nedabûyan îskence li wan dihat kirin. Ya din di nava jiyana rojane de rewşên mîna çûyîna nexweşxanê, banyo, cihê hevdîtinê yan jî bi mûwekilan re hevdîtin çêkirin hebû.

Di Girtîgeha Amadê ya Leşkerî de çûyîna nexweşxanê yan jî derketina revire bi serê xwe îskenceyek bû. Bijîşkê li revîrê bi awayeke vekirî digot; "ez beytarim." Bi rastî jî ew ne ku beytar bû, ji bo girtiyan mîna lawiran didît dikir. Heya ku nexweş dibirin nexweşxanê û tanîn li wan dixistin. Bi hinceta ku 'numaran dikin' yên ku nedibirin nexweşxanan jî sê qat zêdetir li wan dixistin.

Yên ku dibirin nexweşxanayan jî cezayê herî mezin yê cîhanê li wan dibirîn. Ger ku li wir raketibana li wir digirtin qawûşekê di şêwazeke ameder de radizandin, bi tekmil girtinê re ji xew radikirin û bi tekmîlê re dixistin nav cîhan. Dernedixistin pêdiviyên şexsî.

Li hemberî Îşkenceyên li Girtîgeha Amedê encax mirov dikare çend salan li ber xwe bide. Lê belê li beramberî kiryarên ku li nexweşxaneyan dihatin

meşandin yê ku mehek li ber xwe daba weke qehremanek mezin dihat dîtin.

Lêgerin her tim di rojên ku tişt dihatin belavkirin de pêk dihat. Hemû tiştên xwarin û yên li xwe kirinê li nav paçên di nava nivênan de tevlîhev dikirin. Muyên binçeng û laşê girtiyan bi çeqmaqa gazê dişewitandin.

Jixwe banyo bi serê xwe îşkenceyek bû. Girtî pir zêde nedibirin banyoyê, dema dibirin jî ji nafteng û şûn de tazî dikirin. Wan bi meş û sirûda leşkerî dibirin banyoyê, li wir ava cemidî ya (tazyikli) şid tavêtin girtiyan.

Bi jopan li laşê wan yê tazî dixistin. Dema ku girtî tanin qorîdorê fermana 'xwe bavê erdê û xwe bi erdê re bixişikîne' didan.

Rûyê wan li erdê, bi awayeke li ser piştê bi rewşek tazî heya qawûşê dixirikandin heta carek din qirêj dibûn banyo jî bi vî rengî diqediya.

Jiyana rojane ji derveyî van bi sedan rêbazên din yên îşkenceyê lê dihat zêdekirin. Yanê jiyan her kêlî bi îşkencê tijî dibû.

Derketina dadgehê îşkenceyek bû, çûyîna nexweşxanê ji wê jî xirabtir bû. Li qawûşê mayîn, neçûyîna wan deran xiraptir dibû. Di navbera

derketina hewagirtinê û di qawûşê de mayîn tercîhkirin zehmet bû. Hindir û derve jî mirov dişewitand.

Wiha di Girtîgeha Amedê de mirovan di îşkenceyek bi vî rengî asê re derbas dikirin û difetisandin. Di 21'ê Adara sala 1982'an de Mazlûm Doxan, di 17'ê Gulana 1982'an de Ferhat Kurtay û hevalên wan canê xwe fedakirin û ji bo mirovên di nava tarîtiya Amedê de bûn ronahî.

Esad Oktay Yıldıran, ew tevgera ku tarîtiyê rake û ronahiyê bîne dibîne, dema dixwaze îşkenceyên şkandinê hîn xurtir bike, dîroka 14'ê Tîrmeha 1982'an ya rojiya mezin a mirinê ku tê de Kemal pîr, M. Xeyrî Durmuş, Akîf Yilmaz û Elî Çîçek şehîd dikevin dest pê dike.

Ev rojiya mirinê girseya girtîgehê kir mîna mistek ji polayê. Û ev kulm di 1'ê Îlona 1983'an de bi hêzek qet neyê jibîrkîrin li rûyê zilmkaran ket.

Zilm weke ejderhayê heft serî hilweşiya. Bi serkeftinên ku girtiyan bi dest xistine mil dan milê hev bi hatina rojên xweş ên li pêşiya wan ketin nava hewldanên pîrozbahiyan.

Destana ku bi berxwedaniya li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê hatî nivîsandin, bû sedema rakirina gelekî yê li ser piyan û yê ber bi azadiyê ve. Bû çirûska yekê û piştre jî bû pêxistina meşala yekê.

## Beşa Yek:

Dîsa di korîdora navberê de deng û qîrînên mirovan... Ji qawûşan girtiyan dianîn.

Yên ku anîn qawûşa 37. girtiyên qawûşa 9.emîn Ferhat Kurtay û komek girtiyên PKK'yî bûn. Wan girtin korîdora qata yekemin. Gardiyan bi hemû hêza xwe ve ketin ser pişta wan li wan dixistin. Yên dianîn piştî ku gelek li wan dixistin û şûnde bi awayeke ne li ser hiş dixistin hûcreyên cûda yên yek-kesî.

Ferhat û komek girtî di qada 1. hûcreya 7. de bû. Yên di qawûşa 37. de diman yên ku nû dianîn vê qawûşê pirsa hevalên xwe yên li wir li ber xwe dabûn dikirin. Ev bûyerên bi vî rengî êdî xwezayî bibûn. Di Girtîgeha Amedê de; yên ku di qawûşê de bi biryarbûn li ber xwe bidin dixistin hûcreyên yek-kesî.

Dema ku pelên taqvîmê 25 Şibata 2981'ê dida nîşan, îdarê dest bi guhertinên nû dikir.

Amîrê ewlekariya hûndirîn yê kevin, navbang Gestapo Havayi Serçawuş Mevlût Akkoyunlu erka xwe berdide, li şûna wî Yûzbaşi Esat Oktay tê erkdarkirin. Bi hatina Esat re ekîbeke îskenceyê ya nû ketibû dewrê.

Hûcreyên esasî yên berxwedanê jî qawûşên 37. û 35’an bû. Ev guhertinên ku hatin çêkirin di demeke nêz de bi hemû hêza xwe ve xwe da hîskirin û diyarkirin. Mîna gurê har bi ser girtiyan de diçû. Ji destpêka 1981’ê ve girtiyan li hember serde hatin û îşkenceyan li ber xwe didan.

Tevî ku Ferhat, keseke eşqê axiftin, dil germ û ji hevaltiyê hez dikir, hefteyek bû têkiliyên wî bi hawirdora wî re qut bibû. Kesî wate nedida vê rewşa wî. Ji derve de hevalên wî yên ku gelek ji hev hez dikirin jê pirs dipirsîn yan bersiv nedida yan jî bi dengeke hêdî û kêm digot; “ez baş im... baş im... tu çawa yî?” bersiv dida.

Lê him kesê ku vê dipirsî him jî yên berê wî nasdikirin fam dikirin ku rewşa wî nebaş e.

Ew, kesê kêfxweş, dilgerm û ji her kesê li gel xwe re heskirina jiyanê dida çûbû, li şûna wî Ferhateke di cîhana xwe de girtî hatibû.

Di behra jiyanê de berxwedan melevaniyeke maratonê bû. Di vê maratonê de kî li ku derê, çi demê, çi bike nediyar bû.

Di rewşa heyî de di cîhana her miroveke berxwedêr de, dilê wî/ê bi agirê hindirê wî dişewite; ji tiliyên lingê wî heya neynokê û têlên pora serê wî qeyd dibe.

Ger ku agirê berxwedanê yê di hindurê mirov de vemire, kes di hûndirê xwe de tê girtin, diçilmise û refên xwe diterikîne. Di despêka Adara 1981'ê de keştiya Ferhat ya berxwedanê birîn bibû. Gelo hewl da ku keştiya xwe ya birînbûyî çêbike an na em nizanin, lê gotina wî ya ku got; ''ez teslîm dibim, quralan pêk tênim!'' Ger ku hevalên li kêleka wî bi guhê xwe nebihîstibana dibû ku bawer nekiribana. Ferhat vê bi nepenî û bêdengî gotibû û wî girtibûn qata 4'an. Lê di vê girtîgehê de her pênc hedaman kes ji yekî deh, ji dehan sed hesas dibû. Û "xebera xirab zû belav dibe" peytandina gotina wî wê carekedin di pratîkê de xwe daba îsbatkirin.

Ferhat dihat heskirin, dihat hesibandin û li ser mirovan bandor dida çêkirin. Xebera "teslîmbûna wî" di demeke kin de di qawûşa 37. de deng veda. Ne qedexe guhdar kir ne jî dîwarên situr. Tevî vê jî beşek ji yên ku bi Ferhat re biryara berxwedan kirinê dabûn wî bi tenê nehêlan. Tevî ku teslîm bibû jî di dûv wî de çûbûn.

Teslîmbûna Ferhat û hatina Esat Oktay "ejderhayê mezin" hema hema rastî heman pêvajoyê dihat. Ev kesê tehdîtkar û her axiftineke wî bîna mirarê jê dihat li ser girseyê bandoreke erênî dabû çêkirin û çend kesên din xwe radestî teslîmbûnê kiribûn. Jiyan û berxwedan, li beramberî hev di nava têkoşînê de bûn.

Bi tezgehên çûyîn hatin, ketin rabûn, kenin û girîn re diyarker bû. Çaxa ku Ferhat teslîm dibe komek girtî jî bi xwe re dibe, di heman demê de Mazlûm bi komek hevalên wî re ji qawûşan tînin qawûşa 37. Çerxa jiyanê her ku diçû hinek din dihat şidandin. Dema ku îşkencekaran diran û rihên xwe yên kirêt didan nîşan, amûrên îşkenceyê jî dihatin naskirin.

Li Amedê yên di qada 2. hûcreya 10'an de diman bi rojan bû bi kurmê teslîmîyetê yê ku ketibû nava wan têkoşînê dikirin. Di ser kurm de nediçû. Hema birîna xwe dixwerand. Di cîhana xwe ya kesî de muhesebe dikir.

Li gor xwe sedemên xwe yên teslîmbûnê diafirand. Carna maf dida xwe carna jî xwe ji eybiyan dixist bin erdê. Amed herî zêde hewl dida wateyeke bide teslîmbûna Ferhat. Hucreyên bi pîsîtiya mirovan dagirtî sedem didan diyarkirin, ji hevdeketina girseyan dikirin biyanî û ji dirêjkirina ling û destan bêzar dibûn.

Digot; “ma wisa berxwedanî dibe? Wisa biryar dibe? Ji xwe re digot; ‘‘bi misogerî Yildirim Merkit derxistiye.” Çend caran bi dengê bilind ji hevalên xwe re gotibû ev xelete, lê bi kesê nedabû bawerkirin ango kesî lê guhdar nekiribû.

Di herî dawî de hemû sedemên xwe anî gel hev, enerjî û hêza xwe komî ser hev kir, tiliya xwe danî ser tetîka zimanê xwe ya mîna guleya ku weke ji namlûya sîlehê derbikeve. Got: “ez ê teslîm bibim û quralan pêk bînim.” Hevalên wî duvdirêj pê re axivîbûn, rica jê kiribûn. Xeletiya wî jê re gotibûn, lê biryara xwe dabû. Carekê tîr ji cihê xwe derketibû.

Dema ku bi rondikên cavên xwe deşarj dibû hemû pereyên di berîka xwe de derxist da hevalên xwe yên ku li hember zilmê li ber xwe didin, dema ji hûcreyê derdikeve ji wan re soz dide ku zarerê nede wan, keseyeta wan, şeref û partiyê.

Dema Amed dimeşiya hinek di milê rastê de li xwe dizivirî, mîna şerampola seyareya dizivire… Ev car hemû hûcreyên wî li kêlekê razabûn. Serî li ber, li rûyê kesî temaşe nekiribû, dema derketibû teklîfa peran ya hevalên xwe yên hûcreyê û wêneyên zaroyên xwe bi destê xwe dabû aliyekî.

Gotibû; “Êdî ew zarok ne yên min in, yên we ne.” Yek jî bi awayeke ji xwe re pist pistê bike diaxivî dema ku li wêneyên her du zarokên xwe temaşe dikir: Dîsa gotibû; “Ez gotina bavê we îxanet kiriye bi we nadim gotin, ez soz didim we!” Ev gotinên wî, hevalên wî jî bihîstibûn, lê Amed carekê navê xwe li ser keştiya teslîmiyetê nivîsandibû.

Êdî di hûndirê xwe de hîn zêdetir hatibû girtin. Lêdana gardiyaneke ecemî ya li girtiyên teslîmbûyî herî zêde xweşî Amed hatibû, bi vê lêdanê re hinek rehet bibû. Bi bêdengî ji xwe re gotibû; “heqê yên ku teslîm dibin lêdaneke zêdetir e.”

Qawûşa 35. û 37. li baremberî hev bûn. Esat Oktay digot, “35 tecrîte yê ku diçe wir êdî dernakeve. Heya ku sax be wê li wir bimîne. Yê ku neyê quralên min bila li vir bêje. Ji qawûşa 35’an re digot: ‘Yê ku bêje ez nayêm quralên te ez nabim qawûşê.’ Girtiyên PKK’ê yên pêşeng herî zêde di qawûşa 35’an de bûn.

Ji hûcreya 37. Kemal Pîr jî anîbûn wê hûcreyê. Piştî demek û şûnde rojiya mirinê ya ku Kemal Pîr û Xeyrî pêşengatiya wê dikirin dest pê kiribû.

Ji ber rojiya mirinê ya ku hatibû destpêkirin îşkenceya li ser girtiyên din hinek kêm bibû. Lê di qawûşa 37’an de ji dest heya lingan, ji lingan heya

destan mekîk bi wan didan kirin; bi jop, kalas û darên hesin li wan didan.

Yek jî destikê tambûrek hebû ku êşa wê ji mirinê xiraptir bû. Nayê vegotin yan jî vegotina vê gelek zehmet e. Ji ber “hinek tişt nayên gotin, tenê tên jiyîn.”

Êşa destikê tembûrê jî wisa bû. Tenê yên lêdana wê xwarine dizanin.

Ev jop, ev kalas ev destikê tembûra xweşik’ ji 75 kesên koma Elazixê 5 kes tenê jî di nava koma berxwedanê de nehêla. Merwan yê ku di nava koma berxwedêran de derket holê bi awayeke vekirî, got; heval, êdî pêwîst nake hûn min îdare bikin, di tuwalêtan de veşêrin û bêjin ew nexweş e.

Ev lêdan îmana min derxist. Êdî ez nikarim li ber xwe bidim. Ez ê quralan pêk bênim. Gotibû; ‘‘hinek pere bidin min ez ê di demeke kin de ji vê hûcreyê derbikevim.” Hevalê Elî Çiçek, biraderê hevalê Merwan yê zarokatiyê bû. Wî baş nas dikir.

Got; “ger ku Merwan gotibe ez di vî karî de nînim û ji destê min ewqas tê, êdî kes nikare wî ji biryara wî vegerîne.” Elî rabû ser xwe, hinek pere da biraderê xwe yê kevin. Kesî ne bi çaveke mizemiz lê mêze kir, ne jî

tiştek digotin. Merwan, yekî bejin dirêj û zirav bû, serê xwe bilind kir mîna her carê berê xwe da hûcreya 4 an.

Dema çû ji xwe re digot; “ ez ji lêdanê ditirsim û ez nikarim demek dirêj li ber xwe bidim, wê demê çi wateya xwe tengkirin û serî xwe xistina ber xwe heye?” Yên ku teslîm dibûn dibirin qada 4’ an û ji ber her roj hêjmara wan zêde dibû ji hêla îdareyê ve dihat pîlankirin ku wan bibin qawûşê. Piştî teslîmbûn û hilbijartina dawî û şûnde dozaja lêdanê hinek din zêdetir kirin.

Jixwe her tim heman textîk dihat bikaranîn. Dema çend kes diketin nefsa îskencekaran lêdan zêdetir dibû. Hesabê ku ger em çend dar din li wan bidin wê hinek din bikevin dikirin. Ev hesap carna ser digirt carna jî qet ser nedigirt.

Ji yên li ber xwe didan zêdetir yên ku îşkenceyê dikirin diwestan navber didan lêdanê. Bi qasî biperçiqînin lêdan li wan dikirin. Bi qasî lez dan îşkenceyê zêde dikir.

Û yên ku di qawûşa 37. de li ber xwe didan hemûyan li qada yek bi cî kirin. Hûcreya jêr ya qada sêyemin û salona navber di nava pîsîtahiyê de mabû.

Yanê hûcreya 7’an ji girtiyên berxwedêr tijî kiribûn. Îşkenceya sadîst, ya ku girtî jê re digotin “Deccal” di wê kêliyê de dengê Esat hat bihîstin:

Ji “qada 4. re got tiştên xwe kom bikin! Ez ê we bibim qawûşê. Dê kurên min… zû bikin.”

Girtiyên berxwedêr dizanin dibin vî zimanê şîrîn de çi heye.

Dibe ku di nava yên teslîm bûyîn de yên ku ev îdrak nekiribin hebin… Lê qada 4. êdî neçarbûn hemû gotinên Esat bi cî bînin. Carek dest û lingên xwe xistibûn nava destê dijmin. Dîzgîn di destê Esat de, ew di kîjan alî de bikişîne girtiyê teslîm bûyî neçarbû bi wî alî ve biçe.

Ev qural û rêbaz tenê bi şartekî xirab dibû. Ew şart girtina ber çavan jî gelek bi risk bû. Vale vale negotine, “heya ku kole di xizmeta xwe de qusurê neke, efendî jî hema wisa ji ber xwe de qamçî nade destê xwe.”

Lê di kêliya ku kole di xizmeta xwe de qusur kir, wê demê qamçî dikeve ser pişta kole... Êdî di nava qawûşa 37. de qada 4. birîneke reş bû. Evladeke gayrî meşrû bû. Dema yên di qada 4’ an de diketin rê mîna kerwanan tesbihek notûneh li bîra mirovan dianî. Di

dawiya vê rêwîtiya xwe de di gavavêtina xwe ya yekem de navê vî zarokê pîç lêkirin. Qawûşa 33'an.

Qada 4' an di dema 37. de jî bûn di nava bêdengiyê de bûn. Hebûna wan zêde diyar nedibû.

Lê li ber dengê Esat yê nexweşik qada 4' an valekirin û birina wan, li ser girtiyên diman û yên li ber xwe didan bandoreke mezin dabû avakirin.

Tiştek ji nava wan qut kiribûn û biribûn. Çi dibe bila bibe heval û biraderên wan bûn. Berxika bê çare yê di devê gur de li bîra mirovan dianîn. Ji bo tiştek ji bo wan bikin ji destê berxwedêrên diman tiştek nedihat, ev jî gelek li zora wan diçû. Ma dikarin çi bikin ji domandina berxwedanê zêdetir…

Ji bo yên teslîm bûyîn gelek diqehriyan. Lê aliyên wan yên berxwedanê zêdetir dihat nasîn. Yên diman ji dêla ji ber yên çûyîn ve biqehrin û bifikirin, xwe û berxwedanê difikiriyan. Ji ber tenê ev dibû xilasiya her kesî. Hinek jî bi guman li hev temaşe dikirin. Lê rê ji xirabiyê re bifikirin nebû di nav refên berxwedanê de.

Berxwedêrek diviyabû her tim tiştên baş bifikire. Belê destpêkê qada 4' an biribûn. Piştre jî koma Elazixê. Berxwedêrên ku li wir mabûn bi serê xwe bûn. Her ku hêjmara wan kêm dibû zêdetir hevdu hemêz

dikirin. Xurt bûn, hevalên wan yên pêşeng di hemêza mirinê de ji bo wan bi diran û neynûkên xwe riya careseriyê dikolan. Û her ku xwe xurt didîtin ji bo yên teslîm bûne diqehrîn û xem dixwarin.

Dema ku lêdan û zext bi leza bahozê dihat, tenê daxwazeke wan hebû ala berxwedanê hînek din zêdetir bilind bikin. Di seriyê her livek tizbehê 99'an de hezar fikir derbas dibû. Dema ku di rê re derbas dibûn hinek ji wan dizivirîn li hûcreya 35. temaşe dikir. Hinek ji wan jî bi awirên bê wate li çep û rastê xwe dinêrîn. Tiştên hinekan nebûn, di destê hinekan de jî mîna ku kincir di dest de ye digirt.

Yek jî dema Ferhat û Necmî ji hûcreyên xwe derketin li dawî mabûn; bi fikar digotin"em ê biçin kî derê û çima diçin?" Bi dengê gardiyanan re ser xwe ve hatin. Mîna ku di nava valetiyeke mezin de melevaniyê bikin, di deriyê 33. re ketin hûndir. Dîsa neçar man ku guhdarî dengê ew Esadê pîs bikin.

Di pişt re çawûş jî nesîhateke kir. Lê bîna cihê razanê ya qawûşa 33. ku bîna qerêjiya mehan jê dihat ji wan re zehmetîr dihat. Mîna westandina şer ya salan di nîvê qawûşê de rûniştin. Kes neket nava tevgereke ku xwe li ser wan şûnan dirêj bike. Lewra ji wan re hatibû gotin ku divê hema biçin xwe dirêj bikin. Cihê ku jê re

digotin qawûşa 33. (valahiya di navbera arîk û banê xanî de)bû.

Di mercên wan deman de dema ku hêjmar zêde dibû hemû valetiyên heyî mîna qawûşan dihat bikaranîn

Ev der ne qawûş, depoyeke bû. Her girtiyê ku gava xwe davêt di deriyê hesin re diket hûndir, destpêkê tişta pê re rû bi rû dihatin du tencereyên mezin yên avê bû.

Li ser destê çepê li baremberî derî tankera petrolê dixist bîra mirovan. Kolonake (kolon beton)ya çîmento ku her du tencere ji hevdu cuda dikir hebû.

Du çengilên lingê herdu tencereyan bi hev ve girê didan hebû. Binê tencereyan di dîtina despêkê de mîna hûcreyan dihat dîtin. Ji ber ku girtî bi mehan bû di hûcreyên xwe de bûn, bi hînbûnî ji vir re jî gotin, "hûcre."

Dibe ku girtiyên dihatin wan hûcreyan û hevalên ku di wan hûcreyan de li ber xwe didan ji bo neyên jibirkirin ev nav li wan kiribûn.

Ev jî wan kefxweş dikir. Lê girtiyan hûcreya binê tencereya yekemîn nedipejirandin. Ji ber ku her cara mazgal yan jî derî vedibû girtî bê aram dibûn.

Di milê çepê de, li beramberî tencereyan, dîwareke mezin ku dikir du beş hebû. Ji vî diwarî û valahiya li beramberî tencereyê re jî gotin ‘’xwaringeh.’’ Li pişt dîwar jî sê tuwalet dihat dîtin. Diyar dibû ku ev dîwar piştre hatine çêkirin.

Girtiyan li şûna deriyan betaniyan li deriyên tuweletan xistin. Li hemberî tuwelêtan jî, ranzeyên sitûr rêz dikirin. Ev duqat bûn, yên li beramber jî sêqat bûn. Ji ber qawûş qada navber bû banê wê daketîbû û ji ber vê yekê jî ranzeyên li milê rastê du qat bûn. Şeş şebeke li seran serî ranzeyên milê çepê hebû.

Girtî bi seatan rûniştin tiştên ku jiyankirine û tiştên çêdibûn difikirin. Mîna ku her kes ji hûcreyên xwe rizgar bûbin, ketibin hûcreyên hindirê xwe. Lewra beriya ku mirov zincîra di cîhana xwe ya kesî de bişkîne û derbikeve, wê nikaribe bi keseke duwem re têkilî danîba ango bidabûna avakirin.

Ev rewş û nefsiyeta ku ev mirov ketine navde ev bû: Di wateyek de di dema ku gava xwe avêtibûn nav şoreşgeriyê û di navbera gavên xwe yên dawiyê de nakokî jiyan dikirin. Ji ber ku tevgerê portreya tipa mirovên nû li van mirovan dabû qezenckirin û kesayeteke nû afirandibû. Lê ew xwedî li vê

derneketibûn û ketibûn nava feraseta kevin a sedan salan li wan hatibû barkirin.

Ev jî hilweşandineke mezin bû ku kesê di îdabûna PKK' bûyînê de bû. Lê kesên di zanebûn û ferqa vê de bûn wê di her aliyên xwe yên jiyanê de bidabana diyarkirin. Lewra kesê ku ne di îda û jiyana şoreşgerî de bû jiyaneke bi vî rengî gelek xwezayî bû.

Ferhat bi awayeke xemgînî ev bêdengiya heyî xira kir got; "heval madem em hatin vir ka rabin em bi cî bibin" Ferhat bêdengiya heyî bi vî rengî rakir. Lê di navbera wan de nêzîkatiyeke kolektîf û alikariyê çênebû.

Yên ku li der ve hevdu nas dikirin û li hûndûr nêzî hevbûn bi hev re alîkarî kirin.

Ev alîkarî û nêzî hevbûyîn di rastkirina doşekan de derdiket holê. Di demeke kin di ev doşekên şil û bêna pîsîtiyê jê dihat ji hêla girtiyan ve li ser ranzeyan hatin rastkirin.

Dibe ku dîroka 9'ê Adara 1981'an ji bo her miroveke wateyeke îfade neke, lê her ferdeke qawûşa 33. wê ev dîrok, piştî navê xwe mîna paşnavê xwe bizanibe û wê ti caran jibîr neke. Roja ji her tiştî bê agahî diçû ava, girtiyên qawûşa 33. jî dest bi jiyana rojeke nû dikirin.

Di dema xwarina wan ya êvarê de Esat Oktay mêvanê wan yê venexwandî bû. Di nava qawûşê de ev ji wan re got: “Hûn ê êdî di vê qawûşê de bimînin. Ez zêde tiştek ji we naxwazim. Tenê dema ez hatim hûn ê rabin ser xwe. Hûn ê Sirûda Îstîklalê rojê carek bixwînin. Yek jî di dema hewa girtinê de hûn ê 15 deqîqan perwerde bibînin. Piştî wê dê mehmetcîkên min dema bêhnvedanê bide.

Ez ê jî hemû pêwîstiyên we bicî bînim. Em ê hemû bi hev re jiyana xwe bi kêfxweşî derbas bikin. We hemûyan bi çavê xwe dît ku dawiya li ber xwe dayînê nîne ango bê encam e. Derabin niha jî biçin ser ranzeyên xwe bîna xwe vekin.” Piştî van gotinan ber bi derî ve meşiya. Dîsa paşde hat, “haa, zarokino beriya ji bîr bikim vê jî bêjim. Piştî xwarinê hûn ê diayan bixwînin. Yek jî min pîdeya germ ji we re anî. Wê hema bê. Hûn ê germ germ bixwin” û piştî van gotinan bi awayeke sinsî mîna marek li ber çavan winda bû.

Wê şevê beriya xwarinê tenê tişta girtiyan hemû bi hev re kirin, xwendina dûayê bû. Xwarina karawanê ya ku hatî kesê nexwar. A rastî birsî bûn, lê ne di rewşeke ku bikaribin xwarinê bixwin de bûn.

Piştre pîdeyên yûzbaşî yên germ hatin. Pîde mîna torbeyeke cenazeyan danîn hûndir. Destpêkê kesê

nexwest nêzî vî cesede bibe. Yê ku herî zêde cesaret kir ku nêzî ev cesed bibe, kesê bi navê Şaban bû. Torba anî nava qawûşê û bi dengeke bilind bihayê wan got. Yê ku pere li gel wan hebû girtin.

Yên ku pere li gel wan nebû negirtin. Tevî pere li gel hinekan hebû jî negirtin yan jî nexwastin bigirin. Lê dema dewsa jiyaneke bi vî rengî ya kesî xwe da nîşan û şûnde, hinek girtiyan hîn di destpêkê de fam kirin ku teslîmbûn wê bibe çirkefek çawa.

Dema di hûcreyan de bûn pirsgirêkeke wan ku bêjin ev “yê te ye”, “ev yê min e” nebû. Ev rewş hinek girtî gelek xemgîn kiribû û hejandibû. A rastî ev mînaka nebaş ji bo keseke ku bifikire gelek bi wate bû.

Ev girseya mirovan a 99 hemû ne PKK’yî bûn. 5 ji van “KUK”, 6’ ji wan “Partîzan”, 8’ kawayî û 1’jî “Rizgarî”bûn...

Ev kes hemû bi awayeke rasterast tevlî berxwedanê nebibûn û nehatibûn qawûşa 33. Mînak hêjmareke ji van “KUK” dema diçin dadgehê di rê de dixwazin têlên seyareyê jêbikin, dema dixwazin vê bikin tên girtin û tênin qawûşa 33.

Pêşkeftina êvara roja duwem jî guhertina berpirsyarê qawûşê, alîkarê wî û berpirsyarê qantînê

bû. Îdarê dixwest her tişt di bin berpirsyariya wî de bimeşe. Bi vî rengî herdu kesên ji ber doza partîzanan dihatin dadgehkirin kirin berpirsyar û alîkarê berpirsyar. Ya din jî wê van herduyan li karê qantînê jî mêze bikiribana.

Ev herdu heval tevî hemû xweferzkirinên îdareyê neketin nav nêzîkatiyên xirab, îspiyonkarî û hwd. Her kes çû ser cihê xwe û xwe dirêj kirin. Hinek razan, hinekan jî hewldan razin. Hinek jî li pêşeroja xwe difikirîn: Xeteriyên ku li benda wan bûn çi bûn? Hinek ji wan jî li hevalên xwe yên di hûcreyan de û berxwedêriya wan difikirin. Êdî ji bo girtiyan, dawiya rêwîtiyeke meçhul destpêkiribû...

## Beşa Duwem:

Ger ku em bêjin wê şevê di nava girtiyan de yê herî zêde difikirî Ferhat bû, em ê nexapîn. Li ser ranzeya xwe yê li kêlekê bû, xwe dirêj kiribû û difikirî. Di vê navberê de dîsa yê ku mîna wî difikirî, lê herî zêde tiştên ku Ferhat difikire meraq dikir Ednan Yilmaz çû gel Ferhat: Jê pirsî got; “bira tu çi difikirî?”

Ferhat, li ser pirsa Ednan ji cîhana xwe ya lêhûrbûnê derket rabû ser xwe:

Got; “ ma ez ê çi bifikirim? Ka were rûne.”

Ednan rûnişt. Dest bi nîqaşê kirin.

Ednan, dixwest bipirse ka Ferhat çi difikire, lê wê wêrekiyê di xwe de nedidît ku bipirse, hîn Ednan wisa difikirî Ferhat got, “şêwaza belavkirina pideyên vê êvarê gelek zor û li ecêba min çû. Ferhat dest bi gotinê kir û got: Ma em ê biketiban nava van rewşane jî?”

“Ednan got; bala min jî kişand.”

Lê em ê demek li ber xwe bidin. Ka em hinek der û dora xwe nas bikin, em ê li çareke wê bigerin. Karên me yên ji vê zêdetir hene. Di destpêkê de rewşa ku girseya me ketiye nav divê fam bike. Li gorî nêrîna min a herî girîng ev e Ednan.”

“Hêjmareke zêde ya girseyê gundî ne, ji ber vê yekê hêjmareke pir kêm wê vê rewşê fam bike. Ka mêze bike dema ku pîdeyek hat çawa her tişt ji bîr kirin. Li gorî nerîna min ev mînak rewşa girseyê danî holê.”

Ferhat fam kir ku bi gotinên xwe Ednan hîn zêdetir xemdar kir. Behnek kur hilda û ev bersiv da Ednan:

Got;“ tu vê deyne aliyekî. Ma tu nabînî em jî di nava vê keştiyê de ne.

Baş e, ma me jî hevalên xwe yên di nava hûcreyan de li ber xwe didin nehêlan û nehatin? Ma em jî teslîmkar nînin? Ma niha cudahiyeke me ji mirovê herî ji rêzê heye? Gelo ma mafeke me heye ku em ji vê re bêjin vê bike, vê neke?”

Ednan bêyî ku bersiveke bide serê xwe xist ber xwe û fikirî.

Di dawiyê de rêyeke çareseriyê dît û got; “ welle bira ez çi bêjim, tu baştir dizanî” piştî van gotinan bêdeng ma.

Girtiyan tevî her tiştî, hewl didan li qawûşa xwe bi cî bibin. Dezavantaja qada navber (çatı katı) jî bêavbûn bû. Di vê qawûşê de av bi awayeke dîrhem dihat pîvandin. Ji wan re tenê ji bo paqijiyê hindek av didan. Hêjmareke girtiyan jiyana xwe ya xwezayî dimeşandin,

hinek ji wan jî hîn di cendereya hesab ji xwe pirsînê de bûn. Hinek ji wan jî, mîna ku ji bo ev rewşên bi êş ji bîr bikin xwe bi hinek tiştên şexsî re mijûl dikirin.

Lê hinek girtiyên ku ev rewş hezim nekiribûn, gelek bê hesap hev rexne dikirin. Ev, di aliyek de nîqaşkirina rewşa heyî bû. A rastî mirovên ku hişê wan li serê wan û yên ku nedixwestin ji nirxên şoreşgeriyê dûr bikevin, di roja ku gava xwe avêtibûn wê qawûşê ev pirsgirêk her tim rojeva wan a sereke bû.

Di koşeyeke qawûşê de Merwan rûniştibû li gel çayê cixareya xwe dikişand. Dema ku Amed temaşeyî Merwan kir ku tinê rûniştiye çû gel rûnişt. Merwan, gilaseke çay dagirt li gel cixareyek da Amed.

Destpêkê ji vir, wir axivîn. Lê hûndurê Amed ji acizbûnan tijî bû. Dixwest fikrê xwe bi hevaleke xwe yê ku jê bawer dike parve bike û baxive. Ji ber vê nêzî Merwan bû:

Got; “Merwan serê min gelek tevlîhev e. Ev rewşa ku em ketine nav tu çawa dibînî?

Di van rojên dawî de tiştên li qawûşa me diqewimin tu li ser çi difikirî?”

Merwan raste rast ket nava mijarê.

Jixwe ev taybetmendiya wî ya bingehîn bû: “Velle rewş li holê ye. Em teslîm bûn û hatin. Di dema ku hevalên me li ber xwe didin de, em li vir rûniştine çay vedixwîn. Ji vê zêdetir ez çi ji te re bêjim.

Tu her tiştî bi çavên xwe dibînî.”

Di vê navberê de Keşe yê mezinê hemûyan bû û di heman demê de kêfxweşê wir bû hat gel wan. Gilasa çaya nîvî ya Amed ku li gel Merwan ketibû nava nîqaşê rakir û vexwar. Amed ku hîn nîqaşa xwe berdewan dikir, dema destê xwe dirêjî gilasa xwe kir ket ferqê ku gilasa wî ya çayê vale ye. Keşe jî mîna zarokeke nesekinî ji dûr ve li Amed temaşe dikir û dikeniya.

Di vê navberê de Mahmûd  Zengîn û Eşref Anyik jî hatin gel wan rûniştin. Bi vî rengî sohbet xurt û dewlemend bû.

Tiştên ku di serî Amed re derbas dibû bi awayeke vekirî ji hevalên xwe re rave kir û got:

“Li gor nêrîna min rewşa me bi rengeke vekirî wiha ye: Di cepheyeke şer de tu çawa hevalên xwe di nava dijmin de dihêlî û diçî, rewşa em niha tê de jî heman tişte. Yanê me xiyanet li heval û îdealên xwe kir.”

Merwan lê zêde kir:

“Di vê rewşê de ne partiya me ne jî gelê me bi ti awayî me efû nake.”

Di vê navberê de Ferhat jî hat li nîqaşên wan guhdar kir. Keşe dîsa hat belaya xwe li Merwan da,

Got:“Kîbarê min, tu gelek axivî. Ka wê çayê bide min.”

Merwan got:

“Keşe te dîsa min xist zerarê. Min çend caran ji te re got wisa neke. Niha jî ez neçarim hemû çaya xwe belav bikim.”

Ferhat, ji Keşe re got:

“Were tu jî rûne. Çima wisa digerî?”

Dema Ferhat wisa got, Keşe jî wî neşkand hat li gel wî rûnişt.

Eşref dest bi gotinê kir:

“Wiha we dît, di belavkirina çaya ku hatî de hinek helwestên ku qet li me nedihatin çawa derketin holê? Dibe ku îdaya me ya şoreşgertiyê nebe. Jixwe ger hebûya me dê di hûcreyan de mil daba milê hevalên xwe wisa li ber xwe bidabûya.

Lê tevî vê exlaqek û kesayeteke ku bi salan bû partî dabû me hebû. Bawer im em hîn bi temamî ji vê xilas nebûne. Her çendî me refên berxwedanê ji ber hinek

sedaman berdabe jî, pêwîst nedikir ku em ew çend rezîl bibin.

Herî kêm me dikarî rêz ji hevalên xwe yên li ber xwe didin re bigirin. Ew bi rojan heta bi mehan tîn û birsî dimînin. Her ku ez tiştên bi vî rengî dibînim ez ji xwe nefret dikim!" Li beramberî van gotinên Eşref, Ferhat got: "Ev tişta te ev çend daye şermkirin çî ye ?"

Mahmûd :

Got;"bira ma we nedît, bûyera di mijara çaya hatî de? Weke çay û pîda bibe her tiştê van mirovan. Dema derî vedibe mîna zengilê bi sitûyê xwe ve bikin bireqisin lê tên. Bi qasî serî derziyê ji rewşa ku em tê de ne bandor nabin. Bi rastî jî weke Eşref jî gotî divê em ji rewşa xwe şerm bikin."

"Ev mirovên ku hûn qal dikin kî ne? Hêjmareke mezin ji van kesan ji ber sebeba me kesên gundî yên alîgir û senpatîzanên me ne. Divê hûn di derbarê van mirovan de wisa nefikirin. Temaşe kin ez, bi temamî berevajî difikirim. Ev demek dirêje bi me re, xwe li ber gelek êşan ragirtin û bi me re li ber xwe dan heta vir hatin. Ka wan berdin em li xwe binêrin. Heke rewşa ew tê de xeta be, ya ku em tê de suce."

Yê ku nîqaş didomand û temaşe dikir bi şermî serê xwe dixistin ber xwe. Ferhat, belaya xwe li Keşe da û got:

“Tu çi difikirî mûdûrê maliya Hîlvanê?”

Keşe bi kenê xwe yê her carê yê şîrîn tengbû, zer û şînbû.

Got: “Bixwedê ma ez çi bêjim? Me hevalên xwe li wir hiştin û em hatin. Rêxistin û gelê me çi ji me re bêjin mafdar in.”

Ferhat, bi dostanî milên wî gemrand. Got: Xeman nexwe elbet wê ev roj jî derbas bibin.” Ev nîqaş êdî ji sohbeteke normal derbas bûbûn. Hemû mirovên di qawûşê de yên ku dixwazin cewherê xwe yê şoreşgeriyê biparêzin guhê xwe didan wê nîqaşê.

Ji ber mîna meqnetîzê hevdu dikişandin. Ev kes jî di her fersendê de dihatin gel hevdu. Û Necmî Oner jî tevlî nîqaşê bibû. Di van nîqaşan de pirsgirêkên ku dihatin destgirtin xwest, mîna çareseriyekî fikrê xwe bêje:

“Li gor nêrîna min merca derketina ji rewşa em niha tê de ne, bi salan bû me çawa jiyan dikir dîsa berdewamkirina wê ye.”

Li Ferhat, Amed û Merwan fitilî got:

“Min nîqaşa we guhdar kir. Lê min bi temamî fam nekir. Hûn dikarin vê li gel hevalan jî rave bikin?”

“Ez çi bêjim? Herî baş bila Amed ji we re veke.”

Amed jî di nîqaşên xwe yên bi Merwan re hîn zelal nebûbû, lê wisa axivî:

“Li gorî min me îxanet kiriye. Ji ber ku em mirovên ji rêzê nînin. Bi salan bû rêxistinê ne xiyanetê, berxwedanê fêrî me kiribû. Em jî nebûn layîqê partiyê. Ev rewşa ku em niha tê de ne, em ê ne ji hêla rêxistinê ve ne jî ji hêla gel ve bên efûkirin.” Li ser vê Ferhat li hevalên xwe fitilî got: “Hûn jî tevlî gotinên Amed dibin?”

Mahmûd got:

“Amed rast dibêje.”

Eşref:

“Ez jî wisa difikirim.”

Ferhat got: “Heval, beriya her tiştî têgiha îxanet û teslîmyetê vekin.”

Piştî vê gotina Ferhat bêdengiyeke mezin çêbû, di vê kêliyê de dengê gardiyan hat ew bêdengî xira kir.

Got: “Ji bo derketina cihê hewagirtinê xwe amedekin!” Girtiyên ku bi rojan bû pêwîstiya wan bi hewayê hebû pêl bi pêl mîna ku hewaya xweş û rojê

hemêz bikin derketin cihê bakêşiyê. Weke berê komên dukesî-sêkesî dest bi volta avêtinê kirin. Wisa dizanîn ku li cihê bakêşiyê wê bi dilê xwe û azad tevbigerin. Lê ev kêfxweşiya wan zêde dirêj nekir. Mehmetçîkê yûzbaşî hema mudaxele kir got:

“O, hoo... wisa nabe! Wisa hema kî dixwaze çawa bigere nabe. Destpêkê em 15 deqîqeyan perwerde bibînin. Piştê wê hûn ê vehesin.” Di wê kêliyê de çawûşê bolûkê û bloka gardiyanên din jî hatin cihê bakêşiyê.

Çawûş got:

“Destpêkê bi awayeke ku çar çar bi hev re bimeşin bikevin milê hev.” Piştî ku her kes ket milê hev û şûnde çawûş got: “Rawestin...

Amadebin… û piştre komuta pêşde bimeşe da...” Ji ber ku girtî fêrî van emran nebibûn, hema nikaribûn van quralan bicî bînin.

Li ser vê çawûş, gardiyanan xist rêzê û da meşandin. Ji girtiyan re got li wan temaşe bikin. Piştî vê xwepêşandanê şûnde ji girtiyan xwest ku heman tiştî bikin. Girtiyan, bi awayeke bê serober kirin. Ev, perwerdeya wan a destpêkê bû.

Kêfxweşiya wan ya dawî jî ev perwerde xira kiribû.

Kolombo İsmet yekemin kes bû ku nerazîbûna xwe bi dengeke bilind da derve û

got: “Hevalên me di rojiya mirinê de ne em ji li vir mîna mehmetcîkan perwerde dibînin!”

Piştî demek şûnde gardiyan navbera bêhnvedanê da. Girtî mîna berê ku derketibûn cihê hewagirtinê dest volta avêtinê kirin. Girtiyek bêyî ku gardiyanan hilde diqatê bi kesên yên di qawûşa li beremberî wî de rûniştibûn diaxivî. Ji aliyekî ve rewşa xwe ji wan re digot, ji aliyê din ve jî rewşa wan fêr dibû.

Piştî ku demjimêrek li cihê hewagirtinê man û şûnde çûn qawûşên xwe. Girtiyên ku xwarina xwe ya êvarê xwarin û şûnde çûn xwe li ser cihên xwe dirêj kirin, bi komikên biçûk dest bi nîqaşê kirin. Ednan li kêleka Ferhat rûniştibû û Ferhat ji Ednan re got:

“Beriya em derkevin hewagirtinê hevalên ku me bi hev re nîqaş dikir kom bike, em nîqaşa xwe berdewam bikin.” Adnan, hevalên ku di wê nîqaşê de amedebûn, hemûyan li dora cihê Ferhat kom kir.

Ferhat:

“Belê hevalno, herî dawî pirsa ku beriya em derkevin hewagirtinê min kiribû, ji ber sedema çûyîna me ya hewa sitandinê we nebersivandibû. Dîsa em dest

bi nîqaşa xwe ya beriya niha bikin. Bila Mahmûd bersiva vê pirsê bide."

Merwan:

"Em mêvanên te ne, ma tu cixareyeke îkramê me nakî?"

"Mêzeke tu di vir de mafdar î. Madem hûn mêvanê minin wê demê ez ê jî malxotiya malê baş bikim. Ednan got; ka li wir bangî İkram, Giresor û Efe jî bike, bila bên." Ciqara ameder ne. Dema ku Adnan hewlda ji bo çûyînê rabe Ferhat got:

"Ka temaşekin her kes li bîra min tê, lê hemşeriyê xwe ji bîr dikim.

Ne ku tu ji bîr bikî bangî Bûrokrat û Hespık jî bike bila bên." Yên ku bangî wan hatî kirin hêdî hêdî kom dibin, di wê navberê de Ferhat jî cixare li ser hevalan belav dikir û navendê ameder dikir. Piştî ku yên hatin li cihên guncav rûniştin û şûnde Ferhat got:

"Dê ka Mahmûd , em li benda te ne."

Mahmûd got:

"Heval ez pêwîstî bi axiftineke dirêj nabînim. Ji ber vê ez ê hewl bidim fikrê xwe bi cewherî bînim ser ziman. Dema em rewşa xwe dinirxînin divê objektîf bibin.

Tiştên ku partiyê di hûndir û derve de daye me, şert û merc çi dibin bila bibin pêwîst e em dev ji rêgezên partiyê bernedin. Di dema ku hevalên me li ber xwe didin de, me xwe ji gel wan qut kir û hatin. Bila kes hewl nede qilifek li ev rewşa me ya objektîf bike.

Li gorî vê, tenê rêyek heye em xwe bi gel û rêxistinê bidin qebûlkirin, ew jî di demeke kin de vegara nav koma berxwedanê ye. Ez bawer im wê ev jî suçê me kirî ji holê raneke. Lê weke ku em hemû jî dizanin, di têkoşîna girtîgehê de ji bo em xwe bidin qebûlkirin qadeke pratîkî ya berfireh heye.

Di nava vê de pêşniyara min ev e: Ji bo em beşdarî nav refên berxwedanê bibin, divê em dest bi amedekariyan bikin.” Piştî axiftina Mahmûd a hinek bi hêcan Necmî dest bi axiftinê kir û got:

“Tiştên ku hevalê Mahmûd gotî ez tevlî dibim. Lê bi vî rewşê ve divê em rewşa girseya xwe jî bidin ber çavan. Yanê dixwazim vê bêjim:

Artêşeke di şer de binketî ji nû ve anîna gel hev, xistina nav şer dibe di destpêkê de hinek zehmet bibe, lê ne tişteke ku neyê kirine jî. Niha tişta herî lezgîn ku em bikin, avakirina jiyana komûnê ye. Armanca me ji vê parastina cewher û kesayetiya şoreşgerên ku

dixwazin bên gel hev e û berxwedanî li ser esasê komînan înşakirine.

Amed got:

“A rastî di vir de tevlî Necmî dibim heta dikarim bêjim ku em dereng jî mane.”

Ednan:

“Heval, kêliya ku em çûn qawûşê, heta Amed jî dizane, dema em li qawûşa 37. bûn dema me dibirin cihê hewa kêşanê her çendî ne berfirehî jî be heval Ferhat li ser van mijaran bi me re axivîbû.

Yanê kêliya ku me gava xwe avêt vê jiyana kirêt, di heman demê de me dest bi nîqaşa riyên ku em careke din çawa vegerin kir. Lê ez bawer dikim ku ev di me hemûyan de jî bûye, lê kesî ev nêrîn nexist pratîkê. Ez jî tevlî tiştên tên gotin dibim. Bi taybet li gel pêşneyara Necmî dixwazim vê jî bêjim:

Yên ku girseyê li pey xwe bibin em in. Ger ku em bi qasî tê xwestin vê berpirsyartiyê hîs nekin û nexebitin, yanê berxwedanê bi rêxistin nekin, xwe bidin quncika xwe bêdeng bimînin, li wir suçdar wê ne bibe girse, sucdar em in yên ku li vir dirûnin. Ger guncav bibînin, dixwazim hinek li ser avakirina komunê nîqaş bikin.”

Ferhat got:

“Heval tiştên ku we gotine bi giştî rast in. Ez jî tevlî dibim. Lê ger hûn dîqat bikin, heval Mahmûd gotibû, “divê em rewşa xwe bi awayeke objektîf binirxînin. Bi rastî jî ger ku em dixwazin rewşa xwe bi awayeke objektîf binirxînin, di vê em vekirîbûn ango zelalbûn ji hinek têgihên di serî xwe û yê girseyê de hene bênin ziman û binirxînin.

Heta ev neyê kirin wê kareke bi tenduristî dernekeve holê. Yanê rewşa ku em tê de ne ger fam nekin, nêzîkatî û tevgerên hestyar wê me nebe ti cihan. Pirsa ku beriya niha min kirî kes ji we bersiv neda. Ger hûn diqat bikin we hemûyan jî got:

“Me xiyanet kiriye, partî û gel me efû nake’’ we tenê bal kişand ser mijarekê. Ev rast e, lê ji bo me kêm e. Ez ê bixwe bersiva xwe bidim. Teslimbûn û xiyanet du têgihên cuda ne. Ger li gorî gotina we me xiyanet kiribe, wê demê ti wateya nîqaşa ku em carekedin vegerin nav refên şoreşgeran nîne.

Ji ber ku nîqaşa xiyanetê çênabe. Xiyanet di şêwayeke dijwar de tê cezakirin. Temaşekin teslîmbûn, derenceya yekem ya ku diçe îxanetê ye. Ger hûn dîqat bikin, di vê mijarê de di şîarên rêxistinê de ev soz heye: ‘‘***Teslîmyet Dibe Îxanetê, Berxwedan Jî Dibe Serkeftinê!*** ”

Di vir de teslîmyet û îxaneta qala wê tê kirin du têgihên cuda ne û di navbera herdu têgihan de demeke diyar heye. Di vê em têgehan li şûna wan bi cih bikin binirxînin û fam bikin. Rewşa me ya objektîf teslîmiyet e. Pêwîst e em hemû vê bibînin û binasin. Ger ku em, di vê navenda teslîmiyetê de ji nû de hêza xwe kom bikin û xwe bi rêxistin bikin, em ê zincîra teslîmiyetê bişkînin û bigihîn nasnameya xwe ya berxwedaniyê.

Ev gava me ya ne di cî de ku me avêtiye bêguman ji hêla hevalên me ve wê bê nirxandin. Ez di wê baweriyê de me ku vegera me ya nav refên berxwedanê, wê him rewşa me sivik bike û him jî wê bibe sedem ku hevalên me di derbarê me de biçin nerînên baş.

Ger em vê helwesta xwe ya teslîmiyetê mîna tarzeke jiyanê bidin dest û hin pêşdetir bibin, wê demê cihê ku em lê bisekinin wê bibe îxanet. Bêguman weke ku Necmî jî gotî wê karê me zehmet bibe.

Ji ber rewşa me ya niha, mîna nîvê artêşeke di şer de bi bin ketibe tîne bîra mirovan. Ev hêza nîvî ya ku di şer de bin ketiye ji nû de komî ser hev kirin û xistina nava şer erka me ye.

Û eşkereye ku wê ev erka me gelek zehmet be. Em raste rast nikarin ji girseya xwe re bêjin ku “werin em carekedin vegerin nava refên xwe” ya ku me beriya

niha terka wan kiribû. Tişta sereke ku em bikin, weke we jî gotî divê em jiyana komîn bidin avakirin. Ez di niha de ji we re pêşniyar dikim ku dest bi xebata komînê bikin. Di vê mijarê de li benda nêrîn û pêşniyarên we me.”

Alık pirsî û got:

“Ev xebata komînê wê vekirî bê kirin, yan jî veşartî?”

Eşref got:

“Li gor nerîna min vekirî be baştir e. Ji ber ku em kar veşartî bikin, hinek mirovên durist yên ku li hemberî me sempatî dibînin dibe ku wê demê tevlî nebin.”

Bûrokrat:

“Pêwîste em şartên heyî paşçav nekin. Ger hûn dîqat bikin, axiftinên yûzbaşî yên wê rojê di derbarê komînê de bû. Heke ji hêla îdarê ve bê hîskirin ku jiyana komînê tê meşandin ev, dibe ku bibe sebeba bilavkirina me. ”

İkram axîvî got:

“Tiştên ku Bûrokrat gotî divê li ber çav bê girtin.”

Ednan ji yên din pirsî û got:

“Başe hûn çi pêşniyar dikin?”

Girêsor:

“Li gor nerîna min, ji dêla ku em raste rast ji girseya xwe re bêjin komîn heye, bi şêwazake bi hev re alîkar kirin û yên ji heman herêmê jî anîna gel hev re dest bi rêxistinkirinê bikin, wê hîn baştir be.”

Birokrat:

“Tiştên ku Girêsor got rast e. Ji ber ku îdare di dema xwarinê de yên hemşerî hev li gel hev rûniştî bibîne wê bêje hemşeriyê hevin û wê tişteke din ferq neke.”

Mahmûd axivî got:

“Heval şêwaza jiyana ku we pêşniyar kirî herfî ye. Ev li gorî me guncav nîne. Ev şêwaza jiyana ku we pêşniyar kirî bibe bibe di navbera girtiyên adlî de derbasdar dibe.”

Amed got:

“A rastî Mahmûd rast dibêje. Em ne harfane, divê jiyana komîneke şoreşgerî birêxistin bikin. Ji ber jiyana şoreşgerî wê me hîn zêdetir nêzî hev bike, herî kêm amûreke ku nirxên me yên şoreşgeriyê biparêze wê çêbibe.”

Merwan axivî got:

“Heval ger ku min şaş fam nekiribe, we rewşa ku em tê de ne vekir û qala destpêkirina berxwedanê kir. Û we got ancex înşaya vê berxwedanê li ser jiyana

komînê bê bidestxistin. Ger rewş bivî rengî be, wê demê divê em komîneke vekirî birêxistin bikin. Bila vekirîbe ku kî tevlî bibe kî tevlî nebe bizanibin. Tevlîbûna ji berxwedanê re çi vekirî çi jî girtî encax bi vî rengî bibe.”

Ferhat got:

“Bi qasî ku min ji axiftinên we fam kir, du nerîn derket holê: A yekem, rêxistinbûneke li ser bingehê alîkariyê digire nava xwe, ya din jî tarzê komîna şoreşgerî ya ku bi salan e em dimeşînin e. Ger ku em ya yekem bi rêxistin bikin û bêxin warê jiyanê, bi vî rêbazî bi jiyanê re sînordar bimînin wê demê dê ev, ji xizmeta armanca ku me şêwirandî dûr be.

Lê ger em piştre veguherînin jiyana komîna şoreşgerî wê pirsgirêkeke xwe nebe. Nerînên min yên kesî, bi awayeke vekirî avakirina komîneke şoreşgerî ye. Ger ku qala sebeba wê bikin: Di destpêkê heya niha de di mijara ji nû de dest bi berxwedanê kirin em hemfikirin.

Wiha, komîneke vekirî û jiyaneke şoreşgerî ku ji vê re xizmet bike pêwîst e. Piştî me rewşa girseya xwe zelal kir şûnde, wê derbikeve holê ku di çi astê de piştgirî bidin me. Bi vî rengî hêza me, wê rewşa girseya xwe ya li vir bi awayeke zelaltir fam bike.

Bi awayê rêbaz pêşniyara Girêsor baş e. Komên komînan wê bi awayê taybetmendiyên herêman bên avakirin, lê wê bi qasî misqalekî jî ji komîna şoreşgeriyê cuda nebe. Ji vê kêliyê û pê de em komên xwe destnîşan bikin.

Ez bawer im yên ku bi me re tevlî nav jiyana komîn bibin wê bigehe hêjmareke 60-65’an. Em dikarin komînê bi awayeke 6-7 kesan birêxistin bikin. Di her komînekê de wê berpirsyarek hebe. Pereyê ku ji kesên di nava komînê de bên re wê bişînin navendê, navend jî wê ev pereyê di destê wan de di navbera koman de beş bike û ji bo nexweşan jî foneke taybet bê avakirin.

Li koma 1: Amed, koma 2: Hespık, koma 3: Merwan, koma 4:

Eşref, koma 5: Mahmûd , koma 6: Necmi, koma 7 jî wê: Efe û Alik

meyze bikin.

Girêsor jî, ji gel çend welatparêzên me hene ew jî li wan meyze bike. Le ew, bila kirariyeke(îşlem) ji me cudatir bibînin. Di mijara cixare, çay û tiştên mîna wan de bila cudahiyeke wan ji me hebe. Dibe ku kom li hember mayîna me ya li vir bên guhertin.

Bi taybet ji bo rewşa me ya dawî ku em ketine nav, pêwîst e em girseyê nexin nava dîsîplîneke teng ya şoreşgeriyê."

Merwan, bê cixare mabû û canê wî dixwiriya. Mîna her carê dîsa belaya xwe li Ferhat da û got:

"Te ji fecara sibehê ve me li vir kom kiriye, tenê cixareyeke daye me. Ma li memleketê we malxotiya malê wisa tê kirin? Ka çend paketên cixarê dêne vir da ku em vexwin."

Dema Ferhat bi kêfxweşî rû bi rûyê Merwan hat bi henekî bersiv da û got:

"Li memleketê me destpêkê karê mîvanan bidawî dike, piştî ku dirûçikîne û şûnde li gorî rewşa wê digire dest."

Bersiva dijber wiha bû:

"Bixwedê bira, hûn gelek mêvanperwer in. Çavên min rondik barand in." Piştî ku Ferhat bi vê heneka xwe girse dilşad kir û şûnde, pakêta cixareya Maltepe danî pêşiya wan. Lê beriya ku deyne bi destê xwe cixareyeke ji pakêtê derxist dirêjî Merwan kir.

Bahrî yê ku di vê nîqaş û sohbetê de mêvan bû xwe li ser ranzeyeke dirêj kiribû guhdarî wan dikir li Ednan

zivirî û got: “Bi qasî ku ez dizanim jiyana komîn jiyana şoreşger û komînîstan e.

Lê rewşa em tê de ne, devjê berdin şoreşger bikevê, rewşeke wisa ye ku di vê welatparêzek jî nakeviyê ye.”

Eşref dest bi gotinê kir û got: Li gorî nerîna min mirovên ku li virin yek jî vê heq nekiriye.

“Tişta ku te kiriye jê re tê gotin beredayîtî. Ma em ewqasî nizanin? Jixwe di jiyankirina komîneke bi vî rengî de em ê bizanibin wê kî cî bigire kî negire tesbît bikin.

Ev jî heye: ‘‘Heta di nava vê hefteyê û deh rojan de nêzîkatiyên jiyana hinekan ya kesî derket holê.” A rastî Behrî li gel nerînên xwe mebesta xwe jî danîbû holê. Ji hêla Eşref ve bersivek wisa jê re dayîn, wî veguherand bilbileke ku tu xwaribe.

Behrî li gor standartên welat zarokê malbateke rewşa wan navîn bû. Dema ku têkoşîna şoreşgerî di herêma wan de pêş ket ew jî neçar ma ku têkilî dayne. Ti caran niyet nekiribû ku bibe şoreşger yan jî proleter.

Dema ku bi zehmetiyan re rû bi rû hat li behaneyan geriya ku têkiliya xwe ya heyî qut bike. Dema rewşa hemşeriyê wî Mehmet derket holê wî jî vê ji bo xwe kir

behane, têkiliya xwe ya bi tevgerê re qut kiribû. Ji ber vê jiyana komîn û şoreşgeriyê jê re zehmet dihat.

Bi vî rengî qawûşa 33. civana xwe ya yekem li dar xistibûn. Ev di wateyekî de barîkata parastina tevgereke ku rihê şoreşgeriyê diparêze bû.

Ev gava yekem bû ku ber bi hevalên xwe yên ku li hember hemû îşkenceyan li ber xwe didin diavêtin. Ji bo wan helqeya girêdanê ya bi hevalên wan yên pêşeng ku li ser doşekên mirinê dirêjkirîne.

Ev tevgereke tolhildanê ya ku bi rojan bû van mirovan nedikarin nefes bigirin bû. Êdî ev him tedaviya Amed him jî yên ku mîna wê digevizîn bû. Ji ber van mirov tevî her tiştî dixwestin nirxên xwe hemêz bikin.

Nedixwestin gava ku avêtibûn hinek din pêşdetir bibin. Û piştî girtina vê biryarê çavên wan diberiqand, dilê wan kêfxweş bû. Bêguman jiyankirin zehmet bû, lê di girtîgeha Amedê de jiyan zehmetê zehmetiyan e. Ji bo li ser linga mayînê diviya bû li ser pira silatê cambaztî bihatiya kirin.Di ciheke ku îşkence û hemû şêwayên zordestî, tundî mil lê gerandiye de bi ken li jiyanê bê temaşekirin; pira ku dirêjî pêşerojê bibe bi beden, xwîn, ked û îdeayan avakirin, beriya her tiştî diyet razandinê pêwîst dike.

Bûyîna miroveke ji rêzê gelek hêsan e. Lê di vê girtîgehê de mîna mirovek ji rêzê mayîn jî jêhatîbûnekê dixwaze. Ya herî giring sînorên heyî tangav kirin û hinek tiştan dana têkoşînê ya herî bingehîn bû.

Sibê dema bergeşa (sofra) şoreşê hat raxistin, wê şahiyeke ku zikê her kesî têr bike bê raxistin... Roj û şev di nava girtîgehê de girtîgeh bû. Ev girtîgeh ne ji birsînan, bê avî û tinebûnê bû. Nerihetiya nekirina hinek tiştan û teqandina xunçeya jiyanê bû.

Her wiha Keşe, yê ku di her awirekî xwe de îksîrên (iksirleri) jiyanê belav dikir, her çendî mîna berê nebe jî dikeniya. Û ev kêfxweşiya xwe bi Amed re parve dikir û digot: "Îşev ez gelek rehet raketim."

Piştî xwarina sibê û şûnde di qawûşê de dest bi xebateke xurt ya nîqaş û xebatê hat kirin. Her kes li gor ku plana hatibû dayîn bi nasên xwe re diaxivî. Mîna ku Ferhat gotî 63 kes tevlî komînê bûn û li gor koman hatin parvekirin. Pere di demeke kin de ji navendê re hat dayîn û li ser koman hat belavkirin. Di vê navberê de Ferhat ji min re got, "Îkram bibînin bênin gel min." Keşe Îkram dît û anî gel Ferhat.

Ferhat got:

"İkram di demeke kin de listeyeke qantînê çêbike, bêyî ku ji bîr bikî, tiştên ji bo nexweş û yên temenê wan mezin çi pêwîst be binivîsîne. Ji niha û şûn ve tu yê li vî karî mêze bikî."

İkram got:

"Bira tu jî dizanî dema em hatin vir ji bo ev kar ji hêla îdarê ve partîzan hatibûn hilbijartin. Tevî hêjmara zêde ya girseyê yê me ye, ma rast dibe ku ev kar ew bikin?"

"Dizanim, dizanim. Tu dîsanî listeya qantînê binivîse û bide wan. Tenê karê qantînê nîne, meseleya berpirsyarê qawûşê jî heye. Di demeke kin de em ê him berpirsyartiya qantîn û him jî ya qawûşê bigirin.

Ka bila hinek din dem derbas bibe. Yek din jî hûn dizanin, yên ku bi berpirsyariyên qawûş û qantînan re eleqedar dibin ji bo ti girêdaneke wan bi partîzanan re nîne em ê raste rast bi wan re baxivin."

Li gel derbasbûna rojan yên ku ketibûn psîkoza îxanetê ji ev rewşên xwe yên giyanê ku tê de bûn xilas dibûn. Bi xebata ku dihat kirin re di nava girseyê de jî kombûnek çêdibû. Her çendî asta jiyana komîna ku bi dest hatî xistin pir baş ne be jî, di mercên wan rojan de

ya herî baş bû. Ji ber di demeke kin de girse ketibûn ferqa vê guhertinê.

Jiyana şoreşgeriya berê ji nû de avakirin, ne serkeftineke ku biçûk bihatiba dîtin bû. Bi vê ve girêdayî bernameya jiyana rojana gav bi gav dihat rûnişkandin. Çîzelgeya paqijî û nobeta rojane hatibû çêkirin.

Hêjmara van mirovan ya herî zêde rewşa wan ya darengî (Maddî) baş nînbû. Di warê aborî de jî wê bi hinek zehmetiyan re rû bi rû bihatiban. Hêjmareke zêde yên ku rewşa wan ya darengî başbû tevlî nav komînê nebibûn.

A rast hinek ji yên di nava van de bi awayeke vekirî ji Ferhat re gotin: “Dibe em nikaribin di jiyana komîn a ku we ava kiriye pê re bibin yek, lê em dikarin ji derve de alîkariyê bidin we. Bi nêzîkatî û helwesta Ferhat re ji gelek mirovên ku ji derveyî komînê diman alîkarî dihat girtin.

Ferhat bi taybet li hember van mirovan ti caran neket nava helwesteke ku dilê wan bê êşandin û sekter nêzî wan bibe. Her tim ev şîret li hevalên xwe dikir û digot: “Divê em bi helwest û nêzîkatiyên xwe, xwe bidin qebûlkirin.”

Ji derveyî PKK’ yiyan rewşa girtiyên tevgerêndin yên siyasî zêde baş nebû. Ji bo yên ji derveyî partîzanan diman gotina herî baş ku ji bo wan bê gotin, “Gundê pir qralî bû.” Tevî çend komên ji hêjmarên biçûk pêk dihat jî bi ti awayî jiyaneke bi rêk û pêk nedidan avakirin.

Rewşa partîzanan jî ya darengî baş nebû. Ferhat ji hevalên xwe xwest ku partîzanan jî mîna komîneke xwe bihesibînin û pereyê ku didin her komekî xwe, heman pere ji partîzanan re jî bê dayîn.

Hevalên Ferhat jî ev nêzîkatî qebûl kirin bi heman şêwayî alîkariya pere bi partîzanan re kirin. Lê ev tenê alîkariya pere bû. Yanê partîzan ne di nav jiyana komînê de bûn. Bi vî rengî partîzanan jî bi awayeke xwezayî di nava jiyana qawûşê de bi cî bûn.

A rastî Ferhat vê ji hevalên xwe re digot: “Min bi hemû komên li derveyî me dimînin re nîqaş kir. Min ji wan re pêşniyar kir ku tevlî nav jiyana şoreşgerî bibin. Lê mixabin bersiva ku min ji hemûyan jî girt neyênî bû.

Wiha digotin: Di vê navendê de naxwazin tevlî nav jiyana şoreşgerî bibin. Sedema xwe jî wiha tînin ziman: “Sibe du sibe birêxistinkirina komînê derbikeve holê dibe ku em ev navenda baş winda bikin.”

A rastî ji rewşên xwe razîn e. Ev ne di şertên xwezayî de jî avaniyeke bi tenduristî bi me re û di nava xwe de nedan avakirin, di rewşeke wisa zehmet de qet nakevin nava jiyana komînan. Ev zelal e wê nekevin nav jî.

Lê divê berpirsyariya şoreşgerî ku dikeve ser milê me her tim bi cî bînin. Em van hemû bidin aliyekî. Di gelek mijaran de jî fikrê me û yê wan nabe yek. Bi taybet di derbarê KUK' de vê dibêjim, bi rastî jî fikrên wan yên ecêp hene. Di vê qonaxê de berxwedaniyê mîna întiharê dibînin. Yanê li gorî wan berxwedankirin întîhar e.

Ji ber ev nêzîkatî û tesbîtên xwe tevlî nav ti berxwedaniyên li girtîgehê nebûne. Yek din jî îdayeke KAWA yiyan ya tewş wiha heye, dibêjin: "Em berxwedaniyê dana domandin rast dibînin. Divê li ber xwe bê dayîn. Lê şert nîne ku her kes bikeve nav berxwedanê. Dibêjin weke temsîlê me Mahmûd hîn li ber xwe dide."

Partîzan jî li gel cudahiyên xwe di derbarê berxwedanê de riyakar nêz dibin. Ti caran nabêjin em li beramberî berxwedanî dana meşandinê ne. Di berxwedaniya 1981'ê de mîna helwesta ku dabûn raberkirin, weke tevger dev ji berxwedanê bernedan.

Nerînên van ji despêkê de tên zanîn. Tişta dixwazim bêjim ev e ku, ev xwe weke berxwedêr nîşan didin, lê di rastî de ji bo li ber xwe nedin tişta ji destê wan tê dikin.

A rastî hinek unsurên wan dibêjin berxwedaniya ku niha li girtîgehê tê meşandin rast dibînin û rêz didin nîşan, lê ev polîtîkaya wan ya giştî nade guhertin. Tevî van hemûyan divê her tim em bi yên derveyî xwe re di nava danûsitandin û alîkariyê de bin. Di aliyekî de ev ji bo me weke pêwîstiyek e. Ez texmîn nakim ku ji van zarer bê me."

Piştî ku Ferhat, aliyê din yê qawûşê ji hevalên xwe re got û şûnde rihet bû. Bêdeng û miskînê qawûşa 33. Halo bû. Bi bejin û bala xwe ya dirêj û çavên xwe yên mezin abîdeyeke bû di nava girtiyan de.

Yê herî bê biryar jî dema li wî temaşe dikirin hûndirê wan tijî hêvî dibû. Ji wî safbûn û dirûstî diherikî. Bi mehan bû dilê kesî neşikandibû. Di wan mercên zehmet û bê rehm de ti caran pirsgirêk dernexistibû.

Halo, ji Qiziltepe gundên deştê bû, dema ku li ber deriyê sohbetên xurfeyên gund bû, naskirina wî ji şoreşgeran re çêbû, şoreşgeran cihê herî xweş li gel

xwe jê re veqetandibûn. Di çavên Halo de şoreşger bi malê dinyayê nedihatin pîvan.

Cara yek bi naskirina şoreşgeran re wateya jiyanê fêr bibû. Ev cîhana wî ya biçûk di carekî de mezin bibû. Di demên dawî de bahoza şoreşa dijber ya ku di welat û girtîgehê de dihat bandora xwe li ser Halo jî kiribû.

Bi bejna xwe ya dirêj ve, li gel mirovên sîmav (civa) cihê xwe girtibû, lê bahozê bejna wî hinek din tewandibû. Wate nedida hebûna ku em jê re dibêjin mirov ev çendî bêrehm be. Halbikî dizanîbû ku dijminê xwe naskiriye. Ji ber dema ku hîn zarokeke biçûk bû ji dayîka xwe dipirsî û digot: “Dayê bavê min li kî derê ye”, “wê kengê bê?”

Dayîka wî jî her tim bi bersivên cewaz kurê xwe mijûl dikir digot: “Kurê min, bavê te li ciheke dûr e, dibe ku niha li ser kendalên çiyayên Başurê Kurdistanê di kemîneke de be. Dibe ku di behnvedana şevê de te û birayên te difikire. Wê bê kurê min, elbet wê rojekê bê...”

Bavê Halo hatibû. Lê hîn kurê xwe nedîtî, têra dilê xwe maçî nekirî ji hêla eskerên Tirk ve hatibû girtin, piştî demeke û şûnde ev xebera bi êş di dilê xwe de hîs kiribû.

Dayîka wî got: “Bavê te daliqandin kurê min, ew êdî tu caran nayê. Ne tu li bendê bimîne ne jî ez bimînim, êdî tu mezin bûyî, ma ez ê heya kî derê ji te veşêrim; daxwaza min ev e ku çeka bawê te ya ku li erdê mayî tu rojekê rakî...”

Halo, her tim ev şîretên dayîka xwe mîna lorîkan guhdar kiribû. Bi vê hêrs û azweriyê re mezin bibû. Aliyekî hêrsa wî ya welatparêzî, aliyê din jî li hember şoreşgeran sempatî dida avakirin. Tişta herî bingehîn ku Halo anî nav refên şoreşgeran, zimanê Ferhat yê şîrîn û nêzîkatiyên wî yên nirx dida mirovan bû. Halo naskirina xwe ya ji şoreşgeran re wisa bi lêv dikir. Ji vegotina vê teng nedibû û digot: “Ez evîndarê welat û gelê xwe me. Dema ku yekî li gel min qala Kurdan bikiriba muyên laşê min radibûn, baweriya min zêde dibû.

Piştî 1978’an û şûnde DDKD’yî dihatin gundê me û diçûn. Tiştên wan digotin min zêde fam nedikir. Ew ji bo min ciwanên Kurd bûn. Heskirineke min ya mezin li beramberî wan hebû. Min her tim parçeyeke nanê xwe bi wan re parve dikir.

Lê piştre hatin û çûyîna Ferhat wan çêbûn. Ew jî ji bo min heman tişt bûn. Ez ti caran li gor tevgerên wan

nêzî wan nedibûm. Ev car nebejî rojek dê DDKD yî û Ferhat rû bi rûyê hev bên? Ketin nava nîqaşê.

Hemû gundiya bi dil û can ew guhdar dikirin. Ferhat tenê bi serê xwe wan hemûyan bêdeng kiribû û heyrantiya me hemûyan qezenc kir. Êdî gundê me divê tercîha xwe bikiribana. Gundê me hemû em ketin nav partiya Ferhat."

Di vê navberê de girtiyeke xwe negirt got: "Halo, te got partiya Ferhat." Başe ma te wê demê navê partiya wan nedizanî?"

Halo kenî got: "Me wê demê partiyê nedizanî ji wan re digotin 'Şeyh Barut'."

Dîsa girtiyekî din ket navberê û got:

"Halo, Şeyh Barut çiye?

Dema ku got cara yêk vê ji te dibihîsîn," pirqepirqa ken bi Halo ket:

Got: "Xwarzî, tu nizanî. Tu li ku Mêrdîn li ku?

Li Mêrdînê ji dêla gotina Apoyî 'Şeyh Barut' gotin ya herî baş bû. Niha jî ez ji we re vekim. Partiya Ferhat gelek şer kir. Yanê bi çek her tim bersiva muhbîr, ajan û xayînan dida. Wisa yê ku mirinê heq kiribû heman di dema wan de cezayê wan dihat dayîn.

Ji ber vê PDK' ( KDP) yên berê ev nav li wan kiribûn. Me jî ev nav bihîstibû, lê me qet wan nedîtibûn.

Ji ber digotin ku 'Apoyî di bin erdê de dixebitin.' Carna min bi vê safbûna xwe digot başe; 'ma ev qet dernakevin ser rûyê erdê?' Wiha dema naskirina min ji Ferhat re çêbû min her tişt fam kir. Û em ê çawa xilas bibin ez cara yek ji wî fêrbûm."

Yên di qawûşê de diman digihîştin avaniya xwe ya berê. Ji aliyekî ve lîstika Ferhat wan a satrancê, ji aliyê din ve jî henekên herdu kesên dilşat Keşe û Kolombo Îsmet asta maneviyata qawûşê bilind dikirin. Lêystika Ferhat û Merwan amûra moralê ya herî li pêş bû di qawûşê de. Lîstika satrancê hatibû qedexekirin.

Lê mirov li hember van qedexeyan derdiketin. Dema ku kevirên satrancê nedibû girtiya ji hevîr kevirên satrancê çêkirin. Merwan yê ku mîna Ferhat ji satrancê hez dike, ji hevîrê nava nan de taximeke satrancê çêkiribû.

Him dê satranc çêkiriba, him bilîstiba û him jî veşartibana. Ger satranc bê girtin wê him satranc biçe, bi yên ku pê dilîzin re û yên di qawûşê de jî wê lêdan bixwariban. Tevî vê, leystikên satrancê vediguherî turnuvayê. Hinekan aliyê Ferhat digirt hinekan jî aliyê Merwan digirtin. Her kes dixwest aliyê ku girtiye ser

bikeve. Yek jî mirov ji nîqaşên ku di van lestîkan de pêş diket têr nedibû.

Hele henekên Ferhat yên li Merwan û derdor dikir tameke xwe yê pir cudatir hebû. Dema ku Ferhat hemleyekê dikir, kevir didanî û digot: “Haydî Merwan. Ger tu wisa bi texlîtkirina Apoyiyan re bileyîzî wê wezîrê te jî biçe, qela te jî biçe, filê te jî biçe. Tu yê hemû hêza xwe nedî pêş. Tu yê kombînasyonan ava bikî.”

Merwan, ji aliyekî ve difikirî, ji aliyê din ve jî hewl dida van gotinan fam bike. Lê nedikarî ne bersiva hemleyên Ferhat bide ne jî dikarî xwe biparêze:

“Em çi bikin, em harbî dileyîzin. Çiyê me heye di holê de ye.”

“Naa, di şer de wisa harbîtî nabe. Ger tu herbî derkeve holê, dê wisajî çira te bişewitînin.

Wezîrê xwe bigre, turşuya wî ava bike. Ka temaşekin wê ji me re harbî bileyîze.” Dilê Merwan li ser wezîr bimîne, yan jî binkeftinê qebûl bike û terka lestikê bide… Lê Merwan rikdar e. Lîstik berdewam dikir digot, “ez ê heya dawî li ber xwe bidim.” Dema Merwan vê digot, dixwest bêje ku “carekdin teslîmiyet di pirtûka min de çênabe.” Lîstikên satrancê her tim wisa

bi koşan (çekişmeli)derbas dibû. Hêjmara girtiyan ya zêde lîstika satrancê dizanîn. Di aliyê din yê girtîgehê de jiyan pir cudatir bû. Girtiyên di qawûşa 37. de anîbûn qawûşa 35.

Girtiyên li ber xwe didan hemû anîbûn qawûşa 35. Ev demek bû rojiya mirinê dest pê kiribû. Bi awayeke fîîlî yên ku li ber xwe didan li hember hemû zehmetiyan berxwedaniya xwe didomandin. Carna lêvên xwe bi dilopên barana ku di navbera banda dihat xwarê şil dikirin, carna jî bi libek birinc îdare dikirin.

Dijmin wan hemûyan mîna hestî û çerm hêlabû. Bi mehan bû bi nasên xwe re havdîtin çênekiribûn. Sipî(pit) li ser canê girtiyan yê çerm û hestî zêde bibûn. Dibe ku ew jî di nava qehra ku weke dixwazin nikarin xwîn ji canê wan bigirin de bûn. Heta ku berxwedan didomiya, yanê yên ku teslîm dibûn rehet dibûn, heskî bila qet li ber xwe nedin heskî bila li ber xwe bidin û teslîm bibin, yek, yên ku dihatin quralan hebûn, yên din jî yên ku li ber xwe didan.

Esat Oktay her tim ser yên ku li ber xwe didin de diçû; hemû enerjî û keda xwe li ser perçiqandina girtiyan xerc dikir.

Yek din jî yên ku teslîm dibûn mîna du beşan cuda dibûn: Hêjmarek li gor hêza xwe li hember vê

wehşiyetê derketibûn, lê hêza wan têr nekiribû û refên berxwedanê terikandibûn. Hêjmareke din jî qet li ber xwe nedabûn. Evna hêjmareke gurên bê hestî mayiyên kevinbûn ku teoriya teslîmbûnê ava dikirin.

Mîna ku li ber xwe nedabûn, mafê xwe didîtin ku hemû gotinan ji girtiyên li ber xwe didin re jî bikin, dikirin. Dema ku zeleyek dixwarin ji dêla ji dijmin aciz bibin, xebar ji girtiyan re dikirin. Digotin: “Ger ev Apoyî nebûna ne 12 Îlonê dibû, ne jî me ewqas lêdan dixwar. Sebeba hemû êşên ku em dikişînin, ev mirovên macarayên cahîl û hov in. Gelo me di van mercan de berxwedan çêdibe? Ev bi yek gotinê întîhar e. Lê heke tenê xwe întîhar bikin gotineke me ji bo wan nîne. Faturaya ev tevgera wan ya dînîtî em dikişînin…”

Doza PKK’yiyan li ber vekirinê ango destpêkirinê bû. Diviya di nêz de îddîanameya wan bihatibaya. Hêjmara mirovên ku dawa li wan hatiye vekirin gelek zêde bûn. Bêguman amederkariyên doze wisa mezin wê dirêj bikiriba. Di dawiyê de îddaneme hatibûn.

Îddanemeya ku gardiyan xistibû hemêza xwe berbi qawûşa 33. ve dibir.

Mazgala deriyê qawûşa 33.vekir û got: Ha min ji we re pirtûk anîne. Ka zû bikin, van bigirin, milê min di bin wan de şikest. Çendî pirtûkên mezin in. Got: “Hûn ê

çawa van bixwînin?" Girtiyan, wateyekê nedan pirtûkan.

Lê dema qapên wan dîtin zanîn ku ne pirtûk in. Dema nivîsa "Doza PKK'ê(Apoyiyan)" xwendin gotin ev ne pirtûk mûrtûk in. Îddanemeyên me ne!" Îddanemeyên birin hûndir di carekî de ji destê hev girtin. Hîn negiştibûn erdê li hewayê hemû hatin girtin. Her kesî dest da yekî lê temaşe kirin. Girtiyan, herî zêde rewşên xwe û beşên ku wan eleqedar dikir meraq dikirin.

Piştî ku yên di qawûşê de meraqa xwe derbas kirin û şûnde Ednan, hevalên xwe dawetî aramiyê kir û beşa îddîanameyê ya pêşîn xwend. Ji ber di vê beşê de avabûna partiyê, derketina wê ya holê, armanca wê, îşleva wê, mûtefîkên Şoreşa Kurdistanê, stratajî û textîkên wê tê de cî digirt. Di beşa dawî de jî bûyer û rewşa girtiyan ya kesî hebû. Agahiyên di beşa yek de ji bo ji hêla girtiyan ve nedihat zanîn û meteryalên cuda jî nebû bala girtiyan zêde kişandibû. Ev beş bi dehan car hat xwendin.

Hinek ji wan jî îddaneme girtin dest xwe bi heyranî lê temaşe dikirin. Ev belgeya di destê xwe de girtin weke ku ne îddanemeya wan be, belgeyeke pir cudatir be. Di dema ku girtiyan ev kêfxweşiya xwe dijiyan,

rûpelên taqvîmê jî 5 Nîsana 1981'ê nîşan dida. Piştî belavkirina îddanemê demek şûnde deriyê qawûşê vebû. Bi dengê fermana gardiyan re hemû girtî rabûn ser xwe. Yûzbaşî ket hûndir, got:

"Hûn çawanin zarokîno? Bila her kes bê vî alî. Tiştên ku ji we re bêjim heye."

Girtî di xwaringehê de kom bûn; bi meraq li benda ka wê yûzbaşî çi bêje bûn. Tevî ku di destê yûzbaşî de tomarek qaxez hebû jî gavek pêş gaveke paş diçû û dihat. Dema ku dît her kes ji bo guhdarkirina wî amedeye, li beramberî yên ku kom bûne sekînî û got:

"Dizanim ev demeke dirêje hûn di hûndir de ne. Bi alîkariya min îddîanameyên we yên ku hatibûn amadekirin hatin. Ji we re hat dayîn. Di demeke nêzîk de ez ê we derxim dadgehê. Û heke hûn aqilê xwe bidin serê xwe, tewşîtiya vir-wir guhdar nekin, hûn ê di demeke kin de bigihin kesûkarên xwe.

Ji min bawer bin. Bila baweriya we bi min hebe. Jixwe dizanim gelek ji we bê sûc in. Dizanim we xapandin e. Yên ku sucdarin ne li vir in. Hûn qet meraq nekin, tiştên ku ew ji destê min bikişînin heye. Li gardiyan zivîrî got:

“Kurê min ka maseyeke ji min re bîne.” Gardiyan mase anî. Yûzbaşî kaxezên ku di destê xwe de danî ser masê û got:

“Li ser esasê ku we îdanameya xwe girtiye hûn ê van kaxezan îmza bikin.” Girtî, bi rêzê ve çûn van kaxezan îmza kirin. Dema yûzbaşî derket got: “Dûbare dibêjim aqlê xwe bênin serê xwe. Di derve de yên ku li benda we ne hene. Guh nedin tiştên hineke din dibêjin. Di dadgehan de her tiştî vekirî bêjîn. Wê ev ji bo berjewendiya we be û piştre derket.” Girtî çûn beşa razanê. Her kes çû quncikekê. Hinekan li îddanemê temaşe dikir, hinek jî li ser gotinên yûzbaşî difikirin.

Girtî wê rojê hinek xwemgînî, hinek jî bi dudilî rojek derbas kirin. Serê sibehê gardiyan bi lez derî vekir û got: “Ulan berpirsyar, bila Amed xwe amede bike dadgeha wî heye. Dema ku Ferhat vê bihîst hat gel Amed, ji Amed re got: “ Ger tu bikaribî bi yên tên dadgehê re rewşa me ji qawûşa 35. re ragihîne. Bi mîsogerî di derbarê rewşa wan de agahî bigire.”

Gardiyan dikir qêrîn digot, “bila yê diçe dadgehê bê.” Amed ji bo biçe dadgehê ji qawûşê derket. Girtiyên ku mayîn, xwarina xwe birin hûndir...

Bi bêsebiriyeke mezin li benda hatina Amed bûn. Amed encax piştî xwarina êvarê anîn. Hevalên wî li

dora wî çemberek avakirin. Bêyî ku firsend bidinê xwarin bixwe, pirs jê kirin. "Amed got ka bisekinin, madem hûn xwarinê bi min nadin xwarin, wê demê cixareyeke bidin min ku dest pê bikim."

Cixareyekê dan Amed.

"Piştî ku min gava xwe ji vir avêt heya niha ez ê bêjim."

Eşref belaya xwe lê da û got:

"Ger tu wisa nekî cixareya ku me daye te em ê şûnde bigirîn."

Amed rûnişt.

Hevalên wî bi mereqeke mezin li dora wî kombûn û dest bi vegotinê kir:

"Ez ji derî derketim. Dema ku min xwest dakevim jêr gardiyan min da sekinandin. Piştî ku kontrola min kir şûnde, min birin cihê hevdîtinê. Li wir ji qawûşên cuda jî gelek mirov kom kiribûn.

Di nav wan de ji hevalên ku li ber xwe didin Adil jî hebû. Em yên ku teslîm bûne cuda kirin. Lê di seyarê de me û yên li ber xwe didin danîn gel hev. Gardiyanan, "her çendî got bila kes bi vî re neaxive jî" piştî ku gardiyan di nava xwe de ketin sohbetê me ji bîr kirin. Min jî ev firsad bikar anî. Ez nêzî Adil bûm û min rewşa

wan bi berfirehî pirsî. “Roja ku me anîn vir, koma Elazixê jî birin qawûşa 34. a li beramberî revîrê. Di nava koma Elazixê de du-sê kesên li ber xwe didin hebûn. Yên din hemû teslîm bûne.”

Eşref got:

“Jixwe kesî li ber xwe nedan ku teslîm bibin.”

Ednan got:

“ Di 37. de wisa, lê em yên di 35’de dizanin.”

Amed got:

“Malneket sebir bikin mane ez dibêjim. Yên di qawûşa 37. de li ber xwe nedan.

Hêjmareke qawûşa 35’an li ber xwe dane. Lê piştre ew jî teslîm bûne. Weke ku min gotî ye-du kes mane.”

Ferhat pirsî û got:

“Yên li ber xwe didin kî ne?”

Amed:

“Navê yekî tê bîra min. Ez bawerim Halît bû. Yê din nayê bîra min. Weke hûn jî fam dikin rewşa Xarbêtiyan (Elazığlıların) jî ev e. Piştî ku em hatin vir û şûnde hevalên li ber xwe didan yên ku di qawûşa 37. de diman daxistine qada yekî, îskence û zexteke mezin li ser wan dane meşandin.”

Necmî:

“Tabîî, heke em 99 kes wan berdin û bên, bêguman wê dijmin îskenceyeke mezin li wan bike. Li vir yên suçdar tenê em in.”

Ferhat:

“Şirove nîne. Bisekinin bila Amed vegotina xwe berdewam bike. Em ê piştre şiroveyên din bikin.”

“Lê tevî evqas îşkence û zext kes neketiye û teslîm nebûne. Dijminê ku ji van sepandin û îşkenceyan encam negirtî, di Adarê de wan birine qawûşa 35. Niha yên ku li ber xwe didin hemû li qawûşa 35. kom kirine. Koma yek a rojiya mirinê 35. rojên xwe temam dikin. Komek din a duwem dest bi rojiya mirinê kiriye. Hevalên ku mane jî di qata 4. de berxwedana xwe didomîn.

Yên ku berxwedan didomandin, li gel lêdan û îşkenceyan, birsî, bê avî û bi hemû zehmetiyan re rû bi rû ne. Adil got; hêjmara yên li ber xwe didin nêzî 150 kesan e. Bêguman ev hêjmar carna tê guhertin. Wisa; yên ku teslîm dibin dikarin cardin vegerin nav refên yên li ber xwe didin. Îxtiyar, du caran teslîm bûye cardin çûye nav refên berxwedanê.

Ti caran ji bo wan ji qantînê tişt nayên girtin. Lê yên di qata 3’ yan de teslîm bûne hemû tişt ji wan re tê dayîn. Yên ku teslîm bûne, dema li qantînê tiştan dikirin car caran cixare û hinek xwarin didin berxwedanvanan.

Di cepheyê ku yên li ber xwe didin bi kinahî tiştên tên bîra min ev in. Dema em bên li ser rewşa xwe, heval hemû dixwazin me hemûyan carekdin bibin nav pêla berxwedanê. Bêguman hatina me ya vir moralê wan xistiye. Di vê mijarê de me rexne dikin.”

Mahmûd got: “Bêguman wê madalya bi me ve nekin.”

Ferhat:

“Ji derveyî me ji tevgerên din yên siyasî keseke ku hatibûn hebû? Tu karî bi wan re baxivî?

Amed:

“Rast e. Yên ji Özgürlük Yolu û DDKD’yê hatibûn hebûn. Min çend car xwest baxivim. Gotineke tenê jî neaxivîn. Heta yêkî got: “Qedexeye, ger gardiyan bibîne wê baş nebe, bi min re naxive!” Bi kinahî tiştên ku bêjim ev in. Tiştek din nîne.

Keşe pirsî û got:

“Çima gazî te kiribûn?”

“Dozger ji ber bûyereke di sala 1980’î de li Amedê qewîmîbû ji bo îfadeyê bangî min kir. Îfadeya min girt.”

Piştî ku tiştên Amed gotî qediyan û şûnde her kes belav bû. Dema ku Amed xwarin dixwar girtiyan koman ava kiribûn, ketibûn nava nîqaşeke zêde. Navaroka van nîqaşan, berxwedanî û pêşeroj, yên teslîm bûne û rewşa wan a ji niha şûnde, polîtîkayên îdarê û entrîka û lîstikên li ser berxwedanê bidin meşandin bûn. Jixwe di vê mijarê de demek dirêj bû Ferhat dixwest bi hevalên xwe re nîqaş bike. Dema ku agahiyên Amed anî lê zêde bû û şûnde, navenda nîqaşê ava bû.

Ferhat:

“Asta ku niha berxwedan gihiştiyê, him girseya me him jî yên li ber xwe didin heviyên xwe bi ji rojiya mirinê heye. A rastî berxwedan hîn didome, ev navenda rehet ku niha îdareyê ji bo me afirandiye, encama berxwedaniya heyî û rojiya mirinê ye. Ger ku em bên ser xala beriya niha Necmî û Mehmut qal kirin, bêguman teslîmbûna me zexta li ser hevalên me zêde kiriye. Lê ev diyarker nîne. Dibe ku teslîmbûna me di warê maneviyata te wan lewaz xistibe. Lewra polîtîkayên îdarê hîn berfirehtir e.

A rastî hatina 12 Îlonê, derbeyên mezin li tevgerên şoreşgeran xistin û di girtîgehê de di şexsê girtiyan de dixwazin tevgera me bifetisînin. Li gel van hemûyan dawayên me ku di demeke nêz de bên destpêkirin jî dema lê zêde dibe rewşa vahametê ango xeteriyê fam dibe. Wiha ev îdare, ji bo hedefên ku danî pêşiya xwe bixe meriyetê, wê serî li gelek rê û rêbazan bidin ku li hemberî hevalên me yên li ber xwe didin bikar bînin. Riya vê ya destpêkê jî wê hewl bidin ku me parçe parçe teslîm bigirin, hedefa wan ya bingehîn jî kesayeta me tine kirin, di nava gel û rêxistinê de me tine û mîna sucdaran dana nîşan e."

Girtiyên di qawûşa 33. de dizanin ku ev roj jî mina rojek ji rojên ku jiyan dikirin bû. Di demjimêrên şevê yê 13 Nîsana 1981'ê de seat di 24.00 de gardiyanan derî vekir, dîsa bi ew dengê xwe yê nexweş got, "Bêdeng bin li dadgehê guhdar bikin. Niha kesên ku min navê wan xwendin bila bên vî mile:

Ferhat, Kurtay, Amed, Ednan, Alî; ev koma Amedê ye. Niha jî ez ê koma Riha yê bixwînim: Merwan, Eşref, Keşe… Yên ku niha jî bixwînim koma Mardînê ye: Hespik, Fırat û Yasin... Koma herî dawî jî koma Sîîrt-Batmanê ye: Temaşekin divê hûn tevlîhev nekin. Dûbare kir û got hûn hemû koma Apo ne"derket û çû."

Dûbare vegeriya kuna mazgalê vekir û got; “ bila her kes cilên xwe li xwe bike, amedekariyên xwe bikin, ez ê behnekdin bêm we bigirim.”

Ednan got:

“Birayê Ferhat, ma di demjimêreke şevê de dadgeh wisa dibe? Di nava vî karî de tiştek heye. Muhaqaq ev me dibin şûneke din.”

Ferhat:

“Ez bawer nakim, ji ber ev dadgeha me ya yekemîn e. Li gorî ku wê me bi komî derxin dadgehê karê wan gelek zehmet e. Lê hêjmara girtiyên derkevin dadgehê nêzî 500’î ye. Îdare jî divê mijarê de hinek ecemiye. Ez bawerim komkirina me ya vê seatê ji bo vê ye. Tiştên te gotî jî dibe.” Piştî ev bûyara dadgehê û şûnde di qawûşê de gêrewêreyeke dest pê kir, hinek ji wan kêfxweş bûn hinek ji wan jî xemgîn. Yên kêfxweş, “digotin em ê hevalên xwe bibînin şad dibûn, ger ji vê mehrûm jî bimînin xemgîn dibûn.

Ev kêfxweşî û gêrewêre heya saet duduyan domand. Derî di carek de vebû û gardiyan got: “Dîqat!” Bi hatina dengê gardiyan re awirên çavan hemû vegeriyan ser derî. Yê ku hatî yûzbaşî Esat bû. Her kes di cihê xwe de ketin rêzê û sekinîn. Yûzbaşî, gelek hişk û vekirî axivî û

got: “Baş li min guhdar bikin! Cihê ku hûn dîsa bênê ev dere. Li gorî vê baxivin. Ger hûn nêzîkatiyeke şaş bikin ez xwe têkil nakim!” Bi awayeke hêrs derket û çû.

Asteymenê ku bi yûzbaşî re hatî hûndir, emir da û got“ bangî wênekêş bikin.” Çawûş got: “Tu emir dikî fermandarê min” piştî demek û şûnde wênekêşek anî qawûşê. Astegmen bi dengeke bilind, “bila koma Amedê cuda bibe. Yên ku ez navê wan bixwînim bila li jêrî dîwar bibin rêz.” Girtiyên ku li jêrî dîwar bibûn rêz bi awayeke lez wêneyê hemûyan kişandin. Di demjimêr sisiyan de navê hinek girtiyan ji hêla erkdarekî ve hat xwendin. Yên ku navê wan hat xwendin ji qawûşê veqetiyan. Koma yekem ku birin koma Amedê bû.

Piştre komên din jî birin. Bi giştî yên di qawûşa 33. de di doza PKK’ê de dihatin dadgehkirin 42 kes bûn. Ji bo girtîgeha Amedê ya 5 Nolu ‘Tîpa E’ dihat bikaranîn. Nîvê çep û rastê qawûşan korîdorek mezin e. Girtî jê re jî dibêjin, “Malta.” Di destpêkê de mirov vir mîna korîdorê nabîne. Mîna mahzenî, tirbeke zindî dide hîsandin. Girtiyên ji qawûşên wan derxistin, qawûş qawûş cuda kirin.

Lê dema ji bo ev karê taqsîmê cî nema, ev car dadgehê li gorî komên dadgehê beş kirin. Girtiyên

teslîmbûyî yên ji qawûşan dianîn, li gor daxwaz û fermana gardiyanan tev digeriyan. Fermana gardiyan ya yekem, “li dîwar bizivire, çep û rastê xwe nenêre û bi kesê re nepeyîve” bû. Di ciheke ku hezar mirov lê diman de bêdengiyeke mirênê hebû.

Ger ku yên li ber xwe jî didin nebûna wê ev bêdengiya mirî hîn zêdetir bidomaba. Lê girtiyên li ber xwe didin yên talîmatan guhdar nedikirin, girtiyên ku teslîm bûne lê hîn di bedana wan de rihê berxwedanê lêdide, dayîk û zarok, yên hez dikin û tên heskirin hemû xistin nava hev. Bi awayeke devliken bi çavan silav didin hev û gotineke ji dil, besî kêfxweşiya wan bû.

Kelepçe li destê wan hat xistin û kontrolên dawî hat kirin. Çavên her kesî li qawûşa berxwedanê ya 35’an bû. Bi salanbû li gel hev bûn, belkî zarokatiya hinek ji van mirovan jî bi hev re derbas bibû, her yek ji wan mîna qehremanek, mîna qehramanên mîtolojiyê li wan dinat nêrîn. Bi wan re axiftin û ji bo tenê carek wan hemêz bikin dikarin çiyê xwe nedin. Her tişt… Dema ku girtî di nav xewn û xiyaleke wisa de jiyan dikin, bi dengê, “Deccal” Esat Oktay’ re vegeriyan jiyana xwe ya rastîn.

Got: “Dadgehên we vebûn, efendî efendî biçin û werin. Wê mehmetcîk jî bi we re bên, divê hûn li wir tiştên ne ji rêzê nekin. Ji ber cihê ku hûn dîsa bênê ev dere. Li gorî vê nêz bibin û li asteymen zivirî got,” asteymenê min zincîran bîne!” Girtiyên ku beriya niha destê wan di pişt de girêdayî komên bistkesî avakirin û kirin yek rêz. Serê zincîrê, bi kelepçeya girtîyê pêşî ve girê dan û bi kelepçeya girtîyên din re derbas kirin serê cincîrê bi kelepçeya girtîyê herî dawî ve girê dan. Piştî ku girêdana zincirê xilas bû yûzbaşî got: “Koma Amedê bixin destpêkê. Bixin seyareya yek dudan. Piştre jî koma Rihayê bixin seyareya sê û çaran; koma Mardînê jî bixin seyareyên pênç-şeş, koma Sîîrt-Batman jî bixin seyareyên heft û heştan.”

Seyareya dadgehê dişiba seyareyeke cenazeyan. Hemû aliyên wî girtîbû, bi awayeke xwezayî ku tenê 15 mirov dikarin bikevin van seyareyan 40 girtî û nêzî deh gardiyanan xistibûnê. Tenê kuneke hewa girtinê hebû. Ew jî bi qasî ku mirovek serê xwe bixe tê de bû. Li ber vê kunê jî her tim gardiyan disekinîn. Dema ku derî seyareyê dihat girtin girtî di nava xwêdanê de diman. Ji ber bê hewayî û bê avî mirov serab didît.

Gardiyan jî ji ev dera tengezar bandor dibûn. Ji ber vê hemû diçûn ber kuna ku hebû. A rastî ji sibê de

girtiyan şiyar dikirin digotin, “naxivin!” Yên ku van tehdîtan riayet dikirin jî hebûn. Lê yên nedikirin jî hebûn. Ji ber ku gardiyan ketibûn derdê ka çawa hewa bigirin ji ber vê zêde guh nedidan ka girtî diaxivin an na.

Girtî dest bi hev re axiftinê kiribûn. Rêwîtiya dadgehê ya di saet 24.00’an de dest pêkiribû, sibê saet di 06.00’ an de bi dawî bû. Ev rêwîtî mîna mêrûya bêling a ku diçe Bexdayê dirêj bibû. Dema ku girtî ji seyareyê daxistin, manzareyeke mîna bazara koleyan ku zext li wan dikirin derdiket holê. Girtiyên destê wan bi hev ve girêdayî, mîna çawalê patatan ji seyareyê tavêtin. Di vê navberê de girtiyê li pişt girtiyê din dema ku tavêtin yan çeneya wî yan jî serê wî li pişt girtiyê li pêşiya wî diket.

Bînaya dadgehê nû hatibû çêkirin. Ji bo girtiyan bank hatibûn amadekirin. Şebakeyên wê, mîna yê girtîgehê bi şîşên hesin hatibûn cudakirin. Gardiyan û eskeran dîwareke ji goşt li ber pencereyên wê ava kiribûn. Beşa ku girtî lê diman dîsa bi şîşên hesin hatibûn cudakirin. Li jor cihê heyeta dadgehê hebû. Li milê rastê parêzer, li milê çepê jî çapemenî hebû.

Dîsa rêza herî pêş a ku girtî lê diman, hema du metre nêzîkî vê rêzê mîkrofona ku bilind û nizm dibû

danîbûn. Li kêleka wê jî sehpaya ku mînaka ragihandina nasnameyan hatibû dayîn. Bi fermana asteymenekî ku li karê dadgehê dinêrî dest bi vekirina zincîr û destbendên girtiyan kirin.

Bi fermana asteymenê ku li karê dadgehê temaşe dikir, zincîr û kelepçeyên girtiyan hatin vekirin. Piştre got: “Navan guhdar bikin. Yê ku min navê wî xwend bila bi dengeke bilind navê xwe bêje!” Piştî ev îşlem jî xilas bû û şûnde, girtî li ser ciheke ku sê kes nedikarin li ser rûnin pênc kes li ser dan rûnişkandin. Rûniştina wan nîzamîbû; dest li ser çokan, ling hevbend ango li gel hev, serî rast û wê li pêşiya xwe temaşe bikiribana.

Girtiyan mîna libên tezbiyê kirin rêz. Herî dawî qawûşa 35’an jî anîn. Girtiyên ku teslîm bûne hemû emrên gardiyan tanîn cî, yên ku li ber xwe didan jî guhdarî gardiyanan nedikirin li beremberî emrên wan radibûn. Ji ber vê gardiyan li ber girtiyên berxwedan dikirin û li ber xwe didin disekinin li wan dixistin û mudaxele dikirin.

Di demjimêr 10.00’ an de heyata dadgehê nû dihat. Heyeta ku bi apoleta xwe arastî û di nava cil û bergên leşkeran de pêçabûn ku ji bo bi heybet bên dîtin li cihên xwe rûniştin… Girtiyên ku di qawûşê de diman dema bihîstin hevalên wan hatine kelecan girtin.

Necmî got: Hûn li kî derê man? Dema hûn nînin em xwe mîna yetîman hîs dikin."

"Bisekinin heval, bila kes mûdaxeleyê yên ku hatine neke. Ka bila pêwîstiyên xwe derbas bikin û xwarina xwe bixin, pişte em kom bibin bila pêşkeftinên bûyî ji me re ragihînin." Girtiyên ku li qawûşê mabûn neçûbûn dadgehê ji hevalên xwe re xwarin amede kirin û anîn. Piştî xwarin xwarin û şûnde derbazî qawûşê bûn.

Mahmûd pirsî û got: "Ji me re pêşkeftinên ku çêbûn di serî de bêjin, çi bû? We karî bi yên qawûşa 35'an re baxivin, berxwedanî didome, kesî ji rojiya mirinê anîbûn?

Ferhat got:

"Ka bise birayê min. Em hinek bêhna xwe bigirin, cixareya xwe vexwîn. Pişre em ê bêjîn." Yên ku çûbûn dadgehê hema çaya wan anîn.

Eşref got:

"Ha piştî ev çay û şûnde ez ê seatek ji we re xeber bidim." Lê sebra yên ku li qawûşê mabûn nemabû.

Ferhat got:

"Heval, wisa nabe. Bila li her şûnek dengek dernekeve. Herî baş em vê bi rêbazekî ve bidin girêdan. Mesela Eşref, madem tu meraqdarî ku seatek nutuk

bikişînî, wê demê tu beşa bi derketina me ya vir re heya hatina heyeta dadgehê bêje. Piştre dema dora mijarên din hat, ez ê mafê axiftinê bidim hevalan meraqa wan derbas bikin û wisa wê agahiyên baş bidest bixin."

Eşref, ji aliyekî ve çaya xwe vedixwar, ji aliyekî ve jî cixareya xwe dikişand û dest pê kir. Her kesî wî bi baldarî guhdar dikir. Di vê navberê de jî got: "Pirsên ku bên jî Ferhat tu û Keşe hûn ê bersiv bidin." Keşe got: "Bi quran ez tiştek nabêjim. Ji ber ku ez gelek aciz bibûm. Dema ku got hinek mabû bikim bin xwe, ken bi qawûşê ket. Dema Eşref axiftina xwe qedand behnek kur hilda.

Got: " Ka çay? Dema ku ez axivîm we jî çay vexwariye. Ma wisa jî nabe. Heke min bizanîba min qet nedigot."

Merwan got:

"Ji bo tu baş neaxivî min ceza da te."

Ferhat:

"Başe Merwan, tu bi lingê xwe ketî bîra xwe. Wê demê ka bêjê, pêşkeftinên di dadgehê de. Hevalê ku ji niha û şûnde baxive, di çûyîn û hatinê de, di dadgehê

de çi axiviye, hele ev kes ji qawûşa 35'an be di vê hemû ziraviyên wê bêje."

Merwan dîsa ketibû nav darbendek. Dema li pêşiya komek biaxivîba gelek teng dibû. Reng lê nedima û di nava xwêdanê de dima. Destpêkê hinek bêdeng ma. Piştre,

Ferhat got:

"De haydi Merwan, evqas heval li benda te ne."

Merwan:

"Baş e ez ê vebêjim. Hinek destûra min bidin."

Merwan dest bi axiftinê kir:

"Ez pêşkeftinên di dadgehê de nabêjim. Lê ez bi kêre çi axivîme ez ê wê bêjim. Bila yek din tiştên di dadgehê de bûne bêje."

Dema ku ev digot, bi dest û lingan dida îfadekirin ku wê neaxive.

"Dema em ji vir çûn ez û Refîk yê ji qawûşa 35'an li gel hev bûn. Ez destpêkê neaxivîm. Lê me tenê silav da hev. Min dizanî ku wê ew bi min re baxive. Di dawiyê de pirsî û ji min re got; "tu çawa yî?" Min jî got; "ma em ê çawa bin weke ku tu dibînî." Dest pê kir û rewşa heyî wisa ji min re vegot.

Rewşa berxwedaniyê didome, piştî koma rojiya mirinê û şûnde, koma duwem ya rojiya mirinê ya din jî dewam kir, helwesta ku li dadgehê bê raberkirin, dema nav tên xwendin wê bersiv neyê dayîn, serî her kêliyek yûzbaşî bi yên rojiya mirinê diaxivî û herî dawî got, hêjmara berxwedêran jî nêzî 150 kesî ye. Piştre rewşa me pirsî. Heval ji veqetîna we ya ji refên berxwedanê gelek xemgîn bûne, dema ku got lê hêviya xwe qut nekirine, min jî rewşa me jê re got. Tiştên ku ez bêjim ev in.

Ferhat got:

“Amed, tu jî pêşkeftinên di dadgehê de bêje.”

“Ez bawerim demjimêr di 10.00’de heyeta dadgehê hat. Komeke temaşekeran ya zêde hebû. Min gelek ji wan kesên temaşeker dinasîn, lê derfeta ku li pişt xwe bizivirim nebû. Kameremanên TV’yê hatibûn. Her serî kêliyekî me dikişandin. Li milê rastê çapemenî hebû. Hêjmareke zêde ji van biyanê bûn. Li milê çepê jî parêzer hebûn. Piştî ku heyeta dadgehê dest bi dozê kir, bi awayeke alfabetîk li gorî rêzê dest bi destnîşankirina nasnameyan kirin. Jixwe bi awayeke xwezayî tespîta nasnameyan dikirin.

Dema ku dor hat Vedat Alataş yê ji qawûşa 35’an bersiv neda. Got: “Li girtîgehê zext û îşkence heye.

Dema ku got ji bo ev rabin hevalên me di rojiya mirinê de ne” serdozgerê rûniştinê Emrullah Kaya got, ev me eleqedar nake. Bi îdareya girtîgehê re baxivin.” Dema ku Vedat xwest bidomîne serdozgerê rûniştinê got! “ Wî li cihê wî bidin rûnişkandin.”

Tesbita nasnameyên me yên ku teslîm bûne berdewan kirin. Kontrola nasnameyên ti girtiyên berxwedanê dimeşandin nekirin. Bi kinahî, pêşkeftinên di dadgehê de ev in.” Di rojên piştre jî heman tişt di girtîgehê de hat jiyîn. Hemû sibeh girtî ji bo bibin dadgehê serê sibehê wan di demjimêrên zû de amede dikirin.

Dema ku dadgeh dewam dikir, di rûniştinên dozê yên navber de girtiyên li ber xwe didan bêyî ku pakî ji lêdanê bikin gardiyanan kontrola nasnameyên wan nekirin. Dadgeh û îdare nedizanin li baremberî wan çi bikin. Dadgeh dixetimin. Diviya bû çareyeke ji vê re bidîtibana. Di roja sisiyan ya kontrola nasnameyan de girtiyên di rojiya mirinê de jî derxistin pêşiya dadgehê.

Girtiyên di rojiya mirinê de weke ku ji tirbê derxistibin anîbûn. Di serî de Xeyrî û girtiyên din, pala xwe dan tirabzan wisa kontrola nasnameyan hat kirin. Beriya ku Xeyrî bikeve venêrîna nasnameyê ev got:

“Ji bo protestokirina îşkence, zext û wehşiyeta li girtîgehê tê meşandin, me komek girtiyên PKK’yî di destpêka meha Nîsanê de dest bi rojiya mirinê kiribû. Li ser bingeha ku soza ji me re hatibû dayîn me dawî li rojiya mirinê anî. Li ser vê sozê biryara ku beriya niha me girtibû, ya nasnameya xwe negotin me rakir.”

Dadgeh bi vî rengî domiya. Lê ji ber hêjmara kesên ku doza xwe hebûn zêdebû, bi awayeke komî girtiyan derxistin dadgehê. Dema ku îdaname hat xwendin destpêkê koma Amedê derxistin. Di vê komê de: Xeyrî, Mazlûm û gelek hevalên pêşeng tê de cî digirtin. Lê tişta herî zêde qawûşa 33. meraq dikirin, girtiyên ku di qawûşa Mazlûm wan de bû. Ji ber bi riya wan him tiştên di dadgehê de diqewîmîn û him jî yên di girtîgehê de fêr dibûn.”

Yek di vegara dadgehê de girtiyên ku dianîn girtîgehê kelepçeyên wan vekirin, zincîrên wan derxistin. Bi xwendina navan re li ser qawûşan bilav kirin. Dema ku koma Amedê ji dadgehê vegeriyan, girtiyên di qawûşê de mabûn gelek kêfxweş bibûn. Gava ku hevalên wan ketin hûndir Eşref dengê xwe bilind kir û got: “Hûn li kî derê man? Em ji meraqan mirîn.”

Ferhat:

“Pele neke. Em ê bêjin. Ka em hinek behna xwe bidin.” Hemû girtî fam kiribûn ku moralê Ferhat nexweş e.

Mahmûd :

“Bira, keyfa we xweş nîne û em di rûyê we de vê dibînin. Divê bi qasî em fêrî agahiyên kêfxweşiyê bibin ewqas jî ji bo yên bi êş jî xwe ameder bikin.”

“Naa ewqas jî rewşek giring nîne. Tenê ew kesê ku wê rojê agahî dayî hevalên me, şaş agahî dane. Rojiya mirinê li ser “soza” yûzbaşî berdan e. Yanê di encama lihevkirinekî de berdan e. Herî dawî dema îskenceyeke zêde li ser koma girtiyên Amedê kirin, ji derveyî çar hevalan yên din hemû teslîm girtine. Ev heval jî ev in: Mazlûm, Akîf, Sedat û Avreş.”

Necmî got: “Yanê heval xapandine?”

Ferhat:

“Mirov dikare wisa jî bêje.”

Eşref:

“Ez bawer nakim. Tişteke ku heval dizanin heye.”

Amed:

“Ez wê nizanim, lê rastiyeke gotinê di pratîkê de nîne. Ka temaşeke, ji aliyekî ve ‘soz’ didin, ji aliyê din ve jî îşkenceyê li ser koma Amedê didomînin.”

Necmî:

“Ger tiştên ku Eşref dibêje rast bûya, koma Amedê nediket. Yanê hevalên ku dikarin li ber xwe bidin hîn berxwedaniya xwe didomînin. Yên ku teslîm hatine girtin jî di encama îşkence û zexteke zêde de teslîm hatine girtin. Li gor nerîna min îzaheke din ya vê cuda nîne.”

Amed got:

“Necmî rast dibêje. Bi qasî ku ez dizanim ez ê mesaleya teslîm girtina koma Amedê ji we re bêjim. Di dadgeha wê rojê de, hevalan xwest di derbarê îşkence, zext û wehşiyeta li ser girtîgehê bi daxwaznameyeke(dilekçe) ji raya giştî re ragihînin.

Ev daxwazname jî di serî de birayê Mazlûm û nêzî 10 girtiyan îmza kiribû. Piştî ku daxwazname dan dadgehê û şûnde di vegerê de, li girtîgehê, koma Amedê girtin qawûşa 37’an û îşkenceyeke pir zêde li wan kirin. Piştî ev lêdan û îşkenceyê, hevalên ku me di jor de qala wan kirî ji derveyî 4 hevalan yên din hemû teslîm girtin.”

Ferhat:

“Ez bawer im we hîn polîtîkaya îdareyê baş fêm nekiriye. Îdare ji bo bigihe ermanca xwe hemû rê û

rebazan bikar tîne û bêguneh dibîne. Ger ku li hember sozên ku didin tişteke ku tu xwe pê biparêzî nebe, hemû sozên tên dayîn xapandine. Weke ku Amed jî gotî rewşa koma Amedê li holê heye.

Li aliyê vê yê ecêp binêrin dijmin, ji aliyekî ve “soz” dide ji aliyê din ve jî me parçe parçe dike û hewl dide me daqurtîne. Wê ji ev armanca xwe jî ti caran neçe paş. Di navendeke wisa de bawerî bi “sozan”neyê. Xetaya me ya herî esasî ku me li vir kirî, diviyabû di dadgehê de em jî başdarî protestoya ‘nasname nedayînê’ bibûna.

Ev, ji bo me xetayeke bingehîn bû. Herî kêm diviyaba me hevalên xwe di dadgehê de dema ev helwesta xwe dan diyarkirin me tenê nehêlabana, lê me kir.” Piştî gotinên Ferhat yên dawî, di qawûşê de bêmoralbûnek da avakirin.

Ji ber ku ev mirov bi awayeke fiîlî teslîm bibûn jî, dilê wan hîn ji bo berxwedanê û ji bo yên li ber xwe didin lê dida. Dema ku ji gel yên berxwedanê didin meşandin agahiyên nexweş dihat, bixwazî nexwazî xemgîn dibûn.

Dema hatin qawûşê, gotin ku em hewl bidin ku carek din vegerin nava refên berxwedanvanan.

Bêguman di ferqa zehmetiyên vê de bûn. Ma jixwe hemû hêvî bi rojiya mirinê ve nehatibû girêdan?

Di encam de vê jî zext û îşkenceyê nerakiribû, ev çeka hêviyê ya herî mezin jî êdî bandora xwe nebû. Girtiyên di girtîgehê de êdî bi guman nêzî vê jî dibûn. Dema ku Ferhat, bêhêvîbûna di nava hevalên xwe de hîs kir, pêwîstiya bi hevalên xwe re baxive dît."

Ferhat got:

"Hevalno ez we baş fam dikim. Tevlî xemgîniya we jî dibin. Lê di vê ev kar wisa xwezayî neyên destgirtin. Ev, berxwedaniyeke demdirêj e. Di vê berxwedaniyê de ketin, rabûn, windakirin û rabûn wê çêbibe. Divê em jibîr nekin ku ew kesên di çavên me de qehremanin li girtîgehê li ber xwe didin, ew jî mîna me mirov in. Hevalên me yên berxwedaniyê didin meşandin bêguman wê car caran kêmanî û lewaziyên wan jî çêbibin.

Ger ku em wan mîna mirovên asayî bibînin, dibe ku xelet bibin. Lê tevî her tiştî berxwedaniya me hîn didome. Li gor nerîna min tişta herî girîng ala me ya berxwedanê nekeve erdê ye. Pir zêde girîng nîne ku Ahmet yan jî Mehmet vê alê hilde. Ya giring ev e ku ala me hîn di hucreyên girtîgehê de tê hejandin e.

Dema ku em bên ser rojiyên mirinê; ev raste me hemûyan hêviya xwe bi vê ve girê dabû. Îro rojiyên mirinê wisa hiştin, sozên ku hatin dayîn nexistina meriyetê, wê ti caran tiştek ji girîngiya rojiya mirinê nede windakirin. Divê em vê jibîr nekin ku; ev destkeftî ji bo me bûn tecrûbeyên gelek mezin.

Diyare ku di demê pêş de wê encamên mezin jê bê derxistin." Dadgeh û îşkencekar bi lez dixebitin. Weke ku yek li pey wan be, "ji wan re bêje zû bikin karê wan biqedînin.Yan na dibe ku sibe gelek direng bibe!" Di nava lezgîniyeke de bûn ku mîna mal ji nav agir birevînin. Mîna ku biçin talanekê bikin bi hoyratî êrîş dikirin.

Dijmin ji her çar aliyan ve bi qalas, jop, leystik û entrîkayan ve êrîşî ser girtiyan dikir. Lê girtî bi bawerî û îradeya xwe ve li hember birsîtî, bê avî, zext û îşkenceyan mîna mizraqek li ser lingan bûn, her çendî mîna çerm û hestî mabin jî...

Êdî koma Rihayê biribûn ber devê topê. Êdî dor hatibû koma Rihayê. Wê him dadgeha wan bidomaba, him jî seansên wan yên îşkenceyê. Dijmin digot; "parî gelek mezin tê, divê piç piç bê xwarin." Bi mehan bû berxwedanvanên ku ji hêz û taqet ketibûn, destpêkê yek yek, piştre jî kom bi kom diketin erdê.

Bi vî rengî koma Rihayê jî li gel koma Amadê cihên xwe li gel teslîmyetê girtibûn. Meha Gulanê meha biharê ya herî xweşik e. Di vê mehê de her tişt kesk dibe, mêrg mîna xalî dirêj dibin li ber lingê mirovan. Gul renga reng vedibin. Çûk di nava şoleneke şahiyê de dibin. Hatina biharê mizgînî dide.

Lê ger tu li girtîgeha Amedê girtîbî, di hûcreyan de bî tu yê bi hatina biharê nehesî, nezanî dem dema hatina mîhrîcana çûkan e. Li ser serê te ji dêla pelpelîkan jop tên. Xwîn diherike. Xwîn, mîna gulên sor in…

Dijmin ket nav êrîşeke dawî. Girtiyên di qada 4. de diman di carek de teslîm hatibûn girtin. Bivî rengî berxwedanî bi dawî dibû. Êdî ala berxwedanê di bircan de nedihejî, ji dêla çûkan kund qêr dikirin.

Deccalê Nolu 5. a Amedê Esat Oktayê bêmerêz, wê bi helwesta xwe ya sadîst re vê gotiba: "Îro li vir li baremberî min pêşûyeke tenê jî berxwedanê nake."

Esat Oktay wê bi hinek girtiyên teslîm bûne, di bin " heyva bi stêrk yanê ala tirkan de sond" dabûna gotin." Ev teslîm girtinek bû. Yên ku berxwedan dikirin, ti caran nefikirîn xwe bi xwe teslîm bibin. Di cihê ku berxwedanî xilas bibû de, lê di hindirê wan de agirê berxwedanê pêt bi pêt hîn pê diket.

Lê bi awayeke objektîf navenda teslîmyetê hatibû afirandin. Dîroka bi lanet ya 26 Gulana 1981’ê di heman demê de ji bo girtiyan çûyîna yekem a rawestandinê bû. Deriyê qutbûnê vebû. Bi asteymenê berpirsyarê bloqê, bloqê gardiyanan û çawûşên wan re ketin hûndir. Asteymen got: “Ji niha û şûnde hûn ê li cihê hewasitandinê perwerde bibînin.

Li şûna sirûdekê berpirsyarê we mehmetcîk çendî ji we re bêje hûn mecbûrin ew çend bêjin. Di çûyîn û hatina hevdîtinan de hûn ê bi gavên baş bimeşin. Her ku deriyê kuna mazgalê vebû kesê ku bangê wî tê kirin wê bê tekmîla xwe bide. Her kes wê bi awayeke rêk û pêk bê girtin. Mecbûrin her kes sirûda îstîklalê ji ber bike. Yê ku di demeke kin de vê ji ber neke wê bê cezakirin. Ev tiştên ku me gotî we hemûyan fam kir?” Ji girtiyan tu deng derneket. Yên ku hatibûn derketin û çûn.

Eşref:

“Heya niha nehatina wan a ser me tenê sedemeke wê hebû, ew jî domandina berxwedanê bû. Got jixwe diyar bû wê me wisa nehêlabana.”

Merwan:

“Lê zêde kir û got: Bi dawîbûna berxwedanê hîn hefteyek-deh roj temam nebûye. Diyare her tişt ji berê de eyar kirine.”

Ferhat:

“Heval, me hîn di serî de ev digot: Ger ku berxwedanî xilas bibe, wê bi ser me de bên, hinek tiştan bixwazin û heta ji tiştên niha xwestin wê hîn zêdetir tişt bixwazin dizanî û digot. Di vegera Merwan a dawî de dema ku got berxwedanî xilas bûye, mirov ji nêzîkatiyên dijmin vê didît. Tişta ku em hemû li ser disekinin ev bû:

Heya ku berxwedanî bidome wê bi ser me de neyên û di vê navenda rehet de me yê jî xwe ji bo mercên zehmet û bê rehm amede bikiriba, li gorî wê tevbigeriyaba, wiha îro ew demên zehmet dest pê dike. Her çendî berxwedanî bi awayeke fiîlî bi dawî bûbe û navenda teslîmiyetê hatibe avakirin jî li gel vê cepheyeke din ya berxwedanê vebûye. Ji ber mirovên ku bi awayeke giştî xilas bûyî û teslîm bûne; dema ku derdikevin pêşberî dadgehê nabêjin “pîşeya min şoreşgerî bû. Ez endamê PKK’ê me.”

Ya ji rêzê di qonaxa lêpirsînê de nêzîkatiyeke şoreşgerane nade raberkirin. Heta di kontrolkirina

nasnameyan de jî xwedî li fikrê şoreşgerî û rêgezên wê dernakeve. Lê gelo rewşa hevalên me wisa ye?

Teslîmbûna me rastiyek e. Bi xwe teslîmbûne, lê di dadgehê de heta dawî partiyê diparêz in. Em dûr neçin, li gel me hevalê Keşe di dadgehê de got, “ez sempatîzanê PKK’ê me.” Dîsa Merwan got, “ez sempatîzan im.” Beriya her tiştî divê em vê navenda xwe ya teslîmyetê baş fam bikin. Rewşa me ya heyî teslîmyet e.

Di fikir û bawerî de jî berxwedan heye. Wisa bêjim: Di nava dîwarên girtîgehê de heya radeyekî qebûlkirina tiştên ku dijmin dibêjin heye. Dema em gava xwe davên ji derveyî girtîgehê bi berxwedaniya heyî re dest bi têkoşîna xwedî li nirxên şoreşgeriyê derketin dest pê dike. Ev, li ti ciheke din yê cîhanê nehatiye dîtin. Ev jî bibe bibe rewşeke me xweser e…”

Keşe, gundiyekî sempatîk 38-39 salî bû. Xwendin û nivîsandina wî nebû. Di girtîgehê de her kesî xwe fêrî xwendin û nivîsandinê kir. Lê ji ber wî nexwest fêr bibe, fêr nebû. Bavê 5 zarokan bû. Bi heskirineke mezin bi şoreşgeran ve girêdayîbû.

Êdî malbata wî rêxistin bû. Her ferdeke rêxistinê bi qasî birayê xwe yê heqîqî jêhez dikir. Di nava van şartên teslîmiyetê de jî pêwîstiya ku heskirina xwe ya li

hember rêxistin û şoreşgeran veşêre nedîtibû. Bi taybet di helwesta xwe ya dawî de ku di dadgehê de dabû raberkirin, heyranbûn û heskirineke zêdetir di nava qawûşê de dabû avakirin. Hemû kesên di qawûşê de heyranê wî bibûn. Hevalên wî her tim belaya xwe lê didan. Jê re digotin: "Keşe ka dîsa ew axiftinên xwe yên dawî yên di dadgehê de bêje."

Keşe digot: "Ma ez ê çend caran ji we re bibêjim, neyên gel min. Biçin bila katîbê min kîbar ji we re bêje."

Mahmûd :

"Em katîbê te dizanin. Lê ka tu jî bêje."

Keşe:

"Piştî kibarêm min û şûnde dadwer Emrullah, bangî min kir. Ji min re got, 'te şekir û nîsk diziye. Tu çi dibêjî.' Min jî got; "agahiya min ji şekir nîne. Lê me nîsk nediziye me gasp kiriye." Piştre ji min re got, 'dibêjin tu endamê partiyê yî, tu çi dibêjî?' Ez destpêkê sekinîm, fikirîm ku ka çi bêjim.

Min ji xwe re got gelo endam bêjim baştire yan jî sempatîzan kîjanî mezintirîn e. Hema di wê kêliyê de Kibarê min hat bîra min. Min got, ez sempatîzan im. Piştî wê min bêhneke aram nedît. Dadwer Emrullah

pêşiya min berneda; ji min re digot tu çima hez dikî? Tu çima xwe partîzan dibînî, dipirsî.

Ez jî ditirsiyam ku tişteke şaş bêjim. Herî baş min biryarda ku bêjim, 'ji ber ez ji wan hez dikim, ez senpatîzan im. A rastî heke tiştek din bipirsîba min ê bangî Kemal Pîr bikiriba. Min ê bigotiba 'sekreterê min ew e.' Hûn dixwazin çi bipirsin ji wî bipirsin!' Ya baş dev ji min berdan, ez jî çûm li cihê xwe rûniştim."

## Beşa Sêyemîn:

Lenîn gotiye: “Salên binkeftinê salên yeman in.”Her binkeftinek hinek dewsên nebaş dihêle. Lê di girtîgeha Amedê de binkeftin di aliyekî de jî be wekheviyek ava kiribû. Ev wekhevî, wekheviyeke gelek nebaş bû. Ger ku ev wekhevî serok, welatparêz, qadro, sempatîzan hevkêşana(denklem) mirovê ji rêzê afirandibe, wekheviyeke xeter e. Keştiyeke ku di zivironeka bahozê de mabe bifikirin.

Ev rewşa alabore bûyî ji bo navenda rêxistina girtigehê rastiyek e. Rêxistina navendî darbeyek mezin xwaribû. Heta mirov dikare bêje hemû belav bibûn. Kadroyên pêşeng, dixwestin dîsa destpê bikin, bi enerjiya (wize) xwa ya di dadgehê de veguherînin kursiya şoreşgeriyê. Di nava girtiyan de rêz-heskirin mîna berê dayîna dest ji wan re mîna xeyalekê bû. Mîna berê nedibûn. Hestên hevaltî û hewrêtiyê mîna qalibeke cemedê ku deynî ber germahiya rojê roj bi roj diheliya. Jiyana şoreşgerî û navenda komîn tevlî hev kiribûn.

Dijmin, darbeyeke wisa hişk li wan xistibû ku, girtiyê herî xurt jî para xwe jê girtibû. Bi salan bû şoreşgeriya ku burjiwayê xistibû bin bandora xwe, ji nû de dewsên

birjuwayê biçûk û şexsiyeta feodal zindî dibû. Di her dema veqetîn ango dêrînê de,(ayrışma) di hemû demên zehmet de ev diyarde û xwediyê van diyardeyan dê xwe nîşan bidin.

Lê tevî her tiştî di navenda fikir de komeke girtiyên bi rik ku şerê xwe yê li hember kursiya dadgehê bêyî ku nefes bigirin didomandin. Ev jî agirê kesên ku azwerî (azim) berxwedanê di hindirê wan de ye dixistin tevgerê. Her çendî agirê tekneçûyînê kêm jî be zindî digirtin. Gelek mirovên ku dixwestin evîna agir di destê xwe de bigirin hebûn.

Qawûşa 33: Çawa ku gula berberoj her sibeh bi derketina rojê re li rojê temaşe dike, ev girtî jî wisa li benda agahiya ku ji hevalên wan bên bûn. Di dema atmosfereke wisa hikum dikir de, yên ku radibûn ser xwe hebûn. Yek ji van jî Ferhat bû.

Ferhat got:

“Hevalno, pêşniyariyeke min ji we re heye: Li gel jiyana me ya komîn, ji ber avaniya me ya qawûşê jî dest dide em perwerdeya xwe jî bibînin. Hûn çi dibêjin?”

Ednan:

“Di merceke wisa de tiştek wisa kirin wê rast bibe? Ji nîşkê ve derî vekin û bikevin hûndir wê encam çi bibe?”

Necmî:

“Li gor nerîna min pêşniyariya hevalê Ferhat di cî de ye. Tişta ku ji me re kêm were metaryal in.”

Ferhat:

“Her hevalê ku tiştek dizane bila ji hevalên din re bêje. Yek din jî em ê li ser mijarên rojane jî rûnin nîqaş bikin.”

Eşref:

“Bira, divê mijarê de dixwazim pêşniyarek bikim: Bila çend heval ji bo perwerdekirina girseyê bên erkdarkirin. Ev, bila destpêkê bên gel te çarçoveya mijaran diyar bikin, piştre bila ji komên ku hatine destnîşankirin re bêjin.”

Ferhat:

“Ji berê di mijara perwerdê de di me de nêzîkatiyeke şaş heye. Xebata perwerdeyê, ji jiyana rojane ya pratîkî bigirin, heta mijarên teorîk baweşîneg (yelpaze)digire nava xwe. Di vê navendê de perwerdeya ku em bidin girseyê wê pirsgirêkên rojane bigire nava xwe. Ji bo

perwerdeyeke wisa jî nebûna metaryelan pirsgirêkeke girîng nîne.

Pêşniyara Eşref di vê mijarê de rast e: Ji bo giringiya xebata ku em ê bidin meşandin, berpirsyarên wê bên destnîşankirin û ev di navendeke diyar de bê organîzekirin wê baştir be. Li gor nerîna min jî divê ev mijar li ber çav bê girtin.”

Gelek girtî beşdarî pêşniyara Ferhat bûn. Piştî demekê û şûnde, ji hêla Ferhat ve du kes hatin destnîşankirin ku bi perwerdê re mijûl bibin. Ev herdu kes jî Ednan û Alik bûn. Di demeke kin de dest bi xebata xwe ya dayîna perwerdê kirin. Kom li ser teslîmyete, îxanet, berxwedan û têgehên şoreşgerî yên di dadgehê de bên bikaranîn xebitîn. Yek din jî polîtîkaya îdarê û bûyerên girîng yên di cîhanê de diqawimin jî di nava mijarên ku dihatin nîqaşkirin de bû…

Wê rojê dengê gardiyan yê bilind hat û digot:

“Ulan berpirsyar, ka were vir! Emrên ku min sibê dabûn bi cî hatine?”

Berpirsyar: Bersiv da û got, hewl tê dayîn bên cî fermandar!”

Gardiyan:

“S...im ulan, tu çawa dibêjî hewl tê dayîn bê jî, îbne! Ma min çi gotibû?

‘Ma min negotibû wê bê cî,’ wê demê ‘wê bê cî!’ Min seatek dem dabû.”

Berpirsyar:

“Ma ez çi bikim fermandar. Hêjmara van mirovan ya zêde gundî ne. Xwendin û nivîsandina wan nîne.”

Gardiyan, derî vekirin û ketin hûndir.

Gardiyan got:

“Bikevin rêza hêjmarê! Zû bike kuro xwe nehejînin! Ka tu bixwîne.”

Girtiyê berpirsyar got:

“Ez ê çi bixwînim fermandar?”

“Tu yê roman bixwînî îbne! Kuro ma tu yê çi bixwînî, tu yê sirûda îstîklala me bixwînî sirûda îstîklala me.”

“ Min hê ji ber nekiriye qomîtan.”

“Baş e başe ka tu biçe vî alî. Ez ê niha nîşa te bikim ji ber nekirin tiştek çawa ye.”

Çawûş ket navberê:

“Navê te çiye navê te kuro?

“Navê min Îsmet Kolombo qomîtan.”

“ Kolomboya çî? Xizmetiyeke te bi ew Kolomboyê di televizyonê de dileyîze re heye?”

“Na qomîtan. Navê min yê kod ‘Kolombo’ye.”

“Başe paşnavê te çî ye?”

“ Korkmaze qomîtan.”

“Tu ji niha û şûnde postavanê min î.”

“Ma ne nameyên te nayên vir ku ez namegeriya (postaci) te bikim.”

“Kurê min, ne wisa yanê tu yê karê min yê li ber lingan bikî. Dema ku ez ketim qawûşê tu yê hema bêyî tekmîl bidî. Tu yê du gavan di pişt min de bisekinî.”

Kolombo hinek fikirî û got:

“Ez nikarim.”

Çawûş:

“Çawa dibêjî nikarim? Tu yê bikî ulan! Ê ka em ê piştre mêze bikin.”

Dema ku gardiyan, dît emrê serê sibê dayî nehatiye cî, ji derveyî Kolombo lêdan li her kesî da.

Dema ku hevalan lêdan dixwar, moralê Kolombo gelek nebaş bû. Piştî rêza lêdanê xilas bû û şûnde, Necmî got: “Serê xwe li ser neêşîne. Tiştek nabe. Ne

qanuneke ku her kes lêdan bixwe. Carna tu yê bixwî em ê nexwîn.”

Îsmet, bi eslê xwe ji Rihayê Qezaya Birecikê bû. Bavê wî gerdêlêneyeke (at arabası)xîzan bû. Dema ku kurê xwe nikarî bide xwendin û bike keseke zana, êdî tiştek ji destê wî nedihat ji derveyî pîşeya ku di destê wî de.

Pîşeya xwe fêrî kurê xwe kir. Li gorî bavê wî fêrbûna gerdêlanê jî hûner dixwest. Di ciheke ku ew qas seyare tê de bi cî dibin de hespan netirsandin û destgîna wan bikaranîn hostatî dixwest. Îsmet di demeke kin de fêrî hûnera bavê xwe bibû. A rastî di çavên wî de ev pîşeyek nebû. Îsmet ji bo girtiyan hêza kêfxweşiyê bû.

Bi qasî ku mirovan bide giryandin dikenand. Lê gelek zû jî teng dibû. Kesê ku jê tore dibû, piştî deh deqîqeyan û şûnde diçû lêborîna xwe dixwest û lihev dihatin. Ti caran demek dirêj bi yekî re xeyîdî nedima.

Lê yekî ku pê li demarê wî bikiriba, yanê berevajiyê nirxên şoreşê ketibe êdî ew kes nedibû dost û hevalê Îsmet. Bi temamî ji wî dixeyîdî. Hele dema zext û îşkence zêdebû û jiyana monoton destpêkir, Îsmet bibû hêza kêfxweşiya sohbetên civatê. Piştî bûyara lêdanê û şûnde ji bo ku hevalên wî, wî kêfxweş bikin, li dora wî rûniştibûn, hewl didan Îsmet bidin axiftin.

Necmî: “Ka Îsmet ji me re bêje tu çawa bûyî şoreşger, em jî guhdar bikin.”

Îsmet, destpêkê got: “Îro serê min pir tevlîhev e, dev ji min berdin!”

Eşref:

“Sankî li Qeredenîzê keştiya te hilweşaye, serî bin te îro hinek lêdan nexwariye. Meraq neke, tu yê hîn gelek bixwî. Ka tu ew meseleya xwe ji me re bêje. Em jî guhdar bikin…”

Kolombo:

“Mesele ne meseleya lêdanê ye. Çawûşek radibe ji min re dibêje, “tu posteyê min î.” Yên ku min dinasin dizanin. Li Birecikê heta qeymeqam jî ji min ditirsiya. Li ciheke ku ez tê re derbas dibûm her kes ji ber min ve radibû. Dibe ku hûn bawer nekin, lê ez ew kesim yê ku DDKD’ yê li Birecikê belav kiriye.”

Necmî got: “Îsmet, tu dîsa wisa yî. Serê xwe li ser neêşîne.”

A rastî ji dihû ve Îsmet amedebû ku çîroka xwe bêje, lê hinek delaliya xwe dikir.

Heke demeke din bûya, kesê jê nepirsîba jî wî yê çîroka xwe bigotiba. Piştî ku hinek kêfxweş û germ bû û şûnde dest bi çîroka xwe kir:

“Şoreşgerî yekê li Birîcikê ez bûm. Lê piştre ez pasîf bûm. ”

Necmî pirsî û got:

“Tu çima wisa bûyî?”

“Çîrokeke dirêj e. Sewdayeke dil. Neyse ez berdewam bikim: Ez berpirsyarê DDKD’ yiyan bûm. Rojek Cin Alî, hat Biricikê. Bangî min kir, em li TÖB-DER’ê axivin. Piştî vê axiftinê û şûnde min jî biryarda ku bibim Apoyî. DDKD’ yên ku girêdayî min bûn, min hemû tecrît kirin.”

Eşref got:

“Îsmet te çima hemû tecrît kirin; te dikarî wan jî bikî Apoyî ?”

“Ji bo min nexwest kes dibin bandora min de bibe Apoyî, ji ber vê yekê min tecrît kirin. Ger ku kesek bixwazibe bibe Apoyî, wê bi xwe lêkolîn bike û biryara xwe bide.”

Necmî:

“Ka tu devji DDKD’yî yan berde were ser meseleya hespên xwe.”

Kolombo:

“Du hespên min hebûn. Herduyan jî dema ku min hinek zêde bar li seyareyê bar dikir, gava xwe

natavêtin. Rojek min dîsa dar lê bar kirin di pirê de dimeşiyam. Ez hatim nivê pirê, ma ev nesekinin? Ez ji seyareyê daketim. Min serê wan gemrand, rica kir û li ber geriyam. Wan dîsa gavek tenê jî neavêtin.

Min ji xwe re got, ‘ev çima nameşin?’ Wiha piştî wê, min tevgerên din anî ber çavên xwe. Nexwe dema ku te bar zêde li wan jî kir ew jî di cihê xwe de disekinin gav navêjin. Ez li hespên xwe vegeriyam. Çawa ku em, yên din li pey xwe dixişikînin, min jî qemcîra wan girt, bi lêdanê wan bir. Min ji yekî re got, ‘revizyonist,’ ji yê din re jî got, ‘oportûnist.’

‘Hûn bimirin jî hûn ê vê şoreşê çêkin!’ Min wisa anîn. Piştî wê rojê û şûnde navê hespên min Oportînist’ û ‘Revizyonîst’man...”

Gardiyan bang kir û got: “Ji bo çûyîna hewa girtinê amede bin!” Li ser dengê gardiyan girtî hemû ji ser ranzeyên xwe hatin xwarê. Destpêkê li ber derî bûn rêz. “Berpirsyar got, divê kes di hûndir de nemîne.”

Gardiyan: Her girtiyê ku ji derî derkeve, bi dengê bilind bêje” yek, du, sê…” Bi vî rengî bi lez û bez dadiketin cihê hewa girtinê.

Gardiyan: “Çarkesî bibin rêz. Yên bejin dirêj li pêş!”

Li gor bejnê bûn rêz. Yên bejin dirêj çûn rêza pêşî. Di her rêzê de 20 kes hebûn. Heta, yên seqet û pîr bi seatan di rewşeke “amede ”de sekinin. Çawûş: “ Bila rêza yek cûda bibe!”

Girtî: “Ferman ke qomîtan!” Ji hev cuda bûn. Bi lez û bez çûn pêşiya çawûş bûn yek rêz.

Çawûş got: “Tu fermandarê komînê yî.”

“Komîtan ez.”

“Tu, kuro tu.”

Merwan bêyî ku dudilî bijî got, “tu ferman dikî qomîtan!”

Çavûş pirsî û got:

“Tu ji kî derê yî kuro?”

“Ez ji Rihayê me qomîtan.”

“Carekdin dema te tekmîl da rast bide.

“Tu ferman bike qomîtan.”

Çawûş got: “Ka nîşanî van bike meş çawa tê kirin, di vegerandinê de çawa çerx tê nîşanî van bike.”

Onbaşi, bi awayeke ji xwe bawer, mîna ku keseke nikaribe tiştek bike dike, singê xwe danî erdê lingên xwe metreyek ji erdê rakir, bi gavên ji xwe bawer du caran bi cihê hewagirtinê ve çû.

Çawûş got:

"Baş e, hûn ê jî wisa bikin."

Çawûş, bangî berpirsyarê qawûşê Girêsor kir got: "Were vir!"

Girêsor bi awayeke bez çû li pêşiya çawûş sekinî silaveke rewşedar a li ser pehniyê da çawûş.

"Girêsor Mardîn, emirke qomîtan!"

"Ûlan îbne, silava pehniyê wisa nayê dayîn, ka tu li wir bisekine. Bila berpirsyarê komîna din bê. Tu jî biçe gel yê din. Yê din yê di rêzê de Necmî tu were."

Necmî got:

"Necmî Öner, Amed, fermo qomîtan."

"Ka tu bimeşe ûlan îbne, ew çi meş e."

Yek ji van berpirsyarên qawûşan li gora ku gardiyan dixwest pehniya xwe li erdê nedan û meş nekiribûn. Lê yek ji van yanê Merwan, di salên xwe yên dibistanê de, majorê taxima dibistanê bû û ji qomîtanê herî bijarte xweşiktir dikarî silava pehniyê bide (topuk selami) û bimeşe. Her ji çi be îro dilê wî nedixwest tiştek bike.

Gardiyan got: "Bila berpirsyarê komînê li pêşiya min kom bibin. Destên xwe vekin kuro!"

Qalasê xwe yê ku di pişt derî de bû rakir û anî. Heya ku westiya li dest û her deverê van hersê girtiyan da.

Ev sepandina ku li ser hersê girtiyan dihat kirin yûzbaşî di pencereyê re temaşe dikir. Dema gardiyan dît ku yûzbaşî wî temaşe dike, êdî ne tenê li hersê berpirsyarên qawûşê, li her kesî xist.

Ne di xema gardiyan de bû ku ciheke girtiyan bişke an na. Wê kêliyê ji bo wan tişta herî girîng, bikevin çavê yûzbaşî û yûzbaşî ji wan re bêje eferîn. Mîna ku gardiyan ji ser xwe çûbin bi jop, kalas, pehîn û zeleyan li girtiyan didan, yûzbaşî ket hûndirê cihê hewa girtine.

Got: “Lêdanê qut kin!”

Girtî ketin rêzê di nava tirs û hêcaneke mezin de li yûzbaşî guhdar kirin. Yûzbaşî li gardiyan zivirî û got:

“Kurê min te van girtiye qantînê?”

“Min girtiye qantînê fermandarê min.”

“Baş e, min ji we hez kir. Heya ku we kuralan pêk anî ez ê jî we mîna ku hûn di mala xwe de ne bidin jiyîn. Haa hindik mabû ji bîr bikim. Hûn qet çûn serşoyê, serşoyê?”

Girtî hemû bi yek dengî gotin, “na fermandar.”

Yûzbaşî:

Ji gardiyan re got: “Hema wan bibe serşoyê.”

“Tu ferman dikî fermandar! Qawûş, ji bo serşoyê bimeşin!

“Gardiyan got, kuro berpirsyar, heya ez biçim jor her kes bila ji bo serşoyê amedekariya xwe bike, li ber derî li benda min bimînin. Divê ez wan di vê pozisyonê de bibînim. Dêka, bibeze, tu jî.”

Ji dema ku ji qawûşê hatibûn heya wê kêliyê, ava germ bi çavên xwe nedîtibûn. Em berdin ava germ, ava cemidî ya ji bo vaxwarinê jî zehmet didîtin.

Qirêjî, nepaqijî û sipî sînor derbas kiribûn. Tevî ku dizanîn wê di çûyîn û hatina serşoyê de lêdan bixwen jî, lê dîsa jî ji bo çûyîna serşoyê kêfxwaş bûn. Gardiyan li ber deriyê qawûşê bang kir:

“Ji bo çûyîna serşoyê hêjmara dawî sê, bila kes di hûndir de nemîne!” Dema ku girtî hilkişan ser maltayê gardiyan bi qomîta “bisekina!” wan da sekinandin. Bûn rêz, bi gavên baş û sirûd re ketin serşoyê.

Serşo, ciheke biçûk bû. Bi awayeke xwezayî tenê 20 kesan dikarin bikevinê û xwe tê de bişûn. Lê nêzî 100 girtî ketin hûndir li benda hatina ava germ man. Di navberê de du-sê deqîqe derbas bibû 30-35 gardiyan di destê wan de jop û bi kalasan ketin hûndir û gotin, “zû derkevin kuro û êrîşî girtiyan kirin!”

Girtiyên ku dixwestin biçin derve gardiyanên li ber derî li wan dixistin. Dema diçûn hûndir jî gardiyanên li

hûndir li wan dixistin. Girtiyên ku karibûn tenê bi ava cemidî hinek xwe şil bikin, ev car jî bibûn hedafa derbeyên jop û kalasan. Bi vê re jî sînodar neman, girtî bi awayeke tazî li maltayê kirin rêz li ber sirûdê meş bi wan dan kirin. Girtî hîn 5-10 gav navêtibûn gardiyanan bi kalas ji milê cep û rastê ve carekedin êrîşê ser wan kirin. Li ber dengê kenê gardiyanan yê bilind ji wan re qomita, "xwe dirêj kin! Bi erdê re bixişikin!" dihat dayîn. Ji serşoyê heya xwaringehê bi lêdana jop, kalas û xortuman bi erdê re li hawirdorê maltayê xişikandin. Bi qomita gardiyan ya,"qawûş rabe!" Hemû girtî rabûn, bûn yek rêz û rawestiyan.

Li ser vê gardiyan, qomîta "marş marş biçe qawûşê!" da.

Girtî ji aliyekî ve cilên xwe yên di destê xwe de girtibûn, ji aliyê din ve jî ji bo xwe ji ber darbeyên jop û kalasên gardiyanan biparêzin xwe avêtin hûndirê qawûşê.

Îsmet got, "bi rastî jî me serşoyeke xweş kir!" Her kes çû gel bîdonên avê. Yên nexweş û temen mezin çûn ser ranzeyên xwe ji hêla hevalên wan ve mesaj li pişt û lingên wan hate kirin. Derman li birînên wan hate kirin.

Di vê navberê de, li ser ranzeyan kulîsa sohbetan ava bû. Mijara nîqaşan jî êrîşên îdarê yên dawî bû. Avantaj û dest avantajên her cihek li gorî xwe hene. Destavantajên qawûşa 33. ji ber qata çati bû lewra bêavî, cihê pêwîstiyên kesî di nîvê qawûşê de bûyîn û ji ber piştre hatibû çêkirin her tim dixetimî.

Bêşansiya wê qawûşê ev bû. Tişta ku avantaja wan tê de hebû, ji ber qada çati bû kesî nedikarî wan bişopîne. Dema ku mazgal vedibû hemû qawûş nedihat dîtin. Ji ber pir bilind bû ne gengaz bû ku di şebekeyan de bên şopandin ango kontrolkirin. Qawûş gelek mezin bû û hejmar pir bûn. Ji derveyî PKK'yiyan girtiyên tevgerên din yên siyasî pirsgirêk ji wan re dernexistin û nebûna kesek ku di derbarê wan de agahî bide îdarê em dikarin ji bo qawûşa 33. avantaj bihesibînin. Îdarê her roj bi bername û rêbazeke nû re li baremberî girtiyan disekinî.

Herî dawî bernameya jiyana rojane ferz kirin û xwestin ev bername bikeve meriyetê. Êdî di Girtîgeha Amedê de hemû kêliyên jiyanê bi îşkenceyê re derbas dibû. Miroveke ku hinek bifikire wê armanca tişta ku li vir tê kirin bi hêsanî fam bike. Diviyaba girtî ne xwe û ne jî pêşeroja xwe bifikirîban. Diviya şeklê "miroveke"

wisa derxistibana holê ku ji bo bêjî “mirova” hezar şahît jê re bihatibana dîtin.

Yanê tişta ku îdarê dixwest, dema girtî di neynikê de li xwe binêrîn nikaribin xwe binasin. Tenê ne di warê fizîkî de, di warê fikrî de jî divê “tine” bin. Bernameyeke girtiyan ku neyê guhertin hebû û tevî van bêderfetiyane jî armanc kiribûn ku pêk bînin. Lê dijmin wisa vale nedisekinî. Pir zêde dixebitî.

Di girtîgeha Amedê ya Nolu 2 de du bendên destura bingehîn yê gardiyanan ketibû pratîkê. Ev bend wiha bûn: Benda 1: “Qomîtan her tim mafdar e!” Benda 2: “Dema ku qomîtan bêmaf be, benda yekem derbasdar e.” Ev dihat vê wateyê: Girtî, ji bo îdarê û K.T (Komara Tirkiyê) ne tiştik bûn ango tiştek îfade nedikirin. Dikarin her tiştî bi serê wan bikin. Weke ku ji vê jî tê famkirin, dikarin hemû îşkence li ser girtiyên di girtîgeha Amedê ya Nolu 5 de bidin meşandin. Ti mafeke girtî, heta mafê wî yê herî xwezayî axiftin jî nebû. Ew, tenê çi dibe bila bibe neçar bûn ku fermana ji wan re tê dayîn bi cî bênin û pê ve girêdayî bimînin.

Li hemberî hemû îşkence, zext û xweferzkirinên wan girtî, bi awayeke bê navber jiyana xwe ya rojane didomandin. Carna di pişt lêdanên herî zêde de, carna jî di pişt kêliyên wan yên herî xemgîn de ya çend

stranan dibêjin yan jî li gel sohbetên xwe yên germ dest bi ken dikin. Ev jî zagona girtiyan ya ku qet nedihat guhertin bû. Li hemberî her bêhêviyekê hêviyek, li hember her kêliyeke biêş kêliyeke kêfxweşiyê lêbar dikirin. Yên ku nedixwestin ji nirxên şoreşgeriyê dûr bikevin û hîn jî di dilê wan de agirê gel û welat pêdiket hewl nedidan ku xirap bifikirin, li hember yên wisa difikirîn jî her tim hewl didin bibin hêviyek.

Şayed mirov di ciheke wisa de bikeve hundirê xwe û her tim li xwe bifikire, wê ev li gorî berjewendiyên dijmin baya. Ji ber ku dijmin her kêlî dixwest vê sor bike ango pompa bike. Heya kêliya ku berxwedan bidomandiba, çi di qawûşa 33'an de çi jî qawûşên ku teslîm bûne hinek pêwîstiyên wan yên cur be cur bi cî dianîn.

Li gel tundiyan di hemû warê jiyanê de hecîrkirin (kısıtlama) hat dîtin. Di serî de çûyîna hewa girtinê, qantîn, xwarin, av û gelek pêwîstiyên giştî yên jiyanê kêm kirin. Çûyîn û hatina dadgehê, hevdîtin, serdana parêzer, çûyîna nexweşxanê, çûyîn-hatina qantînê û hwd. Ev hemû mîna şêwazeke îşkenceyê dan bikaranîn. Jixwe kontrolkirina wan îşkenceyeke bi serê

xwe bû. Ev îşkence veguherandin talan û bi rûmeta girtiyan lîstin.

Gardiyan: Bangî “qawûşa 33!” kir.

Got berpirsyar:

Berpirsyar: “Kerem ke qomîtan!”

“Ji bo qantînê bila 10 kes derkevin derve!”

Li ser qomita gardiyan hemû qawûş li ber derî kom bûn.

Gardiyan bi dengê bilind qîrkir got, “dengê xwe qutkin, dengê xwe!”

Ew 10 kesên ku gardiyan hilbijartibû derketin tekmîla xwe dan û bi gotina “yek, du re…” derketin û çûn. Yên ku çûne qantînê yên bejna wan dirêj girtin pêşî heya ber qantînê bi awayeke yek rêz li ber sirûda komando meşiyan. Wê kêliyê yûzbaşî Esat yê ku ji qantînê derket di destek de xiyarê xwe dixwar, ji aliyê din ve jî ji gardiyan dipirsî, “kurê min ev kîjan qawûş e?”

“Gardiyan bersiv da, qawûşa 33. qomîtanê min!”

Yûzbaşî:

“Ha 33 baş e tu van dibî kî derê?”

Gardiyan:

“Dibim qantînê qomitan!”

Yûzbaşi:

“Na, na; tu van cardin bibe qawûşa wan, ez ê niha bêm.”

Her ku girtiyan yûzbaşî didîtin dizanîn ku wê felaketeke bê serê wan. Ev car jî diyar bû ku wê heman tişt bihatiba serê wan.

Gardiyan:

Bi dengeke bilind“vegerin qawûşê, haydî bi lez marş marş!”

Piştî yên ku ji bo qantînê derxistibûn û şûnde, yên di qawûşê de mabûn jî hewl dabûn perwerdeya xwe hinek zindî bimeşînin. Heya yên nexweş jî rabibûn ser xwe. Bi fikirandina ku wê her tim qantîn bê çend qotiyên şîr bi awayeke comert ji yên gel xwe re îkram kiribûn. Bi vebûna derî re girtiyên ku çûbûn qantînê di nava xwînê de hatin ketin hûndir. A rastî êdî ev bûyerên îşkence û lêdanê bibû parçeyeke ji jiyanê. Girtiyên di qawûşê de mabûn, birînên hevalên xwe yên ku çûbûn qantînê derman kirin.

Di laşê Halo de hema hema cihê hemû nexweşiyan hebû. Mide,

qalp û hwd. Lê Halo, tevî hemû nexweşiyên xwe ti caran bejna xwe li ber dijmin netewand.

Piştî her lêdanekê lezo, şîr û tiştên din yên xwarinê ku ji bo xwe rakiribû li hevalên xwe belav dikir. Li gel vê bi henekan moral dida hevalên xwe. Halo, li hember lêdanê ti caran negot, “ay! Oy!” Û delalê hemû qawûşê bû. Dîsa gardiyan bi dengeke bilind, “bal kişand!” Li ser balkişandina gardiyan hemû girtî rabûn ser xwe di cihê xwe de sekinin. Yûzbaşî Esat li pêş, Co li pişt, di pişt Co de jî 10-15 gardiyan ketin hûndir.

Yûzbaşî got:

“Ez hatime vê ji we re bêjim. Divê hûn vê baş bizanibin ku di vê girtîgehê de wê kes ji derveyî quralên min dernekeve. Ger ez bixwazibim ez ê we bibim derve û we bidim rizandin. Aqlê xwe bînin serê xwe. Ez ji we nerazîme. Di derbarê we de hinek tiştan dibihîsim. Ez di wê baweriyê de me ku hûn ê ji niha û şûn ve xwe rast bikin.”

Yûzbaşî piştî van gotinan û şûnde derket çû.

Ka gotinek heye dibêje: “Tu ji min re hevalê/a xwe bêje, ez bêjim tu kî yî?”

Dostê Esat Oktay yê herî nêz kuçikekî nêr bi navê Co bû. Conî ji navên Emerîkî yê hatiye kurtkirin, yanê Co.

Lê ev navê bêsiûd li kuçikeke Tirk ku berevajiyê berjewendiyên Tirk bikeve hatibû dayîn.

Ji bo Esat, sedeqeta xwe li bîra emparyalîzmê bêne wî ji gel xwe qut nedikir. Heta wî ji kurê xwe yê rastîn zêdetir hez dikir. Ji bo Co îhtîmama taybet dide nîşan, ji bo domandina nesîlê xwe, hewl dida enik zêde bide. Parêzeke taybet ji bo wî diafirand. Co hemû demên rojê li gel Esat bû, di hemû teftîşan de Esat li gel wî dibû. Bi hev re dihatin gel girtiyan beriya ku Esat tekmilê ji girtiyan bigire, tekmil ji Co re dihat dayîn û piştre bi xwe tekmîla girtiyan digirt. Ji bo girtiyan Co fermandarê girtigehê yê herî mezin bû. Ji ber hevalê Co Esat, wisa dixwest. Gardiyanên di qawûşê de man, hemû girtiyan di rêza lêdanê re derbas kirin. Yanê her girtiyek nasîbê xwe ji lêdana gardiyanan girtibû. Di nava girtiyan de taybetmendiyeke din jî hebû: Di guhertineke herî biçûk de jî gelek şirov dikirin.

Hanê "dibêjin ya xeber ango nûçe şiroveya herî pîroz e" ev ji bo qawûşa 33. û Girtîgeha Amedê derbasdar bû. Dema kefçiyeke xwarin didan girtiyan lewra heqê şiroveyê gelek zêde dibû. Dema ku lêdan gelek dixwarin, dîsa makîneyên şiroveyê diketin dewrê digotin, "gelo çima wisa bû?" Di dema ku girtiyan hewl didan wate bidin lêdana ku ji sibê ve li wan tê kirin,

temaşe kirin ku komeke din girtiyên ku nû hatine girtin anîn qawûşê. Girtiyan wê demê behneke kur hildan. Û gotin, “ wiha sedema lêdana ku em dixwin ev e, girtiyên nû hatîn hevalên me ne.”

Gardiyan:

“Lan berpirsyar hinek nan û av bidin girtiyên nû hatin. Bila xwe bişon.”

Berpirsyar: “Tu emir dikî qomîtan! Berpirsyar got hûn bi xêr hatin, derbasbûyî be.”

Girtiyên nû hatin gotin, xêredar be, hûn saxbin.”

Girtiyên nû hatîn qawûşê hinek girtiyên berê yên di qawûşê de bûn nas kirin.

Piştî ku hevdu hemêz kirin û şûnde çûn li koşeyeke qawûşê rûniştin.

Pirsên destpêkê ku dihatin kirin, “li derve çi heye çi nîne, hûn kengî hatin girtin? bû.

Girtiyên nû hatîn bersivên hinek bitirs û bi guman didan.

Necmî got:

“Heval navê te çî ye?”

“Elî.”

“Hûn kengê hatin vir?”

“Ev nêzî meheke di hûcreyan de me. Vê sibeh qomîtanê min yûzbaşî hat got, “ez ê we bidim qawûşekê.” Û me anî vir.

Necmî, li Amed temaşe kir. Ev awir weke ku bêje “guhdarke, di van de gelek tişt heye.”

Necmî:

“Çawa, di hûcreyan de li we baş temaşe dikirin?”

Elî:

“Tabî gelek baş li me temaşe dikirin.”

“Yanê qet lêdan li we nedikirin?”

“Na, çima lêdanê li me bikin. Piştî ku tu guhdarî wan bikî û şûnde...”

“Yaho heval, em gotinên wan yek bi yek bi cî tînin lê dîsa ji lêdanê xilas nabin.”

Amed, ji bo ku piştgirî bide gotinên Necmî dest bi axiftinê kir:

“Bi rastî jî ger weke ku te gotibe, tu vale vale hatiyî vir.”

Elî got:

“Ji bo min ferq nake.”

Di wê kêliyê de berpirsyar girtiyên ku nû hatin dîsa bir xwarinê. Di qawûşê de hemû tiştê ku dihat dîtin yên

mîna şîr, reçel û çi hebû danî ber girtiyên nû hatî. Yên ku nû hatin, him xwarina xwe dixwarin, him jî bersiva pirsên ku dihatin kirin didan. Di nava van de yekî bêdeng û bi awirên watedar li hawirdora xwe temaşe dikir dihat dîtin. Ev helwesta bi gûman bala hemû girtiyên di qawûşê de kişandibû.

Amed, çû gel Necmî bi dengekî hêdî got:

“Di yên te de tiştek heye.”

Necmî:

“Tu mereq neke. Ez ê rastiya wî di demeke kin de derbixim.

Ka bala xwe bidê tenê ne ew, ew ê kinik yê li kêlega wî xwarin dixwe? Gumanên min ji wî jî heye. A rastî yên ku wî nasdikin hene li vir.”

Amed:

“Ew hemşeriyê me ye. Piştî xwarinê tu bi wî re baxive ez ê jî bi yê din re baxivim...”

Necmî:

“Bila ev kar Eşref û Mahmûd bikin.”

Amed:

“Baş e, ez ê wan teslîmê Eşref û Mahmûd bikim...”

Dîsa qawûşa 33 ket nava teşqeleya bendewariyê. Ji qawûşê 3-4 hevalên wan çûbûn dadgehê. Ji bo girtiyan dadgeh cehenemek jî be, ji doh ve her kes ji bo çûyîna vê cehenemê amedebûn. Ji ber rûyên hinek mirovên cuda dîtin, her çendî di bin esaretê de bin jî çend caran li rûyê esîman temaşekirin ji bo wan nîmeteke ku nedihat dîtin bû. Hele ger ku girtî hinek agahiyên xweş anîbe, di cîhanê de dibû kesê herî bi şans û yê herî bextiyar.

Cihê van agahiyên xweş û kevirê mîheng jî di pişt ragihandina gotinên hevalên wan yên di dadgehan de xwe pê di parastin de bû. Girtî, ev bi rojan bêyî ku bêzar û aciz bibin vedigotin. Him jî wisa tanîn ziman ku mîna yê li wir axivî û parastina xwe kirî ew bi xwe bin. Wiha tişta ku girtiyan li ser lingan dihişt û di wateyekî de nedihişt binbikevin ev xeber ango agahiyên ku ji dadgehan dianîn bû. Ber bi demjimêrên êvarê ve Ferhat, Amed, Ednan û Alık ji dadgehê hatin. Destpêkê pêwîstiyên xwe bicî anîn û çûn beşa ku lê dirazan.

Eşref pirsî û got:

“Çi bû li dadgehê, ka pêşkeftinan bêjin. Kesek ji qawûşa 35’an hatibûn hebûn?”

Ednan got:

“Tiştek pir cudatir nebû. Rewşên her carî bûn. Di çûyîn û hatinê de me têra xwe lêdan xwar.”

Ferhat, li Amed zivirî û got, “te pere da?”

Amed:

“Min da bira. Lê nizanim bigihe cihê xwe yan ne.”

“Çima, ma te da kê?”

“Li gel min Faysal hebû. Bi awayeke mecbûrî min da wî. A rastî dema ku min da wî birayê Mazlûm dît. Min jî bi zanebûn û dengeke bilind got ev pere bide birayê Mazlûm.”

“Ez bawerim wê bigehe cihê xwe.”

Necmî dest bi gotinê kir û got: “Tiştên di dadgehê de bûne ji me re bêjin. Bi seatane em li benda hatina we ne”

Ferhat got:

“Ednan, tu ji hevalan re bêje. Îro hinek serê min diêşe.”

Dema Ferhat xwe li ser cihê xwe dirêj kir Ednan, ji girtiyên li dora wî kom bûne re mîna ku konferansek bide dest bi tiştên di dadgehê de qewimîbûn kir:

“Hevalno! Ez ji we re qala lêdan, îşkence û nêzîkatiyên di çûyîn-hatinê de bûne nakim. Ji ber ev tiştên heroj tên kirine.

Jixwe tiştên ku hûn jî ji min dixwazin ne ev in. Koma Amedê hemû anîbûn. Pêşkeftina herî giring ya di dadgehê de, axiftinên hevalê Xeyrî bûn. Çend raporên Komîteya Navendî ya Partiyê xwend. Li ser vê birayê Xeyrî mafê axiftinê girt û dest bi axiftina xwe kir. Da diyarkirin ku ev belge aîdê navendê ne. Di pirşt vê re daxwaz kir ku bi hemû komên di doza PKK'ê de tên dadgehkirin bi Mazlûm re beşdar bibin.

Dadyar Emrullah Kaya jî pirsî û got, 'hûn çima bi hemû grûban re dixwazin derkevin? Hûn di koma Amedê de tên dadgehkirin.'

Birayê Xeyrî bersiv da û got, "dozên PKK'ê yek e. Heta daxwaza me ya ku bi hemû koman re derbikevin hebû. Lê ji ber em bêderfetiya vê dizanin lewra di vê mijarê de bi israr nînin. Ji bo bi awayeke peryodîk derdikevin doza bingehîn, lewra anîna wan gengaz e. Ji bo çi û sedema vê jî, bi sifata ku em endamên PKK-komîteya navendî ' ne divê em li wir bin. Ya din jî li hember rewşên ku li dijî rêxistina me derbikevin holê jî wê nêrîn û parastina me jî çêbibe.

Mînak, di koma Xarpêt (Elazığ) de dîtina keseke mîna Şahîn DÖNMEZ di vê em jî li wir bin. Ji ber nirxandinên di derbarê me de bên kirin em ê bibin mûxatabê wan nirxandinan."

Li ser vê heyata dadgehê di navbera xwe de nîqaşeke kirin û ev daxwaza birayê Xeyrî hat qebûlkirin. Ji niha û şûn ve bi hemû komên ku di doza PKK' de tên dadgehkirin wê birayê Xeyrî û Mazlûm jî derbikevin. Agahiya yekem a giring ev bû. Yek din jî lêpirsîna Akif Yılmaz hat domandin.

Mahmûd :

"Çima? Ma beriya niha lêpirsîna Akif nehatibû kirin?

Ednan:

"Na, nexêr. Di dema lêpirsînê de Akif neanîbûn. Akif, îro di lêpirsîna xwe de partiyê parast. Bi kurtî got, ez sekreterê herêmê bûm û di vê demê de bûyerên ku çêbûn ji hemûyan agahdar bûm, lê kê van bûyeran pêk dîanî nizanim."

Eşref:

"Di 35'an de rewş çawa ne?"

Amed:

"Ma çawa bibe? Qet nebaş e."

Di wê kêliyê de bala her kesî çûbû ser Amed.

Amed got:

"Di vegerê de ez û Akif ketibûn gel hev. Ji min re hemû pêşkeftinên qawûşa 35'an got. Li gorî ku gotî; hêjmareke ji hevalên pêşeng birine qata 4'an di

navberê de hûcreyeke vala hêlane, ji ber vê xeterî û zehmetiyên agahîdayîna hev anî ziman û got heta yek du nîşeyan jî girtine. Wiha wisa axiftinên xwe domand.

Jiyana komîn bi awayeke teng didome, li gel vê hinek kes-kesên şoreşger erozyon bûne û tevî ku li gel hevin jî alîkarî bi hev re nakin ango ji alîkarîdayîna hev diçin paş. Ez bawer im ev rewş gelek zora wî çûbû ji ber dema tanî ziman bihêrs bû. Diyar kir ku bi taybet di qata 2'an de jiyana komîn qet nîne. Wiha ji ber van sedeman em car caran ji we pere dixwazin, lê ew pereyê ku we bi hinek kesan re şandî ew kes van pereyan ji bo xwe birin û ji komînê veqetan. Da xuyakirin ku pereyên me şandî ji bo qada 4'an bû û got, pereyên hûn dişînin nagihe cihê xwe ji niha û şûn de pere neşînin."

Ji nîşka ve Ferhat, bangî Amed kir û bir gel xwe jê re got:

"Min axiftinên te guhdar kir." "Tiştên ku te anîn ziman hemû rast in. Ji bo vê tiştek nabêjim. Lê her rastî li her cihî nayê gotin. Ev tiştên ku te zanîbûn te yê komeke teng yên hevalan kom bikiriba bi wan re parve bikiriba. Tiştên ku te li pêşiya girseyê gotî wê di serî mirovan de rê li ber gelek pirsnîşanan veke.

Heta hinek kesên ku nebaş difikirin wê vê li baremberî me bikar bînin. Mesela di qawûşa 35'an de lewazbûna komînê û di qadekî de jiyana komîn nebûyîn ji girseyê re nayê gotin. Di vê mercên ku em di nav de ne bidin ber çav."

Amed, mîna keseke ku sucê xwe qebûl bike serê xwe xist ber xwe:

Got:"Tu mafdarî, mafdar. Bila ev jî ji min re bibe ders. Ez bawer im wê careke din çênebe. Min carek xwe winda kir."

Ferhat: "Ka bangî hevalan bike em hinek ser vê rewşa dawî baxivin."

Amed, çû gel girtiyan û got, "heval bi awayeke cewherî min pêşkeftinên hebûn hemû ji we re got, hûn dikarin belav bibin."

Mahmûd  meraq kir û got:

"Çibû?"

Amed got:

"Qed qal neke. Ka tu hevalan kom bike. Birayê Ferhat bangî me hemûyan dike."

Mahmûd  got:

"Ev car dora me ye?"

Amed:

“Ka tu hevalan kom bike tu yê li wir fam bikî.”

Ferhat, dema dît hevalên ku bang kirî li dora wî kom bûne dest bi axiftinê kir:

“Bi kinahî dixwazim vê ji we re bêjim. Ji dema em hatine vir heya niha me çend caran bi 35’an re alîkariya peran kir. Ez bawer im agahiya gelek ji me heya agahiya me hemûyan jê hebû.

Lê îro him hevalên ku ez bi wan re axivîm him jî yên hevalê Amed bi wan re axivî, xwestin ji qawûşa 35’an re pere, cixare û pêwîstiyên din bişînin.

Heya ku pêwîstiyên qawûşa 35’an çênebin êdî em ji wan re pere û cixare naşînin. Ev helwesta baş ku niha qawûşa me di nav de ye, yanê hebûna komînê, meşandina xebatên perwerdê, domandina yêkitî û bi hev re bûna me ji siya hevalên me yên pêşeng ku di qawûşa 35’an de cî digirine, em vî hêz û moral ji wan digirin.” Ferhat bi vî rengî axiftinên xwe bi dawî kir.

Halo, ji lezoya taybet ku îstîqaq ango heqê koma nexweşan bû çêkir û yek yek li ser hewrêyên xwe belav kir.

Keşe, hewl dida lezoyê bixe mîdeya xwe. Îsmet jî komeke girtî li dora xwe kom kiribû, bi kelecaneke mezin axiftinên Xeyrî û Akif yên di rûniştina xwe ya

dozê de kiribûn tanî ziman. Kolombo, dema dît partîzanek tê gel wan mijara axiftinên xwe guhertin û got:

"Wiha her kes derketiye holê, 'dibêje ez şoreşger im.' Lê li hember dadgehê jî bêdeng dimînin, serê xwe ditewînin û dibêjin "me berdin, em bûne tobekar. Temaşekin heta dibêjin em beşdarî çalekiya berxwedaniyê jî nebûne." Halbikî pêşengên me him di girtîgehan de li ber xwe didin him jî di dadhehan de dengê xwe bilind dikin."

Yê partizan got:

"Ê baş e, lê îro berxwedan nîne. Her kes teslîm bûye."

Kolombo got:

"Tu wisa bifikire. Dema pêşengên te li vir mîna mehmetcîkan perwerde dibînin, pêşengên me jî ancex Dimitrov dikare wan parastinan bike dikin. Ji min nepirse, ger tu nizanî biçe ji hevalên xwe bipirse.

Li Tirkiyê ji dema Ataturk ve heya niha yên ku ji xwe re dibêjin em şoreşgerin hene. Lê heya roja îro helwesta ku me di dadgeh û girtîgehê de daye raberkirin kesî nedaye nîşan."

Yê partîzan got:

“Tişteke ku ez ji helwesta yên we di dadgehê de dane raberkirin nabêjim.”

Kolombo:

“Tabî tu nikarî bêjî.”

“Îsmet ka berde ez hinek baxivim.”

Kolombo:

“Tu yê çî bêjî? Ka bêje. Li qilif gerîn nîne. Her tişt zelal û raste rast bêje. Ez ji teoriyê fam nakim. A rastî serokeke şoreşger dibêje; “şoreşgerê herî baş kesê ku teorî û pratîkê bi hev re dimeşîne û hez dike ye.” Bi rastî her çendî min ji te re gotibe ez ji teoriyê fam nakim jî min şaş fam neke, ez zilamê ku teorî û pratîkê bi hev re hez dikime. Ev tenê ne di we de, di gelek kesên Çepê Tirkan de heye. Yan teoriyê bi serê xwe dimeşînin yan jî pratîka wê.”

Yê partizan got:

“Yahu Îsmet ji bo xwedê ka bisekine. Tu ji min re dibêjî ‘teoriyê neke,’ lê tu bi xwe teoriyê dikî.”

Kolombo:

“Hûn fam nakin. Ger ku teorî ji pratîkê bê qutkirin, wiha wê demê dê lingê me li hewayê bimîne. Te niha fam kir? Ji ber ez dizanim; tişta ku tu ji min re bêjî tenê teoriya meselê ye. Di pratîkê de jî hûn sifirin.”

Yê partizan, aciz bû çû. Îsmet, bi ken li hevalên xwe temaşe kir û got, “we dît min çawa wî mat kir?”

Hevalên wî gotin:

“Îsmet, tişta te kirî qet baş nebû. Mane te mafê axiftinê neda zilam. Çi digot bila bigota tu neçarbû wî guhdar bikî. Mademkî nîqaş dikî, tu yê nîqaşê jî li gorî quralên wî bimeşînî.”

Kolombo: “Ji xwe tiştên ku wê bigotiba dizanim. Çima wê baxivîba û serê me biêşandiba.

Me gotibû çûyîna girtîgehê bi taybet girtîgeha Amedê di 13 deriyan re dikeviyê. Yek jî hinek deriyên girtîgehê ku nayên vekirin hene. Yek ji van, heya çend ji van deriyan, deriyên ku mirov dikare tê re biçe cihê hevdîtinê bûn.

Dema ku maltayê derbas kirin hatin cihê ku îdare lê dimîne, li ser milê çepê jî deriyek dihat dîtin. Li ser vî derî jî nivîseke bi tîpên mezin ku hatibû nivîsandin hebû.

**“ BI TIRKÎ BAXIVE PIR BAXIVE!”** Dema li milê çepê dikeviyê li ser milê rastê çend kabînên hevdîtinê yên mîna jêrzemînê heye. Carna li wir bi ziyaretvanên xwe re hevdîtin pêk tînî. Yan jî pêşde biçî deh-duwazde kabînên din tên dîtin, yê herî dawî jî bi tenê ye. Bawer

in cihê hevdîtina parêzeran e. Lê heya niha kesê nedîtiye kes li wir bi parêzerê xwe re hevdîtin kiriye. Parêzer jî di kabîna ziyaretvanan de hevdîtin dikin. Ti cudahiyeke wan nînbû.

Ser parêzeran tê gerandin; parêzer bi nêzîkatiyên nebaş re rû bi rû tên. Gardiyan mîna zebariyên cehenemê li ser serê wan radiwestin. Dema ku hevdîtin bi dawî dibe gardiyanek situyê wan digire dixişikînin derve. Di kabîna hevdîtinê de destpêkê têlên vehonayî û piştre cam hebûn. Lê beriya ku cunta bê, girtiyan caman şikandibûn ji ber wê kabîna hevdîtinê bê cam mabû. Kabîne tarîbûn. Yên ku dihatin hevdîtinê encex ji dengê girtiyan dikarin wan binasin. Rojeke din yê hevdîtinê yên weke her carê dihat jiyîn, listeya navan a ku di destê gardiyan de di kuna mazgalê re dirêj kir û got, “berpirsyar!”Berpirsyar bi lez û bez bersiv da. “Yên ku navên wan di vê listeyê de ne bila xwe amede bikin.”

Berpirsyar, di henaseyeke de navên di lîsteyê de xwend û piştre bi pele got, “zû bikin hevalno, xwe amede bikin, hûn ê biçin hevdîtinê.”

Di postaya yekem de navê Amed, Girêsor, Ferhat û bi çend hevalên xwe yên din re di derî re derketin derve û

çûn. Dema ku gihîştin maltayê gardiyan bi qomîta "bisekinin" wan da sekinandin.

Gardiyan got: "Bibin dudu. Hazir û amede bin, baş bimeşin, bila ling rabin kuro ling. Dest bi sirûda Eskîşehîrê bikin û hwd!"

Girtiyan gotin:

"Eskişehir, Eskişehir..."

Gardiyan got:

"Sirûd qutke, ez ê di vegerê de hesap ji we bipirsim îbneno."

Dema ku girtî gihiştin cihê hevdîtinê, dîtin ku di hûndirê her kabînekê de û li aliyê ziyaretvan lê dimînin askerek heye. Her girtiyek, diçû cihê hêjmara kabina wî lê ye û sicila xwe ji asker re digot. Li benda emrê ku gardiyan bide diman. Bi awayeke giştî gardiyan wiha digot, "li min temaşeke bikin hûn ê bersiva pirsên 'tu çawayî, baş î?' Tu yê wiha bêjî: 'Ez pir baş im, cihê min gelek xweş e, tenduristiya min li cî ye, min meraq nekin û tiştek ji min re pêwîst nîne."

Yekî ku van pênç kelîman derbas kir dişewite. Digot wê pirsên, gelo nîsk baş in, mîh û bizin çawanin, metik û xaltîkên min çawanin çênebin. Hat famkirin? Girtî neçarbûn bêjin "tu emir dikî qomîtan."

Amed yê ji qawûşa 33'an tiştên hatî gotin hemû qebûl kir. Gardiyan "bizivire paş" Amed zivirî paş û li benda emrê ji wan re bê ma. Bi ketina ziyaretvanan ya kabîneyê re, gardiyan bi qomita "bizivire" zivirî paş. Ziyaretvanên wî kî dibe bila bibe divê tiştên ku gardiyan gotî bihatibana dûbarekirin. Amed li şûna dayîka xwe ku her tim dihat hevdîtina wî birayê xwe û hevjîna xwe dît. Birayê Amed yê biçûk Rizgar, xortek çeleng û ciwan bû. Di heman hefteyê de zewicî bû. Ji bo dilmayîna ku bê xebera birayê xwe zewiciye derbas bike û ber dilê wî bigire ji cihêzên xwe diyarî ji bo Amed anîbû. Ev, rewşeke wisa bû ku tiştên gardiyan gotî gelek derbas dikir. Dema Amed birayê xwe û hevjîna xwe ya ku ew 6 meh bû nedîtibû dît, bi awayeke xwezayî ji gotinên ku gardiyan gotibû derket û dest bi axiftinê kir.

Rizgar got:

"Tu çawayî bira?"

Amed:

"Ez baş im tu çawa yî?"

Rizgar di ferqa dem û rewşê de bû. Ji ber vê hema ket mijarê:

“Bira, a rastî min dixwest ji te re bigotiba lê ji ber min derfet nedit lewra min negot. Ez zewicim.”

Dema ku Amed vê bihîst, kêfxweş bû. Dixwest heyecana xwe bide derve, birayê xwe hemêz bike û serkeftinê jê re bixwaze. Lê dema gotinên gardiyan anî ber çavên xwe û lêdana di piştre bixwe, hinek sekinî. Rizgar li pêşiya birayê xwe sekinîbû li benda bersiva wî bû. Hevjîna Amed jî bi awayeke bê çare û xemgîn li tirêjediya herdu birayan temaşe dikir. Amed fikirî, hema di carekî de biryara xwe da. Neçar bû bide. Çi dibû bila bibe wê baxivîba.

Amed got:“Ez gelek kêfxweş bûm ji te re kêfxweşiyê dixwazim, kî ye ev bûka me ya bişans? Gelo ez wê nas dikim

Gardiyan, destpêkê bi hemû hêza xwe pê li lingê Amed kir. Wateya vê: Tu li hember emrê ku hatî dayîn derdikevî, pîvanê derbas dikî bû. Lê êdî Amed dizanî ku wê bi misogerî lêdan bixwe, axiftinên xwe domand:

“ Rizgar got:

“ Raste bira, tu nas dikî keça xaltîka me ye.

Kêfa Amed gelek ji vê agahiyê re hatibû. Li hevjîna xwe vegera û got:

“Zozan, li şûna min Kezbanê pîroz bike û kêfxweşiyê jê re bixwaze.

Gardiyan, bi awayeke vekirî mûdaxele kir. Bi milê Amed girt ji kabînê derxist. Rizgar û Zozan jî gotinên xwe domandin û gotin:

“Me ji te re bist cot gore, bist mendîl, bist xewliyên desta aniye, em ê teslîm bikin. Tu yê bidî hevalên xwe.”

Dema ku Amed ev bihist fam kir ku cezayê wî çendî mezin e.

Di hûndirê xwe de ev car ji bo tiştan îfadeya xwe ameder dikir.

Amed raste rast birin îdarê. Çawûş bi çengên wî girt bi erdê re xişikan û bir beşa îdarê ya du astegmen lê dima. “Qomîtanê min ev zilam li cihê hevdîtinê talîmatên ku jê re hatibû dayîn yek jî bi cî neanî. Ya din jî ji hêla rêxistinê ve 20 cot gore, 20 mendîl û 20 mendîlên desta anîne.” Asteymen, hema telofonî derve kir. Bêyî ku axiftina xwe bidawî bike ahîze danî ser masê û got: “Ka were vir. Bi awayeke hişk got navê te çî ye?

“Amed got... Amed qomîtan!”

Asteymen careke din ahize rakir û got: “Yên hatibûn hevdîtina Amed bigirin.”

“Yên ku hatibûn zîyareta te kî bûn?”

Amed got:

“Hevjîna min û birayê min in.”

Asteymen:

“Em ê niha fam bikin.”

Asteymen, li çawûş vegera û got; “Vî bibin ciyekî. Dema min got bînin hûn ê bînin.” Amed birin qawûşeke vala ya li hember qawûşa kêşan û derî li ser qufil kirin. Nêzî seatekî Amed li wir dan sekinandin. Ji hêla heman çawûşî ve hat girtin û bir cihê îdarê. Asteymen rûniştibûn.

“Ez cara dawî dipirsim: Yên ku hatibûn çiyê te bûn?”

Amed got: “Yên ku hatibûn ziyaretê li ser wan nasnameyên wan hebûn. Ger ku hûn bawer nekin nasnameyên wan qontrol bikin. Ma êdî ji vê zêdetir ez ê çawa bi we bidim bawerkirin.”

Asteymen:

“Baş e madem tu rast dibêjî navê hevjîna te çibû?”

Amed, bi awayeke ji xwe bawer got, “ Zozane qomîtan.”

Asteymen got:

“İbne foyana te derket holê. Gûlizar, te qet ev nave bihîstiye?”

“Raste qomîtan.”

“Bêje. Kî ye ev?”

“Xwişka min e qomîtan.”

“Baş e te heya niha digot hevjîna min e. Niha jî bû xwişka te?”

“Ger hûn destur bidin ez îzah bikim qomîtan.”

“ Tu yî çî îzah bikî? Her tişt di holê de ye. Lê dîsanî bêje.

Derew nîne.”

“Qomîtan em bi nîkaha mele mahrkirîne.”

“Kurê min, ji vê re nîkaha mele nayê gotin. Ev nîkaha şoreşê ye.”

“ Na qomîtan, ev 8 sale em zewicî ne.”

Asteymen, ji serî heya binî li Amed temaşe kir:

“Kuro, me got direw nîne. Ger tu bi vê temen û serî re direw bikî, dibe tu beriya 18 salan jî zewicî bî. Ulan nûtik, tu kê dixapînî?

Yan jî tu hîn dema zarok bûyî zewîcî?”

Amed, bi awayeke bê çare serê xwe hejand got:

“Bixwedê ez rast dibêjim.”

Asteymen ev car rabû ser xwe bi yaxa Amed girt:

“Ulan tu bawer dikî ku tu yê min bi van derewên xwe bidî bawerkirin?”

Amed piştî ku çend caran Amed li dîwar xist û şûnde ji çawûş re got, “vî bidin axiftin.”

Got: Wê her tiştî bêje!” Amed birin korîdorê, 4-5 gardiyan û çawûş gotin, “em destpêkê hinek lêdan lê bikin.”

Di demeke kin de hemû metotên îşkenceyê li ser Amed ceribandin, lê Amed heman tiştan dûbare dikir.

Dîsa anîn beşa îdarê. Amed, Yûzbaşı Esat û asteymenên ku lêpirsîn dimeşandin amadebûn.

Yûzbaşî got: “Demekî tu rastiyê ji me re nabêjî?”

Amed: “Bixwedê qomîtan ez rastiyê dibêjim.”

Yûzbaşı got:

“Çawûş kurê min ka derî veke.”

Li ber derî birayê Amed Rizgar û hevjîna wî Zonan birin hûndir. Her çendî bi qasî Amed lêdan nexwaribe jî lê diyar bû hinek lêdan xwariye. Di rewşa Zozan de diyarbû ku ji wan ditirse. Bi awayeke xwemgîn li ber dîwar sekinî bû, him li Amed û him jî li yên ku lêpirsînê didomînin temaşe dikir. Ji ber lêdana zêde Amed

nedikarî xwe li ser lingan bigire. Lê tevî van hemûyan bi awayeke devliken li bira û hevjîna xwe temaş kir.

Yûzbaşı, li Rizgar fitilî got:

“Te ewqas tişt ji kî derê aniye? Û çima bi qasî pêwîstiyên birayê xwe neaniye? Bi ti awayî direwan li min neke.”

Rizgar got:

“Beriya hefteyekç ez zewicî bûm. Min got ez van tiştan ji birayê xwe re bibim bila li hevalên xwe belav bike.”

Yûzbaşi got:

“Ger tu wisa zengîn û xêrxwazî, para xwe nede van terorîstan bide kesên feqîr û belangaz.”

Amed, neçar ma ku ji bo bersiva Rizgar baxive:

“Qomîtan, ger hûn destur bidin, ez ê îzah bikim ka çima birayê min evqas tişt aniye.”

Yûzbaşi:

“Ka bêje.”

“Li gel me yên nû dizewicin diyariyan belav dikin. Ev di nava me de çandeke. Wiha ji bo birayê min jî nû zewiciye van diyariyan bilav nekir, anî ji bo ez li van kesên feqîr û yên pêwîstiya wan pê heyî belav bikim.”

Di wê navberê de çawûşeke ku di destê wî de kaxezek hebû ket hûndir. Ji yûzbaşi re got:

“Agahiyên ku we xwestibûn hat qomîtan.”

Kaxezê da destê yûzbaşî. Piştî ku yûzbaşî li kaxeza hatî temaşe kir û şûnde li Amed zivirî:

Pirsî got: “Gûlizar çiya te bû?”

“Xwişka min e qomîtan.”

“Hevjîna wî nîşan da û got, baş e ev Gûlizar e?”

“Na qomîtan.”

“Baş e ev kî ye yan jî çi te ye?”

“ Hevjîna min e.”

“Navê wê çi ye?”

“Navê wê Zozan e.”

“Tiştên te gotî piraniya wan rast qebûl bikin jî bi nasnameya yekî din hatin ziyaretê suç e. Ger hûn heya niha zewîcîne, we çima heya niha muameleya zewacê nekiriye? Yan jî çima cuzdana we ya zewacê nîne? Hûn ê vê çawa îzah bikin?”

Asteymen ket navberê got:

“Qomîtan vê mijarê ji jinê bipirsin.”

Zozan, li ber dîwar sekinîbû temaşe dikir. Yûzbaşi îşaret li Zozan kir ku biçe gel masa. Pirsê ji Zozan kirin.

Zozan got:

“Em bi nîkaha îmam mahrkirîne.”

Yûzbaşi:

“Ev çend sala hûn zewîcî ne?”

“8 sal.”

“Baş e tu çima bi cuzdana xwe nayê ziyaretê?”

Zozan got: “Ji ber zewaca me ne fermiye ez bi cuzdana dişaya xwe hatim.”

Yûzbaşi, rabû ser xwe piştî ku yek du caran çû û hat got:

“Ev car ez we afû dikim. Lê caraeke din bi cuzdana yeke din newin ziyaretê û tiştek wisa neciribînin jî! Piştre li çawûş zivirî û got: “Kurê min, van bibe derve, bila biçin. Asker tu jî wan gore, medil û xewliyan bîne vir.”

Asker, emrê ku jê re hatibû dayîn hema anî cî. Yûzbaşî, asteymen û gardiyanên li wir bûn her yek ji bo xwe gore, mendîl girtin yên mayîn jî dan Amed.

Asteymen got:

“Min ji ev çanda we gelek hes kir û got, çawûş wî bibe qawûşa wî.”

Heya ku Amed hat qawûşê, tenê 10 cot gore, 6 mendîl û 7 xewlî mabû.

Hevalên Amed yên di qawûşê de ev çîroka rêxistina veşartî ya malbata Amed bi mehan nîqaş kirin. Yê herî zêde jî Keşe, belaya xwe li Amed dixist.

Dipirsî û digot: “Sekreterê we yê hûcreyê kî bû?”

Tiştên ku mabûn, yanê yên ji ber talanê mabûn, di qawûşê de li ser yên ku pêwîstiya xwe hebûn belav kirin.

Îsmet belaya xwe li Amed da û got: “Ew lêdana te xwarî hêjayî van tiştane ye. Di vê ziyaretê de jî bêje bila bavê te jî bizawice.”

Ev, tenê ji hezar bûyerên ecêp yên bivî rengî bû. Ev bûyer û bûyerên bi vî rengî di serî hemû girtiyan re derbas dibû. Yê hinan biêş yê hinan jî komîk bû. 99 livên tezbiyê qawûşa 33’an her roja ku derbas dibû livek din lê zêde dibû.

Yên nû dihatin qawûşê dema ku xwe di nava navendeke dostanî û têkiliyên dostanî yên germ de dîtin, ecêp diman. Di ciheke wisa de û afirandina navendeke wisa hêzeke pir cuda dixwest. Lewra kêfa wan ji vê navendê re dihat û kêfxweş dibûn.

Li hemberî nêzîkatiyên van mirovan yên baş, yên ku herî xirap difikirin jî xirabî ji dilê wan derdiket dilê wan tijî heskirin dibû.

Yên ku ji tirsan soz dabûn ku xirabiyê bikin, di nava dudiliyê de diçû û dihatin.

Sedema vê dudiliyê, tevî ku beriya niha soz dabûn îdarê ku xirabiyê bikin, piştî hatin qawûşê û şûnde tişta dîtin nêzîkatiyên însanî yên germ bû. Mirovek hema wisa bi rehetî nikare pişta xwe bide nirxên mirovbûnê. Lewra ev bûyereke wisa ji rêzê nîne.

Necmî pirsî û got:

“Te çi kir Eşref? Hindik jî be tu karî fêrî hinek tiştan bibî?”

“Zêde tiştek nabêje. Lê diyare hinek tiştan jî dizane. Hêjmareke zêde yên hatin xwe dane girtin. Ji ber helwestê wî yê li gel polîsan kesê ku dê herî zû bikeve ye. Bi yên din re jî axivim. Yê hûrik û Elî dema li 37’an bûn, li heman hûcreyê diman. Ev li gorî yên din di rewşeke gelek baştir de bûn. Ji çawûş bigire heya yûzbaşî dihatin bi van re hevdîtin dikirin. Dema ku nêzîkatiyên wî yên balkêş ku di qawûşê de bala mirov dikişîne bênî ber çavên xwe, zelal dibe ku van soz dane îdarê.

“Ka bise em bangî Mahmûd  jî bikin. Ez bawer im tu mafdar î.”

Bangî Mahmûd  jî kirin.

Pirsî û got:“ Tu bi Elî re axivî?”.

“Ez bi Elî re axivim. Hata min got were em di nava koma me de xwarin bixwin.” Zilam mîna cinan e. Hûn dizanin ji min re çi got? Pirsî û got; ‘ma yê we komîn e? Heke komîn be ez nayêm.’ Min jî jê re got, tenê yên ku hevdu nas dikin li gel hev dimînin û bi hev re xwarin dixwin. Lê zêde ji vê bawer nekir.”

Merwan got:

“ Ez dikarim rûnim hevalno?”

“ Tabî were rûne. Me jî qala yên dawî hatine dikir.”

Merwan:

“Ger bi ya min be Elî û Boyaciye moyaciye çi ye, yanê ew hûrik piştê ku baş lêhat xistin û şûnde divê derxînin ber derî. Ji ber ez bawerim herdu jî ispiyoncitiyê dikin. Şeva din, ez û Alık heya derengî şevê şiyar bûn. Ev herdu jî me dişopandin. A rastî ez ê wê kêliyê rabûma minê lê daba, lê Alık nehêla.”

Necmî:

“Tu mafdarî lê ka em mêzekin birayê Ferhat wê ji vê re çi bêje? Ger em bi serê xwe karek bikin, bi misogerî wê me aforoz bike.”

Mahmûd :

“Çima em naçin naxivîn? Ka ew ji vî tiştî re çi dibêje biçin fam bikin.”

Merwan got:

“Hûn herdu biçin. Ez û Necmî em ê li vir li benda we bimînin.”

Mahmûd û Eşref çûn cihê ku Ferhat lê dima. Mahmûd , ji Ferhat pirsî û got, “xêre te dest bi dirûnê kiriye?”

Ferhat got:

“Çima nebe Mahmûd , ez gelek ji vî gumelgê xwe hes dikim.

Dûh di dadgehê de dema gardiyanek kişand, yaxa wî parçe parçe kir. Hinek jî dilê Amed li ser vî gumlegî hebû. Ji min xwest min nedayê.

Li ser lingan nemînin kerem kin rûnin.”

Mahmûd û Eşref rûniştin ser ranzê.

Mahmûd got:

“Birayê Ferhat, me dixwest mijareke bi te re nîqaş bikin.”

“Tişta ku hûn dixwazin bêjin çiye, kerem bikin?”

“Mijar ev e bira, gumanên me li ser Elî û Boyacî heye.”

“Sedemeke diyar ya ev gumanên we heye?”

Eşref got:

“Rast e bira heye. Guya yek ji wan li leşkeriyê qomando bûye ji ber vê jî gardiyan serî kêliyekî di bin navê perwerdê de dibin derve. Yê din jî bi bahaneya ku potîna gardiyanan boye dike rojê çend caran diçe derve. Ma ev sedem hemû bes nîne?”

Ferhat got:

“Baş e, we qet bi wan re nîqaş kir? We ji wan pirsî ku hûn çima ev qas diçin derve û çima evqas bangî we dikin?”

Lêkolîna ku Eşref li ser wan kirî bi awayeke dirêj anî ziman.

Ferhat got:

“Wê demê hûn çi difikirin?”

Mahmûd :

“Beriya çend deqîqeyan dema me di nava xwe de nîqaş dikir, Merwan pêşniyarek kir ku “em hinek lêdan li herduyan bikin.” Me jî bi we re nîqaşkirin guncavtir dît.”

Ferhat got:

“Li gor nêrîna we lêdan çareserî ye?”

Eşref:

“Çima nebe? Him jî wê ev lêdan ji bo qawûşê jî bibe dersek.

Ferhat ji vê bersivê tore bû û got:

“Na birayê min, di van mercan de lêdan careserî nîne. Ji ber gumanên xwe hûn mafdar in. Ez bi herduyan re jî axivîme. Dema ku ev di qawûşa 37’an de bûn, ji hêla îdarê ve hatibûn qezenckirin û li ser vê esasê şandin qawûşa me. Lê ji dema ku hatine vir heya niha nêzîkatiya ku me li hember wan daye raberkirin wê ev tertîba îdarê ya xayîn vale derbixîne.

Her çendî ser hev diçin derve jî ez di wê baweriyê de me ku ti agahî nedane îdarê. Heta li hember rewşa ku ketinê xwe çewisandî (ezik)dibînin. Di nava pêvajoyê de dibe ku em van dahîlê komînê bikin. Ji ber mayîna van ya tenê bi xwe re xeteriya ku cardin bikevin

hemêza dijmin heye. Pêşniyara min ji we re li hember wan hinekdin temkînlî û însanî nêzî wan bibine."

Eşref got bira: "Hûn gelek xweşbîn û însanperwer difikirin. Careke van soz daye ku agahî bidin îdarê. Yanê van derlinga xwe xistiye nava destê wan, xilasbûna wan hinek zehmet e. Ez weke kes bi ti awayî ne aligirê ku van herdu kesan bixin nav jiyana komîn momînê."

Ferhat got:

"Min negot hema em bigirin komînê. Min got di nava pêvajoyê de dibe. Ger ku bi rastî em naxwazin wan bixin hemêza îdarê, her çendî hinek tiştên wan ji me re ters bêjî, em neçarin hinek tawîzan bidin. Di vê em hinek kesan, bi taybet yên lewaz biparêzin. Ji Merwan re bêjin, pêwîst e bi ti awayî lêdan li wan neyê kirin. Di heman demê de ev ji bo me hemûyan jî derbasdar e."

Piştî ku Ferhat vê mijarê girt û şûnde beriya hevalên wî rabin ket mijareke din.

"Karên me yên din çawa dimeşin?"

Mahmûd :

"Kîjan kar bira?"

“Ma wê kîjan kar bibe, ew karê me yê perwerdê, kêmbûnên di komînê de, jiyana nava qawûşê, ev hemû çawa dimeşin?”

Necmî û Merwan ku li benda hevalên xwe diman nikarîn xwe bigirin ew jî hatibûn cihê ku heval lê nîqaş dikirin. Dema ku Ferhat dît Necmî û Merwan jî hatin, dilê wî xwest belaya xwe li wan bide.

“Ka werin. Wiha dibêjin hûn ê li zilaman bidin?” Necmî û Merwan, him devlikenbûn, him jî bersiva Ferhat dan:

“Çima nebe? Yanê ma vê heq nekirine? Tabî em ê li wan bêxin.”

Ferhat got:

“Ka tu Merwan ma ez te nizanim? Tu nikarî li kesî bêxî.

Ger Mahmûd  be tiştek nabêjim dibe.”

Eşref got:

“Ger lingê Mahmûd  ne seqet bûya, dibe ku bûba.”

Mahmûd :

“Ma însafa te heye? Ez her roj Keşe dixim bin ranzeyê.”

Keşe jî mîna dîkê şerker li hawirdor digeriya. Dema ku Keşe dizanî hevalên wî mijareke cidî nîqaş dikin

nediçû gel wan. Lê dilê wî gelek dixwest biçe gel wan û li kêleka wan rûne nîqaş bike.

Eşref got:

“Hêdî baxiva, dengê te diçe Keşe.”

Mahmûd :

“Ka li kî derê ye?”

Ferhat got:

“Ew dengê gavadin yê we bû?”

Mahmûd :

“Raste bira yê me bû. Ez û Amed ser ketin.”

Ferhat:

“A... were, ka were.”

Ferhat, ti caran bi navê Keşe bangî wî nedikir. Her tim bi navê wî yê resen bangî wî dikir. Keşe jî ti caran aciz nedibû ku çima ev navê duwemin lê hatiye kirin. Ev sifata navê duwem di hûndir de bidest xistibû. Hevalê wî Cemal Kılıç ku gelek jê hez dikir di girtîgehê de ev nav lê kiribû. Rojek Cemal Kılıç, bi yêkî re di qawûşê de dikeve îdayê. Ji bo çareser bike jî serî li şahidiya A… dide. Dema ku Cemal îdayê winda dike, lewra şahidiya A… qebûl nake. Sedema wî jî got, “ev zilam Keşe ye.” Tiştên ku wî gotî qebûl nakim.”

Wiha piştî wê rojê û şûnde navê A… bû Keşe. Keşe, di kurdî de tê wateya 'papaz.' Ji hemû rahîbên Hiristiyanan re Keşe tê gotin. Keşe bi ken nêzî wan bû û got:

"Ha bila Mahmûd we nexapîne?"

Ferhat jî bi ken got:

"Ka we re, Mahmûd dibêje min bixwe biskûvitan qezenc kiriye.

Dibe ku ew me bixapîne, ka tu jî meseleyê bêje."

Keşe got:

"Mahmûd bi xwe moral dide xwe. Hûn dev ji wî berdin. Ez ê rastiya wî derxînim."

Eşref got:

"Keşe ez şahidim. Nabe ku tu herî bavê jî. Jixwe peymana we jî wisa bû.

Kî kê bêxistiba bin ranzê piskûvît dibûn yê wî."

Keşe got:

"Bi quran Mahmûd nikare min bêxe bin ranza loo. Kanî şeva din asteymenê kinik got bikevin bin ranza, bi rastî min nizanî ka min çi kir. Bi ewqas lêdan nikarin min bêxistan bin ranzê, wê Mahmûd çawa min bêxe bin ranzê."

Mahmûd got:

"Yanê tu niha înkar dikî?"

"Na, tişteke ku ez înkar dikim nîne! Ez rastiyan dibêjim."

Necmî got:

"Mahmûd ev car wî bixe bin ranzê û girê bide. Piştre bangî hemû qawûşê bike. Wê demê dê nikaribe înkar bike."

Keşe, destê xwe da çena Necmî got:

"Dema ew rewş hat jiyîn wê diyar bibe birazî. Ka li kî derê ye, sekreterê rêxistina malbatê?"

Ferhat got:

"Ew kî ye?"

Keşe:

"Ya ma tu hîn nizanî? Amed e."

Ferhat:

"Rastî ka ew li kî derê ye? Ka bangî wî jî bikin bila bê."

Di wê kêliyê de gardiyan mazgalê vekir û got: " Ka bila du kes bê kuro." Vê çayê bigirin!"

Eşref got:

"Bira ez ê çayê belav bikim û werim."

“Bi gotina çayê bibe hûndir”di carekê de hemû qawûş zindî bû. Her kes dest bi amadekariya çay vexwarinê kir. Di van mercan de zewqê tişt xwarina girtiyan gelek kêm bû ango kêm dihat dîtin. Ger ku di girtîgehê de çay, cixare, henek û tiştên mîna şahiyê nebûna, jiyana di girtîgehê de bi mirinê re yek bû. Lê bi taybet dema çay dihat, kêfxweşiyek zêde li qawûşê belav dibû. Her çi jî be çay di mirov de zindîbûnek dida avakirin. Ji ber nîqaş germ dibûn û cixare dihatin vexwarin. Ya bîranîneke xweş dihat gotin yan jî nêzîkatiya hevaleke ku xweşî hemû hevalan diçû dihat gotin. Piştî belavkirina çayê Eşref û Amed hatin quncika nîqaşê ya qet nayê guhertin ya ku Ferhat lê bû. Her kes li dora cihê wî rûniştîbûn.

Ferhat pirsî û got:

“Ez cixare bidim we?”

Merwan jî got:

“Te cixareyên me jî xilas kir.”

Ferhat got:

“Ez baş dizanim. Tu yan di dema satrançê de galip dibî yan jî dema di qawûşê de li gel kesê cixare nemîne belav dikî.”

Merwan got:

“Welle ev gelek rast e.”

Keşe, belaya xwe li Amed da û got:

“Goreyên me kevin bûn, ka bipirse ji malbata we keseke din bizewice nîne?”

Amed got:

“Kes nema.”

Keşe got:

“Ji xwe hebe jî ez ê êdî xwedî lê dernekevim.”

Ferhat got:

“Çawayî Amed, parsûyîn te çawa ye? Baş bûn?”

Amed got:

“ Baş e bira.”

Mahmûd :

“Yaho Amed, ev Keşe qebûl nake ku bin ketiye. Em çi bikin?”

Ferhat got:

“Ji niha û şûnde ji A… re bila kes nebê Keşe.”

Necmî got:

“Ew bi xwe ji vî navî hes dike.”

Eşref:

“Beriya niha min jê re got em navê te biguherin, bese ev du sale tu Keşe yî, ji niha û şûn ve em navê te bikin Patrîk lê qebûl nekir.”

Keşe got:

“Ez patrîk matrîk nizanim. Yê ku xwestibû Mehmet Ali Ağca bikûje Papa bû, navê wê çibû nizanim lê bawer im yê herî mezin ew bû. Ger wisa bêjî ez ê qebûl bikim.”

Mahmûd got:

“Keşe tu hîn negihiştî mertebeya Papatiyê.”

“Tu wisa bizane xwarzî. Ka were ez te bixim bin ranzê wê demê tu yê bibînî.”

Ferhat got:

“Êê heval, henek besin. Em hinek jî qala tiştên din bikin.”

Dema ku Ferhat wisa got, hemû hevalên wî bi cidiyeteke mezin ketin pozîsyona guhdarkirina wî.

Ferhat got:

“Necmî tu ev kesên nû hatine li cihên baş bi cî bike. Yek li qada binî nêzê A…, ji bo Boyacî jî cihek guncav bibîne û bicî bike.

Eşref, dema ku te jî çay belav kir, hinek zêde bide yên temem mezin û yên ji derveyî me.”

Eşref got:

“Ji xwe çaya zêde dimîne, didin yên dixwazin.”

Ferhat pirsî got:

“Kî li karê pîdê mêze dike?”

Mahmûd bersivan got:

“Heya niha alîkarê berpirsyar lê temaşe dikir. Di dema derbasbûyî de, nerazîbûnên gelek hevalan ji me re hat. Gotin ku wekhev belav nakin. Li ser vê Amed dest bi belavkirinê kir. Niha Amed dike.”

Ferhat, li Amed zivirî got:

“Di vê mijarê de nerazîbûnek heye?”

“Ne bira, ji xwe hatineke pîde jî nîne.”

“Ez bawer im di dema pêş de wê çay û pideyê herduyan jî qut bikin. Ji ber ku ev, bi polîtîkaya îdarê ya niha re nakok e. Ez bawer im xebatên me yên perwerdê baş dimeşin. Ger ku di vê mijarê de nêrîn û pêşniyarên we yên cuda hebe bêjin. ”

Eşref got:

“Gelo ger dîroka kurdan bê dayîn baş nabe?”

Ferhat: “Hevalno, ger dem hebe em ê ev mijar û mijarên mîna vê bigirin dest.

Lê ez bawerim niha tişta ji bo me ya giring tiştên rojane ne. Beriya her tiştî di vê em mercên ku tê de yî fam bikin."

Mahmûd got:

"Li gor nerîna min ger em dîroka Kurdan û felsefeyê bigirin dest wê hîn baştir bibe. Ji ber ji dema me perwerde dest pê kiriye heya niha em vê rewşa ku niha tê de ne nîqaş dikin."

Ferhat got:

"Armanca perwerdê ya herî bingehîn, fikrên me di nava dîwarên girtîgehê de hepis nebe, derbikeve derveyî dîwaran, bûyer û pêşkeftinên di welatê me de dibe di hûndirê xwe de hîskirin û li ser wan şiroveyên berbiçav kirine. Ji ber ger ku fikrê mirov di navendeke teng de bimîne, ew fikir pêş nakeve.

Dema em qawûşa xwe difikirin divê em van perspektîfan ji destê xwe neberdin. Yanê perspektîfên me derbasî derveyî qawûşê, girtîgehê, dîwerên girtîgehê û li ser vê divê her ku biçe dengê welatê me li herêm û cîhanê belav bibe. Divê ti caran fikrê me di nava dîwarên qawûşê de nemîne em ji vê re destûr nedin û têr nebin."

Ti êş domdar nîne. Ti zext bêdawî nîne. Berpirsyarên zextên zordestiyê jî dema vê zordariya xwe didin meşandin, li gorî polîtîka û felsefeyeke diyar didin meşandin. Îdareya girtîgehê, parçeyê girtî yê zordestiyê bû. Bêguman ew jî wê taybetmendiyên giştî bidana diyarkirin. Hûn ê carekê temaşe bikin ku zext û îşkenceyeke pir zêde bikar anîn.

Piştre wê dozaja zext û îşkenceyê hinek danîban. Gelek girtî ne xerîbê vê rewşê bûn. Ev girtî hemû di îşkenceyan re derbas bûbûn. Di îşkenceyê de rêbaza pir dihat zanîn ev bû: Her yêkî ku pirsyaran ji girtiyan dikirin, diketin rolên cuda. Ev yêk bêyî ku çavên xwe bigirin îşkenceyê di asta herî jor de bide meşandin, yê din jî wê bê ji yê îşkence kirî re xebera bide. Wê bibe firişteyê parazvanê girtî.

Bi vê erka xwe wê hewl bide agahiyan ji girtî bigire. Ji ber girtîgeh îşkencexaneyek bû, lewra her tim serî li vê rêbazê didan. Di destek de jop, di destê din de jî şekir, berdin pêwîstiyên jiyanê yên herî xwezayî yên mîna nan, av, hewa, razan û behnvedanê ti caran ti pêwîstiyeke girtiyan bicî nedianîn. Girtî her tim di nava birçîbûnekî de bûn. Îdarê vê bi awayeke zanebûn bikar tanî, birçûbûnê jî her tim li hember girtiyan weke qertekê dida şixulandin. Dîsa li hemberî pêkanîna van

şertan û bi dirayet nêz bûyîn îdare, cardin ji bo ev pêwîstiyên wan zindî bigirin diketin nav tevgerê. Mînak pêwîstiyên girtiyan yên herî xwezayî yên mîna nan, av, hewa, cixare, çay û hwd. gelek rojan ser hevdu bi cî dianîn. Piştî demek û şûnde van pêwîstiyan bi zanebûn kêm dikirin.

Armanca di vir de; her tim tengezarkirin û bi ti awayî nesazîkirina jiyaneke xwezayî bû. Gardiyan bi awayeke lez deriyê hesin vekir û ked hûndir. Bi qomita berpirsyar "dîqat!" hemû girtî rabûn ser xwe û rawestiyan.

Gardiyan pirsî û got:

"Kuro berpirsyar, ew marşên ku min beriya niha dayî we, we wan marşan ji ber kirine?"

"Yek din jî min ji we re du pirtûkên nû anîne. Ji niha û şûn ve hûn ê van her du pirtûkan bixwînin wê yek ji we bixwîne yên din jî lê vegerînin!"

Berpirsyar got: "Tu emir dikî qomîtan!"

Gardiyan got:

"De ka, niha jî xwe ji bo çûyîna hewa standinê amede bikin." Girtî hema rabûn li ber derî amedebûn da ku biçin derve hinek hewa bigirin. Bi vebûna derî re kesê ku yekem derket, bi awayeke nîzamî selama pehnî da û

meşiya. Ji pêlekanan heya cihê hewagirtinê diviya bêyî ku li çep û rastê xwe temaşe bikin daketibana xwarê. Dema di nîzama perwerdê de li benda fermana gardiyan diman, gardiyan weke her carê got, “hazir be, amede be û baş bimeşe!”

Piştî yek du caran meşîn û şûnde, sirûda 52’yan ku gardiyan dabû qawûşê ku ji ber bikin yek yek bi girtiyan dan xwendin. Piştî sirûda yekem şûnde qawûşê da sekinandin dujûnên herî xirab ji wan re kir û got, “kuro ez dizanim vê sirûdê çawa bi we bidim gotin!” Piştî ku çend caran girtî bi erdê re xişikand û şûnde ji girtiyan re got, “rabin.” “Rabin kuro em ê perwerdeyê berdewam bikin!”

Beriya hefteyekê sirûda 52. ku dabû girtiyan ji wan re gotibû divê hûn ji ber bikin. Îro jî dixwest li cihê hewasitandinê di dema perwerdeyê de girtî wan sirûdan bixwînin. Lê ji ber ku jiberkirina 52’yan sirûdan hêsan nebû lewra kesî jiber nekiribû. Wiha ji ber vê gardiyan perwerdeyê ne eciband û qawûşê bi erdê re dixişikand. Bi ketina yûzbaşî ya cihê hewagirtinê re gardiyan qomîta “baldar bin!”da û li ser qomîta gardiyan hemû qawûş ketin rêzê.

Yûzbaşi got:

“Perwerdeyê bidomînin kurê min, bidomîne.”

Gardiyan got:

“Bi gavên baş bimeşin! Dest bi sirûda Çanakkale bikin!”

Beriya ku girtî dest bi sirûdê bikin, yûzbaşî qomit da û got; sirûdê qutkin! Derbasî sirûda Dîrokê Bizivirîne bikin!”

Ji ber ku girtiyan ev sirûd nedizanin lewra deng ji yekî jî derneket. Yûzbaşi got:

“Berpirsyar were vir:”

Berpirsyar:“Tu ferman dikî qomîtan!”

Yûzbaşi:

“Lawo ma ev sirûd ji we re nehatibûn dayîn?”

“Hat dayîn qomîtan.”

“Başe hûn çima nizanin?”

“Bi giştî 52 sirûd ji me re hat dayîn. Me jî bi rêzê dest bi jiberkirina wan kir.”

“Nabe wisa. Vê sirûdê hema jiber bikin!”

“Tu ferman dikî qomîtan!”

Yûzbaşi, du caran got, “gardiyan, gardiyan!”

Gardiyan:

“bi fermo qomîtan”

“Kurê min ka li rewşa vê qawûşê temaşeke. Ma tu xwarinê nadî wan?”

“Ez didim qomîtan!” Ev car jî li girtiyan zivirî û got:

“Berpirsyar, xwarina we baş tê ango didin we?”

“Tê qomîtan.”

“Çaya we jî tê? Cixare tê qantîna we?

“Ew jî tên qomîtan.”

“Hûn dixwazin topê bileyîzin?”

“Em dixwazin qomitan.”

“Ez ê hema ji we re topek bişînim, bileyîzin.”

Piştî ku yûzbaşî çû gardiyan qomît da û got:

“Dest bi Sirûda Dîrokê Bizivirîne! bikin da”

Dema ji kesî deng derneket, gardiyan emir da û got “bi erdê re bixişikin!”

Bi vebûna deriyê hewagirtinê re nêzî 20 gardiyan, çawûş û onbaşî di destê wan de jop û kalas ketin hûndir.

Girtiyên li erdê dirêjkirî yên bi erdê re dixişikandin mîna beranên qurbanê li erdê bûn. Mîna goşt ji termekî vekin girtî lîme lîme kirin. Hûndirê hewagirtinê ji meydaneke şer ne cuda bû. Ji şerên xwezayî tenê cudahiyek hebû: Hêrîşkar bi darbeyên kuştinê li wan

dixistin, lê yên beremberî wan ti mafeke wan yê ku xwe li hemberî wan darbeyan biparêzin nebû. Heya ku girtî hemû hatin rewşeke ji ser hişê xwe biçin li wan xistin. Darê lêdanê ji bîr kiribû ku qanuna sekinandinê jî heye.

Dema ku gardiyan westiyan wê demê jop û kalasên di destê xwe de berdan. Dema qomîta “rabe!”dan yên ku karibûn rabin ser xwe rabûn. Nêzî 20 girtî jî li erdê dirêjkirî ji ser hişê xwe çûbûn.

Çawûşê blokê qomit da û got:

“Bila deh kes bên vir. Bibezin ji hûndir pênç bidonên avê bînin!”

Ava ku girtiyan anî bi ser ew girtiyên li erdê dirêjkiribûn de kirin. Girtiyan hevalên xwe yên li erdê dirêjkirî birin hûndirê qawûşê. Beriya ku gardiyan derê qawûşê bigire got, li hûndir çiqas “cixare hene derxin derve. Îbneyan demekî hûn perwerdê nakin.” Çi cixare hebû berpirsyar hemû derxist derve. Dema ku berpirsyarê qawûşê cixareyan di derî re da destê gardiyan, gardiyan got; “temaşeke berpirsyar behnekdin ez ê bêm bigerim. Ger ku ez cixareyeke tenê jî bibînim ez ê s…m û te!” Berpirsyar bersiva cixare li hûndir nemaye da. Girtiyên ji ber lêdanê ser hişê xwe çûbûn li ser cihê wan dirêj kirin mesaj dikirin û birînên

wan derman dikirin. Piştî ev bûyera lêdanê û şûnde gardiyan cardin deriyê kuna mazgalê vekir û bangî berpirsyar kir:

“Berpirsyar!”

“Berpirsyar emirke qomîtan!”

“Hemû tiştên xwarinê yên li hûndir, lalîk-kefçî û bîdonên avê derxin derve. Hûn cezalîne, cezalî!”

Sibeha din, gardiyan qomita dest bi “xebata sirûdê bike da!” Hîn talîmata ku dayî neqedandî got, “vehesîn nîne, xwarin nîne, heya êvarê hûn ê sirûdê berdewam bikin!” Heya sê rojan ne xwarin, ne av û ne jî cixare nedan girtiyan. Serê sibê seat ji 6.00 heya 6.00’ êvarê sirûd bi girtiyan dan gotin...

Pişre girtiyan banyo kirin. Ji aliyekî ve kêfxweş dibûn ji aliyê din ve jî tiştên qantînê dikişandin. Qawûşa 33’an di jiyana xwe ya girtîgehê de ne lîsteyeke qantînê wisa nivîsandibûn ne jî dîtibûn. Tiştên ku di lîsteya wan de hemû hatibûn. Dema ku li ser komên komînê tişt dihatin belavkirin bi çawûşê blok re nêzî 15 gardiyan ketin hûndir.

Çawûş:

“Berpirsyar, boyaxên ku min xwestibûn hatin?”

“Na qomîtan.”

"Çima kuro?"

"Pereyê me nîne qomitan."

"İbne! madem pereyê we nîne we çima evqas tişt ji qantînê xwest? Ka temaşeke we hemû tiştên qantînê kişandiye vir!"

Berpirsyar, bi awayeke bêdeng serê xwe xist ber xwe. Gardiyan mîna gurên har ketin hûndirê qawûşê. Ji xwe re mere li girtiyan xistin. Çawûş çend qutiyên rûnê zeytûnê rijand erdê got ev 'pereyê boyaxê ye,'çend qewenozên rîçelê jî rijand got 'ev jî pereyê kartonê' ye.

Çawûş got:

"Berpirsyar, kuro pereyê hefteya bê ku hûn ji ziyaretvanan bigirin hûn ê hemû ji bo boyax û kartonê cuda bikin. Jixwe ma ev pere ji Rusya ji we re nayê? Hinek jî ji bo berjewendiyên gel bikar bînin. Bila girtî li xwaringehê amede bibin. Dê ka zû bikin, xwe nehejînin" Piştî ku girtî hemû li xwaringehê amede bûn û şûnde çawûş got: "Bila her kes li gorî koma xwe ya dadgehê cuda bibe."

Hemû koman yek yek pirsî. Di dawî de aciz bû got:

"Kuro ev çi kome kuro? Ma Riya Evînê nîne?" (Aşkın Yolu) Dema çawûş fam kir ku girtî tênagihin, bi awayeke hîn vekirîtir pirsî got:

"Ji Özgürlük Yolu kes nîne?"

Ji Özgürlük Yolu tenê kesek hebû. Beriya hefteyekî wî anîbûn qawûşê. Ew kes derket pêş got:

"Ez heme qomitan."

Çawûş:"Ohoo! Ka li akter temaşekin! Kuro tu çima li vir tenê mayî?"

"Ez nû hatim qomitan."

"Kuro sucê te çî ye?"

"Sûcê min nîne qomitan."

"Way way ka temaşekin sucê wî nîne, ma tu hatî vir seyranê?"

"Ez rast dibêjim qomitan. Ez bi xwe hatim teslîm bûm. Ez heya Almanya çûbûm. Dema ku min bihîst di derbarê min de biryara girtinê heye ez bi xwe hatim teslîm bûm. "

"Ka li akter (artist) temaşekin. Yêke ku sucê wî nebe ma wê biçe heta Almanya?"

"Qomitan ez rast dibêjim. Hûn ê jî bibînin di nava şeş mehan de ez ê bêm berdan."

"Baş e, ji niha û şûn ve tu berpirsyarê qawûşê yî!"

"Qomitan li min negirin, lê ez nikarim vê erkê bikim."

“S.... im dema min got tu yê bikî lewra tu yê bikî.

Mazereta nekirinê nîne!”

Özgürlükçü, ji zû ve di rewşeke zehmet de bû. Neçarbû ku biryara xwe di wê kêliyê de bide. Her tişt da ber çav û gotina xwe dûbare kir:

Got: “Ez nikarim qomitan.”.

“Tu çima nakî? Ma tu ji Apoyiyan ditirsî? Berpirsyar ka ji min re tayek bîne.”

Berpirsyar şelîta cilan a hûndir anî dirêjî çawûş kir. Çawûş, şelîtê li situyê Özgürlükçü werand û aliyekî wê girt got:

“Îsmet ka tu li kî derê yî Îsmet.”

Kolombo got:

“Ez li vir im qomitan.”

“Ka were vir!”

Seriyê din yê ta da destê Îsmet.

“Mêzeke ev zilam nayê quralan. Talîmatên ku ez didim pêk nayîne. Tu dizanî cezayê nehatina quralan îdam e. Îdam jî hema înfaz tîne. Niha ez û tu jî em ê îdama vî bikin înfaz, ta bikişîne.”

Tayê di destê Îsmet de ket erdê û got:

“Ez nikarim. Tu yê bi xwe bikî.”

Çawûş:

“Min beriya niha jî got, ez nakim nîne.”

Tevî ku İsmet zanî wê lêdanê bixwe jî got, “ez nikarim bikim.”

Hemû gardiyan û çawûşan temaşeyî vê dîmena heyî dikirin. Çawûş, ta ji erdê rakir got: “Serî ta bigire bikişîne Îsmet!” Îsmet hinek fikirî, cardin ta avêt erdê got:

“Xwendin û nivîsandina min nîne, ez nikarim.”

Li baremberî vê gotina Îsmet êdî girtiyên di qawûşê de nikarîn xwe bigirin hemûyan dest bi ken kirin. Dema ku çawûş fam kir Îsmet wê neke û bû pêkenokê qawûşê êdî ser qawûşê de çû.

Çawûş got: “Ji min re karavaneke vale bînin.”

Karavanaya ku anîn serê girtiyekî kir tê de û got bimeşe. Ji ber rîçel û rûnî zeytûnan rijandibûn erdê lewra erd şemitokî bû. Girtî diketin erdê, li dîwaran diketin û dişemitîn. Çawûş û gardiyan bi tîqe tîq bi vê rewşê dikeniyan. Piştî ku têra xwe şabûn û şûnde qomît da û got, “sengerê we dîwar e, bi lez bibezin!” Girtî bi bez çûn ber dîwarê qawûşê yê din sekinîn.

Çawûş got: “Du kesên ku dizanin dansê bikin bila bên pêş.”

Ji bo ku Alık fam nekir çû tekmîl da:

“Aaaaalık... Adıyaman, emirke qomîtan”

Çawûş got:

“Bila keseke din jî bê.”

Amed û Halo li dawî disekinin. Ji bo ku Halo xwe têkilî vî kare neke Amed bixwe bezî çû:

Çawûş got “Amed... Diyarbakır, Amed emirke qomîtan.”

Çawûş:

“Demekî di vê qawûşê de tenê yê dizanin dansê bikin hûn herdu tenê ne.

Çawûş got: Dest bi dansê bikin.”

Alık got:

“Ez nizanim qomitan.”

“Wê demê tu çima hatî îbne?”

“Min fam kir ku we tiştek xwest ez ji ber wê hatim.”

“Hêsane kuro, ka were bikeve çengê min ez ê nîşa te bikim.”

Dema ku çawûş xwest şovek bike, bi Alık re li erdê ketin.

Gardiyanên ku li wir bûn bi awayeke tîqe tîq dest bi ken kirin.

Çawûş got:

“Kuro ez jî dizanim ez ê vê dansê çawa bi we bidin kirin, dê destpê bikin.”

Alık û Amed gotin, “em nizanin dans bikin.”

Çawûş:

“Wê demê xwe bişemitînin. Heya dawiya dîwar biçin. Ji wir jî bi bez xwe bişemitînin.” Dema ku Amed, bi bez çû cihê ku jê re hatibû diyarkirin ket erdê.

Li ser vê çawûş keneke vîqe vîq kir:

“Dibe, dibe ger wisa biçe wê Nesrîn Topkapı li gel we kêm bimîne. Ger hûn derbikevin derve hûn ê birsî nemînin. Bila kom li xwaringehê amede bibin.

Got: Di nava we de DDKD’ yî hene ger hebin bila derkevin pêş.” Çar memosteyên ku nû hatibûn qawûşê derketin pêş û gotin; “emirkin qomîtan.”

Çawûş:

“Kuro hûn Şakir Tutal nas dikin?”

Yek ji DDKD’yiyan got:

“Ez nasdikim qomîtan.”

“Ma serokê we ew e?”

“Ew sekreterê DDKD’yê ye. Ez ne DDKD’yî me. Tenê bi wî îdayê hatime girtin.”

“S.... ew serokê we ye kuro, tu çima qebûl nakî. Li vir ji derveyî Apoyiyan kes sucê xwe ango tiştê kirî qebûl nake.

Heta serokên we jî di dadgehan de dibêjin me tiştek nekiriye.

Gelek ji Apoyiyan di dadgehê de dibêjin, “em ê Kurdistanê ava bikin!” Kolombo Îsmet bi baldarî guhdarî nîqaşa di navbera çawûş û yê DDKD’yî de derbas dibû dikir, carek awirên xwe veguherand ser yê DDKD’yî, piştre li çawûş mêze kir û serî xwe xist ber xwe û fikirî.

Girtîgeha Îstihkam hat birê. Hema di carekê de Şakir Tutal hat ber çavên wî. Di Girtîgeha Îstihkam de Şakir Tutal nameya ku ji destgirtiya xwe re şandibû ji îdarê re, îdarê di nava xwe de xwendibûn û di nava leşkeran de kiribûn mijara pêkenokê. Ew tiştên di wan rojan de dihat gotin Kolombo İsmet di hafizeya xwe de zindî kir. Gotibû:

“Fikirandina min tenê tu yî, ji derveyî te êdî nikarim tiştekedin bifikirim. Gumana min tenê tenduristiya te ye. Cixareyên samsun nevaxwe, ji niha û şûn ve Malbora vexwe. Wê ji bo tenduristiya te baştir bin.” Mîna wê rojê, îro jî li ser rûyê wî keneke şîrîn diyar bû. Bi ken berê xwe da aliyê din.

Bi dengê gardiyanê derve ku got; “hêjmar” gardiyan û çawûşên di hûndir de derketin û çûn. Hûndirê qawûşê ku ji navendeke şer xiraptir bibû, girtî dest bi paqişkirina wê kirin. Di şûneke ku av nedidîtin de, bi bardaxeke av tiraş dibûn, mîna ku ji canên xwe parçeyeke qut bikin ava heyî ji bo qawûşê bikar anîn. Di demeke kin de qawûşê anîn rewşa ku êdî lê rûnin. Yê berpirsyarê komînê, tiştên ku mabû li hevalên xwe belav kir. Keşe, belaya xwe li Alık da û got:

“Amed bûya tişt nedibû, lê di Kahtaya Adiyamanê de cewherên wisa derketin ji bo me şaneziyeke mezin e. Min dizanî ku li Kahtayê tenê bacan û tûtin meşûr e. Meger gelek marîfetên Kahtayê yên din jî hene.”

Alık got: “A rastî wê te bibiribana, wê demê te yê bidîtiba, min ê çawa bi te bidabûya lîstin?”

Keşe got:

“Na bira na, ciheke ku tu û Amed lêbin ma wê dor bihatiba me?”

Mao dibêje: “Gel deryayek e, şoreşger jî di nava vê deryayê de masiyek e.” Tevgera şoreşger jî di kurahiya binê erdê de kaniyeke dipejiqe ye. Her çendî ev kaniya bihêz û xurt bixwazin biçikînin jî bila biçikînin, wê dîsa av hêzeke muazzam kom bike derkeve ser rûyê erdê.

Şoreşger bi zayînbariyeke (doğurganlık) mezin re zêde dibûn. Bi girtin, kuştin û xistina hundir re tine û xilas nedibûn. Wiha komek din girtiyên din anîbûn qawûşa 33'an. Êdî ev ji zû ve ji tesbihê 99 yê di destê sofî de derbas kiribû. Qawûşa 33'an dêwek zindî bû. Bi bawerî, îrade xwe xemilandibûn, bingehê xwe li ser esasê dostaniyê û hevîrê xwe jî bi hezkirinê strabûn.

Hêjmara wan ya heyî 130' derbas kiribû gihiştibû hêjmareke 140' lî. Mîna bîreke bê binî bû. Qawûşa 33'an rûyê xwe li kesî nedizivirand. Ji kesê re nedigot "cih nîne."

Di tarîtiya hatî mayekirin de çar canên xweşik dilên xwe heya dawî vekiribûn. Tişta ku îdarê dayî raberkirin û gelek ji kesên ku îdarê gotibû "zilamên minin" bi agirê dostaniyeke bi vî rengî ve şewitîbûn.

Ev her çar reh bibûn hostayê hemû şêwayên zehîrê veguherînin panzehîrê. Dîsa di nava koma hatî de yê ku bêsûdiya herî mezin jiyan kir û neçar bû ji bo hemû îşkence û zehmetiya amede be û bi ti awayî poşmaniya vê jiyan nekir keseke bi navê Kamîl Ocalan bû. Paşnavê Ocelan deriyeke îşkenceyê li pêşiya wî vekiribû, lê gazindeke wî ji vê nebû. Ji derveyî yên li ser navê PKK'ê hatibûn çar mamoste û yek jî sendikacî hebû. Mamoste ser navê DDKD'ê hatibûn, yên sendîkacî jî ser nav Rêya

Azadiyê (ozgurluk yolu). hatibûn. Hêjmara yên ku nû hatibûn nêzî pazde kesî bûn. Gardiyan, ji nava girtiyên ku nû anîbûn Ocelan dan nîşan û got; “ev cezaliye wê kes pê re neaxive û nan jê re neyê dayîn. Fam bû?” Berpirsyar bersiv da û got: “Tu emir dikî qomîtan!” Piştî ku derî hat girtin hemû çav vegeriyan ser Kamil yê ku ji lêdanê êdî nedikarî li ser lingên xwe bisekine. Yek ji girtiyên berê yên di hûndurê qawûşê de ber bi Kamil ve baz da. Pirsî û got:

“Xalo ma te jî anîn?”

Xalê xwe hemêz kir. Xal û birazî bêyî ku baxivin demek wisa hevdu hemêz kirin. Ji ber ku xem û keser dema ku hevdu hemêz dikirin û destê xwe didan hev dihat derbaskirin ango kêm dibû. Ne xal û birazî ne jî girtiyên din guhdarî qedexebûnê nekirin. Her kesî bi dil can xal silav kirin.

Necmî got:

“Hevalno, em hinek hevalên xwe yên nû hatine rihet bihêlin. Yên ku pêwîstiya wan hebe bila pêwîstiyên xwe bi cî bînin. Ji yên birçî re jî xwarin amede bikin. Wexta me hîn pir e, em ê zêde zêde sohbet bikin.”

Li ser vê gotinê yên ku nû hatibûn, li qawûşê bi cî kirin. Despêkê cilên li ser wan yên qirêj derxistin. Ji gel yên komînê pêwîstiyên her kesî yên cilan pêk anîn.

Kamil got:

“Cilên li ser min hemû tijî sipî ne. Wan bidin aliyeke ku nekevin we. Ev nêzî sê mehan e me rûyê avê nedîtiye.”

Eşref got:

“Cudahiyeke me ji we nîne. Ger bêjî sipî di me de jî heye. Av jî, ji bo vexwarinê zehmet dibînin.”

Kamil:

“Dostên min, ev qet negirîng in. Ez bi dîtina we kêfxweş bûm. Ev jî besî min e.” Hêjmareke zêde ya qawûşê Kamil nasdikirin. Yên ku nasnedikirin jî wî ji giyaba wî nasdikirin. Kamil, zilamekî temenê xwe navîn, durist û hestên xwe yên welatparêziyê xurt bûn. Biryardariya wî ya li hemberî dijmin ku di kesayeta wî de derdiket holê di nava qawûşê de wî hîn rêzdar dida nîşan. Ji roja ku hatî girtin heya kêliya ku anîn qawûşê hemû ji girtiyan re got.

Li hember hemû zext û îşkenceyan kesayeta xwe ya bi onur parastibû. Kamil di îşkenceyê de tiştên ku lê hatine kirin “xwezayî” didît. Ji ber digot; “çawa be navê

wî li ser re, îşkencexane û lêpirsîn, lê li hemberî min tiştên ku di qawûşa 37'an de kirin, qat be qat zêdetirbûn. Ez gelek ji vê ecêp mam. Tiştên ku we kişandine min niha nû fam kir. Gelek caran min digot xwezka min carekedin bibiriban cihê lêpirsînê, yanê bêxin bin çavan. Ji ber wir li gorî vir bûheştek e. Lewra rojê çend car dora te tê, tu diçî îşkenceya xwe dibînî. Dema te ya mayî jî bi îstirehetê re derbas dikî.

Lê ma vir wisa ye? Her kêliyeke yê rojê, îşkenceya herî giran e. Li vir jiyan bi xwe veguherandine îşkenceyê. Bawer bikin dema ku min van jiyan dikir, bi çavên tijî rondik min hûn bi bîr tanî. Û li hemberî we di dilê min de rêzdariyeke mezin ava bû."

Mahmûd got:

"Bira dema tu hatî gardiyan got, bi taybet ev zilam cezaliye wateya vê çî ye. Ev bingeha xwe ji çi digire?"

Kamil:

"Hevalno, tişteke min ku ji we veşêrim nîne. Li wir heman tiştên ku min ji wan re gotî, pêwîst e hûn jî bizanibin." Hinek bi ken û piştî axîneke kur kişand û şûnde axiftinên xwe domand."

Piştî vî emre û şûnde ji min xwestin ku ez îspiyoncîtî bikim. Herî zêde jî ez ji vê aciz bûm. Min ji lawirên wan

yên mezin re got ku, ji bo kesayet û şerefa xwe ez tişteke wisa misoger nakim. Ne bi min re, biçin bi kesên lewaz re mijûl bibin. Vê sibê beriya ku me li ser qawûşan bilav bikin, yûzbaşî hat carekedin bi min re axivî. Min jî tiştên ku beriya vê gotibû bi awayeke vekirî jê re dûbare kir. Wiha sedema ceza dayîna min ev e."

Necmî mamosteyên DDKD'yî nasdikir, yê ku ji Özgürlük Yolu jî ji bo ji Amedê bû Amed nasdikir. Bi wan re eleqedar bûn û li cihên guncav bi cî kirin. Bi vî rengî, yên ku nû hatine jî di qawûşa 33'an de bi cî bûn û cihê xwe di nava vê kerwanê de girtin. Her çendî her çar hêlên wan hatibin dorpêçkirin, hemû rojên wan bi îşkenceyê derbas bibin jî, di wan de tişteke nedihat hilweşandin hebû. Ev gotina serokê şoreşekî wê rojê baş vedigot wiha digot: "Dibe ku dijmin hemû aliyên me bi dest xistibe. Ger ku hemû aliyên jiyanê aravtaraf (didik didik)bike û hawirdora me dorpêç bikin jî, divê dil veguherin qadên rizgarkirî."

Divê dil ji yekê deh, ji dehan sed wêrektiyan pompe bike.

Ji vir ketina rê divê dest bi kar bê kirin."

Li qawûşa 33'an gelek dilên hatibûn xilaskirin û ji tirsê rizgar bibûn hebûn. Her yek ji wan, dema dijmin

ya xwe ferz dikir, kêliya dema wê dihat dilên ku ji bo teqandinê amede li gel hev dibûn, wiha qawûşa 33'an jî vediguherî qadeke rizgarkirî. Stargeha dema herî zehmet bû qawûşa 33. Girtî li wir xwe di nava ewlehî û heskirinê de didîtin. Ev îqlîm hêza wan a herî mezin û palpişta wan bû.

Diviyaba her roj ev qaleyên asê hîn xurtir bikiriban. Ev "To Be Or Not

To Be'ya wan bû. Dudiliya ku Ferhat û hevalên xwe hîn di destpêkê de dema ku komîn dabûn avakirin carekedin dihate rojeve. Pêwîst bû berpirsyarê qawûşê û alîkarê wê bixistiban bin venêrîna xwe û nehiştiban tiştên di qawûşê de diqewimin bibin derveyî qawûşê. A rastî ev erka ku dabûn hevalên partîzanî ne ji ber bêrûmetiya wan bû. Ev heval, li hember hemû zext û xweferzkirinan tiştên ku îdarê dixwest di derbarê qawûşê de fêr bibin nedidan, yek gotin tenê jî di derbarê qawûşê de parve nedikirin.

Yekem kesê ku darbeya yekemîn di qawûşê de lê bikeve û divê li beramberî van darbeyan li ber xwe bide berpirsyarê qawûşê û alîkarê wî bû. Di vê wateyê de ji her milî ve erka wan ya ku qawûşê temsil bikin hebû. Li gel hemû tiştên baş ku moral dide qawûşê,

tiştên nebaş jî ew çend bêmaralî di qawûşê de dide avakirin.

Li gel vê yê ku bi vê erkê re radibe pêwîst bû him fizîkî û him jî di warê moral de bihêz bûya û bi zanebûna berpirsyariya xwe tevbigeriyaba. Pêwîst bû namzetên têkoşînê û yên di rewşa diyet dayînê de, berpirsyariya vê jî rakiriban. Dema kesê berpirsyarê qawûşê jî nexweş ket, pêwîstiya guhertina vê jî xwe ferz kir. Ji ber kêm jî be ewrên ku agahiya rojên reş û nebaş dianî digeriya. Îdarê jî ji bo erka berpirsyartiyê girîng didîtin, lewra yên dibûn berpirsyar ji hêla wan ve dihatin diyarkirin. Ji ber berpirsyarê qawûşa 33'an agahiyan di derbarê qawûşê de nedidan îdareyê, loma îdare ji wan nerazîbû. Û ji bo wan jî "berpirsyareke" nû dîtin mecbûryetek bû. Ji bo ku Ferhat, ev polîtîkaya îdareyê dizanî hevalên xwe kom kir, ji bo çareserî ji vê pirsgirêkê re bînin dest bi xebatê kirin.

Ferhat got:

"Hevalno, weke hûn jî hemû dizanin rewşa qawûşê her roj zehmetir dibe. Ev rastiyeke wê hîn zehmetir bibe. Ji bo ku rojên zehmet derbas bikin, divê em jî xwe ji bo hinek zehmetiyan amede bikin."

Necmî:

“Wê demê em jî amederkariyên xwe bikin.”

Ferhat:

“Ew qas hêsan nîne. Ev kar dema mirov dibêje hema nabe Necmî giyan. A rastî ji destpêkê ve rewşeke ku min tangav dike heye. Ew jî ev e; di vê perpirsyarê qawûşê bê bihêzkirin. Ev jî encax ger yek ji me pê re rabe dibe. Ev kesên ku ji destpêkê heya roja îro bi vê berpirsyariyê re radibûn, cî bi cî kêmaniyên wan derketibin jî hewl dan erka xwe bidin meşandin. Divê em mafê wan nexwin. Ji hêla me hemûyan ve avaniya qawûşa me tê zanîn. Hêza xwe zêde abartmakirin wateyeke xwe nîne. Hinek hevalên me li hemberî zehmetiyan lewaz in. Ji hêla her kesî ve tê zanîn ku di van rojan de îdare ketiya nava hewldana berpirsyar dîtinê. Ger ku îdare bikeve ferqa vê û yek ji wan ji bo berpirsyariyê hilbijêre wê demê dê rewşa me zehmetir bibe.”

Ednan pirsî û digot: “Wê demê em çi bikin bira?”

“Weke min beriya niha jî gotî, îdare wê yekî nêzî xwe û di bin denetîma xwe de hilbijêre. Bêyî ku em dem winda bikin bi hevalên xwe yên partîzanî re baxivin. Em ê ji wan re bêjin ku bila xwe ji erka ku heya niha didan meşandin bikişînin û ji îdarê re ragihînin. Li ser vê wê îdare ji bo hilbijartina berpirsyareke din bê

qawûşê. Wê bipirsin, 'ka keseke ku bixwazibe di nava we de berpirsyartiyê bike heye an na?'

Wê demê bila du kes ji me bi awayeke ku ew dixwazin tekmil bidin û bêjin 'em dixwazin bikin.' Ji derveyî van herdu hevalan, îdare çi dike bila bike divê keseke din xwe nede ber erka ku îdare bide. Niha bêjin. Keseke ku bixwaze vê erkê bike heye? Di destpêkê de vê bêjim: Hevalên ku bi vê erkê re rabe li pêşiya wî ezmûnekî zehmet heye."

Necmî:

"Ez xwe ji bo vê erkê amede dibînim. Ger ji hevalan yêkî bixwaze bike hebe, ez amedeme bibim alîkarê wî. Lê divê ev jî bê zanîn, ez dikarim vê peywirê jî rakim."

Ednan got:

"Ez di vê baweriyê de me ku ez ê bi Necmî re vî karî bikim."

Ferhat:

"Li gor nêrîna min herdu heval jî guncav in. Bila Necmî bibe berpirsyar, Ednan jî bibe alîkarê wî." Girtiyên din jî beşdarî vê peywirdarkirinê bûn. Mijara berpirsyartiya qawûşê wê li ser vî pîlan bihatiba meşandin. Girtiyên ku di civînê de amedebûn, li ser bingeha talîmatên Ferhat, ketin nav kar. Ednan bi

Partîzanan re, hevalên wî yên din jî bi girseyê re eleqedar dibûn, ji wan re digotin û didan famkirin. Li ser peywirberdana partîzanan û weke pêşdîtinên Ferhat jî, ji bo derxistina berpirsyarek ji bo qawûşê asteymenek û nêzî pazde gardiyan hatin hûndir. Asteymen berpirsyar bangî gel xwe kir û got:

"Tu çima berpirsyartiyê berdidî?"

Berpirsyar: "Ez nexweşim, min beriya niha verem derbas kiriye, di demên dawî de rewşa min zêde baş nîne."

"Baş e derbasî cihê xwe bibe. Qawûş min baş guhdar bikin. We hemûyan guhdar kir. Ji ber berpirsyarê we nexweş e lewra dibêje ez nikarim peywira xwe bidim meşandin. Niha jî ez ê ji nava we berpirsyarek hilbijêrim. KUK'ciyê di rêza pêş de bû bangî gel xwe kir û got:

"Hıdır... Diyarbakır, emirke qomîtan!"

Asteymen got:

" Hûn ji kîjan dozê tên dadgehkirin?"

"Ji doza KUK'ê qomitan."

"Tu derbasî milê din bibe."

Yên ku nû anîbûn qawûşê Şekif yê ji doza Özgürlük Yolu dihat dadgehkirin çawûş bi milê wî girt û anî.

Got: Qomitan ev dikare bike.”

Asteymen got:

“Ka tu jî derbasî wî alî bibe.”

Asteymen li namzetên ku hilbijartibû fitilî xwes tekmîlê bidinê.

Tekmîla ku girtiyan dayî eciband û got, “zindîtir zindîtir.”

Di herî dawî de Şefik got:

“Ez nikarim qomitan.”

Asteymen got:

“Tu çima nikarî bikî îbne. Min hîn erka berpisyariyê teklîfê we nekiriye kuro. Him jî ger ez bêjim bikin hûn neçarin bikin.”

Herdu girtî dan diyarkirin ku nikarin bikin.

Asteymen got:

“Yan na hûn ji Apoyiyan ditirsin?”

Girtî:

“Nexêr qomitan. Ew jî mîna me mirov in. Sedemeke ku em ji wan bitirsîn nîne.”

Asteymen got:

“Biçin cihê xwe îbne kurê îbneyan. Kuro keseke ji we bixwazibe berpirsyartî rake heye?”

Necmî û Ednan bi dorê tekmîl dan û gotin:

“Em dixwazin bikin qomitan.”

Asteymen tekmîla ku Ednan dayî ne eciband û got:

“Tu biçe cihê xwe, cuda yên ku bixwazin bila bên. Dema ku Asteymen dît kes dernakeve, bangî Fethî yê ku di rêza pêş de bû kir û got:

“Were vir!”

Fethi, tekmîleke ku Asteymen dixwest dabû.

Asteymen got:

“Hah temam. Wê ev bibe berpirsyar.”

Li Necmî jî zivirî û got; “tu jî alîkarî fam bû?”

Fethi got:

“Ez nikarim erka berpirsyartiyê bikim qomitan.”

“Tu yê bikî kuro!”

“Bi rastî jî ez nikarim qomitan. Bila Necmî bibe berpirsyar ez jî bibim alîkarê wî.”

Asteymen, li Necmî zivirî û got, tu yê bikaribî?

Necmî got:“Ez dikarim bikim qomitan!”

Asteymen got:

“Temam baş e. Ma ez ê bi we re mijûl bibim. Ev berpirsyarê we û ev jî alîkarê wî ye. Baş e kuro?”

Hemû qawişê bi hev re got, tu emir dikî qomîtan. Pîlana ku hatî danîn bi temamî jî nebe ketibû meriyetê. Lê dîsa Ferhat ji hevalên xwe re got, "Fethî" bixin bin venêrînê. Ji ber digot li hember lêdanê lewaziyên min hene."

Bi vî rengî ew xala lewaz jî girtiyan bihêz kiribûn veguherandibûn (lehlerine)aliyê xwe. Dereng hatina mirovan a dinyayê, yanê ji ber dema zêde ya di rehîma dayîkê de bi xwe re bêhêzî û lewazî aniye. Lê ev bêhêzî û zeafa mirov jî bi xwe re bihêzbûnê jî anî. Hîsê li hember xwezayê xwe parastin û neslê xwe zêdekirin, ji hêla mirov aliyên xwe yên lewaz bihêz bike. Bêguman dema lewazî xwe dide derve û yan jî diyar dibe ev dibin demên herî zehmet. Navêndên zehmet, zext û tehakûmî ji bo mirov kevirê miheng e. Mirovê çar çar nîne ango yê mûkemel. Lê mirov dikare aliyên xwe yên lewaz hilde bin venêrîna xwe û di demên herî zehmet re derbas bibin. Tenê bila hêza îrade li ser xalên lewaz lêhûr bibe (yoğunlaştırılsın) ango bifikire. Di qawûşa 33'an de girtî bi vê re îdeal bûn? Bêguman na.

Lê başiyên giştî, dema ku lewazan ji lewazbûna wan xistin asta herî jêr, mîna ku xirap nînbe dihat dîtin. Xala herî hesas ya îradeya kesên lewaz mîdeya wan bû. Navend û tîpê mirov yê ku dixwestin biafirînin jî ji bo

vê guncav bû. Felsefeya mirovê ku dixwestin bidin afirandin jî ev bû, “ yê ku keştiyê xilas dike qaptan e.”

Lê xilasbûna keştiyeke bê qaptan li ku derê hatiye dîtin? Gotineke pêşiyan heye dibêje; “giyan ji gewriyê tê.” Baş e, mîde dikare şûna mejî bigire, yan jî kesê ku bi mîdeya xwe fikiriye hatiye dîtin ku ev mirov çend gav meşiya ye? Bêguman na. Lewaziyek din ya qawûşa 33’an, yên ku derveyî jiyana komînê jiyana xwe didin meşandin e. Hêjmareke ji van, mebesta xwe bi awayeke vekirî digotin. Hêjmarek ji wan jî behane diafirandin.

Di cewher de herdu nêzîkatî jî diçûn heman derî ango heman şûnî. Lê vekirîbûn her tim dihat ecibandin û qezenc kirin. Ji bo di dema pêş de ev nekevin himêza dijmin ji hêla komînan ve ji wan re tolerans didan nîşan. Jixwe helwesta Ferhat jî vê dida nîşan. Kesên li ser navê PKK’ê hatibûn û ji derveyî komînê diman nêzî deh kesî bûn. Ji van çar kes mîna komek li ser berjewendiyên herêmî û berjewendiyên kesî hatibûn gel hev.

Yên mayîn jî bi serê xwe jiyan dikirin. Pêwîst bû ev taybetmendiyên wan yên xirap di bin venêrîna xwe de bigirtiban. Girtiyan jî ev dikirin. Ji ber di vê navendê de rehneyek (gedik) biçûk dihêla bi xwe re ziyaneke

mezin bîne. Lewra yên di nava komînê de pêwîst bû di çarçoveya disiplîneke xurt de tevbigeriyaban. Û dozaja vê disiplînê jî girêdayî kesê di nava komînê de û rewşa kes bi xwe bû. Dema ku zext û lêdan zêde bû, yek du kesên ku nikarîn li ber xwe bidin xilasiya xwe derketina ji nava komînê de dîtin. Di nava komînê de mayîn û di nava komînê de ketina nava lewaziyên kesî bêguman li hember wan helwestên şoreşgerî dihat raberkirin. Mînaka vê jî rewşa Hespık bû. Gelo Hespık çi kiribû? Dema ku di qawûşê de qedexeya ciqarê hebû, yanê ji hêla îdarê ve qedexeya ciqarê hatibû dayîn, Hespik nikarî qontrola xwe li ser xwe bide çêkirin û wexta ku dema çaya ziwa kir xwest vexwe, ev rewş ji hêla hevalên wî ve hatibû dîtin. Destpêkê ji hêla hevalan wî ve pê re hat axiftin.

Jê re hat gotin ku tişta kirî nebaş e, ger ku li ser van lewaziyên bi vî rengî nesekinî tu yê bikevî nava lewaziyên hîn xiraptir. Lewra ev xal hemû li bîra Hespik anîn. Hespik qebûl kir ku tişta kirî nebaş bûye. Bi mehkumkirina vê nêzîkatiyê re pirsgirêk hatibû destgirtin û ji girseyê re jî bibû mînekeke berbiçav. Dema nêzîkatî û hewldanên bi vî rengî derdiketin holê, helwestên şoreşgerî dihat raberkirin.

Riya herî baş ya ku mirovan ji şaşî û lewaziyên wan rizgar dike, bi rêbazeke baş a perwerdekirinê re derbas dibe. Perwerde armanc dike ku jiyana mirov ya civakî û jiyanê bi pergal bibe. Lê ev perwerdeya di girtîgehê de, bi şêwaza du koman dihat kirin. Ya yekem, perwerdeya şoreşgerî bû. Di nava bêderfetiyên herî zêde de ev, nedihat îhmalkirin. Di qawûşa 33'an de ji hêla Ferhat û bi alîkariya hevalên ku van meseleyên teorîk dizanin dihat kirin. Mijara vê ya herî giring jî, di nava van mercên herî zehmet de xwesteka girtiyan ya kirina vê bû. Ferhat rabû ser xwe çû cihê ku ew seatek bû Amed û Mahmud bi dengê bilind nîqaş dikirin, ji wan pirsî û got:

"Hûn çi dikin?"

Mahmûd  bersiv da û got: "Em di nava xwe de nîqaş dikin."

"Min jî got qey hûn şer dikin. Ferhat bi ken got, ma tişta hûn bêdeng nîqaş dikin çî ye."

Mahmûd  pêwîst dît ku vê mijar veke:

"Beriya niha Îkram, ji Rojnameya Milliyetê nûçeyek xwend. Em jî li ser vê nûçeyê nîqaş dikin."

Ferhat got:

“Çi ye mijara hûn nîqaş dikin? Ka bêjin em bi hev re nîqaş bikin.”

Mahmûd :

“A rastî mijar giring e. Lê wê gelek dirêj bike.”

“Ka tu ji min re mijarê bêje.”

“Mijar li ser mekaleya Çetin Altan ya li ser îdolojiyê ye.”

“Min jî ev nivîs xwend. Tiştek zêde tê de nîne. Mijareke rojane û giring bibînin wê baştir be.”

Îkram yê ku vê nîqaşê guhdar dikir ew jî hat gel wan:

“A rastî tiştek wisa bê kirin wê gelek baş be. Ji ber bi hev re nîqaşkirin, ji bo fêmkirina mijaran baştir dibe.”

Ferhat:

“Ka tu bangî hevalên din jî bike. Em bi hev re mijarek diyar bikin û nîqaş bikin.”

Heval hemû hatin rûniştin. Ferhat ji İkram re got:

“Tu mijarê ji hevalan re bêje.”

İkram:

“Hevalno, em dibêjin di navbera xwe de mijarek diyar bikin û li ser nîqaş bikin.

Wiha ji bo wê me gazî we kir û xwest nêrînên we bigirin. Hûn di vê mijarê de çi dibêjin?”

Hemû tevlî vê nêrînê bûn.

Alik:

“Pêşniyereke min jî heye: Em qawûşê bikin du beş. Bila berpirsyarê her komek jî hebe. Em wisa nîqaş bikin.”

Eşref:

“Wisa nabe, koma ku birayê Ferhat di nav de be wê pir xurt be.”

Merwan:

“Wê demê bila birayê Ferhat him nîqaşê bimeşîne û him jî encama nîqaşê komî ser hev bike.”

Her kes tevlî vê nêrînê bûn. Yek jî Merwan got; “mijarê bi xwe diyar bikin.”

Ferhat:

“Hilbijartina mijarê ji min re nehêlin, destpêkê di navbera xwe de nîqaş bikin.

Di mijarekî de li hev bikin, piştre em ê baxivîn.”

Eşref:

“Wê demê em koman diyar bikin. Li gor min bila yek Mahmûd yê din jî Îkram mêze bike.”

Kom hatin diyarkirin. Li ser mijara ku wê bigirin dest seatek nîqaş kirin. Herî dawî mijara ku Eşref anî rojevê hat pejirandin. Li gorî vê: “Mûtefikên şoreşa Kurdistanê kî ne? Bi vê re girêdayî, mewziya çînên di welatê me de wê çawa bibe?”

Tevî ku ev pêşniyar hatibû qebûlkirin jî yên ku tevlî nedibûn hebûn. Mînak Alik digot, “em roja îro ya girtîgehê, derbasbûna wê û hatina wê nîqaş bikin.” İkram jî digot, “em helwesta şoreşgerî ya di dadgehan de û parastina di dadgehan de bandora ku bide avakirin nîqaş bikin.” Ferhat jî beşdarî nîqaşkirina mijara dawî dibû.

Hêjmara zêde jî beşdarî pêşniyara Eşref kirî dibûn.

Ferhat:

“De baş e em li ser mijarên ku me diyar kirine nîqaş bikin. Lê tişteke ku me jibîr kiriye heye.”

Necmî:

“Tişta ku me jibîr kiriye çî ye?”

“Di navenda ku em tê de cî digirin meseleya ku bi lezgînî em bigirin dest ev e: Dibe ku ev nîqaş dirêj bike. Li gorî ku hemû qawûş jî beşdarî vê bûne, divê tiştên îdare jî di vê mijarê de bike li ber çavan bigirin.”

Mahmûd :

“Di vê mijarê de tişta herî zêde îdare bike wê hewl bide dema me ya vale dagire. Li beramberî vê em ê jî awantaja nebûna çavdêriyan bikar bînin. Yanê komek li beramberî derî bi awayeke ku dema digerin wan bibînin bi cî bibin, em ê jî nîqaşa xwe bi rihetî bidin meşandin. Di tevgerek herî biçûk de wê agahî bidin me.”

Belê, bi vê rêbaza nû nîqaşkirin di nava girtiyan de hêcanek dabû avakirin. Tevlîbûna ji nîqaşê re gelek zêde bû. Lê cihê herî xweş yê vê nîqaşê, carna bi ketina gardiyan ya hûndir re nîqaş qut dibû. Girtî bi rojan van mijaran nîqaş kirin. Dema ku Ferhat dît ev nîqaş di nava hefteyekî de bi dawî nabe, mijaran bi encam kir û nîqaş bidawî kir.

Li beramberî bûyara teslîmgirtinê navenda ku şoreşger tê de mişraq (odaklama) bibin, mişraqên berxwedanê ne. Qarektera wê ya herî bingehîn, li beramberî berxwedaniyeke kêm jî tehemûl nekirine. Di 26 Gulanê de ku Esat Oktay digot, “ li beramberî min mêşek tenê jî li ber xwe nade, bêguman derew dikir. Dibe ku li beramberî xwe berxwedaniyeke “fiîlî” nedidît. Lê di qada fikir de berxwedan her tim didomiya.

Lê ew, di fikir, giyan û bawerî de roboteke ku bi qasî diyardeya berxwedanê hîs neke bû. Wî, ti caran ev nedidît û wê hîs nekiriba. Ew, dema diket hêrîşa dawî ditirsiya. Ditirsiya yûzbaşiyê ku apoletên xwe diguvaşt. Hewl dida tirsa xwe di gerdava gilasên îçkiyan de bihelîne. Dema ku di ew korîdorên vale re derbas dibû li pişt wî bi dehan gardiyan hebû. Ji ber ditirsiya serî kêliyê êrîş dikir. Ji kenê zarokeke 7 salî, ji çavên dapireke 70 salî ditirsiya. Ji hemû tiştên baş û xweşik direviya. Her ku direvî û ditirsiya mafê girtiyan yê herî xwezayî binpê dikir.

Yûzbaşî yekî ji mirovan ditirsa muswedeyeke mirovan bû. Çepera xwe pêşde anîbû, anîbû heya ber deriyê girtiyan. Di hinek cihan de bi riya hespên truva yê xayîn destê xwe dirêjî hûndir jî kiribû. Heta hinek girtiyan heya ber deriyê hûcreyê tangav kiribû. Û dest bi hemleyeke nû dikir. Dest bi sefera Viyanayeke din dikir û mîna ku îdare biçe aqineke(akına)din. Dijmin wê di hemleyekî de hemû dema girtiyan ya vala bigirtiba.

Baş e, lê wê vê çawa bikiriba? Wê çawa pêşkeftinên di hûndir de fêr bûba? Tişta herî zêde îdareyê ditirsand di nava qawûşa 33'an de nebûna îspiyonciyên wî yên ku pê ve girêdayî bûn. Ev jî dest û lingên îdarê dişkand.

Ji ber her hespê truva ku dixwastin bixin hûndir zehîrek jî be, polîtîkayên qawûşa 33'an jî wê zehîrê vediguherandin panzehîrê. Yên ku beriya niha soza îspiyontiyê dayîn îdarê, yanê sebexker (boyacısı) komando, derew merew û gotinên wan yên şirîn jî feyde nekiribû. Lewra ev tenê jî ji bo dînbûna yûzbaşî bes bû. Yûzbaşî Esat Oktay, di qawûşên ku îspiyonker tê de bi cî kirî xebata xwe ya perwerdê hîn baştir dixist meriyetê. Ji ber dema wexta girtiyan ya vale çêdibû ji bo wî xeter dibû. Ji ber seydayên wî yên aqil di ferqa vê de bûn, dema wexta girtiyan ya vale çêbibe wê bi misogerî afirîneriyên xwe yên şoreşgerî bixistiban tevgerê. Karê perwerdê yê di hûndir de bi misogerî ne valetiya wî bû. Destpêkê ji girtiyan re" Dîroka Îlke û Înqilabên Ataturk dida" û pirtûkên "Nutuk" dida û wiha digot: "Hûn van hemûyan ji ber bikin."

Wê ev çawa bibe? Armanc, ne "perwerde û fêrkirin bû. Armanca wan ya bingehîn her tim girtiyan mijûlkirin bû, dema wan ya fikirandinê heta atoma herî biçûk tinekirin bû, bê kesayet hiştin û anîna asta papaxanek bû. Armanca wan ya bingehîn mîna ku zarên mêjûyên wan biteqînin bi seatan, bi mehan û heta bi salan wan tiştan dûbare dikirin ku girtî bênin asta şêtbûnê.

Bi kinahî kes ji fikrên wî, baweriyên wî, şoreşgeriya wî, gel û ji nirxên partiyê dûrxistin bû. Kesayeta ku dixwestin bidin afirandin, ji derveyî mirovan wê bişibîyan her tiştî. Ev perwerde bi vî rengî dihat kirin: Ya yekem, girtî neçar bûn seat di 5.00'an de li ser lingan ban. Sond, "Sirûda İstiqlalê, û Gençlige Hitabe"dihat xwendin û piştre bênc deqîqan navbera pêwîstiyan dihat dayîn. Di vê de rîh kurkirin jî hebû. Piştre diketin rêza hêjmartinê. Heya dema hejmartinê wê yek ji girtiyan Dîroka Înqilabê bi dengê bilind bixwendiba, yên din jî wê lê vegerandiban û dûbare bikiriban. Piştî sayîmê yan wê derxistiban cihê hewasitandinê yan wê sirûd bixwendiban û yan jî derbazî xwendina pirtûkê bibana.

Bi giştî di dema sirûd xwendinê de dengê girtiyan kêm derdiket, ev car jî pirtûk bi wan didan xwendin. Ji bo xwarina navbera nîvro nîv seat navber didan. Piştî navberê bi vî rengî ev şêwaza perwerdê heya êvarê didomiya. Dema ku girtî sirûd û xwendina pirtûkê didomandin, neçarbûn li ser lingan rawestayî bisekinîban. Di vê kêliyê de cixare vexwarin û pêwîstî bicî anîn bi misogerî qedexebû. Yên ku vê bikiriban bi awayeke herî tund dihatin cezakirin. Beriya niha me qala awantaj û dezawantajên qawûşa 33'an kiribû.

Wiha di vir de awantaj diketin dewrê. Girtî, ev awantajên xwe bi vî rengî bikar tanîn. Di qawûşa 33'an de ti caran polîtîkayên îdarê bi temamî neketibû meriyetê. Dema komek "perwerde didît û sirûd dixwendin, bi awayeke ku gardiyan bibînin li ber kuna mazgalê disekinin yên din jî bi dorê pêwîstiyên xwe bi cî tanîn. Bi vî rengî van dikarin xebatên xwe yên şoreşgerî bidin meşandin. Di hemû kêliyên jiyanê de şerê şoreş û dij şoreşê didomiya. Kê bi awayeke baş mercên heyî bikar anî û vegerand aliyê xwe wê qezenc dikir.

Girtiyan hemû valetiyên heyî dinirxandin û bi ti awayî vê îhmal nedikirin. Hewl didan valetiyên heyî bidest bixin. Girtiyên qawûşa 33'an wisa mîna mîro weke bi derziyê birê bikolin dixebitîn, yek ji van girtiyan yanê bala Eşref mamosteyeke DDKD yî kişandibû. Bi hêcaneke mezin nêzî vî zilamî bû pirsî û got:

"Ya xoce li min biborîne, lê bala min kişand min xwest bipirsim. Tu ti caran vê pirtûkê ji destê xwe dernaxî, tu çi dikî wisa?"

"Heval ez mamosteyek im. Ev pirtûk niha li derve di dibistana amedeyî de mîna waneya bijare tê dayîn. Dema ez derketim ez ê vê mîna waneya cuda bidim. Ji

ber vê ji xwe re dixwînin. Di navberê de di wextê xwe yê vale de jî dixwazim hinek din pêşde bibim.

Tabî tu jî dizanî, beriya demek axiftina yûzbaşî hebû. Ji me nivîsandina kompozisyonek xwestibû. Yek jî ji bo wê dixwebitim."

Eşref:

"Seyda tu dişibî zilameke bi aqil. Ma qet pêwîstî bi van tiştan heye?"

Dîsa Cahît yê ku ji doza DDKD'ê hatibû girtin hat gel wan û got:

"Hûn çi dikin heval?"

Eşref:

"Bi seyda re me hinek nîqaş kir. Seyda li ser vê pirtûkê dixwebite, ez bawer im difikire ku li derve vê mîna waneyeke li dibistana amedeyî bide."

Cahit, zilameke şen û rûgeş bû. Sekna wî qet nedişibiya ya DDKD'yî yan. Nêzîkatiya wî, felsefeya jiyaneke rojane bû.

Tişta ku Eşref gotî mîna her carê dîsa bi henekî bersiv da û got:

"Dema seydayê me got, welle wê bike. Lewra ger ez li şûna wî bin, ez ê di ber karên hîn baştir de ked bidim."

Pirsî got Eşref:

“Mesela tu bûya te yê çi bikiriba?”

“Ez bawerim tu nafikirî ku zilamek mîna min biçe vê pirtûkê ji şagirtan re bixwîne û tiştek wisa jî nakim. Ka temaşeke minê ci bikiriba: Dema ku ez ji vir derketibam ez ê biçûbam minê ji gelê Çunkuşê re bigotiba; ey gelê min yê Çunkuş, ez di nava mercên herî zehmet de bi salan li gel Apoyiyên heqîqî di girtîgehê de mam. Tiştên di vê girtîgehê de hatine kirin bigotiba, ji bo serokê şaredariyê jî xwe namzet bidaba diyarkirin. Ma ji vê baştir kar dibû? Bi xêra we bi salane xeyala bidestxistina serokatiya şaredariyê Çunkuş min ê bidest bixistiba. Ma wisa mamostatiya ji rêzê tê kirin.

Ji dêla ez vê bikim ez biçim lênûsa hesabên bavê mafyeyan bidest bixim. Ev hîn kardartir e. Dema hêrsa çavê mirov yê bidestxistina kar mezin bû, lewra tiştek e ku neke nîne. Bi xudayê min ji ev kar baştirîn kar nayê dîtin. Ka temaşeke girtiyek ji (Özgürlük Yolu) dan nîşan, zilam di asta komîteya merkezê de ye. Heya Almanya yê diçe piştre tê teslîm dibe. Tenê ji bo daran nexwe dema dayîk û bavê wî ji bo dîtina wî tên naça wan nabîne. Ew jî mîna seydayê me serê xwe li ser hesabên biçûk diêşîne.

Ketibûn nava xiyalên ku, ‘ez ê ji vir derkevim biçim Îzmîrê ji xwe re kareke biçûk bigirim, xaniyeke xweş bikirim, bizewicim û bibim xwedî zarok.

Ka temaşeke heval ma min qala şoreş moreşan kir. Ev hatine rewşek wisa ji tîpa Ş. ya şoreşê ditirsin. Bawer bikin ji min û ez vê ji dil dibêjim. Li derve derfeta min a naskirina we çênebibû. Lê di vê girtîgehê de min we naskir. Ev jî ji bo min bes e. Ez vê ji dil bawer dikim: Ev kar ji derveyî we keseke din nikare bimeşîne.

Li ciheke ku seydayê me, Dîroka Înqîlabê ji destê xwe dernaxe, hevalên we jî bi dil û kêfxweşî li ser dîroka şoreşê dixebitin. Wiha cudahiya di navbera me de evqas zêde ye. Ev qawûş, mîna mûzeyeke Kurdistanê ye. Her kes li vir heye. Min hemû naskirin. Ji bo min rewşeke ewqas fêrker ti car nebû. Berdin bila seyda pirtûka xwe bixwîne.”

Seyda, ji bo tiştên ku hevalê wî Cahît gotî heya demekê deng dernexist. Lê hinek bi şermî pirsî û got: “Cahît xoce tu di ferqa wê deye ku te heqaret li min kiriye?

“Na midûr, min rastî anî ser ziman. Ma gelo heqaret li kî dera vê heye? Hevalê min pêwîst nake tu li ber dilê xwe bigirî. Ka temaşeke min mebesta xwe got, dîsa

dibêjim: Ji ber ser sedema van zilaman ez ê biçim bibin reîstiya gelê Çunkuşê bikim. Her çendî rastî biêş jî bin ez ê qebûl bikim.”

Nîqaşê gihandin aramiyê û belav bûn. Ev car Cahît çû cihê ku Necmî lê rûniştibû. Gelek ji Necmî hes dikir û hesab jê dikir…

Dahata girtiyan pereyê ku malbatan ji xwe kêm dikirin ji wan re dianîn bû. Dayîk û bavên ku dizanin zarokên wan di nava mercên herî zehmet de dijîn, dayîk û bavên ku dilê wan dişewitin; bi feraseta ku bila zarokên me di hûndir de baş xwedî bibin, bila hema wisa zû nemirin û neçin her hefte qqerz digirtin ji bo zarokên xwe pere dirazandin. Dayîk, bav û hemû kes û karên girtiyan bi vê ferasetê hewl didan hemû pêwîstiyên zarok û kesên nêzî xwe bi cî bînin. Hinekan bostanê xwe difirot, hinan jî meaşê xwe yê teqawîd(emeklilik) hemû ji bo zarokên xwe dirazandin. Heskirina welet ev e.

Ma tiştek heye dayîk û bav ji bo zarokên xwe nekin? Lê ew li derve zarokên wan jî di hûndir de bûn. Di derve de ew dişewitin di hûndir de jî zarokên wan. Êdî ji hevdu dur di cihanên pir cuda de jiyan dikirin. Weke ku zarokên wan zindî di tirbê de bin. Bêyî ku bimirin xistibûn gorê. “Xirabtirê xirabê van heye” hesab,

jiyankirina zarokên wan ji bo wan teseliyek bû. Şev û roj her tim di xewnên wan de bûn û bêçaretiya ku ji bo zarokên xwe tiştek nekirin dilên wan nedikarî li ber xwe bide. Dilê bi dehan, bi sedan dayîk û bav nikarî van êşan rake koç bûn û çûn ji vê cîhanê. Ji yên hûndir re nedigotin. Dayîk û bavên wan yên mirî, dizanîn ku yên di hûndir de jiyan dikin.

Ma çi bikin? Wê ji kî derê bizanibin? Girtiyên nêzî hev yên di hûcreyên cuda de jî agahiya wan ji hev çênedibû. Tevî ku cihê wan li jorî hev û li beramberî hev jî bûn nedizanîn ka kî miriye kî maye. Êdî her qawûşek û her hûcreyek cîhaneke cuda bû. Hevbeşiya herdu cîhanan yek, di navenda heyî de gardiyan xwe mîna qiralan dîtin û yekbûna heman nîzam ango heman pergalê ye. Pereyê ku malbatên girtiyan ji wan re dianî nivî zêdetir li karê boyaxê diçû. Girtî neçar dihiştin ku bi pereyên xwe boyax bi yax, karton, firçe, tiner, neft û zeliqok bikirin… Gardiyan, bi jop û kalasan li ser serê girtiyan disekinin bi zorî li ser dîwaran wêne û nivîsên curbecur bi wan didan çêkirin. Piştre jî wêneyên Ataturk û alên Tirkan bi wan didan çêkirin. Wisa ku hûndirê qawûşan û korîdorên navber bi awayê ku misqalek tenê jî vale nemîne tijî wane kirin.

Hemû dîwar, ban, heya cihên avdestxanê xêz kirin. Gardiyan, kuna mazgala qawûşa 33. vekir û got:

“Berpirsyarê qawûşê zû were vir!”

Berpirsyarê qawûşê bi lez çû ber derî got:

“Emirke qomitan!”

“Temaşeke kuro, heya ban wê ti cî vale nemîne. Wê her cî bi alên Tirkan bên xemilandin. Ger ku ez bihusteke tenê jî tê de valetî bibînin, s…m li gorî vê tevbigerin.”

Berpirsyar got:

“Ban gelek bilind e, pereyê me nîne, em nikarin bikin qomîtan.”

“Ez fam nakim? Ger min got wê çêbibe dê bê çêkirin. Ew qas.

Ez ê boyêxê li listeya qantînê binivîsînim, wê bê.”

Gardiyan fermana xwe da û çû. Necmî, çû cihê ku Ferhat lêbû tiştên ku gardiyan gotî bi kurtî jê re got.

Ferhat:

“Ev meseleya boyaxê wisa nabe. Heya niha me nêzî 100.000 lîra pere daye bi boyaxê. Niha jî ger cihên ku dibêjin jî em boyax bikin, ez bawer im wê bi qasî wê biçe. Divê em çareyeke ji vê re bibînin. Ka bangî Amed

bike. Ez bawer im berê bi karê boyaxê re mijûl bûye, ji van tiştan fam dike.”

Necmî çû bangî Amed kir. Ferhat got:

“Ka were Amed hosta. Encax tu bikaribî me ji nava vî kare derxînî.”

“Çi kare bira?”

“Ma wê çi bibe, ev zilam resmen me dişêlînin. Gardiyan girtiye dibêje wê her cî bê boyaxkirin. Qaşo ban jî hemû bibe al.

Di ser de jî dibêje divê hemû bi boyaxa ronî bê çêkirin. Li gor nêrîna te wê ciqas bigire? (yanê ciqas pere lê biçe).”

Amed, hinek fikirî:

“Mubarek qawûş jî gelek mezin e, mîna haxekê ye, kî dera wê bê boyaxkirin kî dera wê neyê boyekirin nizanim.”

“Ka tu devji qawûşê berde wê çend bike tu wê bêje.”

“Kêmzêde 100 hezar lîra.”

Ferhat ji cihê xwe rabû:

“Ma tiştek wisa dibe? Di heyatê de em nikarin vî pereye bidin.”

“Ger hûn bixwazin em dikarin hinek din erzantir bînin.”

“Ka bêje. Tişta em jî dibêjin bila hinek erzan be.”

“ Wê derkeve hezar, hezar û pênsed lira.”

“Êêê, ka bira ev car formûla wê bêje. Sed hezar lîra li ku hezar û pênsed lîra li ku derê.”

“Formûl ev e bira, ji dêla boya ronî em ê boya toz çêkin. Yanê wê bibe şêlavk (badana). Bila Necmî biçe bi gardiyan re baxive. Bila ji me re 3 kîlo boya toz, 1-2 kîlo alçî, hinek kirêç û çend kîlo xwê bînin. Yek jî du firçeyên badana jî bîne em ê hemû çêkin.”

“Baş e ev ya herî baş e. Necmî tu biçe heman tiştî ji gardiyan re bêje.

Bila van tiştan bibîne bîne. Bila Amed jî çend hevalan bigire gel xwe çêkin. Ji ber me negot em nakin lewra em ê bikin, lê bila erzan be.”

Necmî li kuna mazgalê da bangî gardiyan kir.

Gardiyan:

“Hûn çi dixwazin kuro?”

“Qomitan ji me re sê kîlo boya toz, kireç, hinek xwê û ger du firçeyan jî bînin em ê qawişê mîna ku hûn dixwazin di demeke kin de boyax bikin.”

“Temam baş e boyax aîdê min. Tenê hûn bikin.”

Bi vî rengî qawûşa 33. ji belaya boyax kirina qawûşê xilas bibûn û ev mesele çareser kiribûn.

Ji bo ku îdarê kirêç zirar didît loma nedibûn. Lê tiştên din hatin.

Amed, Eşref, Keşe û çend hevalên din da gel xwe dest pê kirin. Di demeke kin de wê boyaxkirina qawişê qedandiban.

Ji ber ku ban gelek bilind bû nêzî mehek pê re mijûl bûn. Lê ji ber di nava boyaxa ku hatî çêkirin de kirêç nebû, tenê boya toz li nava avê hatibû tevlîhevkirin û wisa li dîwaran hatibû xistin di bayeke kêm de hemû diweriya.

Ji vê girtî û gardiyan tangav dibûn. Bi boya ronî posterên Ataturk û wêneyên din dihat çêkirin. Di qawûşê de yêkî bi navê Yasîn ku xwe xistibû nava waneçêkirinê hebû. Geh çêdikir geh xira dikir. Tişta dibû bi serê boyaxan dihat. Ferhat vê rewşê ferqkir û bangî Eşref kir got:

"Eşref, ez dîqat dikim ku ev Yasînê me xwe bi temamî ber bi wêneçêkirinê ve berdaye. Tu bi wî re bimîne. Tiştên ku xêz dike bila dûbare dûbare çêneke. Di cara destpêkê de çawa derdikeve bila wisa bimîne. Kes ji wî re nabêje te baş çêkiriye madalya nadinê."

Ji bo ku Eşref ji wêne çêkirinê hez nedikir, bi xwestek bi vî erkî re rabû.

Gardiyan bi dengê xwe yê tîz qîr dikir û digot:

“Bikevin rêza hêjmartinê kuro, bikevin rêza hêjmartinê!”

Girtiyên ku di destê wan de kar hebû karê xwe berdan. Her kes li cihê hêjmartinê amede bûn.

Girtî mîna kerwanek yek bi yek bûn rêz ji ber derî qawûşê dest pê kirin, li binê kevanek xêz kirin cardin hatin cihê ku derî lê bû. Di hêjmartinê de cihê her kesî diyar bû. Bi sûbayên nobedar û bi dehan gardiyanên re kirariya(sayim) hêjmarê dihat kirin.

Necmî:

Tekmîla qawûşa 33. da û got: “142 girtiyên qawûşa 33. di bin fermana te de amederne qomitan.”

Asteymenê hûrik emir kir û got:

“Bêjmêre kuro!”

Girtiyan dest bi hêjmartinê kirin: “1... 2... 59... 99... 142 dawiye qomitan.”

Dema ku Asteymenê hûrik destê xwe danî ser zikê xwe hewlda biçe Eşref ji nişkê ve tekmîl da got:

“Eşref Anyik Riha, emirke qomitan.”

Asteymenê hûrik got:

“Çi ye?”

“Qomitan, ziyaretvanên min ji min re pere anîbûn lê min negirtin.”

Piştî ku Asteymenê hûrik ters ters li Eşref temaşe kir û şûnde, “başe tu dizanî ji te re pere hatiye?”

Rast e qomîtan ziyaretvanên min gotin.

Asteymen, li gardiyan zivirî û got, “ biçe ji min re lênûsa peran bîne.”

Piştî ku li lênûsê temaşe kir û şûnde got:

“Kuro tu derewan dikî. Ger tu nizanî cezayê derew kirinê çawaye ez ê niha nîşa te bikim. Piştre li gardiyan zivirî got: Biçe ji min re kalasek bîne.”

Hûrik, berevajiyê hûrikbûna xwe gelek xirxire bû. Mina camek biterişîne li bîra mirovan dianî. Gumanên girtiyan li ser hebûn ku ew polîsê siyasî be.

Hemû îşkenceyên li girtîgehê bi xwe dida meşandin. Berevajiyê ev girsbûna wî girtiyan jê re digotin “minik” yanê hûrik. Asteymenê hûrik destpêkê seata xwe ji destê xwe derxist. Tabî vê di hemû lêdanan de dikir. Ji bo ji seata xwe hes dikir ji destê xwe derdixist yan jî ji bo baştir li girtiyan bêxe wisa dikir bêguman kes vê nizane. Dema ku kalas hat, dest bi lêdana Eşref kir.

Heya ku Asteymen westiya ev lêdan domand. Piştre mîna ku tiştek nebûye, “ka niha bêje. Pere ji te re hatibû?”

“Rast e qomîtan hatibû.”

“Baş e, madem tu hîn israr dikî ku pere hatiye, wê demê vê li hûcrê bêje.”

Sê rojan Eşref li hûcreya takekesî dan girtin. Her roj lêdan xwar û piştî sê rojan wî anîn qawûşê. Hevalên wî bi mereqeke mezin jê pirsîn û gotin:

“Tu li kî derê bûyî? Çi ji te kirin?”

“Min birin 37’an xistin hûcreyekî.”

“Çi bû?”

“Wê çi bibe? Pereyê min nehatiye. Di herî dawî de ma fêm kir.”

“Yanê dibêjî pere Asteymenê hûrik xwariye?”

“Bêguman xwarî ye. Ji ber her roj bi xwe dihat îşkence li min dikir. Her tim ji min re digot: ‘Bêje pere nehatiye ez ê te bibim qawûşê.’ Di dawî de min qebûl kir ku ji min re pere nehatiye wan jî min anîn vir.”

Jiyan cendereyek bû. Ev vidayên cenderê her roj hîn zêdetir dişidandin. Dema hêza girtiyan ya xwe li ser lingan bigirin nedima, îdarê dizanî êdî kêr ketiye ser hestî, ev car jî wan hinek bi serê xwe dihêlan. Jixwe

navendeke wisa hatibû avakirin ku jiyan bixwe îşkenceyek bû. Di navendeke wisa de koma Amedê birin dadgehê. Li gel dadgehên K.T çawûşan jî karê xwe yê dadgehê didomandin.

Him jî ev dadgeh hema di kêliyê de înfazên xwe dikirin…

Girtiyan, xistin ser riya girtîgehê. Amed xwe nêzî Tekin yê ku di qawûşa 7'an de bû kir. Ji zû de bû wî nedîtibû. Piştî silav dayîna hev û şûnde hatin ser mijara esasî:

"Tekin rewşa we çawa ye? Îşkence zêde heye?"

"Ma ev pirsa bê kirine? Her roj ji lêdanê îmana me derdixin."

"Di qawûşa we de îspiyoncî hene?"

"Him jî çawa, ne yek sê hene. Baş e, rewşa we çawa ye?"

"Li gel me jî îşkence heye. Xwarin-vexwarin yek jî di mijara avê de gelek tangasiyên me hene. Lê di qawûşa me de îspiyoncî nîne."

Gardiyanan ji goşt dîwar çêkiribûn. Serî her kêliyeke carek digot: "Deng nekin ew kî ne diaxivin?" Dema ku gardiyan vegeriyan alema xwe Amed dîsa dest bi axiftina xwe kir:

“Li gel we komîn heye Tekin?”

“Ne babo, komîna çî. Ji tirsan du mirov nikarin bên gel hev.

Ma wê çawa komîn bidin avakirin?”

Amed, li ser talîmata Ferhat ev got.

“Li gel mirovên rast werin gel hev, bi misogerî komînek ava bikin. Ger ku hûn bi çavê şoreşgeran li xwe mêze dikin, hûn ê her tiştî bidin ber çav û bi misogerî vê bikin.”

Polîsekî ji koma Amedê dihat dadgehkirin hemû axiftinên wan guhdar kiribû. Polîs, polîsliya xwe di hundir de jî didomand. Girti birin korîdora navber. Kelepçeyên di destê wan de vekirin, li ser qawûşan hatin belavkirin.

Dor hatibû qawûşa 33. Gardiyan got: “33 derbas bibin, 32 hûn jî di pişt wan de biçin.” Girtî, bi awayê destê wan di hev de, li gel xwendina sirûdê hatin ber deriyê qawûşê. “32 tu qawûşa xwe bibe hundir. Ez ê hinek bi van îbneyan henekan bikim. Gardiyan: Kuro îpneyan hûn dîsan dixwazin çi bikin?” Girtiyên ku çûbûn dadgehê her yek ji wan 20 kalas li wan xist û piştre pirsî; “ka bêjin kîjan ji we di seyarê de axîvî? Dengê wî hinek zelaltir bû ku, yan hûn ê bêjin yan jî ez

dizanim ez ê çawa bi we bidim gotin. Qêr kir û got kî axiviye bila mîna zilaman derkeve holê. Dema ku dît kes dengê xwe nake ev car ji xwe re mere li her ciheke girtiyan dida. Ednan got:

“Qomitan kes ji me neaxiviye.”

“Hêy direwkeran s.....m mi? Niha ez biçim ew yavşaxî bînim hûn ê çi bêjin?”

Girtiyan hemû bi yek dengî gotin “bang bikin qomîtan.” Jixwe êdî hêza girtiyan ya lêdan xwarinê nemabû. Hemû bi awayeke nîv li ser hiş li erdê dirêjkirîbûn. Dengê wan tenê ne çûbû qawûşên wan, deng çûbû qawûşên herî dûr jî. Hevalên wan yên li hûndir vahameta rewşa wan dizanin. Ew jî bi bêdengî di cihê xwe de sekinî bûn.

Dema ku li lêdan û îşkenceyên vê rojê temaşe dikirin cidîbûna vê rewşê hîn baştir fam dikirin. Gardiyan, kuna derî mazgalê vekir got, “kuro berpirsyar ka çend ji we werin van bibin hûndir.”

Piştî ku girtiyan birin hûndir û şûnde gardiyan, carekdin bangî berpirsyar kir:

“Temaşeke kuro, ev cezalî ne. Tu yê wan bavêjî binê tencerê. Xwarin, av tiştek nadî wan. Heresekî bide ser serê wan. Ji derveyî vê ger ez yekî li dora wan bibînim

ez ê we hemûyan s…m. Dema min derî mazgalê vekir ez ê tekmilê bixwazim" û derket çû.

Tevî ku girtî ewqas lêdan xwaribûn jî, dema ketin hûndir bêhna wan derket û rehet bûn.

Ferhat ji hevalên xwe yên ku ji bo rewşa wan fam bikin li ser serê wan kom bibûn re got: "Ka destpêkê cixareyek û avek bidin piştre em ê rewşê ji we re bêjin." Tiştên ku Ferhat gotin hevalên wî hema kirin. Ferhat, rewşa di dadgehê de bi kinahî got.

"Niha jî biçin bila we li van deran nebînin. Piştre em ê bi berfirehî bêjin."

Li ser rewşa yên cezalî re 24.00' seat derbas bû. Di vê seatê de nobedarê gardiyanê asil yê qawûşa 33. bû. Deriyê kuna mazgalê vekir got:

"Kuro cezalî we xwarin xwar?"

Cezaliyan hemû bi hev re gotin: "Na qomitan!"

"Kuro ez we afû dikim, biçin xwarina xwe bixwin, rakevin."

Halbikî girtiyan, xwarina xwe xwaribûn, cixareyên xwe vexwaribûn û pêwîstiyên xwe bi cî anîbûn. Quralê ku tenê pêk anîbûn rûniştina bin qazanê bû. Dema gardiyanê qawûşê gihişt wê qenaetê ku cezayê xwe kişandine ji bin qezanê jî xilas bûn. Qawûş hîn

raneketibûn. Hevalên wan yên ku neçûbûn dadgehê dîsa rewşa dadgehê û çima ceza xwaribûn ji wan pirsîn. Ferhat, rewşa dadgehê û axiftinên Xeyrî yên di dirûşmeyê de got. Amed jî çima lêdan xwaribûn û hatibûn cezakirin got. Ferhat, li Amed temaşe kir û got, “tu dizanî çawa îxbara me hatiye kirin?”

“Raste bira, polîsê li pişt min li me guhdar dikir. Bala min qet nekişandibû. Bênamûs, di hûndir de jî îspiyontî dike ji dewleta xwe re xizmet dike.”

Ednan got:

“Axiftinên te ne tenê polîs her kesî guhdar dikir.”

Ferhat:

“Bila guhdar bikin. Bi vî rengî baştir bû. Em tiştek xerab nabêjin, dibêjin yêkîtiya xwe çêkin.”

## Beşa Çaremîn:

Di vê girtîgeha hemû aliyên wê ji beton hatî çêkirin, deriyên wî ji hêsin û şişên wî ji 30'î hesinan ava dibe mirov tê de jiyan dikin. Ji kêfxweşiya cihana bi xurmexurm diherikî dur û bêparbûn. Ev girtîgeh, mîna kêştiyeke di hezar fersah dibin kurahiya erdê de be, temaşe dikir. Kunên hewagirtinê xitimîne, mirovên wî birsî, bê av û nexeytîkirî (bakımsızlardı) bûn. Dijminê ku wan mirovan li wir bi xurtî digirt heya bêjî bê însafbûn. Ew girtî di destê zebaniyên ji zilmê, êşê û xwinê têr nabin de bûn. Lê ew mirov, mirovên şerkerên girtîbûn yên ku ji baweriyên wan zêdetir tiştek di destê wan de nebû.

Tişta tenê girtî li ser lingan dihişt baweriyên wan bû. Mirov, dikare bêked jiyan bike, lê nikarin bê hewa, bê bêhn û bê têkiliyên civakî jiyan bikin. Girtî her roj mîna şimayê diheliyan, hestî û çerm mabun. Veguheribûn îskeletan, çavên wan çal bibûn, zehmetiya li ser lingê xwe mayîn û li ber xwe dayînê jiyan dikirin.

Di dadgehan de bi awirên xwe, zimanên xwe yên zuwa bûyî û bi hezaran wateyên di çavên xwe de qêrîn dikirin. Lê ev, ji bo bêhnvedana wan bes nedikir.

Di welateke ku muhalefet tê de terqîn (sindirilmek)bûye, yên îşkencekar dest û lingên xwe dihejandin û tê de digeriyan. Di kolanên bajêr û serê wan de laşê qijakan tine nebibûn. Di girtîgeha Amedê de qêrînên mirovan bilind dibû û mirovên taxa Baxlarê ji xew şiyar dikir û zarokan nedikarîn razin; lê hêjmareke zêde mîna ku di bîra mirinê de bin raketibûn. Di girtîgeha Amedê de jî ji rexeke dîwar heya rexê din mirovan berxwedan dikirin, tevî hemû îşkenceyên zilmê li ber xwe didan

Meha Mijdarê, li nûfûsa meha zemheriyê (çilê zivistanê)qeytkiriye. Mijdar, di çavên girtiyên di girtîgehê de li ber xwe didin kaosek e. Xencereke xayîne ku li demarê mirinê dikeve. Yê ku di bin kelaş de qet qetî dibe bedena pêşengan e. Û di taqvîmên K.T de rûpelekî reş e û girtî jî şîngirtîne. Wê rojê, “ dibêjin ev fermaneke, ji xwendekarekî dibistana seratayî yê heft salî bigre heta keseke heftê salî wê her kes reş girê bide. Ger sexte be jî divê wê rojê herker bigrî. Ev fermaneke! Qanûneke! Yan 10 Mijdarê roja mirina Ataturke. Yên ku ji Ataturk hezdikin divê reşgirêdin, şîn bigerînin. Ji ber ku ev fermaneke. Yên ku nizanin bigrîn û rondikan ji çavên xwe birjînin, divê xemla grî bidin çavên xwe.

Yek jî eniya girtîgehê ya 10 Mijdarê heye. Ev sewdayên tarî, ji bo girtî jî ev fermane bênin cî dê wan tangav bikiriban. Yanê ger tu li girtîgehê jî bî, “ tu yê di 10 Mijdarê de reş girê bidî. Ev emrê Esat Okta ye!” Û biryarek bi vî rengî, wê rojê vediguherînin rojeke reş ya 10 Mijdarê. Di girtîgehê de kelha girtiyan ya herî bihêz ji lêdana bi sedan topan xirabtir bandor dide avakirin. Bandora wê ya bi şewat û wêrankar bi gotinên heyî re ferman tê kirin.

Nobedarê sibehê hevalên xwe ji xew şiyar dikir:

“Ka rabin hevalno, îro 10 Mijdarê ye dibê em li qawûşan bigerin.”

Girtiyên ku ji ser ranzeyên xwe hatin xwarê pêwîstiyên xwe bicî anîn dest bi rîkurkirinê kirin. Lewra haya kesî zêde jê nebû ku deriyê kuna mazgalê hatiye vekirin.

Gardiyan got:

“Hêy îbneyan hûn çûne kî derê?” Sê girtî bi bez çûn ber derî tekmîl dan.

“Zû bikin karavana derxin dema ez hatim bila her kes li ser xwarinê amede be.”

Girtiyan bi yek dengî:

“Tu emir dikî qomitan.”

Ji mehek zêdetirbû xwarina sibê ji qawûşa 33’an re nedihat dayîn. Yek jî wê sibê lêdan nekiribûn. Lewra her sibeh ji dêla xwarina sibê lêdan li girtiyên qawûşa 33’an dikirin. Hatina xwarina sibê û lêdan li wan nekirin, bibû sedem ku di nava girtiyan de rê li ber şiroveyên cuda veke. Bi vebûna derî re, yek ji girtiyên ku di rêza rawest de sekinîbû ber bi derî ve baz da karavana girtin hûndir.

Gardiyan got:

“Berpirsyar duayê bixwîne.”

“Emir dikî qomîtan. Bismillahi... Hamd ji xwedê re.”

Gardiyan:

“Afiyet be.”

Girtî hemû bi yek dengî gotin:

“Saxbî.”

Gardiyan got:

“Berpirsyar were vir. Piştî xwarinê ‘İstiklal Marşı’, ‘Anda me’ û ‘Gençliğe Hitabe’ bixwînin!” Piştî van gotinan kir û şûnde deriyê kuna mazgalê girt û çû.

Girtiyên ku ji bo xwarinê rûniştibûn bi vebûna kuna mazgalê re hemû dîsa rabûn ser xwe bûn yek rêz.

Gardiyan got:

“Berpirsyar tiştên ku min gotî piştî bi dengê bilind hat xwendin û şûnde vehesin.”

Di serê girtiyan de pirsnîşaneke mezin çêbibû. Rewşeke wisa cara yekem çêdibû.

Ednan çû gel Amed û got:

“Tu çi dibêjî Amed, ev çi ye?”

Amed,“ez jî nizanim? Polîtîkaya van famkirin gelek zehmet e. Kengê çi bikin kes nizane.

Tu dizanî îro 10’ê Mijdarê ye. Belkî ji ber 10’ê Mijdarê dilê wan bi me bimînin bêjin îro ji xwe re îstîrehet bikin. Yek jî dîqat bike heya duh zexteke pir zêde didan meşandin. Car caran ji bo behn hildanê dibe ku hinek bidin vehesandin.

Lê tevî her tiştî, kî çi dibêje bila bêje îro rewşeke awarte heye.”

Ferhat nêzî Ednan û Amedê ku sofreya xwarinê paqiş dikirin bû, bi ken li wan temaşe kir û got:

“Ji min re jî wisa tê ku wê îro hinek tişt biqewime.” Fermanên ku hatibûn gotin ku piştî xwarinê bên pêkanîn, girtîyan wan fermanan anîn cî û çûn ser ranzeyên xwe. Hemû girtiyên ku behna xwe vedidan di navbera xwe de nîqaş dikirin ku wateya vê roja ne ji

rêzê fam bikin. Seriyê hemûyan bi van pirsgirêkan re meşkûl bû. Di demeke ku qawûş di navbera xwe de ketibûn nava nîqaşê, qirtîniya dengê hoparlo(dengeke xweş) hat bihîstin. Destpêkê kesî bala xwe neda ser. Ji ber çi Esat Oktay çi jî îdarê hinek tiştan bi dengxweşî ji girtiyan re radigihandin. Yan dibe ji ber erzeyekî be, yan jî ji ber karê tamîrekî be. Di pişt de dengek hat bihîstin gotin:

“Dîqat, dîqat!” Bala hemûyan çû ser cihê ku deng jê dihat.

Mîna ku her kesî nefesa xwe girtibe, dengê henaseya wan jî nedihat bihîstin. Ji bo famkirina anosa hatî dayîn bê famkirin her kes li cihê deng jê hatî kom bûn. Hemû meraq û kelacana girtiyan wateya ev roja awarte famkirin bû.

Kesê ku hat ser mikrofonê, piştî yek du ceribandinan û şûnde cihê xwe ji dengê nexweş yê amirê ewlekariya hundurîn Esat Oktay Yildiran re berda. Dema ku girtiyan ev dengê nexweş dibihîstin û her ku ev rûyê nexweşik didîtin bi misogerî texmîn dikirin ku wê belayek bê serê wan.

Wan di jiyana xwe ya pratîkî de bi sedî caran dîtibûn. Dizanîn ku wê ev rewşa awarte bi awayeke çep li wan vegere. Lê nedizanin ka wê çi bibe. Piştî ku çend

gotinan li ser 10’ê Mijdarê kir û şûnde li ser mikrofonê bêdengiyek çêbû. Mîna ku girtî li înfaza cezayê îdama yekî temaşe bikin bêdeng sekinin. Bedelê vê bêdengiyê çi dibû bila bibûba dixwestin qut bibe. Lê li bendê mayîn zêdetir ti çareyeke din ya wan nebû. Ev car Esat Oktay bi dengekî tunt û tûj li ser mikrofonê got; “çend hevalên me yên ku hûn jî baş dinasin wê çend tiştên girîng ji we re bêjin.” Û gotinên xwe domand wê ji we re Gençlixe Hitabe, Sonda me, Dîroka Tirkan û çend helbest bixwînin.”

Li ser vê di hemû girtiyan de nermbûnek çêbû. Heta hêjmarek girtî di hûndirê xwe de digotin, “mesele fêm bû dîsa weke her carê Esat Oktay li gorî xwe lîstikan ava dike.” Bi qasî ku fêm dibû dîsa çend kesan xapandibû û ketibûn xefika Esat Oktay. Êdî girtiyan digotin nihîniya rewşa îro ya awarte zelal bû. Hinek girtî jî bi guman bûn ku ev nerînên xwe bi dengeke bilind bêjin.

Ferhat got:

“Hevalno ka dengê xwe kêmkin ku em meseleyê fam bikin. A rastî me gelek caran ev lîstikên îdarê ditine. Lê dîsa di guhdarkirina vê de feyde heye.” Tevî şiyariyên Ferhat jî girtî sist bibûn û bala wan belav bibû.

Dema ku dengê mina dengê Xeyrî ji mikrofonê hat, her kes ji ber xwe ve li ber hoparloyê kom bûn. Deng destpêkê baş fam nedibû. Dengek pir cemidî bû. Piştre dema deng berdewan kir hêjmareke girtiyan ya zêde deng naskirin. Lê kesî cesaret nedikir ku bêje ev birayê Xeyrî ye. Kesî ji vê bawer nedikir û nedixwestin bawer jî bikin. Her ku axaftin didoma înata di bawerkirinê de sist dibû.

Hinekan di hûndirê xwe de digotin "ew e,"yan jî "negengaze e, birayê Xeyrî tiştek wisa qebûl nake" dema ku wisa digotin mîna li hemberî Xeyrî sucê herî mezin kiribin heta yên ku naletê li xwe tanîn jî hebûn. Di serê her kesî û awirên wan de nermbûnek hat dîtin. Destpêkê serî hêdî hêdî ditewînin, ew çavên ku ji tiştek neditirsiyan jî dadiketin erdê. Taybet rû bi rû hatina baremberî hev ji bo wan mirina herî mezin bû. Guhdarkirin, ew ê ku mîna gewriya wî teng bibe diaxivî, her gotineke axiftinên Xeyrî ji bo xwe mîna newa didît. Guhdarkirin, ew ê ku weke qirika xwe dişidîne diaxivî, axaftina Xeyrî ya ku her gotinek mîna newayekê diaxivî. Dengê wî kêm, banda teyîbê xirabe û ew dengê ku diyar bû ji berê de hatiye dagirtin diaxivî.

Kesî nedixwest ne nevaroka axiftinê fam bike, ne jî guhdar bikin. Beriya her tiştî mereqa ku ka ev deng yê

Xeyriye an ne bû. Pêwîst bû ev deng zelal bikiriban û tê de îqna bibûban. Yên ku qenaet pê anîn ku dengê Xeyriye bi hilweşandineke mezin re bêyî ku bixwazin guhdar bikin, guhdar dikirin. Her kesî ji xwe re îtiraf dikir û digotin ev deng “dengê Xeyrî ye, lewra wateyeke ya xwe xapandinê nîne.” Her kes li benda hevalê li kêleka xwe bû ku baxive an jî gotineke bike. Lê hemû ziman sekinî bûn, dev hatibûn qufilkirin; ne niyeta wan ji bo vekirinê hebû û ne jî ji bo kenînê… Berde bila li wir bimîne, em neaxivin, bila sitranên me yên azadiyê neyên gotin. Bila ti serî ranebin, al bila nivî bên rakirin û çav…

Pêşiya xwe tenê dîtin bese, heta nebînin jî dibe û hwd.

Di her gavekî de em biterpilin bikevin. Bila dest û lingên me xwîn bibin. Dil veguherin deryaya xwînê. Bila her dilekî birîndar birijîne gola xwînê. Bila dilê min yê birindar neyê pêçan, bê kunkirin xwîn bibe. Her dilê ku xwîn dibe destê bi destê xwîn(şerem şehrem), xem bê girêdan. Bila heta temenek bidome ev birîna me.

Wisa bisekinin û guhdar bikin. Ez ji we re dibêjim: Ew ê ku diaxive Xeyri ye. Bihêz bisekinin, hîn êşa dilê me xilas nebûye. Yên ku baxivin hene, di çarmixa

dijmin de hûn ê dengê mêrxazeke bibihîsin. Her yek ji wan bibe guleyeke ya ronî li demarên me yên xwînê bikevin û di reşika çavên me re derbas bibin jî guhdar bikin. Ew ê taxive jî Kemal Pîr e. Di piştre wê dengeke din jî yê tê nasîn bê bihîstin.

Nihîniya wê rojê nû nû dihat famkirin. Olgunbûna (pêgihîştin) wê nû fam dibû. Destpêkê Xeyrî, "Dîroka Tirkan xwendibû,"piştre Kemal " Gençlixe Hitabî," Rifki jî "Sond" xwendibû. Yek-du girtî jî helbest xwendibûn… Bi vî rengî bi dawî bibû ziyafeta Deccal Esat Oktay. Dîsa Esat Oktay di pişt de yek ji girtiyan dikişand:

"Wiha we guhdar kir, heya duh van ji we re pêşengatî dikirin. Demek dînamîtê dixistin bin koka dewleta me. Niha jî di huzura pêşiyên me yên mezin de sekinîne. Ji niha û şûnde dema ku yekî kêmaniyeke derxist wê hemû qawûş cezayê wî kesî nekişîne, wê ew kes bixwe cezayê xwe bikişîne. Wê lêdan li kesekî din neyê kirin." Bi hewaya fermandareke ku serkeftinê bidest xistiye meydan dixwend. Ev serkeftin wî serxweş kiribû, ji kêfxweşiyan dîn dibû.

Qawûşa 33. di nava bêdengiya gorê de bû. Her kes hizirdar, her kes xemgîn û moralê hemûyan nebaş bû. Lê dîsa di van rojan de, di van kêliyên teng de sebir dayîna nîşan û helwestek bi tendurîstî girtin pêwîst

dikir. Girtî bi seatan bi hev re neaxivin. Yekî, li rû yê yê din temaşe nekir. Nedixwestin rû bi rû hev bên û çavên wan bi hev bikevin. Mîna ku yê ketî vê rewşa nebaş û axivî ew bi xwe ne û yê ku bêdengiyê xira bike bi xwe bibe. Navendeke xeydandinê hatibû avakirin.

Bi vê axiftinê re ji hev biyanêbûnek derketibû holê. Ev, hejandinek bû, şoqeke pir bi bandor bû. Girtî êdî li perava dîwaran, kenar û koşeyan de digeriyan, cixare ser cixareyê vedixwarin. Di demeke wisa de nebûna cixareyan tiştek gelek nebaş bû. Mîna ku van mirovan bi salan bûn bi hev re hevaltî nekiribûn, di rojên herî zehmet de pişta xwe nedabûn hev û mil bi mil şer nekiribûn. Di her awirekî de hezar hêrs veşartibû.

Wê bêdengiyê xirakirin lewra jê re wêrekî pêwîst dikir. Di rojên tengezarî û zehmet de kes û kesayetên ku niyeta wan nebaş bi awayeke zelal derdiketin holê. Di kêliyên bi vî rengî de nirx tên ceribandin, girêdana bi şer û evînê re li kevirê meheng tê xistin. Di destpêkê de yên ku diterpilîn û hewl didan mêla xwe nedin diyarkirin hebûn. Hinekan mêla xwe didan derve, hinekan jî dikarin veşêrin, wiha ev kêlî kêliyek ji kêliyên vezîninê bû û mirov di holê de bûn. Di koşeyeke qawûşê de çend kesên lewaz û xirabûyî ev ji bo xwe fersend dîtin û mîna dîkên bê wext bang dan.

Destpêkê di navbera xwe de axivin. Lê di bîreke wisa bêdeng de axiftineke hêdî jî ji hêla gelek kesan ve dihat bihîstin.

Yasin bi vê re jî nedima bi çavsorî bi ser agir de diçû û xwê li birînê dikir. Û mîna ku pê li kuriya xwe kiribe ji hevalê li kêleka xwe re hesabê ku "keça min ez ji te re dibêjim, bûkamin tu fam bike" dikir û digot: " Ger pêşengên me jî wisa baxivin ev kar xilas bûye." Piştre bi zewqî çend caran li ser hev van gotinên xwe dûbare kir. Eşref yê ku van axiftinan dibihîst xwe bi zehmetî digirt. Piştre li ser dûbarekirina Yasin ya van gotinan, zembera sînorên Eşref hetibû valakirin.

Nêzî Yasin bû û got:

"Tiştên ku tu dibêjî ma guhê te dibihîse?"

"Tabî dibihîse. Ma em çi bikin? Ma em mîna deve serê xwe bêxin bin qumê? Êdî ev jî bes nake. Her tişt di holê de ye."

Eşref, fikirî ku ger bersiva van gotinan nede wê bê wate be, bi destê Yasin girt û xirikand:

"Ka tu were vî alî. Li vir wê gardiyan me bibîne. Em li vê koşê baxivîn."

Necdet, him hevalê Yasin bû him jî piştîvanê wî bû got:

“Eşref, Yasin rast dibêje. Ti wateyeke vê ya veşartinê nîne.”

Eşref:

“Ka tu yek deqîqe rawest e. Ez destpêkê bi Yasin re baxivim. Piştre ez ê rastî û şaştiyê ji te re jî bêjim.”

Dema ku piştgirî ji hêla Necdet ve ji Yasin re hat dayîn, Yasin bi wêrek bû û ji bo aligirên nû ava bike bêyî ku hesabê tiştek bike axivî û got:

“Xeyrî, îxanet li me kir. Piştî ku me xapand anî van deran û şûnde di hoparlo de ‘Dîroka Tirkan’ vedibêje. Ma em ê çawa li pişt zilamên ku me firotînê biçin?”

Piştî vê gotinê Eşref li rûyê Amed mêze kir û serê xwe hejand. Mîna ku bixwaze bêje “ez ê karê vî bibînim, tu rewşê îdare bike.” Tişta ku Eşref difikirî wê bêxistiba piratîkê. Êdî wê ti hêz nikarîba wî bigire. Weke ku bi çengê Yasin girtî xişikand pişt ranza. Destpêkê dengê çep repê hat. Piştre dengê qêrîna Yasin û hawar hawara wî hat…

Eşref mîna mengeneyek qirika Yasin dişidand. Ger ku girtî hinek din direg bimaban wê Yasin bimiriba. Ji ber ku Eşref ji gotinên Yasin gelek aciz bibû û ji xwe ve çûbû. Piştî vê bûyerê hema şûnde komek girtî dan

raberkirin ku, “çi dibe bila bibe nêzîkatiyên li hember pêşengan tên raberkirin bêtomar nemînin.”

Piştî vê rewşê û şûnde: Eşref, Amed, Merwan, Ednan, Mahmûd ,

Keşe, Girêsor, İkram, Alik û gelek girtiyên din li baremberi rewşên wisa wê derbikevin û bêdeng nemînin bi awayeke vekirî helwesta xwe danîn holê. Êdî di qawûşê de avên şîlo disekinin. Her kesî bi awayekî nêzîkatiya xwe danî holê…

Roja din Ferhat, bi awayeke fikar li ser ranzeyê xwe rûniştibû bûyerên ku qawîmîbûn digirt dest. Ednan û Alik yên ku di birîma qawûşê de diman bangî gel xwe kir. Nêzî deh deqîqeyan bi wan re axivî. Piştre bangî hevalên din jî kirin.

Ferhat, li Eşref temaşe kir û wiha got:

“Bûyera wê rojê min serî heya binî temaşe kir. Lêdana li Yasin mafdar dibînim. A rastî di mercên xwezayî de zêdetir jî heq kiribû. Lê pêwîst e ev rewşa zehmet ya ku em niha tê de ne bidin ber çav. Di be ku nêzîkatiyên xiraptir jî bidin raberkirin. Bi perspektîfeke hestyar ve nêzî pirsgirêkan bûyîn, wê me ber bi şaşiyan ve bibe. Ez bawer im ger tu jî bi xwînsarî bifikirîba te yê wisa nekiriba.”

Merwan:

“Li gorî nêrîna min di vê girantir li mirovên bi vî rengî bê kirin. Baş bû ez negihiştimê. Bawer bike ger ez li şûna Eşref bûma minê xiraptir bikiriba.”

Keşe:

“Li gorî nerîna min heq kiribû. Eşref baş kir bila ev ji bo her kesî bibe dersek.

Ferhat got:

“A rastî ez we fam dikim, lê îro, qet ne ciyê wê ye. Ez ji we re dibêjim navenda ku em tê de neguncav e, lê hûn hîn fam nakin.

Ma em her roj di cendereya dijmin de bi hekaretên herî mezin re rû bi rû namînin? Li hember nêzîkatiya me ya tund ku em li hember kesayetên lewaz didin raberkirin belkî jî em rûn li nanê dijmin didin. Yanê ev nêzîkatiya li gorî bercewendiyên dijmin bibe. Kî ji we garantî dide ku sibê ji komînê qutbûn çênebe, kesên ku xwe nêzî îdarê bikin dernekevin û hemû nêzîkatiyên xirab dernekevin holê? Heta hîn di niha de hinekan dan diyarkirin ku ji komînê qut bibin.”

Keşe:

“Bira mijareke heye bala min kişand. Gelo Necmî çima beşdarî civînan nabe?”

Piştî vê gotinê bêdengiyek di nava yên ku beşdarî civînê bûne çêbû. Her kes li hevdu temaşe kir. Piştre awir hemû çûn ser Ferhat. Ferhat hinek xemgîn û tengav bû û got:

"Em ê wê jî baxivin. Jixwe hinek mijarên cuda em ê bi hev re baxivîn û nîqaş bikin. Dîsa em ê bi hev re li rêyên wê yên careseriyê bigerin. Hevalno, me dûh di nava xwe de yanê birîmê de nîqaş kir û gihiştin vê biryarê: Em komînê belav dikin."

Ev axiftinên Ferhat jî ji hêla xwe ve şoqek da avakirin. Bi rastî jî komîn û jiyana komînê ji bo girtiyan çi bû? Dema ku mirov dibe xwediyê tiştek, dibe ku di wê demê de qîmeta wê nizanibe. Gotineke ya pêşiyên Kurdan heye dibêje, "giyayê hêwşe tahle." Yanê, giyayê di baxçeyê mirov bi xwe de jê re tahl tê. Roj bingeha jiyaneke devjêneyê berdan e. Lê dema ku tinebûna wê hat hîskirin, yanê tarîtiyê serweriya xwe da çêkirin wê demê fam dibe ku roj xwedî çi ronahî û bingeha çi jiyanê ye. Komîna şoreşgerî, li girtîgehê bi qasî rojê xwedî girîngî bû. Ji ber ku girtî, gava xwe avêtin nav jiyana şoreşgerî û neavêtin bi jiyana PKK'ê ya komîn re dest bi kar kirin. Navên xwe li ser taybetmendiya tipê mirovê nû dan nivîsandin. Û di encama kedeke mezin de bi xebateke berfireh re hemû taybetmendiyên xwe

yên kevin terikandin û sonda ku bibin ferdeke vê jiyana nû dan. Îfadeya siyasî û ramanên şoreşgertiyê di pratîkê de jiyana komîn dayîna avakirin û bi pêkanîna wê re wate didît û digihişt îfadeya xwe ya rast. Şoreşgeriya komînê dibe danasîna bêyî ku yek tiştek bêje û yan jî derbibire ye.

Wiha girtiyên şoreşger, bi berdana şoqek din yê dara ku pê girtine re rû bi rû ne. Dengê axiftinên Ferhat xeteriyê vedigot.

Mahmûd deng kir û got:

“Tu çi dibêjî bira? Ma tiştek wisa dibe?”

Ferhat:

“Ger hûn destûr bidin ez ê ji we re bêjim. Beriya niha hevalek ji we pirsî ku Necmî çima beşdarî civînan nabe. Me hemûyan di nava vê hefteyê de bandora axiftinên 10’ê Mijdarê ya ku li ser me hemûyan bandora xwe dayî çêkirin dît. Mînaka vê ya herî vekirî piştî wê axiftinê û şûnde nêzî bist hevalan ji bo ji komînê qut bibin serî li me dan. Di nava van de yên ku xwedî nirxên şoreşgeriyêne jî hene. Yanê mîna ku hûn difikirin em ê hemûyan bi heman rengî nedin dest. Em di qonaxeke zehmet, pir zehmet re derbaz dibin. Di vê qonaxa zehmet de kesên mîna Necmî dirûst jî bandor

bûne. Tevî hemû axaftin û hewldanên min yên îqnayê jî min nikarî di komînê de bidim hiştin. Ev rewş, yanê axiftinên 10’ê Mijdarê yên ku ji bo xwe fersendek dîtin jî hebûn. Di vê em van û yên mîna Necmî bi misogerî bi heman rengî negirin dest.

Ez bi yên ku xwestine ji komînê qut bibin bi hemûyan re yek yek axivim. Ez bi kinahî rewşa wan ji we re bêjim: Mêyla yekem: ev e yên ku bêyî ku baxivin ji berê de xilas bûne. Axiftinên yûzbaşî û gotina wî ya keseke nêzîkatiyeke şaş bike wê hemû qawûş pê re lêdanê nexwe jî li ser vê bandora xwe da çêkirin. Feraseta wan û van gotinên ku wan kirin guhdar kir û wiha dibêjin: ‘Piştî ev helwesta pêşengan û şûnde ji me re mafê serbestbûnê hatiye afirandin.’ Gotina yûzbaşî ya ku dibêje ‘yê ku suc bike wê bi xwe cezayê xwe bide’ em dibêjim ev ji bo me bes e. Ji niha û şûnde em ê li komînê nemînin. Em ê beşdarî berpirsyartî û risqên wê jî nebin.’ Mêyla duwem: ‘Mercên jiyanê gelek zehmet in. Jiyana komînê bi xeter e. Ya din jî pêwîstiya me bi xwedîbûnê yanê li xwe mêzekirinê heye. Yan na di demeke kin de em ê bikevin nav dest û piyan. Dibêjin di destpêkê de em dixwazin hîn baştir li xwe mêze bikin.’

Mêyla sêyem: Hêjmarek ji van dirustin û dibe piştî ku şoqa bûnalima xwe derbas kirin û şûnde dîsa vegerin nav refên me. “Dibêjin em fam dikin, lê em ê yên ku rewşa wan ya madî nebaş û ji bo komînê jî alikariyeke diyar bikin. Heta dibêjin, “yên ku rewşa wan ya madî nebaş em dikarin çar-pênç kesan bigirin gel xwe.” Weke ku hûn jî fam dikin min, yên ku qut bûne bi awayê sê koman belav kiriye. Heke yek bi îstisna derbikeve jî bi giştî rewşa wan bi vî rengî ye. Ez bawer im li ser axiftina 10’ê Mijdarê re 6-7 roj derbas bûne.

Ji niha û şûnde yê ku ji komînê qut bibe dernakeve. Yanê li gorî min pêvajoya qutbûnê temam bûye. Niha jî em bên ser pirsa Mahmûd ya ku dibê ‘çima’?: Di rewşeke wisa de, şêwaza komîna vekirî ji dêla feydê bînê wê zerarê bide. Dema ku dibêjim ‘ez komînê belav dikim,’ min negot ‘em ê dev ji her tiştî berdin.’ Lê li gorî rewşa ku derketî divê em jî ber bi avaniyeke nû ve biçin. Pêşniyara me ya birîmê, bi awayeke komên biçûk yanê komîn bi şêwazeke din bê birêxistinkirin. Ger bê bîra we, dema ku em nû hatin vir me xwest em komînê ava bikin me li ser rewşa komînê ango şêwaza avakirina komînê nîqaşan kiribû. Di mercên wê rojê de û ji bo famkirina rewşa girseyê ya nezelal me biryara

komîna giştî ya vekirî girtibû. Îro mercên wê ji holê rabûn. Bi vî rengî em ê komînan zelal bikin û jiyana xwe ya komîn bidomînin. Bi nêrîn û pêşniyarên we yên li ser vê mijarê em ê encameke baştir bidest bixin. Hûn çi dibêjin? Bêguman wê zehmetiyên vê jî hebin.”

Eşref:

“Bêguman mercên heyî zehmetin ev rastiyek e. Lewra mercên heyî zehmetin lê ji bo mercên zehmet divê em nekevin nava fikirandineke ku dev ji jiyana xwe ya şoreşgeriyê berdin. Tiştên ku seyda gotine bi giştî beşdar dibim. Lê du xalên ku min fam nekirîne heye: Ya yekem komîn belavkirin. Ya duwem vê ji nû de bê birêxistinkirin. Belavkirin hêsan e, lê birêxistinkirina vê dê çawa bibe? Yanê carekedin birêxistinkirina vê dê zehmet nebe? Mesela em komînê belav dikin, gelo piştre wateya ku dîsa ji wan re bêjin werin tevlî komînê bibin heye?”

Mahmûd :

“Min ev ji tiştên ku birayê Ferhat gotine fam kir: Li beramberî rewşa dawî ku derketî xebata xwe ya komînê bi awayeke îllegal dana meşandine. Wê demê pêwîst e em ji kesên ku heya niha bi me re tevgerîn û me bi her alî ve ji wan bawer kirî hema ji wan re nebêjin me “komînê belav kiriye.” Lê yên ku qut bibin û

yên ji bo qutbûnê dudiliya me li ser wan hebe, lewra ev jî bibin bibin wê yek-du kes derbas neke. Em dikarin bêjin me komînê belav kiriye. Em dikarin îmaja tinebûna komînê ji yên derveyî xwe re bidin. Ji ber em ji mirovên durist ku jê bawer dikin hema bêjin me komînê belav kiriye em ê bibin sedem ku bêmoraliyeke zêde bê avakirin."

İkram:

"Tiştên ku Mahmûd  gotine bi giştî rast in. Ez tevlî nêrînên wî dibim. Lê ger em ê li gorî rewşa heyî berbi çêbûneke nû ve biçin divê quralên wê dizî bên girtin. Heta pêşniyara min: Ji derveyî yên ku niha li vir rûniştine kesekedin bi avabûna ev pêkhateya me nizanibe.

Êdî em hemû vê dizanin. Her ku biçe wê merc zehmet bibin. Ji ber vê kesên ku em jê bawer nakin divê pê nizanibim. Jixwe bi zanîna wan wê ti feydeyeke xwe nebe. Di dema pêş de dibe zirarê jî bidin."

Merwan:

"Mînak, koma min. Ger ku ez rabin ji wan re bêjim 'komîn nîne' gelo ez ê çawa bikaribim wan bînin gel hev? Yan jî exlaqeke xwezayî û disiplîneke komînê heye. Ger ev nebe gelo kî texmîn dike ku di komînê de

manzareyeke çawa hebe? Tiştên ku Eşref û Mahmûd gotine li gorî min hîn rastir û mantiqdar e.”

Girêsor:

“Di vê demê de, ji kêliya em hatine qawûşê heya niha yên ku li gel me cî girtine hemû jî mirovên ku bikaribin xwe li ber zehmetiyan bigirine. Dibe ku yên mayîn hemû rewşa wan ya madî baş nebe. Lê ez bawer nakim kes ji wan dev ji namus û mirovahiya xwe berdin û tawîz bidin. Û ev mirov di kesayetên me de heya dawiyê bi partiyê bawer dikin. Ez di wê baweriyê de me ku em çi ji van mirovan re bêjin wê bikin. Mîna ku birayê Ferhat jî gotî dibe yek-du kesên din bikevin. Ji derveyî vê em dikarin bi rihetî ev kar bi yên din re bidin meşandin.

Dixwazim vê bêjim. Em ji van mirovan re bêjin ne komîn bêjin ‘piştevanî’ dîsan dikarin bên gel hev. Her tişt bi me ve girêdaye. Û bi rêxistinkirina me ya ji niha û pê ve girêdaye.”

Amed:

“Belavkirina komînê wê di nav girseyê de şoqek bide avakirin. Ji ber dema birayê Ferhat ji me re jî got em hemû şaş û maşo man. Ev bandor wê li ser girseyê hîn zêdetir be. Wê demê ji dêla ku em îro bêjin em komînê

belav dikin, ya din jî ger em zelalbûnek nedin çêkirin, îro ew komên ku hinek tevlîhevin dîsa li ber çav bigirin û ji nû de vesaz bikin. Yanê bila ev car kom bi giştî ji kesên ji heman hêrêman çêbibe.”

Ferhat pirsî û got:

“Cuda hevalê ku bixwazibe baxive heye?”

Dema ku dît ji kesî deng dernakeve axiftinên xwe domand:

“Heya niha, ji hevalên ku axivîne di gotinên hevalê Mahmûd û Îkram de cudahiyeke berbicav hebû. Gotinên hevalên din hema hema mîna hev bûn. Ev rastiyeke ku mercên heyî me ber bi rastiyeke ku em jiyana komînê bi awayeke îlegal bidin meşandin ve dibe. Lê mîna ku hevalan jî gotî ji mirovên dirust re ‘belavkirina komînê’ gotin wateyeke xwe zêde nîne. Lewra em dikarin ji hinek mirovên durist û yên ku nebûna komînê ji bo xwe bikin gerekçe ku ji komînê derbikevin re bêjin.

Baş e, wê demê em ev mijarê li vir bidawî bikin.

Di vê pêkhateya nû de jî pêwîst e em hinek adebtasyonên teknîkî jî bikin. Em ê van jî çareser bikin. Ya girîng ew bû ku di domandina komînê de hemfikirbûna me bû. Tiştek din ku bi qasî xebata

komînê û ji nû de birêxistinkirinê girînge axaftina 10’ê Mijdarê ye. Em hinek jî li ser vê baxivin. Me di hinek nîqaş û civînên xwe de wê bi awayeke vekirî anî ziman. Serok û pêşeng jî mîna me mirov in. Pêwîst e wan mîna hebûneke efsanewî nebînin. Ew jî ji goşt, hestî û sinir çêbûne. Ji vê bawer bikin ku, zextên li ser wan ji yên li ser me qat bi qat zêdetir in. Divê em jibîr nekin ku dibe kêmasiyê serok û hevalên me jî çêbibin.

Bêguman teysandina serkeftin û kêmasiyên serokan yên li ser girseyê bandora xwe zêdetir dibe. Lê em mirovên ku astek bides xistine. Rewşeke me wisa ji rêzê nîne. Rewşa me jî wisa zelal nîne. Îro hevalên me yên pêşeng ku di qawûşa 35. de dimênin, tevî her tiştî nûnerê serok in. Berxwedaniya wan dîsa di dadgehan de canên xwe datanîn holê û bi wî rengî parastina xwe dikirin me gihandin van rojan.

Ev fedekarî û azweriya wan wê ji hêla kê ve bê înkarkirin. Dema ku ez van dibêjim bila şaş fêm nebe ne ku ez axiftina 10’ê Mijdarê xweş dibînim. Lê rewş wisa jî be divê li hember dijmin hêrsa me ya berxwedanê tine nebe. Têkoşîna me ya di girtîgehan de hîn didome. Yek din jî bi temamî em nizanin ka hevalên me di kîjan mercan de ev kirine. Ger tişteke tê zanîn hebe ew jî, hevalên me nexwestine rast rast di

mikrofonan de baxivin.” Hemû hevalên ku guhdar dikirin mîna ku piştgirî bidin gotinên Ferhat bêdeng mabûn.

Di navberek de Eşref dest bi gotinê kir:

“Hevalên ku axivîne dibe ku anîbin lîstikê jî. Dibe ku mîna li me jî kirîn destpêkê sirûd û piştê tiştên mîna wan dengê wan girtibin teyîbê. Ji ber dibe ku îdarê raste rast dana wan ya axiftinê ya di mîkrofonê de xetarnak dîtibe.”

Li gorî avabûna şêwaya komînê ya nû pêwîstiyên teknîkî jî hatin derbaskirin. Li gorî vê; pereyên ku bên, bi wesileya berpirsyartiyê wê bidin Ednan û Yilmaz. Berpisyartiya koman û kom jî wisa hatin diyarkirin.

Koma I: Amed, Koma II: Reşit, Koma III: Huseyin, Koma IV: Merwan, Koma

V: Mahmûd , Koma VI: Efe, Koma VII: Eşref, Koma VIII: Nedim û Koma IX: Ferhat.

Girêsor, wê li welatparêz û temen mezinan mêze bike. Di vê rêxistinbûna nû de girse hat agahdarkirin. Ji girseyê ti bertekek derneket ango çênebû. Heta hinek sempatîzanan rewşê fam dikirin. Heta gelek mirov ji wan texmîn dikirin wê pergala komînê bidome, lê wê bi şêwazeke din bê rêxistinkirin. Bi vî rengî di qawûşa

33. de xebata komînê dîsa hat domandin. Ji bo tedbîrên komînê hatibûn girtin, lewra îhtîmala deşifrebûna wê jî ji holê rabûbû. Îsmetê maskotu yê ku şahiya qawûşê bû jî (bi axiftinên 10'ê Mijdarê bandor bibû) bi Necmî re ji komînê qut bibûn bi hev re cuda jiyan dikirin. Êdî mîna berê henek nedikir. Qawûşa 33. heta radeyekî şoqa axiftina 10'ê Mijdarê ser xwe avêtibûn.

Her çendî mîna bêrê jî nebe dîsa girtiyan hewl didan fêrî jiyana rojane bibin. Bi vê şoqê re him di qawûşa 33'an de him jî bi giştî di girtîgehê de îşkenceyê di asta herî jor de didin meşandin. Tuwalêtên qawûşa 33. her tim dihatin girtin û tevî hemû israrên girtiyan bi awayeke zanebûn ji hêla îdarê ve nedihat vekirin û ev jî wiha dikir ku qawûşa 33. di nava pîsî û qîrêjê de bimîne. Jixwe av jî gelek kêm û sordar didan. Heya li hûndirê qawûşan pîsîtiya tuwelêtan belav dikirin. Ev, ji bo qawûşa 33. cezayeke taybet bû. Di piştre serdegirtinên şevê jî hat despêkirin. Di demjimêreke şevê ku qet girtiyan bawer nedikirin de bi dehan gardiyan diketin hûndir bi jop û kalasan li girtiyan dixistin û wan ji xew şiyar dikirin. Bi lêdanên herî zêde re rû bi rû diman. Carna girtiyan mîna pez didanin ser hev îşkenceya ku jê re digotin Kocatepê li hemberî wan didan meşandin. Tenê şeveke ku destê xwe li girtiyan

nedaban nînbû. Dijmin ev jî hezim nekiribû û ew demjimêrên wan yên bêhnvedanê jî ji destê wan girtibûn, veguherandibûn îşkenceyê.

Ev aliyê meselê yê teslîmgirtina girtiyan ya yekem bû. Dijmin wê tenê bi teslîmgirtinê re sînordar nemîne. Bêguman wê bixwazibe wan fêkiyan jî kom bike. Îşkence û serê zextê wê bigehe pêşengan û wê bi awayeke bê rehm bi ser wan de biçin. Ji ber tevgereke ku pêşengên wan hatibin teslîmgirtin û tinekirin negengaze ku li ser lingan bimînin. Lê ev zext jî, wê ti astengiyên ku li pêşiya wê derbikeve bi xweşî nêz nebe; wê carekdin şerê şoreş û dij şoreşê bi awayeke bê rehm di arenayên girtîgehê de dest pê bikiriba. 10'ê Mijdarê, mirovê ku hinek ji siyasetê fam dike û xwedî naskirina taybetmendiyên dijmine wê bizanîba ev xebereke îşkencê ya duwemîn e û ji hemû îşkenceyên din yên heta niha hatin meşandin cudatir e. Yanê dijmin, wê ji girtiyên ku teslîm bûne re; poşmanî, devji doza xwe berdan, îtiraf û îxanet ferz bikiriba.

Di encam de parastinên ku di dargehan de ji aliyê girtiyan ve dihat kirin, di nav şert û mercên herî zahmet de xwedî derketina wan li gel û rêxistinê, parastina ramanên xwe, dijmin dixist nav tirs û xofekê. Dema ku kar weke ku dijmin dixwest nedimeşiya jî

dadgehên xwe didan rawestandin. Li ser şêwaza teslîmgirtina girtiyan lêhûrbûn dane destpêkirin, li gel îşkenceyan bi awayeke ku girtî li gor daxwazên wan îfadeyan bidin xebat dan meşandin û hewldan **xiyanetkarên** ku di girtîgehan de alîkarî bi polîtîkayên îdareyêre bibin alîkar derxînin.

Dibêjin ku; "hêzbûna rêveberiyeke girtîgehê dema ku di qawûşekê de hêjmara îspiyonkeran zêde be li wir xurtbûna ew rêveberî derdikeve holê." Lewra dema ku em di çarçoveya vê şîroveyê de li qawûşa 33'an mêze bikin, em bi yek gotinê dikarin bêjin; polîtikayên îdareyê vala ne. Yanê fiyasko ye. Ji ber tevî hemû hewldanên xwe nikarin di nava qawûşê de mirovên wisa derxînin. Beriya niha yên ku soz dabûn wan bikin nekiribûn, devji wan berdabûn. Ji ber vê sedemê, her ku biçe wê zextên li ser qawûşa 33. zêde bibe. Mafê mirovan yê jiyanê lewra mafê wan yê herî xwezayî ye.

Lê di Girtîgeha Amedê de bi qasî serê derziyê qala van mafan kirin negengaze. Mînak, heta bijişkên hipokrat yên sondxwarî meyzandina ku li lawiran dikirin li wan nedikirin. Jixwe yên rewşa wan lezgîn û biçûna nexweşxwanê tiştên di rê de bi serê wan dihat pir balkêş bû. Keşe yê ku di qawûşa 33. de dima ji bo çûyîna xwe ya nexweşxanê kêfxweş nebû. Halbikî

dema mirov diçe nexweşxanê divê mirov kêfxweş be ji ber ji êş û azarên xwe xilas dibe. Lê Keşe, dema tiştên di derbarê nexweşxanê de guhdar dikir nedixwest biçe. Lewra Keşe, nexwaze jî neçar bû biçe. Ji ber çûyîna nexweşxane formalîte jî be, ji hêla îdarê de biryara wê hatibû dayîn û wê biçûba. Bi alîkariya hevalên wî Keşe, heya ber derî birin. Çavên wî her li qawûşê bû. Ger ji wî re bihiştiban wê ti caran neçûba nexweşxanê. Gardiyan di kuna mazgalê re qîr kir got: “ Qawûşa 33. lêgerîn (arama) heye. Bila ti kes li hundir nemîne. Hêjmara dawî sê ye!”

Mîna ku girtî ji ber tofanê baz bidin li ber derî kom bûn, lewra hîn nû qantînên wan hatibûn û hîn komînker karên xwe yên belavkirinê xilas nekiribûn. Tiştên ku ji qantînê anîbûn hîn li erdê bûn û mîna her carê dîsa tiştên ku anîbûn wê di bin potînan de biperciqîban û biçûban. Lê ferman ferman bû. Tişta ku gardiyan digot nedihat nîqaşkirin. Dema ku got, “kom bibin!” neçarbûn kom bibin. Lê tişta îro ya hemû carên din derbas dikir, girtiyan birin maltaya qada dudan. Deriyên şebekê jî li ser wan girtin. Fermanên ku gardiyan dayî yek bi yek hat rêzkirin.

“Got, li ber dîwar bi awayeke zincîrê rêz bibin. Biçin hîzaya hev. Hema zû cil û bergên xwe ji xwe bikin.”

Girtî tenê bi kîlot man. Yek ji gardiyanan qîr kir û got:

“Mîna ji dayîka xwe çêbûne, mîna ji dayîka xwe, yanê hûn ê xwe ripîrût bikin!”

Girtiyan xwe tazî kirin. Di demseleke de ku peyîz bi pele ber bi zivistanê ve diçû, sarma jî hêdî hêdî xwe li bedana girtiyan dialand. Cil û bergên wan parçe parçe kirin. Bi behaneya qontrolkirinê cilan qet qetî kirin.

Dor hatibû cil û bergan. Ev car lêgerîn ne li ser cil û bergan bû, li ser bedena girtiyan bû. Çawûşê blokê got:

“Paşde vegerin!”

Her kes paşde vegeriya bi awayeke nîzamî li benda fermana çawûş man. Çawûş dîsa qêr kir got:

“Qûna xwe tazî kin ûlan.”

Qûna girtiyan yek yek qontrol kirin. Ev car jî fermaneke nû:

“Paşde vegerin!”

Ev car jî wê qontrola binceng û traşa etek bihatiba kirin. Çawûş hat li pêşiya girtiyek sekinî got.

“Tu çima traş nebûyî?”

Girtî:“Qomîtan ez traş bûme.”

“Kuro ma ev şêwaza kurkirinê ye? Kurkirina te kurkirina usulê Rusan e.

Wisa nabe, ji niha şûnde mîna usulê Tirkan bibî. Tu yê çawa bibî?”

“Ez ê mîna usulê Tirkan bibim qomîtan.”

Çawûş li gardiyan fitilî got, “ji min re çeqmaqek û hinek qaxiz bînin.”

Çawûş, çaqmaq û qaxiz da dest. Qaxeza ku agir pê ketî nêzî traşa etega zilam kir. Muyê ku dişewitî, dema çerm jî bi xwe re disotand, girtî dest bi qêrînê dikir.

“Ji niha û şûn de pêwîst nîne ne li gorî usulê Rusan ne jî li gorî usulê Tirkan traş bibî. Çawûş got, tu êdî ji kurkirinê xilas bûyî.”

Ev şêwaz li ser hemû girtiyên ku mûyên wan dirêj bûna didan bikaranîn. Gardiyan û çawûşên li hemberî van dîmen zewq digirtin bi hîqe hîq dikenin. Bi vê rewşa girtiyan şadibûn. Îşkence bi vê re jî bi dawî nedibû. Bi onura girtiyan jî dilîstin. Yek ji gardiyanan bang kir û got:

“Çawûşê min, çawûşê min ka were vir.

“Çawûş çibû!”

“Çawûşê min, li vir yekî sûnet nebûye heye. Îbne, dibêje ez bi şêwazê suneta peygamber hatime sunetkirin.”

Hemû gardiyan û çawûş çûn wî alî. Hemûyan jî sûnata pêxember meraq dikirin. Çawûş got:

“Tu yî yê ku sunetê pêxember kirî?” (peygamber sünnetli)

Girtî:

“Rast e qomîtan.”

“Kuro ev çawa dibe sûneta pêyxamber ? Zêde fam nabe. Ka serê wî mubarekî rake em temaşe bikin.”

Girtî, ev weke firsendekê dît bi serê penîsê xwe girt û hêdî hişk kir.

Çawûş got: “Kuro ka li îbne temaşe kin. Kuro ma tu yê me bixapînî? Çermê wî nebe jor kuro!

Hemû gardiyanan “mîna ku mal dîtibin” yek yek li kîrê girtî temaşe dikirin. Di wê kêliyê de çawûş Sihhiye yê ku di wir re derbas dibû bangî kirin. Jê re gotin; “ka profesor were li vî temaşek e. Te qet tiştek wisa dîtiye? Zilam dibêje ez pêxemberkî sûnet bûme.”

Çawûşê Sıhhiye got:

“Kuro berde wî. Ma tu yê sergiyê vekî? Te her kes li dora xwe kom kiriye.”

Li ser vê girtî, ket sekna xwe ya rawest kirê xwe yê bi destê xwe girtibû berda.

“Baş e kuro, s…m ha, ev çi sûneta pêyxemberi ye. Kuro tu qet sûnet nebûyî.”

Girtî nerazîbûna xwe da nîşan û got:

“Qomitan, bi rastî jî ez rast dibêjim. Hemû zilamên malbata me wisan in.”

Çawûş:

“Bêdeng be kuro, yan ez ê li te bidim!”

Girtiyan bi rewşa wan ya tazî bi lêdanê re derbas kirin. Bi lez û bez birin qawûşên wan. Dîmena li qawûşê jî êşek cuda bû. Her tişt belav kiribûn. Heya wê demê çanteyên wan yên ku li gel wan bûn parçe parçe kiribûn. Dema ku girtî ketin hûndir, li ber derî çanteyek dîtin.

Gardiyan got:

“Xwediyê vî çanteyî kî be bila neçe hûndir. Li wir bisekine!”

Xwediyê çante Salih bû. Ji ber girtî hemû bi tiştên xwe re mijûl bûn, lewra tiştên ku gardiyan gotin zêde guh nedanê. Gardiyan dîsa derî vekir.

Ferman da û got: “Bila yek-du kes bên vî îbneyî bibin hundir!

Girtî, çûn Salih ê ku li erdê dirêjkirîbû birin hundir. Dema ku Salih bi xwe hesa dîsa birin derve. Gardiyanan bi awayeke vekirî ev dipirsîn û digotin:

“Kuro ev çante yê te ye?”

“Rast e qomitan.”

“Di çanteyê te de meqesek derketiye. Tu tenê dikarî bi şartek derbikevî.

Ew jî ji niha û şûnde tiştên di qawûşê de diqewîmin ger tu ji me re bêjî tu yê xilas bibî.

Û him jî tu yê jiyan bikî. Yan na em ê te bikujin.”

Dema ku Salih ev bihîst, serê xwe li dîwar xist û ser hişê xwe çû.

Salih, gundiyek li ser xwe girs û tijî bû. Dema ku lêdan, zext û îşkence destpê dikir, wî jî bi rêbazên xwe yên gundîtî serî li hinek rê û rêbazan dida. Mîna ku ji lingê xwe yê çepê seqet be tevdigeriya û wisa li riyên ji perwerdê xilasbûnê digeriya. Ji ber ev rewşa xwe ya seqat lêdana herî kêm wî dixwar. Lê, mîna meseleya “papaz her carê girarê naxwe” rojek gardiyanek bangî wî kir û jê rê got.

“Tu çima dikulî?”

“Dema ez li dervebûm ji trektorê ketibûm. Wê demê lingê min seqet bû.”

“Baş e biçe ciyê xwe.”

Salih, zêde baldar tevnegeriya bû. Dema ku çû di milê çepê de dikulî. Dema ku dihat jî li ser milê rastê dikuliya. Bala gardiyan şikandibû. Li ser vê gardiyan carekdin bangî Salih kir û got:

“Ka were vir îbne, kîjan lingê te seqet e?”

“ Yê çepê qomitan.”

“ Kuro ma tu…zarokan, beriya niha te got yê rastê. Niha jî bû yê çepê?”

“Na qomîtan we şaş fam kiriye. Min got yê rastê.”

Piştî ku gardiyan lêda şûnde devjê berda çû. Dema ev textîkê Salih deşifre bû vê carê jî dest bi textîkeke din kir. Ev car jî di dema lêdanê de serê xwe li dîwar xistin bû. Dema ku dizanî wê lêdanê bixwe bi mîsogerî hema serê xwe li dîwar dida. Lê bi rastî ser hişê xwe diçû yan jî nûmare dikir ne hevalên wî dizanin ne jî gardiyanan.

Salîh bivî rengî ji lêdan xwarinê xilas dibû. Mijara meqesê ya herî dawî jî bi vî textîke jê xilas bibû.

“Êêê Keşe, tiştên te xwarin û vexwarin bila ji te re bimînin, tiştên ku te bihîstin û dîtine ji me re bêje. Muhmut gotinên xwe domand, ka bêje ev çend roj bûn tu li nexweşxanê bû, li nexweşxanê çi hebû, çi nebû?”

Merwan:

“Xwe têkilî Keşe yê min nekin. Hîn birînên wî sax nebûne.”

Hemû girtiyên li qawûşê li dora Keşe kom bibûn.

Ferhat got:

“A... derbasbûyî be, çû gel cihê Keşe rûnişt.

Piştre got:

“Li nexweşxanê çi hebû, çi nebû? Ka ji me re bêje.”

Keşe got:

“Ka biçin loo nexweşxaneya çî, halê çî? Nexweşxane ji vir xiraptir e. Dema ku min ji vir birin min hema razandin. Piştî pênç-şeş rojan jî emelyat kirin. Îbiş Vural yê ku ji qawûşan anîbû, ji qawûşa 18’ emin di rewşeke komayê de anîn. Piştî demek şûnde hat ser xwe. Min İbiş berê dinasî. Ji ber wê min her tiştî da ber çav û pê re axivîm.”

Mahmûd :

“Çima, ma axiftin qedexe bû?”

“Nekeve navberê topal. Ez ê piştre bêjim.”

Ferhat:

“Bila her kes li A....guhdar bike.”

Li ser vê Keşe, hîn bi cidî û baldartir axiftina xwe domand.“Dema ku qawûşa 18’ emin tenin cihê hevdîtinê di vegerê de yek ji gardiyanan ji Îbiş re dibêje “tu baş nemeşiyayî” û lê dide. Piştî vê lêdanê û şûnde Îbiş dikeve komayê. Piştre radikin nexweşxanê. Dema ku anîn di komayê de bû. Îbiş hema girtin bin çavdêriya bijîşkan. Piştî sê-pênç demjimêran şûnde birin qawûşê du leşker li ser serê wî bûn. Nedihiştin kes nêz bibe. Dema ku ber bi sibê ve bijîşkan Îbiş qontrol kirin, gotin miriye. Wisa derketin û çûn. Piştre hîn pênc deqîqe derbas nebibû cenazeyê Îbiş ji wir rakirin. Jixwe li nexweşxanê îşkenceyek di asta wehşiyetê de hebû. Piştî vê bûyerê û şûnde îşkence û wehşiyeta li ser me zêde kirin.

Digotin tiştên ku we dîtine ger hûn ji yekî/ê re bêjin wê dawiya we jî wisa bibe. Niha jî ez bêm ser pirsa Topal.

Bi giştî em nêzî hejde-bist kes bûn. Zêdeyî wan verem bûn. Ji bo ku em jî bi nexweşiya veremê bikevin di heman lalîkê de xwarin bi me didan xwarin. Xwarin gelek kêm bû. Girtiyên li kêleka hev rûniştibûn qedexebû bi hev re baxivin. Li hûndir li gel bijîşk gardiyanan her tim li me dixistin.

Jixwe dema ku hemşîre diketin hûndir gardiyan dîn û har dibûn, ji bo zilamtiya xwe bidin nîşan hemû şêwazên îşkenceyê li me dikirin. Ji serê sibê heya êvarê li ser cî bi awayeke nîzamî girtiyan xwe dirêj dikir pêwîst bû batanî heya qirikê bihatiba û serî wan ji dervebûya. Şêwaza dirêjkirina nizamî, diviya di sekna rawestî de bimabûna. Di kêliyên raketî de jî ger ku yekî sekna xwe ya rawestî xira bikiriba lewra lêdan amede bû. Çûyîna tuwelêtê destûr ji gardiyan xwestin mecbûriyetek bû. Bêguman ev jî karê wêrekiyê bû. Ji ber her yekî ku destura çûyîna tuwalêtê bigirtiba wê pê re jî lêdanê bixwariba û pêwîst bû lêdanê bidaba ber çav. Heta yên ku dikirin bin xwe jî hebûn."

Mahmûd :

"Keşe, ka rast bêje, te nekir bin xwe?"

"Na Topal, min nekir. Lê tu biçî bi mîsogerî tu yê bikî.

Vaye min ji te re rewş got. Te niha famkir Topal? Min xwe li ber van negirt. Her sibeh, min ji bijîşkan re digot "min ji nexweşxanê derxînin." Bi zorî û zehmetî hatim vir. Bi quran vir li gorî wir bûheşt e."

Piştî ku Ferhat bi baldariyeke zêde wî guhdar kir û şûnde, dûbare ji Keşe re got "derbasbûyî be" piştre ji

wir rabû çû. Lê yên ku belaya xwe li Keşe didan zêde bûn. Dema Ferhat jî çû vê car xwe hîn nêzî wî kirin û belaya xwe lê didan.

Mahmûd :

“Keşe, temaşeke ji serê sibê ve em li te guhdar dikin. Ferhat jî çû. Ka tu ji me re rast bêje. Te emelyata çi kir?”

“Ma ez ê direwan li te bikim? Ti mecbûriyeteke min nîne ku direwan li te bikim? Ger tu bawer nakî ez nîşanî te bikim.”

Mehmut got: “Tabî bawer dikim. Ma tu min qewîn (kavî)di hesibînî? ”

Bi destê Keşe girt got, “Amed, ka tu were lê temaşe bike. Bi awayeke baş qontrol bike.”

Keşe:

“Hevalno, nekin, şerm e. Ê welleh ez ê qîr bikim.”

Dema ku Keşe fam kir di navbera henekan de wê hevalên wî, wî bixin nava rewşeke nebaş got, “ loo ka bisekinin, yan na ez ê bangî Ferhat bikim. Wê derseke baş bide we,” her çendî Keşe van gotinan serf kiribe jî hevalên wî nedisekinîn.

Amed got: “Keşe, tu çûyî Mındıkoğlu:”

Keşe got: “Mındıkoğlu kî ye? Wellehî min yekî wisa nedîtiye.”

Dema ku hemû girtiyan dest bi ken kirin, Keşe jî kenî. Demsal zivistan bû, heya bêjî hewa cemidî bû. Betonê cemed girtibû, şebekeyan (parmakliklar) cemed girtibûn. Dema ku berfa meha kanûna 1982’an ket, girtî bi sala xwe ya par fikirîn, berxwedaniya xwe ya yekem, piştre her yek ji wan xwe di nava kaniyekî de dîtin û di dawî de jî li ber Gola Wanê kom dibûn. Piştre jî ew lêdana ku di rojên zehmet de xwarîn. Kêliyên xwe yên xweş bibîr anîn, bi awayeke biêş. Hevalekî wan, van rojan wisa bilêv kiribû: “Her roja ku îro tê jiyîn wê sibe bibe dîrok.” Di ferqa vê zanebûnê de bûn. Lê yên ku ne di ferqa vê têgihiştinê de bûn jî hebûn.

Rabûn

her yek ji aliyekê ve

Firîn

her yek ji aliyekê ve

Dema

Firdan

ketina rê

Şerkirnê ye

Dema zengilan lê da

Her yek ji riyek cuda

Her yek ber bi evîndariyek cuda ve

Derketin cuda ye

daketin diyar e

Şîfre hatiye dayîn

Di dema berbangê de

Divê hemû çemên duh biherikin îro

Çemên îro yên diherikin divê bigihêjin sibe

Roj rêber

Sermaye xweragirî

Heyîn berxwedan

Û kombûn

Di şer de bûyîn

Nebû pir cewazî

Nirxa yekê ji yê din

Hevşirîkiya jêpar

Di refên berxwedanê de

Di mîhenga meydanê de

Cih girtin bû ya resen

Qehreman û xayîn

Radestkar û berxwedêr

Merd û namerd

Gavek jê wirdetir

Gavek jê pêştir

Hevraziyek

Jan û zehmet

Ji hevraz ber jêr

Yekem gava çûyîna ber bi nemayînê

Lê jiyan bêrehm be jî didomiya. Pêvajo didomiya. Her çendî di ser berxwedanê re salek derbas bûbe jî berxwedanî bi şêwazên cur be cur didomiya. Mîna domandina jiyanê ya bi şêwazên cuda. Her roj mirovên nû dihatin. Girtî dihatin girtin, îdanemeyên wan dihatin xêzkirin û nivîsandin. Girtî li gel dadgehên K.T. yek jî di dadgehên çawûşan de dihatin darizandin. Ev dadgeh, hema di kêliyê de înfaz dikirin. Herî dawî dema ku îdanameyên Viranşehrê hatin, ji bo gardiyanan şahiyeke xweş ava bibû. Gardiyanên ku îdanemeyên Vîranşehrê dixwendin, yek bi yek bangî girtiyan dikirin û dadgeha wan pêk tanîn.

Herî zêde yên ku di îdanemeya wan de tê îdakirin ku têkilî îdayên kuştinê bûnê, ji bo wan ew dibû gûmanbarê herî baş. Gardiyanan di navbera salonên

qawûşa 33 û 32’an de maseyek û çend kursî danin, di navbera xwe de dozger, hakim û piştî peywirdarkirinên din kirin û şûnde gardiyanê mûbaşir bangî girtî ji qawûşê kir û got:

“Kuro bila Burhan bê, dadgeha wî heye.”

Qawûş, hemû şaşbûn. Ma di vê seateke şevê de dadgeh dibe? Lê gardiyan bi israr got:

“Kuro bila zû bê.”

Dema ku Burhan çû da ku tekmîlê bide, girtiyan çep rastê derî girtin. Axiftinên wan guhdar dikirin. Burhan di sekna rawest de li hember dadgeha çawûş rawestiya bû. Hakimê rûniştinê(duruşma hakimi)dadgehê vekir got: “ Kuro îdanemeya te hatiye. Em ê niha dadgeha te çêkin, dadgeheke cuda nînin. Dadgeha herî mezin ya me ye. Dadgehên din, piştî ya me tên. Beriya her tiştî ez vê jî ji te re bêjim: Li gel me direw nîne. Ger tu direw bikî tê wateya ku tu di riya pîsîtiyê de diçî. Kenan Evren bavê te jî be, wê nikaribe te xilas bike. Birêz dozger, fermo mafê axiftinê yê we ye.”

Dozger li çep, rastê xwe temaşe kir. Weke ku dadgehek dîrokî dike bi awayeke baldar li îdanemeya pêşberî xwe temaşe kir û got; “spas dikim.”

Ev îdayên ku beriya niha dozger ji bo Burhan amede kiribû bi cidiyeteke mezin xwend û got:

“Encax ger tu sucê xwe qebûl bikî û ji dadgehê re bibî alîkar, ji ber sucên te kirî tu poşmaniya xwe li hemberî dadgeha me raber bikî, em ê cezayê te kêm bikin. Lê na, ger tu înkar bikî û dadgeha me mujûl bikî, ez hema li gel pêkanîna înfaza te me. Tiştên ku ez bêjim ev çendin. Spas dikim.”

Heyeta dadgehê destpêkê di navbera xwe de axivîn çûn biryarekî. Çawûşê ku dadgehê dimeşand got:

“Kuro te tiştek bi me da jibîrkirin. Ev tenê sucê me nîne di heman demê de sucê te ye jî. Te çima negot destpêkê nasname tê xwendin?”

“Burhan tenê karî bêje qomîtan ez heya niha qet derneketime dadgehê.”

Çawûşê hâkim:

“Tu çawa derneketî yî. Kuro ma ya me ne dadgeh e?”

Yek ji endamên hakim got:

“Ya dev ji wan formîlîteyan berde. Jixwe dewlet her tim ji bo van formalîteyan wunda dike. Ka bêjê kuro navê te çî ye? Paşnavê te çî ye? Wiha hemûyan niha bêje.”

Girtî bersiva hemû pirsên ku jê re dihat kirin dida.

Çawûşê hâkim:

"Kuro baş guhdar bike. Tiştên ku dozger di derbarê te de gotin te bihîst. Tu yê niha ji me re çi bêjî?"

Burhan şaş û maşo mabû ku ka çi bêje. Hema wisa di cihê xwe de sekinîbû.

Hakimê dozê got:

"Ka bêje kuro ma te zimanê xwe xwar?"

"Qomitan, dîn û îmanê min hemû tiştên ku di wir de nivîsandî tiştên ku polîsan nivîsandine. Ez beşdarî ti bûyerê nebûme."

Piştî ku heyata dadgehê bi baldarî li Burhan guhdar kirin û şûnde, hakimê lêpirsînê got: "Yanê tu niha van îdiayan red dikî?"

"Qomîtan, bi xwedê û pêxember rast dibêjim."

"Kuro temaşeke, heya niha di dadgeha me ya pîroz de bi sedan yên mîna te, derbas bûne. Hemûyan kêmaniyên xwe yek bi yek qebûl kirin. Em zêde pêwîstî bi dirêjkirina dadgehê nabînin. Cara dawî dipirsim: Tu qebûl dikî an na?"

"Qomitan, bi xwedê ez rast dibêjim. Ma ez çawa bi we bidim bawerkirin."

"Wê demê gunehê te di stuyê te de."

Dozger:

“Tiştên ku min di derbarê gumanbar de gotî dûbare dikim.”

Dadgeh di navbera xwe de çûn biryarek û ceza diyar kirin:

1-Bi baldarû gûmanbar dirêjkirin û li her lingekî wî 30 kalas xistin.

2- Herdu lingên wî bi jor ve girêdan bi awayeke serberjêr du seatan hejandin.

3- Sê rojan xwarin nexwarin.

4 ji bona çar rojan bi nobeta ozirmê (tuwalet) bê cezakirin, bi dengdana hevbeş nivîsandina muzakereyê ya ji bo gardiyanê qawûş û alîkarê wî bîryar hatiye girtin.

Ya din jî ji hêla du erkdaran ve bila înfaza sucê wî bînin cî. Gumanbar bibin, niha jî dora gumanbarê dine, bînin.”

Mûbaşir careke din deriyê kuna mazgalê vekir, bang kir got:

“Bila Hesîb bê dadgeha wî heye.”

Ji aliyekî ve dadgeha çawûşan dema dadgeha Hesîb dimeşandin, ji aliyê din ve jî dengê qêrînên Burhan dihat.

Xalê Mehmet, arê xwe li bêjingê kiriye, bêjinga xwe bi dîwar ve kiriye û welatparêzeke dewrandîtî ye. Dixwest jiyanê her tim bi aliyên wê yên xweş bibîne. Niha jî dixwest hawirdora xwe zindî bike. Bi rêzdarî û heskirineke mezin ve girêdayî şoreşgeran bû. Ji ber sedema gotara (Demeç)ku dabû heyeta ji Avrupa hatibû, ew jî hatibû girtin. Wê rojê xwestibû tiştên di welatê wî de diqewimin bi gotarekê ji mafê mirovan û saziyên demokratik yên Avrupa re ragihîne. Di qawûşê de li gel şoreşgeran mayîn aciz nedibû, berevajiyê vê gelek kêfxweş dibû. Yek ji hobiyên xalê Mehmet jî xwendina îdanemeyan bû. Bêîstisna îdanemeyên hemû koman dixwend.

Xalê Mehmet hemşeriyê Amed bû û ji mêj ve hevdu nasdikirin. Ji ber wê jî navbera wan xweş û bi hev re samîmîbûn. Di roja destpêkê de ku hatibû qawûşê hema her tiştî fam kiribû û ji Amed re ragihandibû û jê re gotibû:

“Hemşerî, tu wisa mêze neke ku ez yekî wisa safim. Di qawûşê de, kî di nava jiyana şoreşgerî de ye kî ne tê de ye baş dizanim. Di nava van mercan de ji derveyî we ev jiyan di nava kesî de nîne. Ez li bendê me ku hûn ji min re pêşniyar bikin. Lê ez maf jî didim we. Ger ku hûn qebûl bikin dixwazim mîna welatparêzekî di nava

komîna we de cî bigirim. Bi ti awayî nefikirin ku ji bo rewşa min ya madî nebaşe ji ber wê dibêjim. Berevajî tabî ez pesnê xwe jî nedim, lê rewşa min gayet baş e. Jixwe tu van tiştan baş dizanî.

Beriya niha evên ku bi hev re xwarin dixwin yên DDKD'yî tu wan dibîni, wiha wan teklîfî min kirin ku bi wan re jiyan bikim. Min jî ji wan pirsî û got, ma hûn çawa jiyan dikin? Bersiva ku min girtî, mîna ku tu jî dizanî, jiyana wan ji yên ku tiştên ji wan re tên gotin hema di cî de pêk tînine. Min jî ji wan re got hûn vê jiyana xwe bidomînin lê jiyana we ne li gorî min e. Êê, ez serê te neyêşînim. Bêm ser mijara bingehîn. Pêşniyara min ji we re ev e: Ez jî dixwazim beriya ku direng bikevim di nava jiyana we ya şoreşgerî de cî bigirim. Êdî hûn çawa guncav dibînin wisa bikin. Ger ku hûn min qebûl bikin bi rastî jî ez ê gelek kêfxweş bibim."

Bi destura Ferhat xalê Mehmet jî di nava jiyana komînê de cî girt, dema ku girtiyan ev agahî danê mîna ku cîhan hemû bûbe ya wî kêfxweş bû. Wî, dîsa karê xwe yê xwendina îdanemeyan li qawûşê domand. Dema ku ev kir, hat birê ku îdanameyan bîne baremberî hev. Îdanameyên dozên PKK'ê û yên KUK'ê anî ber hev.

“Ez ê, li îdanameyan temeşe bikim û wisa biryar bidim ku kîjanî şoreşgerin kîjanê ne yên şoreşgeran in. Her çendî ev îdaneme aliyê dijber amede kiribin jî di nava meseleyê de rastiyek hebû. Bûyerên ku yên PKK’yî beşdar bûne bûyerên polîs, ajan, mamur û hwd. dibêjin yên KUK’yan jî herî zêde li Apoyiyan xistine.”

Xalê Mehmet jî mîna ku tiştek pir giring keşif kiribe ji her kesî re digot:

“Tişta herî zêde li ecêba min diçû, polîsê ku li Amedê kuştin yanê Hamdî Ozipek, ev polîs ji bo têkbirina KUK’ê hatibû erkdarkirin. Û zilamekî pir girîng bû. Lê di seatên ku Apoyiyan wî ji holê radikir, KUK’ çiyan jî li Dagkapi gêrîlayek şehîd dikirin.”

Xalê Mehmet jî ji bo belaya xwe li KUK’ çiyan bide car caran diçû gel wan. Ji ber keseke sohbet xweş bû lewra ne KUK’ çî û ne jî ti komêndin jê aciz û teng nedibûn. Wî jî tiştên di dilê xwe de sîngvekirî digot.

Xalê Mehmet got: “Rastî hûn rojek yanê diyar nabe, mêze bikin serê K.T. tevlîhev bû û hûn ber bi îdamê ve birin wê demê dê rewşa we çawa be?”

Yek ji KUK’yan got:

“Ma xalo wê çawa bibe, canê te saxbe. Em ê jî mîna her kesî ta li qiraka xwe girê bidin.”

“Baş e gumana min ji vê nîne, lê ji bo kuştina şoreşgerek hûn biçin mirina gelo hûn ê çi bêjin?” Baş e, ji wê gumana min nîne, lê hûn ê bi kuştina şoreşgerekê ji çûyîna sêdarê re çi bêjin?”

Yên KUK’çî carek sekinin li hev û du temaşe kirin.

“Welle birazayên min, min îdanameya we hemûyan xwend, pêwîstî bi bêdengiyê nîne. Bi awayeke vekirî hûn bikar anîne. Ji ber çalekiyeke we tenê jî li hember K.T nîne. Ez bi vî temen û mejî ve dikarim vê rastiyê bibînim. Him jî hûn pir xirap hatine bikaranîn. Hûn hemû ji bo kuştina şoreşgeran li vir in. Ka li îdanameyên Apoyiyan temaşe bikin û bi çavên xwe bibînin. Wan li polîs, ajan û askeran xistine. Sibe dusibê biçin ber benê îdamê jî wê demê wê dîsa sloganên xwe bavêjin û pehîna xwe li kursiyê di bin lingên xwe de bidin. Lê hûn ê çi bikin?

Hûn ê hema wisa biponijin?”

Piştî ku xalê Mehmet hemû nerînên xwe yên di derbarê wan de danî holê û şûnde dît ku hewaya nîqaşê hat guhertin, piştre pirsî got:

“Kî we girtiye?

KUK’çî got:

“‘Xalo ma pirsa te jî kirî pirse, bêguman dewletê em girtine.”

“Na birazayên min ez wê nabêjim. Dixwazim bêjim kîjan polîs, kîjan ekîba polîsan.”

KUK’ çiyan hemûyab bi hev re gotin:

“Hamdi Özipek û ekîba wî.”

“Ya we dît? Ez jî vê dixwazim. Baş e, kê li Hamdi Özipek xist?”

Dîsa bêdengiyek çêbû û Xalê Mehmet ji gel wan rabû çû.

Xalê Mehmet ji gel KUK’ çiyan rabû çû, piştî ji gel wan rabû, hat gel hemşeriyê xwe Amed:

“Merhaba xwarzî, tu çi dikî?”

Amed li xwe zivirî got: “Silav Xalo ka were rûne.”

“Rûniştinê ez ê rûnim, tu piştî kêliyeke din tu li gurmîniya wir temaşe bike.”

“Çibû xalo?”

“Welle tişteke li min nehatiye. Xwezka min îdanameya wan KUK’çî yan nexwendiba. Bawer bike dilê min derket.”

“Heya niha bi wan re tu di derbarê îdanamê de diaxivî?”

“Heee.”

“Devjê berde xalo, me ji zû de wan tiştan ji bîr kiriye. Şoreşger kînê nagirin.”

“Tu were ji min re bêje. Min bûyeran yek yek li rûyê wan da. Tevî vê jî dilê min aram nebû.”

“Xwezka te ev nekiriba, zilam jixwe di tengasiyê de ne. Jiyana xwe zehmet bi hev re derbas dikin.”

“Naa ev erka min ya şoreşgeriyê ye.”

Dema ku Xalê Mehmet û Amed bi hev re nîqaş dikirin ji koşa ku KUK’çî lê bûn deng hat. Piştre bi pehîn û mistan ketin nava hev. Girtiyên qawûşê ev mîna nîqaşên her carê yên di nava wan de derdiketin girtin dest. Lê ev car rewş cidî bû. Girtî ketin navberê wan ji hev û du vekirin.

Qawûşê pevçûna wan dabûn sekinandin û her yek ji KUK’ çiyan biribûn koşeyeke qawûşê. Lê Hadî hîn bi hêrs bû. Qîre qîr dikir û got:

“Bênamûsan, we em bikar anîn, we berê me da ser Apoyiyan. We ji zilaman re got ajan. Her yek ji me bû qatîlê şoreşgerekî. Piştre jî hûn dibêjin ax û wax. Divê ev hemû bên kuştin.” Yên li dora wî hewl didan wî aram bikin. Piştî vê bûyerê û şûnde şeş kesên KUK’çî bi awayeke du kesî sê kesî bi hev re tevgeriyan.Yanê bi

awayeke sê kom belav bûn. Her yek ji wan yekî nêzî xwe girt gel xwe û bi yekî nêzî xwe re xwarina xwe xwarin...

"Qawûşa 33. bila her kes pênûs û lênûsên xwe amede bikin. Ez ê we di ezbûnê re derbas bikim!"

Yê ku vê digot ne mamosteyê dibistaneke seretayî, ne xoceyê dibistaneke amedeyî ne jî profesoreke amedeyî bû. Belkî gundiyeke belengaz yê xwendin û nivîsandina wî tineye, belkî jî xwendeyeke ji der ve dixwîne bû. Şansê wî yawer çûbû, ji bo girtîgeha Amedê ya Nolu 1 mîna gardiyan hatibû. Tewr yek jî dema bû fermandarê 140 kesan, êdî kesî nedikarî wî zeft bike. Niha jî wê girtiyan di ezbûna îlke û înqilabên Ataturk re derbas kiriba:

"Temaşekin kuro, bila her kes navê xwe, başnavê xwe li milê qaxezê yê çepê binivîsîne. Bila kes ji kesê qopya nekişîne. Ger ku bersiv mîna hev bin ez ê we s……me. Ez hema fam dikim. Kes nikare bi min bide xwarin. Ka berpirsyar bîne 'îlkel û înqilaban.' (gardiyan di asteke wisa paşketî de bû ku ji peyva îlke re digot îlkel)"

Beriya mehan ev pirtûk ji girtiyan re hatibû dayîn. Hemû girtî êdî ev pirtûkê ji ber kiribûn û dizanin. Ji ber hêjmara zêde ya perwerdê li ser vê pirtûkê hatibû

dayîn. Girtiyek riste riste dixwend, yên din jî lê vedigerandin. Di nava deh deqîqeyan de hemûyan pirsên li ser qaxezê bersivandin û dan gardiyan. Piştre di nava wexteke kêm de, ji bo encama ezmûnan ragihînin çend gardiyan ketin hûndir.

“Gotin birokrat kî ye? Bila zû derkeve pêş.”

“ Birokrat Mardin, emirke qomitan.”

Gardiyan:

“Kuro nûtik te çima rast bersiva pirsan nedaye?”

“Min daye qomitan.”

“Bêdeng be kuro, ma tu yê me bixapînî? Tu dizanî cezayê bersiva rast nedayîn çendî zêde ye?”

“Lê qomitan, min rast bersiv daye.”

“De biçe fêris, guya bersiva rast daye. Tiştên xwe kom bike tu diçî hûcrê.”

Onbaşiyê ku dît ku Birokrat diçe daku tiştên xwe bîne got:

“Pêwîstî bi tiştan nake. Li ser çîmentoya sar rakeve bila aqilê te bê serê te.”

Bûrokrat ji qawûşê derxistin û birin. Piştre hêjmareke zêde gardiyan ketin hûndir û gotin:

“Hemû şebekeyên berê wan li derve wê bi reng û şeklê ala Tirkan bê sebixandin. Ji niha û şûnde wê şebeke her tim girtîbin. Kuneke biçûk jî wê vekirî nemîne.”

Beriya niha ji girtiyan re boyax rûn û firçe anîbûn. Şablonên Yasîn yên amede jî hebûn. Ev ferman hema hate cî. Piştî ku şebeke hatin girtin û şûnde, bîna tuwelêtên xitîmî li hemû qawûşê belav bû. Êdî ti cudahiyeke qawûşê ji tuwalêtê nebû. Girtî mîna karkerên ku di bin ocaxa madenê de mayîn li hev û du temaşe dikirin digotin: “Gelo em ê bikaribin çiqas li hember vî pîsatî û bînê bisekinin?” Keseke ji wan nedikarîn bersiveke ji vê pirsê re bibîne. Jixwe nedikarin bibînin jî. Îdarê jî nedikarî xwe li ber ev bîna pîsatiyê bigire. Dema dihatin lêdan dikirin yan jî kareke wan li wir çêdibû hema dixwestin zû biçin.

Ji vê hêlê ve qawûşa 33. dişibiya girava cuzamliyan. Îdarê bi awayeke vekirî û zelal digot: “ Ancex hûn dikarin mehek li hember vê bêhewayî li ber xwe bidin. Di demeke nêz de hûn ê hemû bi veremê bikevin. Digotin wê nexweşiyên wisa derbikevin holê ku wê tip jî şaş bimîne.” Ev rastî wê piştî mehek û mehek niv xwe bide nîşan. Nêzî deh girtî bi nexweşiya veremê ketin. Bûrokrat yê ku ew demek bû biribûn anîn qawûşê. Li

ser şopa îşkenceyeke cidî nînbû. Lê diyar bû gelek tirsabû. Dema ku hevalên xwe didît bi ken li wan temaşe dikir. Di qawûşê de bibû çandek; dema yek ji qawûşê vediqeta yan jî dibirin şûnek, hemû girtî li ser serê wî kom dibûn dest bi pirsyaran dikirin:

"Êêê, çibû, çi ji te kirin? Ezmûna te baş derbas bû?"

Yê ku mûxatabê van pirsan bû dest bi çîroka xwe dikir. Kesê zêde tiştek ji hev nediveşart. Bûroktat ji gundeke deştê kurê meleyeke welatparêz bû. Bavê wî bi salan bû ji nêz ve bi pêşkeftinên li Başurê Kurdistanê re eleqedar dibû. Zarokên wî jî ev taybetmendiyên wî girtibûn. Bûrokrat jî dema gihişt dibistana amedeyî naskirina wî ji fikrê şoreşgeran re çêbibû û xwe di nava xebatê de dîtibû. Di warê taybetmendî girtinê de zêde ser bavê xwe de nediçû. Pir zû teng dibû û ev tengbûna wî jî pir zû derbas dibû. Lê dema şartêlên sinirê wî lê didan, tiştek li pêşiya xwe nedidît û tiştek nasnedikir. Li pêş wî çî heba dişkand, dirijand.

Kêliya ku çavên wî nebaş dibû berçavk bikar tanî. Dema nedikarî tiştek bike berçavka xwe derdixist parçe parçe dikir. Lê dema hinek vedihesiya xemgîn dibû, lêborîna xwe dixwest û hewl dida berçavek bigire û tiştên şkandî tamîr bike. Her çendî Bûrokrat xwedî fikrê şoreşgeriyê jî be, lê hîn nehatibû asta ku di xwe

de şoreşê bide çêkirin. Ji aliyekî ve hîn mîna kurê bavê xwe yê nesekinî bû. Lewra piştî axiftina 10’ê Mijdarê û şûnde zêde bandor bibû. Lê ji ber Ferhat him wî û him jî malbata wî ji nêz ve dinasî pê re alîkar dibû û di demeke kin de xwe komî ser hev dikir. Her çendî nêzîkatiyên Bûrokrat yên zaroktî hebe jî bi heman safbûnê girêdayî rêxistinê jî bû. Ji ber vê sedemê jî ji hevalên xwe, bi taybet hevalên ku nêzî xwe didît tiştekî xwe ji wan nediveşart. Ji ber vê çend roj bûn ji qawûşê dûr mabû lewre gelek xemgîn bibû. Dema ku hevalên xwe ji nû de dît bi kêfxweşiyeke mezin tiştên ku bi serê wî hatibûn got. Serê xwe dibir û tanî, mîna ku çavên wî veguherîbe çanaxa xwînê digot, “yaw ka li îbne temaşekin, hindik mabû min bixwe.”

Ferhat got:

“Aram be M...kî ye ev zalimê ku tu jê re xebera didî? Ka destpêkê bêje em guhdar bikin, piştre tu dikarî xebaran jê re bikî.”

Birokrat:

“Herî baş ez di destpêkê de ji we re bêjim. Dema ku min ji qawûşê birin hema min birin 37’an.

Qada 3 hûcreya 5’emin a ku Halef Çarpar tê de dima. Ji ber ku min Halef li derve dinasî destpêkê ez gelek

kêfxweş bûm. Me qala bîranînên xwe kir û bi vî rengî nîqaşa me germ bû. Me her qala bîranînên xwe yên derve dikir. Hûn dizanin Halef di dadgehê de rêxistin parast. Hinek jî ji ber wê min baweriya xwe pê anî. Di navberekî de ji min pirsî got, "bi rastî te çima anîne hûcreyê?" Min jî jê re got "ger rastiyê bixwazî ez jî nizanim." "Serê sibê gardiyanek hat qawûşa me. Ji bo Îlke û înqilabên Ataturk nivîskî ezmûn bi me da kirin. Qaşo min xelet bersiv daye. Wiha ji bo vê min anîne vir."

Wî jî ji min re got; "dev jê berde, di qawûşê de yekî îxbara min jî kir." Dema ku me wisa nîqaş dikir min jî rewşa qawûşa wan jê pirsî. Wî jî her pirsa meseleyên me yên derbasbûyî ji min dikir. Bi ti awayî qala qawûşê nedikir, wiha li ser vê ez jê ketim gumanan. Ez teng bûm. "Min jê re got tu yê çi bikî, jixwe kes li ser te îfade nade." Ji min re got, "bi rastî jî tu rast dibêjî yê min jî tenê mereq e.

Ez ê tenê tiştek din ji te pirs bikim. Ji ber tu ji min baştir dinasî û dizanî. Ew Akîf Yilmaz tê bîra te? Carek hat Mêrdînê. Bi rastî ji bo çi hatibû? Dema ku got ger nehatiba girtin wê feydeya wî gelek ji tevgerê re çêbibûba," êdî ez bi temamî jê ketim şikê. "Kuro ma ez ji ku dizanim ji bo çi hatibû? Tu van tiştane ji kî derê

derdixî. Yek jî ez Akif Yilmaz nanasim. Her tişt mereqkirin rast nîne. Te jî pê girtiye ka Akif Yilmaz hatibû Mêrdînê, wê çi bikiriba, bi kêre dixebitî? Gelek pirsên din ku ti eleqeya xwe bi me re nîne dipirsî?" Wiha li ser vê Halef ji bo gumanên min jê çênebin got, "ne ya, bawer bike tenê ji bo dema me derbas bibe wisa daxivim." Lê roja duyem bi temamî ez ji Halef ketim gumanê. Hemû pirsên ku ji min dikir ez destpêkê difikirim piştre min bersiv dida. Li ser vê ez gelek pê re axivîm. Vê sibe gardiyan hat ji min re got cezayê te xilas bûye. Dema ku ez ji hûcreyê derketim min hemû pereyê li ser xwe û pêlava xwe ji Halef re hêla.

Lê ger ez şiyar tevnegerîban bi rastî jî wê min bixistiba. Gelek jî hewldan da. Wiha çîroka min ya hûcreyê ya bi Halef re bi vî rengî bû. Dema ku Bûrokrat axiftinên xwe xilas kir, hevalên wî belav bûn û her yek ji hêla xwe ve şiroveyek dikir. Ji ber heya hingê Halef di dadgehan de rêxistin diparast. Heta hinek hevalan ji Bûrokrat re gotin: "Gumankirina te ji wî dilwasiye. Zilam parastinê dike te vê ji kî derê derxist? Hevalê me ye. Çend pirsan ji te kiriye tu jî hema jê ketî gumanê. Li hember rabûn û ji Bûrokrat re gotin ev waswasiya di hûndirê te de ye."

Bûrokrat li hember vê got:

“Xwezka ez xelet bûma, herî kêm wê pêlava min vale neçûba.”

## Beşa Pêncemîn:

Birsîbûn xirab e, feqîrî xirab e, lê tiştek ji stuyê xwe tewandinê xiraptir nîne. Dibe xirabiyên hîn zêdetir yên van xirabiyan jî hebe di girtîgeha Amedê de. Peyva "xirab" wê bi cil-berg bimîne.

Carna dibe goreke bêdeng, carnan jî dibe cehnema ku bi sedan orkestra ava kirî. Li hemberî êş, zextên herî dijwar û bi qasî wê jî serî rakirineke bi onur, lewra diyar dibe ku dê bi xwe re berxwedanê bîne. Di girtîgehê de roj berveçûyîna rojên xirab dida nîşan. Di koşeyeke vê girtîgehê de tezgehên îşkenceyê ava bibûn, îşkencekar mirovên ji rêzê yanê ji bo wan xizmetê di îşkencekirina mirovan de bikin dîtibûn.

Carna hevalên xwe yên bi salan ku bi hev re mabûn didan ber lêpirsînê, carna jî van kesan di derbarê şoreşgereke ku nasnakin de agahiyan kom dikirin. Kesayetên lewaz ji bo kirina her tiştî amede bûn. Tenê bila hestiyeke kêm bavêjin pêşiya wan. Tenê serî zextê bigehe wan. Ocaxa îxanetê bêyî qawûşa 38'an ava bike di qawûşa 40'î de gunehên xwe anî dinê. Êdî îtîrafkar, yên poşman bûyîn, xiyanetkar û bi yek gotinê kesên dijşoreş aliyên xwe diyar kiribûn, li gel hev cî bibûn. Dema ku bi îradê re dibûn alîkar di warê meşadina

polîtîka û sepandinê de jî alîkariyên xwe kêm nedikirin. Girtiyan di bin zextan de hiştin, mîna ku azadiya wan be. Îdarê jî her serî kêliyekî dişidant videyên xwe yên îşkenceyê.

Teslîmkarî, mîna mîsala hespê serê xwe rakiribû têr-tijî diçû. Ev kêliya wî ya herî bilez dikir bû. Yanê îşkence di zîrveya herî jor de ya ku ber bi jêr ve diçû de bû. Ji vir şûnde yan mirad e, yan jî efûyek e… Li hemberî zext, îşkence û hemû zoriyan înat, qawûşa 33. salên derbasbûyî ji bîr nekiribû di nava tarîtiya wê girtîgehê de, dixwestin bi agirê Newrozê ku ji germahiya çakuçê Kawa derdiket û agir bi beriyeke dixwest germ bibin. Di şeva 21'ê Adarê de dema ku gardiyan hêjmarê digire û şûnde asteymen got:

“Piştî pênc deqîqeyan û şûnde ji derveyî nobedaran bila kes li ser lingan nemîne. Ger ez yekî li ser lingan bibînim an…i s…m.” Piştî vê tehdîtê, xebaran û şûnde derketin û çûn. Diyar bû ku hîn ji girtiyan ditirsiyan. Dema ku girtî çûn beşa razanê, bêyî ku pakî ji van tehdît û dijûnan bikin agirê kevneşopiya Newrozê ku sedsal di sere derbas bûye bi pêxistina parçeyeke rojnameya kevin pîroz kirin.

Weke ku hemû li pişt wî bûn li derdora cihê Ferhat kom bûn. Ferhat destpêkê axiftina giringî û wateya

Newrozê kir. Di nav de jî mijar anî ser rewşa ku di nav de bûn. Vê jî bi awayeke dûv û dirêj ji hevalên xwe re vegot.

Eşref got:

“Hevalno, ger hûn bixwazin hez dikim du helbestan ji we re bixwînim.” Piştî ku xwendina Eşref a helbestan xilas bû şûnde çend girtiyan jî hinek stran gotin. Heya nivê şevê nîqaş kirin û Newrozê pîroz kirin... Dema ku ji der ve hewaya biharê dihat, girtiyan di cihê hewakêşanê de perwerde didîtin. Ji bo girtî ji lêdanên jopên gardiyanan xilas bibin hewl didan hemû tiştên ku gardiyan dibêje pêk bînin. Dema ku lingê 140 kesî di carek de ji ser beton radibû û bi erdê diket dengeke ecayîp derdiket. Dest û dev jî di yek tempoyê de bûn. Bi vebûna deriyê cihê hewagirtinê re, awirên çavan dirêjî derî bûn. Dîsa yê ku hatî rûyê ew celadê pîs yê Esat Oktay bû. Gardiyan bi hemû hêza xwe ya deng qêrkir û got; “ dîqat!” Li ser vê fermanê girtî hemû di cihê xwe de mîna ku rih li ser wan nemabe sekinin. Li cihê hewakêşanê dengekî herî biçûk jî dernediket. Di encama îşkenceya perwerdeya ku hatî dayîn de li ser eniya girtiyan dilopên xwêdanê çêbibûn. Her sekin mîna kêrekê bû. Neçarbûn ku li cihê yûzbaşî lê dimîne temaşe bikin. Esat Oktay, mîna tacîrê koleyan ku di

bazara hêsîran de bigere çavên xwe li ser girtiyan digerand û li qaxezên di destê xwe de temaşe kir got:

“Ferhat Kurtay.”

Ferhat:

“Ez li virim qomitan.”

Ji rêza meşê du gav derket pêş tekmîl da:

“Ferhat Kurtay, Mêrdin, emirke qomitan.”

Yûzbaşı, bêyî ku pozîsyona xwe xira bike bi ew kenê xwe yê sexte ji serî heya lingê Ferhat temaşe kir. Piştre li girtiyan vegeriya û bi helwesteke hişk got:

“Baş guhdarî min bikin!” Bi tiliya xwe Ferhat da nîşan û axiftinên xwe domand:

“Ka temaşeke demekî Ferhat Kurtay tu yî. Hindik mabû tu yê derbiketiba. Ev zilamê ku hûn dibinîn zilamek wisa ji rêzê nîne. Berpirsyarê PKK’ê yê eyaleta Amed, Mêrdin û Sêrtê ye. Wiha ger ez nebûma ev zilam wê dest û lingê xwe hejandiba ji vir derbiketiba biçûba.

Zarokîno, vî û yên mîna vî binasin. Hûn yên belengaz jî dê di girtîgehan de birizin. Ma dibe tiştek wisa? Bêguman nabe. Ez ê bi ti awayî destûr ji vê re nedim. Ez ê destur nedim xayînên welat ji vir sax derkevin. Ez, dixwazim hûn ji vir derbikevin. Lê ev û yên mîna wî ez ê li vir bidim rizandin. Êdî tişteke yê wan nemaye.

‘Digotin Kemal Pîr’ wî jî îtiraf kir. ‘Digotin Xeyrî Durmuş’ wî jî îtîraf kir.”

Yûzbaşî hinek kenî. Cardin li Ferhat temeşe kir:

“Ka temaşe kin, ez bawer nakim, hindik mabû, bi rastî jî wê tehliye bibûba û biçûba… Ev demek dirêje me hev nedîtiye. Hinek karên min hebû. Lê çi dibe bila bibe, kî dibe bila bibe, werin gel min, tiştên ku we kirine bi wêrekî bêjin. Ez ê we xilas bikim. Li vir ji derveyî min keseke din nikare we xilas bike. Baş bifikirin ez ê dîsa bêm we bibînim. Heya wê demê biryara xwe bidin.”

Û Esat Oktay bi cewrikên xwe re ku mîna kûçikan digeriyan derketin çûn. Mîna ku weke her carê dikir dema derdiket tiliya xwe li derî dixist û digot, “kurê min bila zarok behna xwe vedin!” Girtiyan wateya gotina îstirehetê baş dizanin. Hîn çend deqîqe derbas nebibû nêzî pazde gardiyan ketin hûndir. Di destê wan de jop, kalas û aletên îşkenceyê yên cur be cur êrîşê ser girtiyan kirin. Navend bû mîna ku ga bikeve nava bostanê gulan lê hat.

Girtî her yek li cihê xwe nale nal dikirin. Dîsa yên ku hinek dikarîn li ser lingan bimînin, hevalên xwe yên ku ser hişê xwe çûbûn dianîn qawûşê. Ji van hevalan rewşa Hesîb xirap bû. Berpirsyarê qawûşê neçar bû ev

rewşa lezgîn ji gardiyan re ragihîne. Hesîb li erdê digevizî mîna ku henaseya xwe ya dawî bide lê hatibû. Herdu tiliyên xwe yên destê rastê vekiribû, îşareta zaferê dikir û digot“Bimire Faşîzim, Bimire…” Wiha di wê kêliyê de komek gardiyan ketin hûndir. Dema ku Hesîb ferq kir ku gardiyan hatin ev car berevajiyê tiştên beriya niha digot dest bi duayan kir û hemû duayên ku dihatin zanîn û nedihatin zanin rêz kir.

“Ay dayê, ay dayê ez dimirim, xwudayê min min xilas bike û digot eşhedû enla îlela…” Eşref li ber serê wî sekinî bû, dema ku van tiştan bihîst aciz bû. Eşref bi kurdî û bi awayeke ku gardiyan nebihîsin pehînek hêdî lê da got, “kuro bêdeng be, beriya kêliyekî te digot bimire faşîzim, niha jî tu li ber wan digerî?” Dema ku çawûş Sihhi derziyek lê da gardiyan derketin û çûn. Dîsa girtî bi serê xwe bûn. Tiştên ku yûzbaşî ji bo Ferhat gotî li ser difikirîn û di navbera xwe de şirove dikirin.

Diyar bû yekî îxbar kiriye. Evê ku îxbar kiriye jî texmin dikirin ku ne keseke ji rêzê ye.

Ednan:

“Bira, gelo kî ye ev zilam?”

Ferhat got: “Kîjan zilam Ednan?”

“Ew zilamê ku ev îtiraf kirî.”

“Ma ez ji ku dizanim birayê min? Le weke ku Merwan jî dibêje yekî kiriye lê kî?”

Amed:

“Bira yê ku ev pozisyona te dizane çend kes li vir hene?” Ferhat

Hinek bi ken:

“Gelek heval hene.”

Her kesî li gorî xwe şîroveyek dikir û ji hinekan diketin gumanê. Lê kesî ev gumana xwe dernedixist derve.

Amed, bi dengeke hêdî ji Ednan re got:

“Bibe nebe ev Yıldırım Merkit e.”

Ednan:

“Tu ji kî derê gihiştî vê encamê?”

“Ez ji kî derê gihiştimê? Ji hemû helwestên wî yên di girtîgeh û dadgehan de.”

Eşrefê ku li wan guhdar dikir got:

“Pêwîst nake hûn wisa pist pirst bikin, dengê we hat min jî. Ger hûn rastiyê bixwazin ez jî ji wî ketim gumanê.”

Hîn axiftin û piste pista wan neqedîbû. Her kes duçûn ser cihê xwe…

Amed pirsî û got: “Evên çûne dadgehê li kî derê man? Hindik mayê hêjmar bê girtin.”

Merwan bersiv da:

“Bawer im pêşkeftinên girîng hene ku dereng mane.”

Dema ku Amed û Merwan van tiştan diaxivîn deriyê qawûşê vebû. Destpêkê Îskan, piştre girtiyên din ketin hûndir. Girtî ji her carê zêdetir hinek din bi meraq nêzî hevalên xwe yên ku çûbûn dadgehê bûn.

Pirsîn û gotin: “Li dadgehê çibû? Hûn çima wisa direng hatin? Keseke ji 35’an hatibûn hebûn?”

Yên ku ji dadgehê hatibûn xemgîn, westiyayî û bêhal bûn. Mîna ku her yekî li ser pişta xwe çiyayek dikişand. Devê wan zûwa bibû, zimanê wan bi şikefta devê wan ve zeliqîbû. Ev, ne ji bê avî ne jî ji westandinê bû. Agahiya kelecana di hafizeya wan de wan tirsandibû, zimanê wan şikefta devê wan zûwa kiribû. Belkî jî digotin, “me ev xebera bi êş girt, dilê me ji ber girtina vê agahiyê diêşe, lê em ê vê agahiyê çawa ji hevalên xwe re bêjin.” Lê bi mîsogerî wê gotiban û pêwîst bû bigotibana. Her çendî biêş û sotînêr jî bû pêwîst bû ji girtiyan veneşartibana. Dilên ku xwîn dibûn bila

zêdetir xwîn bibin. Ev mecbûriyetek bû. Çima, ma yê ku ji wan re jî gotin dilê wan nînbû? Yan jî dilê wî ji kevir bû? Hinek din xwe komî ser hev kirin û gotin:

"Ka hûn picik av bidin me, zimanê me bi devê me ve maye. Hûn çendî zilamên ku ji rewşan fêm nakin. Mîna ku hûn qet li wan seyareyên cenazeyan siwar nebûne rewşekî we heye. Yek jî cixareyek bidin. Bila dilê me qetrana reş girê bide."

İskan, hîn li wir çong danibû ji bo mirinê... Mîna îskeleyek li gel Ferhat bû. Weke ku di dilê wî de tevgereke din nînbe. Çavên girtiyan mîna radarek li cihê ku ew lêbûn reşandin. Hemû projektorên çav bi awayeke herî ronî li ser wan bû. Ferhat, ji gel İskan rabû çû gel komê. Êdî ti wateya veşartina vê nînbû. Ev Kawa Mazlûm Doxanê Hemdem jî qebûl nedikir. Li rexekî din jî aliyekî dilê Ferhat pêt bi pêt dişewitî, li aliyê din jî sûlava diherikî bang kir:

"Hevalno şeva 21 Adarê hevalê Mazlûm agir bi bedana xwe xistiye agirê Newrozê di bedana xwe de gûr kiriye, agirê bedana wî hemû dîwarên girtîgehê derbas kiriye." Di heman kêliyê de bêdengiyek çêbû. Ev, bêdengiyek tijî îsyan bû. Yên ku wateya çalekiyê ya rast dizanin kûr kûr difikirin. Ev berxwedaniya pîroz bi

germahiya dilên xwe silav dikirin. Yên ku fam nedikirin jî ji tirsa bersiva rastiya vê agahiyê nediwêran bipirsin.

Di çavan de rondik û desmalên ku didanin ser eniyan hebûn. Hinan rondikên xwe venedişartin û jê nedibirin, digotin “bila biherikin,” çavên ku girî ji bîr kirine bila bigirîn. Bila di ser derbas bibe, di dil de bîn vede. Ew rondikên bi xwê, ew rondikên germ bila bibe melhema dilan.”

Li mirinekê dihat gerandin. Li mirinekê dihat gerandin di vê girtîgehê de. Li mirinekê dihat gerandin, lê bila mirineke wisa be bi qasî çiyayê Agirî mezin, biqasî Gola Wanê pak û paqij be. Bila agahiya vê xeberê wisa deng vede ku, divê ne Hiroşima, ne Nagazakî, ne di wargeha Auştvist de û ne jî xebera qetlîama Helepçe bi qasî wê bibe.

Hinek mirin hene; ji rêzê mîna ku pelek ji darê ketibe. Mirin hene bê wext tên, temenê wan bi qasî barana Nîsanê dibe. Lê dilê min, roniyê çavê min, hinek mirin hene ku mîna difina qijikê li şahdamarê dijmin dikeve dibe xencera Kurd di reşika çavên dijmin de û li cihê wê yê herî xedar dikeve. Pêteke, tarîtiya bi sedî salane hêvîn bûye diçirîne. Seriyekî wê ji Kawayan digihe Mazlûm Doxanê Hemdem û ev agirê pê dikeve hemû hewirdorê girtîgehê dorpêç dike, dostan dihejîne

doza wan li bîra wan tîne û mirinên ku dijmin şoq dike yek bi yek dide revandin di van girtîgehan de derket holê. Yek jî destnîşankirina mirinê ya ku ji hêla hostayan ve tê kirin heye. Epikurus dibêje: "Divê em ji mirinê netirsîn. Dema ku em mirin wê mirin nebe. Dema ku mirin hat em ê nebin." Mao jî dibeje: " Mirin hene mîna pirç sivik, mirin hene bi qasî Çiyayê Tay mezin." Û Che Guavera jî dibêje: "Yên ku ser mirinê de biçin wêrek û qehremanin, yên ku ji mirinê birevin tirsonek û siyasetvanên xirabin."

Ferhat got:

"Hevalno, we hemûyan agahî bihist. Em derbasî cihê xwaringehê bibin." Hemû girtî li ser cihên xwe rabûn çûn cihê xwaringehê. Ferhat nêzî Ednan bû û pirsî: " Gelo tu bi hevalên ji derveyî me re jî axivî?"

"Kawa û Partizan, 'dibêjin hûn çawa guncav bibînin em ê jî heman tiştî bikin. Lê yên din dibêjin ev kar gelek birisk e."

Ferhat:

"Yên ku beşdar bibin wê bibin. Yên ku beşdar nebin jî bila beşdar nebin ma em çi bikin? Necmî ka tu axiftinekê bike. Piştre jî yek deqîqe rêzgirtin. Dev ji wî

giriyê xwe êdî berde. Xwe hinek komî ser hev bike. Çi ji te tê?”

Necmî, hîn ji bin şoqa çalekiya Mazlûm derneketi bû. Bêyî ku ji kesî veşêre digiriya. Rabû ser xwe û “got baş e bira ez amede me.”

Ferhat:

“Temaşeke Necmî giyan, dema ku axiftina te xilas bû tu yê girseyê deqîqeyek vexwînê rêzgirtinê.”

Necmî bang kir got: “Hevalno kom bibin!”

Girtî mîna ku her rojê di sofreya iblîs de kom dibûn bi zorî nimêj dikirin, vê carê ji dil-can, bi heskirin û rêzdarî ji bo pêşengeyekî xwe li cihê perwerdeyê kom bûn. Qomîta Necmî a ku digot “hevalno kom bibin” bangî dilê wan kiribû, ew jî ji bo rêzdariya herî xweşik bidin nîşan di sekneke rawest de li kêleka hev sekinîbûn. Ev rêzdarî ne ji tirsê, ne ji lêdanê û ne jî ji bêçaretiyê bû. Hesteke ji dil dihat bû.

Dema ku hemû rêheval, welatparêz û gel di vê sofreyê de cihê xwe girtin, hemû girtiyên mabûn jî neçar bûn ku bên di vê sofreyê de cihê xwe bigirin. Bi vî rengî qawûşa 33. bi temamî wê ji bo Mazlûm biketiban rêzgirtinê. Dema ku Necmî dît kes nema hemû kom bûn, bi nirxandineke kurt girtiyan dawetî

rêzgirtinê kir. Necmî ji axiftinê zêdetir bêyî ku hestên xwe veşêre danîbû holê û got hevalno: “Hevalno pêwîst bû îro em li vir kom nebûban û me Mazlûm bi bîr neanîba. Pêwîst bû wî me bibîr banîba. Ji ber ku pêwîst bû me wî biparastiba û bidaba jiyîn. Lê me ev nekir. Li bendê nemînin ku ez li ser Mazlûm ji we re baxivim. Ez nikarim qala Mazlûm bikim. Jixwe hûn hemû wî ji nêz ve dinasin.” Mîna ku tiştek di qirika Necmî de mabe, gotinên wî yên dawî tam fêm nebû.

Dema ku rondikên çavan jî têkilê wê bû girtî hemû bi rondikên çavên xwe beşdarî wî bûn. Nikarî bi xwe, neaxivî. Lewra gelek dixwest baxive û qirîn bike. Ji dêla axiftinê destê xwe yê çepê hilda jor û mista xwe şidant. Girtiyan hema fam kirin ev dawetkirina deqîqeyek rêzgirtinê ye. Tişta ku Necmî kirî wan jî heman nêzîkatî û tişt kir. Li ser rêzgirtinê re du deqîqe derbas bibû. Lê Necmî mîna heykelek li cihê xwe sekinîbû. Mîna ku digot: “Bila xilas nebe ev rêzgirtin, bila bi dawî nebe ev pevçûn.” Tevî ku Ferhat ket ferqa vê jî, nexwest wî şiyar bike. Bangî wî kirin, mîna ku xirabiya herî mezin li Necmî bikin bû. Bi kurtî, axiftina bîranînê ya dawî qedand û xilas kir.

Necmî, nû dihat ser xwe. Û Ferhat jî tenê bi gotinek beşdar bû û got:

“Ez di huzura we de soz didim, ez ê bibim şopdarê heval Mazlûm.”

Jiyan bi riskan tijî bû. Ger ku di her kêliyekî yê jiyanê de riskan nedî ber çav, çalekiyeke ya jiyankirinê wê nebûba. Girtiyan wê bi çalekiya Mazlûm re riskan bidabana ber çav. Ji niha û şûnde wê bigotiban beriya Mazlûm û piştî Mazlûm. Ji ber ku Mazlûm darbeya herî mezin bû ji bo teslîmiyetê. Darbeyeke wisa bû ku hemû plan û programên dijşoreşê serû binê hev kiribû. Mazlûm di çalekiya xwe de da nîşan ku wê atoma şoreşê ti caran têk neçe.

Îbreya hemû meşan ya şaşnebar çêbûye. Bûye stêrka qawanê ji hemû kesên ku riya xwe şaş kirine. Ji bo heval û hogirên xwe bûye xwîna paqij. Ew ji nişkê ve di tarîtî û kurahiya girtîgehê de bû volqanek ya ronahiyê. Ev derketina Mazlûm a şoreşgerane ‘ji her kesî ku dibêje ez mirovim, di şerê mirovahiyê de ez jî heme’ bê îstîsna hemûyan ji serî heya neynokê bandor kir û bi rihê şoreşgerane, bi hêza Kawayan ya ti caran bin nakeve re araste kiribû. Wiha ev di anaforma wehşiyetê de ji bo girtîgehan mizgîniyek bû. Yê herî zêde ev mizgêniyê girtî, bi giyana xwe re kiri yek qawûşa 33. bû.

Mirovên qehreman yên ku rih, giyan û xwîn dabûn qawûşê. Ew bi risk û diyetên xwe re, bi rondik û hêviyên xwe re yên li hemberî wan disekinin bûn. Ev ezmûnên xwe yên biçûk, axaftin û deqîqeyek rêzgirtina li beramberî rêhevalên xwe, di cihê agirê dijmin jê radibû yanê di xwaringehê de kiribûn. Şûna xwaringehê ji cihê herî zêde ji hêla dijmin ve hatibe mayînkirin xetertir bû. Ji ber sedama baweriya ku wê hemû riskan bidin ber çav çûbûn li cihê xwaringehê çêkiribûn. Êdî ew êşa dilên ku bi salan bû xwîn dibû hinek jî be kêm û rihet bibû.

Bi vê hestê rûniştin. Veşargehên xwe teqandin: Cixare derketin holê, pêketin cixareyên di nava tiliyên wan de, dumana çiqarê hildan nava dil û cigerên xwe. Bangî Îskan kirin û gotin: Ka “bêje, te mirina Mazlûm çawa bihîst?”

“Bêje heta xala wî ya herî biçûk bêje. Bêje bavê min bêje meydana gerdena me li ber gotinên te vekiriye.” Navend bêdeng bû, guh li beramberî bihîstina gotinan rawestabû û çav li ser Îskan bûn.

İskan:

“Ji qawûşê bangî me kirin. Di maltayê de destê me kelepçe kirin. Destê me girêdayî sirûd bi me dan gotin heya seat 8.30 nivan. Piştre qawûşa 35. anîn. Nav hatin

xwendin. Birayê Mazlûm nînbû. Ez fikirim min got, “kesîn rêheval Mazlûm nexweşe yan na wê bihatiba.” Heya roja îro xwe ji ti dadgehan nehiştibû. Heyet ancex seat di 10.00 de hat. Formalîteyên ku tên zanîn anîn cî. Birayê Xeyrî destê xwe rakir û mafê axiftinê girt. Heyetê mafê axiftinê dan birayê Xeyrî. Birayê Xeyrî çû ser mikrofonê. Dema ku çû gelek xemgîn diyar bû. Ji dengê wî jî ev xemgînî fam dibû. Li ser mikrofonê wiha got: “Mazlûm, şeva 21 Adarê ji ber zext û îşkenceyên li girtîgehê pirotesto bike bi sê qiştikên şixatê agir berdaye bedena xwe û dawî li yiyana xwe aniye. Lewra çalekiya ku Mazlûm kiriye çalekiyek wisa ji rêzê nîne. Çalekiyeke siyasi ye.” Piştî ku ev nirxandin kirin û şûnde got; ‘dixwazim ev nerînên min bê kêmanî derbazî zabitan bibe û piştre li cihê xwe rûnişt.” Lê min bi sê ziligên şixatê xwe şewitandinê fam nekir. Dibe ku hevalên din ji min baştir fam kiribin.”

Çav li girtiyên din yên ku çûbûn dadgehê zivirîn. Lê wan jî gotin tiştên ku Îskan gotî me jî bi heman rengî fam kiriye.

İskan:

“Pêşkeftinên di dadgehê de ev bûn. Tiştek din cuda nîne. Bêyî ku ji bîr bikim vê jî bêjim: Mazlûm belavokeke hiştiye. Birayê Xeyrî xwest, ew belavoka ku

Mazlûm hiştiye ji îdarê ev belavok bê girtin û bikeve ser dosyeya wan.

Komîna qawûşa 33. dişibiya malbateke ya şoreşger an. Dîrekên vê malbatê yên bingehîn, ciwanên zîrek bûn. Li gel ketkar û hilberîneran zarokên nesekinin jî hebûn. Carna yên dixeyîdin, teng dibin û aciz dibûn diçûn jî hebûn. Bi lewazî, zaaf û meznetiyên xwe re yek bûn. Bêguman dema piştî vê qonaxê û şûnde komîn bi bahoza zext û tunduyan re rû bi rû hat lewra yên ku ji komînê vediqetan jî hebûn.

Hejandina herî mezin di 10'ê Mijdarê de jiyan kiribûn. Yên ku ji wê hejandinê bandor bibûn û ji keştiyê veqetabûn şûnde hatin. Di nava van de Necmî yê ku berpirsyartiya qawûşê di nava van mercên herî zehmet de bi fedekariyeke mezin dimeşand jî hebû. Heya niha yê ku beşdarî komînê nebûbû Fesih jî hatibû, tevlî komînê bibû. Tiştên xwe yên kesî anî danî pêşiya hevalên xwe. Got; "em êdî nikarin bi serê xwe jiyan bikin, dixwaze qebûl bikin dixwaze qebûl nekin."

Girtî derbasî beşadin ya nirxandina çalekiya Mazlûm dibûn. Li ser ronahiya van nirxandinan nîqaşa wê zincîra teslîmiyetê çawa bişkînin dikirin. Cihê ku ev nîqaş lê dihatin kirin, bi giştî li gel cihê Ferhat dibû.

Hemû girtî kom bibûn. Girtiyan ji Ferhat xwestin ku qala Mazlûm ji wan re bike.

Ferhat got:

“Ma ez ê çawa qala Mazlûm ji we re bikim? Hûn hemû wî dinasin. Yên ku nasnakin jî bihîstine.”

Di rewşa Ferhat de diyar dibû ku nedixwest baxive. Lê li ser israra hevalên xwe hewcedariya axiftin û hinek tiştan bêje hîs kir.

“Beriya her tiştî, ji bo naskirina Mazlûm pêwîst e ev çalekiya herî dawî danî holê bê nasîn û bê famkirin. Dema ku hûn vê têgihiştin lewra hûn ê bizanibin Mazlûm îfadeya çî ye.”

Ednan got:

“Ger hûn bixwazin, em li ser bandora ku çalekiya birayê Mazlûm ya li hûndir û derve bide çêkirin nîqaş bikin.”

Mahmûd : “Pêwîst nake em nîqaş bikin. Wate û girîngiya çalekiya birayê Mazlûm û xwest bi vê çalekiya xwe çi ji me re ragihîne bila hevalek bêje.”

Ferhat:

“Hûn bixwe bibînin ka Mazlûm xwest çi mesajê bide.”

Eşref:

“Li gor min polîtîkaya îdarê ya heya niha, yên ku teslîm girtibûn helandin bû. Lê ji piştî sersalê û vir ve guhertinek da çêkirin, yên ku teslim girtî bi temamî dixwaze tine bike. Yanê naxwazin tenê bi teslîmgirtinê re bimînin, dixwazin meselê heya îxanetê bibin. Wiha divê çalekiya birayê Mazlûm di vê wateyê de bê destgirtin.”

Merwan:

“Tiştên ku Eşref gotin rast in. Yek jî, hûn dizanin mafê me yê parastinê heye. Ger ev jî ji hêla dijmin ve bê binpêkirin lewra ji hêla me ve rewşeke ku neyê qebûlkirine. Ji ber ku em tenê dikarin dengê xwe yê şoreşgerî bi riya parastina xwe ji gel, partî û cîhanê re ragihînin. Vê astengkirin dema ku bi tiştên Eşref gotin re jî dibe yek çalekiya Mazlûm mîsoger bû. Ez bawer im ji me re jî got ku divê hûn li hemberî van bêdeng nemînin.”

Ednan:

“Li gel tiştên ku we gotî tiştek din jî heye: Teslîmiyeta ku îro em di nav de ne ger em neşkînin em nedikarin li hember polîtîkaya îtirafê derbikevin, ne jî dikarin mafê xwe yê parastinê yê ku hatiye binpêkirin bidest bêxin. Wateya çalekiya Mazlûm, beriya her tiştî şikandina navenda teslîmiyetê a ku em tê de ne û bi

bidestxistina tiştên ku hûn dibêjine. Yanê Mazlûm ji me re vê dibêje: Bêyî ku teslîmiyet biçe îxanetê bişkînin ger bikaribin bişkînin. Bedela vê encax mîna min bi bedena xwe dayînê re dikarin bikin. Yan na hûn nedikarin li pêşiya îtirafkaran bisekinin ne jî dikarin di dadgehan de ramanên xwe ji gel û partiyê re ragihînin. Mazlûm ji me re riya derketinê da nîşan. Lê dîsa zehmetiya derketina vê riya wî bi xwe bal kişand ser. Li gorî nerîna min tiştên ku Mazlûm xwest ji me re ragihîne ev in.

Ferhat:

"Çalekiya heval Mazlûm hîn berfirehtir e. Di Newrozê de çalekî lidarxistin giringiyeke din jî dide îfadekirin. Ew jî ev e: Kawa yê ku sembola berxwedaniya dîrok û serî rakirinê ya anîna roja me ya îro ye. Yanê Mazlûm Doxan tê rewşa Kawayekî hemdem. Ji ber ku dîroka me ji destpêkê ve bi tevgerên berxwedaniyê re tijî ye.

Lê îro gelê me şerê hebûn û tinebûnê dimeşîne. Tenê rêya wê jî şer e. Îro dijmin di hundur de li ser kesayeta me dixwaze têkoşîna me ya şoreşgerî û azadiya gelê me bixeniqîne û tine bike. Wiha dema ku em bi vî rengî binirxînin, rastiya çalekiya Mazlûm derdikeve holê. Bi kinahî têkoşîn û berxwedaniya ku em niha di nava

dijmin de jiyan dikin ango didin meşandin tê wateya di asta herî jor de temsila gelê me kirine. Mazlûm, di hûndir de dît ku teslîmyet êdî ber bi îxanetê ve diçe. Ji bo li pêşiya vê bigire di asta herî jor de bi çalekiyek bersiv da. Ji me re jî vê dibêje:

“Ger ku hûn naxwazin bigihin îxanetê min bişopînin. Ev rê rêyek wisa hêsan nîne. Ji bo vê pêwîst e jiyan bê fedakirin û vê jî bikêfxweşî bidin ber çav.” Ji aliyê din ve jî teslîmiyet ji bo me qederek nîne. Di vê xalê de teslîmyetê şikandin bi meşandina têkoşînên xurt re serkeftinê jî dide nîşan. Avanî û kesayeta Mazlûm jî yek ji hevalên me yê ku vê rastiyê di kesayeta xwe de şênber kiribû. Ev mercên teslîmyetê ji bo wî mirinên herî mezin bû. Li gel vê xwedî pêşbîn bû û armacên tevgerê baş didît.

Ji bo em di hûndir de teslîm nebin, li derve jî serî li textîkên xwe paşde dayînê nedin û xeteriyên ku şoreşa me pê re rû bi rû ye baş destnîşan kiribû. Di wê baweriyê de bû ku hemû gavên bihatiba avêtin wê destkeftiyên şoreşê ber bi pêş ve bibiriba. Ji ber wê jî destnîşan dikir ku karê herî zêde dikeve ser milê serok û milîtanên vê şoreşê. Erka ku dikeve ser milê me jî ev rêça ku Mazlûm vekiriye bidomînin û pêşve bibine. Ti caran ji mirina Mazlûm xemgîn nebin û şîn negirin.

Mazlûm, ji bo me ne wundahiyeke, bingeha berxwedaniyeke mûazzam e. Qutbûna wî ya bi vî rengî ji me tê wateya em wî heta heta di dilê xwe de bidin jiyîn e. Ev jî bêmirinî bi xwe ye," Ferhat bi vî rengî axiftina xwe bi dawî kir.

Bi lêketina çakûçê Kawa ya li sindê re çirûskek hildipeke û agir bi beriyekê dixe. Dilê Mazlûm li ser girtîgehê şewitî. Hêrsa wî ya li hemberî teslîmyetê sê zilikên şixatê şewitant. Dema ku laşê wî li ezmanan mîna ewreke sor dimeyî ew sê zilikên şixatê tarîtiya li girtîgehê ronî kir û di nava wan dîwaran de şewqeke berxwedaniyê da mayîndekirin. Kawayê Hemdem bû Mazlûm Doxan. Çirûskên wî bi dilên di hundirê girtîgehê de ketibû. Li ser zimanan bû helbest:

Gula min  
Heta roj dernekeve xiyaneta tarîtiyê  
Heyv dernekeve mineta ronahiyê  
Tê nezanî gulam in.  
Gula min berfe ya ku pîsatiya cihanê dinixumîne  
Mirine, ya ku egîdiya mirov diceribîne.  
Dema ku nifir cih negire  
Tê nizanibe gula min  
Bawerke gula min

Hîn dayika te

Te ne welidandiye.

Ya ku te ji te bêtir bibîr tîne

Egîdekê Mazlûm Doxan.

Stranek bû di pişt zimanê girtiyan de şidyayî (kenetlenen)mayî. Kenek bû di xemzeya girtiyan de vebû. Xwîneke taze, kelacanek û şewqek hatibû qawûşa 33'yan. Her çendî ne mîna berê jî be girtî dîsa dikenin, şadibin û henekan dikirin. Kenîn, bi jiyanê hesandine. Girtî her roj di cendereya mirinê de jî bin divê bikenin, bi sih û du diranên xwe bizanibin têkoşînê bikin. Pêwîst e bi vê coş û şewqê re bi înat li hemberî dijmin bisekinin. Ev coşa xwe li rihên herî esasî yên girtiyên qawûşa 33. pêçandibû. Dîsa nîqaşên şevê germ bûn, mîna germahiya mirovan ji qawûşê dihat. Keşe bêyî ku guh bide nexweşiyên xwe ji van nîqaşan dûr nedima.

Carna Amed û Mahmûd jî belaya xwe lê didan. Carna jî li hemberî Necmî û Eşref kemîn datanîn. Lê herî zêde jî bi gotina wî devji Kîbarê xwe bernedida. Li gorî Keşe di qawûşê de kêmaniyeke mezin hebû. Dijberê xwe ji mêj ve winda kiribû. Dîsa belaya xwe li Kîbarê xwe da û got:

“Gelo hemşeriyê te Alik niha li Kahtayê çi dike? Têqez niha pîşeya xwe ya li vir didomîne.”

Merwan:

“Hemşeriyê min, lalûte melalûte bû, lê hevaleke baş bû, ger li vir bûya wê her tim piştgirî bidabana te. Lê ew niha ne li vir e, di pişt re jî destûr nadim ku tu gotinan jê re bikî.”

Keşe:

“Dema ku li vir jî bû me dît, me te jî dît hemşeriyê te jî. Dema ku hat berdan min jê re gotibû xwe bi mala me bêxe. Nizanim gelo wê biçe?”

Merwan:

“Ger ku wî ji te re soz dabe bi mîsogerî wê biçe.”

Îsmet, dîsa coşa xwe ya berê bidest xistibû. Ji girtiyên li dora xwe re qala berxwedan, têkoşînên hundir û serokan dikir û bi zewqeke mezin bilêv dikir. Di navberê de jî ji bo hawirdora xwe bide kenandin bi misogerî hinek mînakên komîk jî digot. Tiştên ku bilêv dike li gel xwe jî hinek tiştan li ser zêde dikir. Ji girtiyên kevin re meseleyên ku êdî bêje li gel nemabû. Ji ber hemû bûyer û macareyên xwe çend caran gotibû. Girtiyên kevin jî êdî zêde wî guhdar nedikirin. Lê Îsmet her tim yên ku lê guhdar bike û bi mîsogerî

guhdarvanan ji xwe re didît. Ev car jî yek ji yên nû hatî, yanê hîn macarayên Îsmet guhdar nekiribûn dîtibû û ji wan re qala bîranînên xwe dikir.

Kolombo Îsmet:

“Baş e, dema ku hûn çûn beramberî dadger we jê re çi got?”

“Ma em ê çi bêjin? Em bêdeng bûn, me tiştên mîna ‘ev îfade ne aîdê me ye’ da.”

Kolombo Îsmet:

“Ev nebû. We bi temamî nikariye îşkenceker û îşkenceyan teşîr bikin. Temaşekin min çi got. Me bi komek hevalan re birin pêşberî dadger. Li berevajiyê vê temaşe kin, ma li wir jinek nedirûnişt? Yek jî tiştên ku me digot wê dinivîsand. Her kesî mîna we got em bê kêmanî nêmînin, di wê kêliyê de dor hat min. Dadger wer fam kir ku ez ê jî bêjim ez bêkêmanî me yanê sucê min nîne. Dadger ji min pirsî û got: ‘Îsmet me îfadeya te xwend tu çi dibêjî?’ Min li çep-rast û yek jî li avradê temaşe kir. Min ji xwe re got çi dibe bila bibe pêwîst e ez vê teşîr bikim. Dadger ji min re got ‘ka Îsmet zû bike em li benda te ne.’ Hevalno mane hûn dizanin şoreşger şerm nakin, lê li her derê jî wisa vekirî jî nabêjin. Min dîsa li avradê yanê jinê temaşe kir, min ji xwe re got

‘gelo bêjim, yan nebêjim:’ Min ji xwe re got ‘Îsmet, ev erkeke li pêşiya te ye. Pêwîst e tu bêjî.’

Yên ku li Kolombo Îsmet guhdar dikirin gotin:

“Îsmet, tişta tu jî dikî mane nabe. Ji serê sibê ve em li te guhdar dikin. Lê te hîn meseleyê negotiye.”

Kolombo:

“Ka bisekinin hevalno, rawestin ez ê bêjim. Ma heke ez nebêjim min çima meseleyê vekir? Her wiha ez we di nava mereqê de nahêlim bêjim. Min got: ‘Dadger bey, di te de jî heye, di min de jî heye, yên ku li vir rûniştine di hemûyan de heye.”

Dadger pirsî got, ‘kuro Îsmet çi di me de, di te de, di wan de heye? Ka bi awayeke vekirî bêje?’

Min dîsa li jinê temaşe kir. Niha ger ew ne li wir ba min ê bi awayeke vekirî gotiba. Di herî dawî de min dîsa got ‘di te de heye di min de heye, di yên li vir rûniştine hemûyan de heye û bi destê xwe jinê destnîşan kir û got, ‘tenê di wê de nîne.’ Dadger, dîsa fam nekir. Dibe ku fam kiribe, lê weke fam nekir da diyarkirin.

Min got, min ji neçarî serê wî girt, ‘polîs jî dan elektirîkê.’ Yanê tişta dixwazim bêjim, kesî wê

pirsgirêka girîng teşîr nedikir. Min ev pirsgirêka girîng bi rihetî teşîr kir.”

Ev car ji qawûşa 33. KUK’î çûbûn dadgehê û hatibûn. Girtî ji bo pêşkeftinên di dadgeha wan de û rewşên girtîgehê fam bikin çûn gel wan. Tiştên ku KUK’ çiyan anîn ziman ji bo girtiyên PKK’yî giring bûn. Ev dem dema ku îtirafkar di dadgehan de diyar dibûn û derdiketin piyasê. Di qawûşa 38’an de îxanet êdî gihiştibû yanê derdiket holê.

“Velle hevalno! Rewşa me ya girîng ya di dadgehê de ev e; yanê agahiyên li ser KUK’ê zêde dibin. Yên berê ku di nava refên me de cî digirtin îdanameya me dabûn destê yek ji wan. Ew jî bi awayeke ku rast destnîşan dike îfadê li ser bûyer û kesên ku di bûyeran de cî girtine dida. Ew qas şîrheranbûn ku, tiştên herî biçûk yên ku dozger ji bîr dikir tanî bîrê. Li gor min hûn jî xwe amede bikin wê baş be. Bi taybet bila Amed û Ednan xwe ji bo îfadeya ev kesê şîrheram amede bikin. Ji derveyî van jî tiştek din nîne. Girtiyên ku hatibûn dadgehê kesê qala girtîgehê ji me re nekir.” Piştî çalekiya Mazlûm û şûnde di girtiyên berxwedêr de tevgerek û hewldanek dihat dîtin. Bêguman li gel van jî îdare û îtirafkarên hevkar jî xwe dişidandin, bi taybet

îdarê talîmatên ji dadgehê girtî li hemberî kesên şoreşger ketibû nava êrîşê.

Mijareke din jî bi encam dibû. Meseleya tiştên ku yûzbaşî li cihê hewa kêşanê di derbarê Ferhat de gotî jî zelal dibû û derdiket holê.

Ev weke ku hêjmareke zêde ya girtiyan texmîn dikirin û texmînên xwe nedidan derve Yildirim Merkit bû. Ji ber ve Amed di derbarê wî de baş nedifikirî. Lê wan pir teng digirt yanê ji kesî re zû bi zû nedigot. Niha jî pêwîstî nedidît ev nêrînên xwe veşîre. Ji bo ku îdara girtiyan ji bin şoqa ku Mazlûm dayî avakirin derxîne, bi hemû hêza xwe ketibû nava kar. Ji ber wê jî kesên lewaz yek bi yek bidest dixistin û tiştên ku dixwastin ji wan kesan digirtin. Dadgehê mîna ku dixwestin van kesên lewaz bikar tanîn. Yek jî îdarê, di vê demê de li gel îşkencê û zextan serî li hemû amûrên propaganda û demagojiyê jî dida. Îdarê, bi taybet di derbarê pêşengan de him antî propagandeya devkî him jî ya nivîskî dikir.

Girtiyan her tim propagandayên ku îdarê di derbarê pêşengan de dikirin berevajî dinirxandin. Ji ber dema îdare hat got, “Kemal Pîr, Hayrî Durmuş îtiraf kirine” girtiyan ji gotinên wan bawer nekirin dizanin derewan dikin. Ger ku ev rast bibûba, jixwe wê pêwîstî bi

propagandayên îdarê nemaba. Her çawa ba wê ev di dadgehan de derbiketiba holê. Lê armanca îdarê, dema ku dixwest serê kesên lewaz yên ku nikarin li ber xwe bidin tevlîhev dikir û tanî asteke îtirafkirinê serî li van propagandayên derew dida.

## Beşa Şeşemîn:

Îdare, rojekê hat qawûşa 33. lîsteya hinek navan xwend. Got: "Bila ev kes xwe bi tiştên xwe ve amede bikin." Girtiyên diman, destpêkê wateya vê dernexistin holê. Dema ku sedema vê fikirin herî dawî zanin ku ji bo ev heval hemû bi veremê ketine û hemû girtiyên din jî yên bi veremê ketibûn li qawûşekî kom kiribûn, loma fam kirin ku wê van jî bibin gel wan. Keşe, razîbû li qawûşê bimîne û çend car din jî bi veremê bikeve. Lê ji derveyî çûyînê ti carekedin ya wî nebû. Bi Keşe re hemû girtiyên din yên ku bi veremê ketibûn birin. Di nava qawûşê de hinek bûyer diqewîmin.

Destpêkê ti girtyan ev fam nekiribû. Ferhat, Necmi, Eşref û Mahmûd  dihatin gel hev diaxivin. Carna bi seatan diaxivîn. Lê girtiyan di nîqaşa wan de ecêvbûyînek nedidîtin digotin, "dîsa birayê Ferhat hinek tiştan ji hevalan re dibêje, yan jî hinek meseleyan di nava xwe de nîqaş dikin"şirove dikirin. Ji ber Ferhat hinek mijarên ku pêwîst bû heval tê de kûr bibin, bi wan re parve dikir û nîqaşan dimeşand. Ji ber nîqaş û axiftinên di navbera xwe de hîn negihandibûn zelalbûnekê lewra nedixwestin bi hevalên xwe û hemû qawûşê re parve bikin. Ji ber vê têgihiştina şoreşgerî û

rast, dikarî tenê bi yekîtiya ramanên hevbeş bê xurtkirin û şênberkirin.

Piştî çalekiya Mazlûm a Newrozê şûnde nîqaşên şikandina teslîmyetê di nava qawûşa 33'an de zêdetir bû.

Eşref:

"Hevalno, divê em hinek tiştan bikin. Piştî Mazlûm şûnde ez bawerim di gelek girtiyan de fikir û nêzîkatiya ku divê êdî 'ji vê wahşiyetê re bê je bese!' ava bibû. Ramana teslîmyetê şikandin di me hemûyan de hebû. Lê kesî alternatîfek ji vê re pêşnedixist.

Huseyin:

"Tişteke me yê ku em winda bikin nîne. Dema em diçin cihê hewakişandinê gardiyanan rehîn bigirin. Deriyên hemû qawûşan vekin îsyan bikin."

Necmî: "Tiştên tu dibêjî baş e, lê li gorî nerîna min ev nêrîna te wê me ji teslîmyetê xilas neke. Ramanên te bibe bibe encama pertekên hestiyariyê ye."

Amed:

"Li gorî min di vegera dadgehê de dema ku kelepçeyan vedikin kesên li wir erkdar hemûyan rehîn bigirin. Deriyê 35'an vekin û êdî ew dizanin wê çi bikin. Yanê piştê vê bila ew bixwe bifikirin."

Merwan:

“Ger hûn bi ya min bikin em Esat bikujin. Pêwîst e ev zilam tine bibe. Heta ku lê neyê xistin berdin erka şoreşgerî anîna pêkanîn, em ê erka xwe ya mirovbûnê jî pêk neyênin .”

Ferhat:

“Tiştên tu dibêjî di wateyekê de rast e. Lê her tişt bi lêdan û şikandinê çênabe Merwan giyan, ev ne çareseriye. Mîna ku tu bi satrancê dileyzî bi van karane nayê lîstin. Esadek wê biçe wê hezar Esat bê. Ji bo me çareseriyek bingehîn pêwîst e.”

Amed:

“Wê demê çareseriya bingehîn hûn bibînin em bi hev re bikin.”

Mahmûd :

“Çareserî heye. Çareseriyeke tenê ji bo me heye ew jî Mazlûmên nû pêwîst in.”

Ferhat:

“Mahmûd gelek rast dibêje. Ne tenê Mazlûmek çend Mazlûm pêwîst in. Heta ku li girtîgehê Mazlûm giştî nebin wê ev zext jî bidomin.”

Necmî:

“Divê çalekiya ku Mazlûm lidar xistî di hundir û derve de bibe kevneşopiyek. Ez di wê baweriyê de me ku wê gelenperî bibe. Wê demê em ê teslîmyet û îxanetê ji holê rakin.” Nîqaş li ser vê didomiya. Di vê kêliyê de Burhan hatibû qawûşê.

“Derbasbûyî be çibû? Te birin kî derê? Me gelek te meraq kir. Em sê rojan li te fikirin.”

Burhan:

“Tenê karî bêje ji bo îtirafê min birin hûcreyê.” Di rewşa Burhan de diyar bû ku gelek xemgîn bû. Serî li ber, bi awayeke bê xwestek bersiva pirsên ku dihat kirin dida. Burhan di koma Amedê de bû. Di derbarê xwe de fikirî ku herî baş û maqûl rewşa xwe ji Amed re bêje û bangî Amed kir got; “were em hinek nîqaş bikin.”

Amed:

“Baş e, em biçin ser cihê birayê Ferhat li wê quncikê nîqaş bikin. Dema ku li ser ciyê Ferhat rûniştin Burhan bi kelecan got, “ger li gel te cixare hebe yekê bide min.”

Piştî yek-du firt li cixareya ku Amed dabûyê da şûnde got, “temaşeke Amed, tiştên ji te re bêjim gelek girîng in. Heke bixwazî bangî birayê Ferhat jî bike.”

Amed got:

“Dibe dostê min.”

Amed hema çû bangî Ferhat kir. Amed û Ferhat hatin li ser ciya rûniştin. Burhan cixareya xwe vemirand dest bi vegotina mijarê kir:

“Dizanim, gotinên ku ez ji we re bêjim ne gotinên ku ji devî yekî xwedî îdaya şoreşgeriyê ye derbikeve ye. Lê li gorî ku min ev kêmasî kiriye divê bêjim. Hûn ê nirxandina wê bikin. Dema ku ez ji vir birin raste rast birin gel yûzbaşî. Lîsteya bûyerên li Ceylanpinarê qewimîne dan min ku di derbarê wê de agahî bidim. Min jî got ti têkiliya min bi van bûyeran re nîne. Li ser vê yûzbaşî got, ‘vî jî bibin gel yên din!’ Min teslîmê Asteymenê kinik kirin. Min birin qawûşa 37’an yanê hûcreyê. Min xistin qada 1 qawûşa 1. Piştî pênç-şeş deqîqe derbas bû şûnde gardiyanek hat çavên min girê da ji hûcreyê derxist. Birin korîdora mezin piştre birin çend ciyê din. Herî dawî min bi dîrekeke hesin ve girê dan.

Piştî hinek dem derbas bû şûnde min dengê îşkenceyê û qêrîna mirovan dibihîst. Di nava van dengan de dengê Sabir û Metin jî dihat. Dîsa dengê Hesen Garip jî dihat. Yê wî ne ji bo îşkenceyê bû. Hesen Garip bi îşkencekaran re pirs ji hevalan dikir û dengê kenê wan dihat bihîstin. Piştî çend deqîqeyan dor hat

min. Li cihê ku destê min pê ve girêdayî vekirin birin cihek din lingên min girê dan, min serberjêr kirin. Ji aliyekî ve li min didan ji aliyê din ve ji bo ez li ser hişê xwe neçim av bi min de dikirin.

Min nikarî xwe li ber van îşkenceyan bigirim. Sabir jî ji min re got 'were em qebûl bikin,' dema wisa got min jî got başe em qebûl bikin. Dema ku çavên min vekirin min dît ku ez li hûcreyê me. Piştî ku me qebûl kir û şûnde pênûs û lênûs dan me. Di serî de onbaşî got, ev pirsên li ser wan qaxezan rast bibersivînin."

Amed:

"Pirs çawa bûn? Bi awayekî kitekit bêje?"

Burhan cixareyeke din jî xwest. Ferhat ji pakêta xwe cixareyek dayê.

"Pirs wiha bûn:

1-Tu kengî beşdarî rêxistinê bûyî û bi riya kê beşdar bûyî?

2- Piştî ku beşdarî rêxistinê bûyî di bin venerîna kê de bûyî?

3- Beşdarî kîjan çalekiyan bûyî?

4- Milîtanên ku di nava rêxistinê de dinasî nav û erkên wan çibûn?

5- Endamên rêxistinê yên li derve hîn nehatine girtin navê wan û navnîşana wan binivîsîne.

6- Çalekiyên rêxistinê yên te dîtin û yên ku te bihîstin ji hêla kêve hatine kirin binivîsîne.

7- Ez poşmam bûm, lewra sedema poşmanbûna min çibû? (Her kes neçarbû ku bêjin em poşmanin).

Pirsên din zêde giring nebû. Pirsên nav û malbatê eleqedar dikirin. Piştî ku min bersiva pirsan da şûnde xwestin min bibin qawûşa 38'an. Dema ku min got ez dixwazim biçim qawûşa xwe min anîn vir. Ferhat axiftinên Burhan ji serî heya binî guhdar kir û got, “ te qet tiştek baş nekir. Lê hatina te ya vir baş bû. Ger ku biçûbayî qawûşa 38'an te êdî nedikarî xwe ji nava wê ceblê derênî. Li vir bi alîkariya hemû hevalan şansê te yê ji vê rewşê derketinê heye. Lê her tişt girêdayî te ye. Tenê tişta tu bikî dema ku çûyî dadgeha yekem tiştên li te û hevalên te kirin bêjî û tiştên te nivîsandine red bikî. Ger ku bi rastî jî tu vê bikî, wê derketina te ya ji nava van kêmaniyên ku ketî nav hêsan bibe.

Burhan:

“Birayê Ferhat, ez soz didim ez ê vê bikim.”

Piştî ku Burhan çû Ferhat li Amed ziviri got, “Burhan di koma te de bû ne wisa?”

“Rast e bira.”

“Ji niha şûnde hîn germtir nêz bibin. Her tim pê re baxivin. Jixwe ketiye bûnalimê. Ger hûn di destê xwe de negirin wê hîn zêdetir xiraptir bibe. Tiştên ku kirî li rûyê wî nedin, lê vê pê bidin hîskirin: Tişta ku kirî tiştek xirabe, heta ev îxanete yanê bila bikeve ferqa tişta kirî û fam bike. Pêwîst e bi baldarî nêzîkatî jê re bê kirin. Agahiya wî ji çêbûna komînê nîne ne wisa?”

Amed:

“Na bira, nizane.”

Ferhat:

“Hevalên din kom bike. Tişta ku Burhan ketiye nav ji wan re bêje.” Di koşeyeke qawûşê de çar heval hatibûn gel hev. Dema ku her kes di nava nîqaş û hewaya xwe de bûn, ev her çar kesên din tiştine cidî difikirîn. Di navbera xwe de bêdeng diaxivîn.

Ferhat:

“Hevalno, dijmin kêlî bi kêlî derdora me dorpêç dike, rewşek wisa ye ku heta ber deriyê qawûşa me hatiye. Bi giştî her roj îtirafkarek derdikeve holê. Êdî dem hatiye em nerînên xwe şênber bikin. Piştî ku me van zelal kir şûnde, yanê di derbarê rêbaz de hem fikir bûn şûnde divê em hinek amederkariyên giring bikin.”

Eşref:

"Bira, li gorî min ya herî girin em feraset û xeta heval Mazlûm esas bigirîne. Ji vê zêdetir ez şêwazeke din yê çalekiyê nafikirim.

Ev feraset, çi di navbera qadroyan de, çi jî bi awayeke sergirtî belavkirina nava girseyê bes e. Heke em her tim heman tiştan dûbare bikin wê hinek heval bikevin gumanê. Hêjmareke zêde hevalên me mirovên jîr in."

Necmî:

"Ez jî di heman nêrînê de me. Zêdetir dirêjkirina vê, wê wateyeke xwe nebe."

Mahmûd :

"Madem em hemû di heman nêrîn û ferasetê de ne, wê demê dem windakirin xeta ye. Nêzîkatiya hinek hevalan ya hestyar û pêşniyarên wan qet neba. Şêwazê îsyanê wê rê li pêşiya çêbûna qetlîamek mezin veke.

Ferhat:

"Em dikarin vê hema bikin. Eşref tu û Mahmûd , ji bo çalekiyê çi pêwîst be bêyî ku bi Îkram bidin diyarkirin pê bidin anîn. Ya duduyan, Necmî, tu jî hema karê nobetê dewr bigire. Bila şeva çalekiyê nebe pirsgirêk. Ji bo vê çalekiyê bi awayeke raste rast bila ti

heval nekevin bin tohmetê. Ya sêyemin, ev çalekî çi li ser me, çi li ser hemû girseyê, bi taybet li ser hemû hevalên qadro, wê di demeke kin de encam negire, lê sûdeke wê dê ji bo berjewendiyên şoreşê yên giştî hebe, em hewl bidin bi wan bidin famkirin û têgihiştin.”

Mahmûd :

“Bira, jixwe piştî çalekiya Mazlûm şûnde me wateya çalekiyê gelek zêde vegot. Tiştên ku te gotin em ê dîsa dem dem bikin.”

Ferhat:

“Lewra mijareke din giring heye: Weke pêdiviya biryara me girtî, hevalên ku di asta parastina partiyê de ne, divê di dadgeha yekem de partiyê biparêzin.

Ji ber vê rewşa dawî û biryara ku me girtî ez ê parastina xwe nekim. Ger ku ez bikim bi îhtîmaleke mezin wê min ji we qut bikin. Ev jî wê nehêle ku em çalekiya xwe bikin.”

Eşref:

“Arastî me ev mijarê di navbera xwe de nîqaş kiribû. Me yê ji te re pêşniyar bikiriba. Tiştên ku tu dibêjî em jî tevlî dibin.”

Necmî:

“Ev biryar yanê biryara parastina xwe nekirin bila tenê bi te ve girêdayî be.”

Ferhat:

“Bêguman, dibe.”

Jiyan di qawûşa 33’an û girtîgehê de mîna her rojê didomiya. Girtiyan dema rûyê Esat didîtin û piştre gotina Esat ya ji bo gardiyan digot, “ji bo zarokan we dema behnvedanê da…dema behnvedanê bidin zarokan?” dema ev digot girtiyan dizanin dîsa dema hatina kêliyên xirab in. Yek jî dema ku gardiyan digot bila filan kes derkeve holê, yek ji tiştên ku ji hêla girtiyan ve baş nedihat destgirtinbû.

Her ku yek ji hevalên girtiyan dibirin, girtiyan hîsdikirin ku wê îşkence li wan bikin û bidin ber lêpirsînê. Dema ji qawûşê dibirin gardiyanan ji girtiyan re digotin, ‘yan parêzerê te hatiye, yan jî kes û karên te hatine dixwazin te bibînin. Vê sibehê jî ji Ferhat û Eşref re gotin “dadgeha we heye.”

Girtiyan fam kirin ku wê herdu hevalan bibin lêpirsînê. Ji ber Ferhat û Eşref ji bo dadgehê di du komên cuda de bangî wan dikirin ango dibirin dadgehê. Nebirina komên din guman zêde dikir. Piştî demeke bêsebir û hemû seatên wan bi îşkence derbas

dibû şûnde Ferhat û Eşref anîn qawûşê. Li ser wan şûnên îşkencê nînbû. Girtî kêfxweş bûn:

“Wê çi bibe ev halê me? Her roj hinekan digirin dibin. Ji tirsan dilê me tê ser devê me. Gotin ev tenê ne ji bo yên diçin, ji bo me yên ku dimînin jî dibe îşkenceyek mezin.”

Ferhat bi kenê xwe yê her carê:

“Xwe li ber van tiştan girtin çareyeke vê zêdetir nîne. Ka hûn dev ji wê berdin ji bo me hinek tiştên xwarinê amede bikin. Bi henekî got, yan jî hûn jî ceza didin yên ku diçin dadgehê?”

Dema ku hevalên wan li van gotinên wan guhdar kirin hema çûn tiştan amede bikin, yên man jî pirsên xwe kirin.

Ferhat:

“Na heval, vê carê em ê ceza bidin we. Heya ku em xwarina xwe nexwin, çixara xwe venexun em tiştek nabêjin. Ev ne cezayeke, berxwedanî kirine.”

Merwan:

“Xwarin hêsan e, lê çixare dîtin zehmet e.”

Eşref:

“Dibe ku li gel her kesî nebe, lê bi mîsogerî li gel te ev meret tê dîtin.”

Ferhat:

“Baş e, niha destpê bikin. A rastî tiştek zêde di dadgehê de nînbû. Li ser îtirafa Halef Çarpar me biribûn. Îdanameyeke dane destê Halef, Halef jî dibêje min ji wê, ji vî bihîstiye her wisa meseleyan diafirîne. Ji bo min jî got “ev berpirsyarê eyaletê ye.” Pêşkeftina herî baş ya ji bo me helwesta siyasî a ku Eşref raber kiriye.

Eşref:

“A rastî diviyaba min hê ji zû de ev parastin bikiriba.”

Ferhat:

“Na na, te tam di dema wê de kir. Ma te nedît, Kemal û Xeyrî çendî kêfxweş bûn.” Dema ku Ferhat qala Xeyrî kir, nikarî xemgîniya xwe veşêre. Yek ji hareketên xwe yên qet nekirî kir. Di vê kêliyê de çend pirtan li ser hev li çixareya xwe da avêt. “Piştî ku Eşref parastina xwe kir şûnde dor hate min. Ez çûm ser mikrofonê, beriya ku bersiva pirsên ku ji min kirîn bidim, fikirîm ku parastina xwe bikim. Lê hîn awirên min û Xeyrî bihev neketibûn lewra ez ê di jiyana xwe de mêzekirina wî ji bîr nekim. ‘Mîna ku ji min re bêje em li benda te bûn tu ev helwest bidî raberkirin, ji te…’digot. Nizanim ji min

fam kir an na min jî jê re digot, ‘hinek din bisekine’ min xwest wisa pê bidim famkirin.”

Bêdengiya Ferhat dibe ku tenê sê mirovan fam kiribe. Ew bêdengî hezar û yek nihînî vedişart. Ji bo çareserkirina wê ji her çar hêlên cîhanê yên ku şifreyan çareser dikin bên, îstixbaratên herî baş kom bibin jî wê dîsan şifreya vê bêdengiyê nikaribin derxinin holê. Ferhat birîndar bû. Ev birîna wî ya kûr ji birîna çeka herî xirap zêdetir êş dida. Dilê wî li ser sêlên hesinî dibirijî. Û ew dil datanin pêşiya wî.

Rabû, çû quncekekî aram. Fikirî, herî dawî got li ber xwe bide Ferhat li ber xwe. Bila Xeyrî wisa li te mêze bike. Bila gelek mirov û kesên ji te hes dikin di derbarê te de xirap bifikirin. Tu bibe tu lê bi mîsogerî, bi mîsogerî mîna Mazlûm ew armanca xwe bicî bîne. Û tu beriya wî here agirê cehenemê vemirîne. Bi hemû canê xwe îstila bike quncika cehenemê. Digot ji bo hevalên xwe hemû cehenemê bike biheşt.” Di vê navberê de yê ku Ferhat ji nava xewn û xiyalan şiyar kir Ednan bû. Ji ber ku dizanî moralê birayê wî Ferhat nexweş e. Ednan li kêleka Ferhat rûnişt. Ferhat got:“Baş bû tu hatî. Tu biçe bangî Amed jî bike, hinek bi te re baxivin.”

Amed jî hat.

Ferhat:

“Mêzekin hevalno, di demeke nêz de hûn ê jî derbikevin dadgehê. Hûn dizanin Xidir îtiraf kiriye. Û ez bawer im me jî dinase. Bi mîsogerî wê îfadeyê li ser we bide.”

Dema ku Amed got, “rast e, wê Xidir îfadeyê li ser me bide,” Ednan bi serê xwe wî erê kir.

“Ji ber wê jî ji bo li hember dadgehê bê amedekarî nemînin hîn ji niha de em hesap bikin ku em ê çi bikin.”

Amed:

“Min beriya niha fikrê xwe ji we re gotibû. Ev ji bo min fersendek e. Ez ê partiyê biparêz im.”

Ednan:

“Min û Amed di navbera xwe de nîqaş kiriye. Em ê bêjin em partîzanin.”

Ferhat:

“Hûn nerînên min yên di vê mijarê de dizanin. Li hemberî her îtirafkarek divê çend heval partiyê biparêzin. Lê ev jî heye: Helwesta ku min nedayî raberkirin nikarim ji kesî jî bixwazim. Lewra ez vî maf di xwe de nabînim. Ez dikarim ev çend ji we re bêjim, ne demdirêj, di demeke nêz de hûn ê fam bikin ku min çima helwest nedaniye. Êêê em vê mijarê derbas bikin. Binê wê zêde nekolin. Helwest raberkirina we him wê

darbeyeke mezin li polîtîkayên dijmin bide, him jî wê ji girseya me re bibe bingehê moralê.” Di vê beşa axiftinê de Eşref jî hat rûniştin. Ferhat axiftina xwe domand:

“Lê ev kar baş hesep bikin. Sivik negirin dest. Bi awayeke hîn vekirîtir bêjim: Pêwîste ti aliyekî ev kar yê hestiyariyê nebe. Hemû gavên ku bi hestiyarî hûn bavêjin, di dema pêş de wê ji we re ziyanên mezin bîne. Hevalê ku ev helwesta siyasî bide nîşan, pêwîst e hemû tiştî hesap bike. Hûn dizanin çawa li ser yên parastina xwe dikin disekinin. Min nerînên xwe bi awayeke kin û cewherî ji we re got. Li gel giringiya ev kar û feydeyên bi xwe re bîne riskên (xeterî) wê jî hûn dizanin.”

Amed:

“Bira, tiştên te niha gotîn ez berê pê fikirîme û min biryara xwe daye. Ez ê xwedî li partiyê derbikevim. Zehmetiyên mercên heyî rastiyek e. Lê di vê mijarê de hûn dikarin bawerî bi min bînin.”

“Hûn ê bi awayê sempatîzanî bikin newisa ye?”

“Rast e.”

“Ev biryara we cihê kêfxweşiyê ye. Ez bivê gelek kêfxweş bûm. Ma ez ê êdî çi bêjim.”

Li gel heman nîqaşên ku hatine kirin, mijara nîqaşa helwesta ku Amed û Ednan di dadgehê de bidin

raberkirin hatibû girtin. Lê nîqaşa giştî ya li ser paraznameyan didomiya.

Ferhat:

“Ger ku dadgehkirina me di mercên xwezayî de çêbibûba, yê ku parastinê bike yê ku parastinê neke wê partiyê diyar bikiriba. Lê di mercên bi vî rengî de kî li xwedî partiyê derbikeve vê heya dawiyê bikaribe bibe, kes nikare jê re bêje ‘parastinê neke.’ Di mercên wisa zehmet de li partiyê xwedî derketin bûye erkeke şoreşgera ne. Ev kirin ne karê vî/ê yan jî keseke din e, bi temamî însiyatifa serbûxwe ya şexs a kesî ve girêdaye. Belê, dibe ku hîn di nava me de yekbûn û bi hev re bûn hebe. Ez wer texmîn dikim ku di gelek qawûşan de rewş hîn xiraptir e. Di navendeke wisa de mîna ku em rûniştine rûnanên û nikarin ji kesî re bêjî,in ‘tu parastin bike, tu neke.’ Hûn fam dikin ez dixwazim çi bêjim?”

Eşref:

“Bi serê xwe Ferhat erê kir û ji Amed re got, ger li gel te cixare hebe yek bide min.”

“Ez bawer im di ev aliyê berîka min de yek hebû. Ger ew jî neşikestibe. Bi rastî ew jî şikestiye.”

“Ka bide ez ê wî bi hev ve bikim.”

Eşref:

“Me belaya xwe li vî Îkrame da birastî.”

Ferhat:

“Dîsa çibû Eşref? Tersiyek heye?”

“Na, tersî mersî nîne, lê Îkramê di dema pêş de li ser serê me bibe baqanê aborî û maliyeyê wê kes nikaribe tişteke îllegal (veşartî) bike. Ji zilam re dibêjim tiner, boya û tiştên mîna wê bikire, nakire. Herî dawî min navê te jî bikar anî. Hinek fikirî nerm bû. Got, “ger birayê Ferhat bêje belkî ez bikirim.”

“Pirsgirêk tenê bila ji hevalên me be. Em ê hemûyan çareser bikin.

Got: Tişta ku ez jê ditirsim, ‘gelo ji hêla dijmin ve tiştek bûye Eşref wisa dibiriqe.” Îkram ev rewş ji min re got. Min lê tembîh kir ku tiştên me got fam bike.”

Di vê kêliyê de Mahmûd biken bi kêfxweşiya zarokekî herdu destên xwe di nava hev de kemirand got; “min emanetên me peyda kir û veşart.”

Eşref:

“Birayê min kengî hat, te kengî veşart?”

“Tu wê ji min re bihêle.”

Eşref got:

“Madem tiştên me hatine, ferq nake. Êdî tirsa min ji tiştekî nema.”

Ferhat:

“Hevalno ji ber em meseleyê dizanin tiştek li ecêba me naçe. Lê li hevalên ku nizanin bifikirin. Dema ku min ji Ednan re got “qantînek tijî û xweşik binivîsînin feqîr ecêp ecêp li rûyê min nêrî. Herî dawî xwe negirt û got, ‘bira sankî hûn rewşê nizanin wisa tevdigerin.Ger wisa biçe wê bûtçe îflas bike.’ Min jî jê re got tişt nabe, bila heval fêkî û hişînahiya destpêka demsalê bixwin.”

Barê salê giranbû û 365 roj têr tejî bû. Temenê mirov ji salan heya salan, ji mehan heta mehan û hefteyan pêk tê. Hefte jî di nava xwe de beş dibin dibin roj. Mirov navan li van rojan dikin: Yekşem, duşem, roja piştirîn ya yekşemê re dibe sêşem, çarşem, pêşem, înê û roja di pişt înê re û hwd. roj wisa dizivirin û çembera di destê zarok de mîna topaç e. Demsal çar in. Demsala herî xweşik bihar e. Gulan di demsala biharê de nêrgizek e. Çar can, çar mirov tiliya xwe ya şehadetê datînîn ser lîstika şans a tabloyên demsalan li ser nivîsî û xêzkirî, li ser şansê wan wê derbikeve.

Û bi hev re di ya hemûyan de demasala Gulanê destnîşan dike. Rojên Gulanê yên destpêkê rojên wan

yên çandin û bereketê ne. Çar giyanên dilxweş, çar mirovên mêrxas û çar rojan li gel hev tên dirêjkirin.

Rojên meha gulanê nayên hesapkirin. 16... 17...18... 19... Mîna gulan zahfin şehîdên şoreşê di meha Gulanê de. Wê di nava kefa destê me de, li naverasta eniya me û li rûpela herî xweşik yê dîrokê bê nivîsandin ew çar dîrok, ew çar roj ew çar mirov.

## 16 Gulanê 1982, Yekşem:

Li her çar aliyên cîhanê rêveberiya wê çi dibe bila bibe bi mîsogerî rojeke betlanê û demeke bêhnvedanê heye. Lê di girtîgeha Amedê de bi ti awayî mirov rastî rojeke bêhnvedan û betlanê nayê. Hemû demjimêr û çirkeyên girtiyan hatibûn dagirkirin. Navê jiyanê heta tu heyî îşkence ye. Qawûşa 33'an jî di nava vê giştîbûnê de parçeyek e. Biêş û evînên xwe re parçeyek in. Yek jî di qawûşa 33'an de yekşem hebû qet nepirsin bila derbas bibe. Di tarîhî sibehê de rabû, bi gilaseke av çav şûşt, rî kurkir. Xwarina sibehê ji zû de hatiye jibîrkirin, bermahiyên xwarinê yên di bin quncikên ranzan de qirik teselî kiribûn, mîde ji vala sekinandinê rizgar bibû. Nobedarê şevê di demjimêrên xwe yên nobedariyê de xweş nemeşina girtiyan dikir hîncet û girtiyan dixist ber lêdana daran. Ev lêdan jî xwarina

wan ya sibehê bû. Komek girtî li cihê xwaringehê(navenda perwerdê)li ser lingan, di sekna rawest de sekinîbûn. Yek ji girtiyan pirtûkê dixwend, girtiyên din jî lê vedigerandin. Navê vê jî “perwerde”bû…”

Ferhat, Necmi, Eşref û Mahmûd  mîna her carê li gel cihê Ferhat rûniştibûn diaxivin. Di van rojên dawî de her tim wisa tên gel hev nîqaş dikin. Ev jî ji ber çavê çend girtiyan neçûbû. Merwan nêzî Amed bû pirsî û got; “yaho ev wisa çi diaxivin?”

“Ma ez ji ku derê dizanim? Ez jî mereq dikim. Ger tu dîqat bikî her tim her çar tên gel hev. Hêdîka diaxivin.”

Bi rastî jî ev çar heval çi diaxivin? Ev her çar hevalên ku bi salan bûn bi hevalên xwe yên din re jiyan kirin û hemû zehmetiyan bi hev re derbas kirine ji hevalên xwe yên din çi diveşartin. Ka em guhê xwe bidin axiftinên wan temaşekin çi diaxivin:

Ferhat got:

“Min belavok nivîsand. Bigirin lê gelek veşartî bixwînin. Piştre ez ê rewşa herî dawî bidimê. We çi kir?”

Necmî: “Karê nobetê yê îşev temam e. Ez ê dewr bigirim. Mîna ku hûn dixwazin wê çêbibe.”

Mahmûd :

“Amedekariyên me yên din jî temam in. Lê rewşekê din heye: Şev heya seat 24.00 û 01.00’ dema me heye. Ez dibêjim di nava vê wexta mayî de ji hevalên xwe re mîna ku me heya niha kirî bêyî ku em vekirîbûnek bidin hinek tiştan ji wan re bêjin.”

Necmî:

“Tiştên ku em bêjin pêwîst e di derbarê çi de bin?”

Eşref:

“Divê bizanibin wê piştî çalekiyê çi bikin.”

Necmî:

“Him ev, him jî ji bo çalekiya me di navbera çar dîwaran de nemîne di vê em bi wan bidin famkrin ku ev çalekiyekî di dadgehan de bênin ziman û bidin vegotin. Bi awayeke sergirtî divê em ji wan re bêjin, piştî çalekiyê divê fam bikin ku me ji wan re çi digot ango çi peyam dida.”

Ferhat:

“Divê em hîn berfirehtir ji wan re bêjin. Pêwîst e em qala Mazlûm ji wan re bikin. Û ev dem, zehmetiyên ku tevgera me di nav de ye ji wan re bêjin. Piştre hundir, bi taybet polîtîkayên îdarê yên îtirafkirinê bi awayeke baş bidin vegotin. Temaşekin, vê baş bizanin tiştên ku

hûn îşev bênin ziman, wê sibe bibe dîrok. Zêde hestiyar nêz nebin.”

Roj, ji derveyî her çar giyanên dilxweş, mîna her carê bi germbûn û monotona xwe ve didomiya. Lewra çar heval bi çar çavan li benda hatina kêliyên demjimêrên şevê bûn. Wê bi hesreta salan lêvên şeva mirinê maçî kiriban. Wê ew tilsim û efsane hilweşandiban. Wê bidîtiban mirin çawa bi rezîlane xwe davêje ber lingê wan. Û wê dijmin ji hilweşandina vê kela mirinê birevîba bêyî ku li pişt xwe mêze bike. Bi kelecanbûn. Kelecana wan ne ji tirsa re bû. Li hemberî tirsa herî zêde serî radikirin û ji bo hesab jê bixwazin bi kelecan û bêsebir bûn.

Lê cudahiya wan ya ji hemû rojên din, şadî belavdikirin li derdora xwe, rûyên wan zindî mîna kevirên di nava avê de diberiqîn, mîna çirûskên agir ji nava agir dipeyîtin ber bi asîmanan ve. Dema ku roj diçê hêlîna xwe êdî meydan ji şevê re dimîne û şev bandora tarîtiyê serwer dike, bi tarîbûna şevê re dengê gardiyan yê mîna jehrê xewn û xiyalên wan parçe dike:

“Rabin derbasî rêza hêjmartinê bibin!”

Pêşiya deriyê kuna mazgalê ji deriyê cehenemê necudatir bû. Dema deriyê mazgalê vedibû, her tim çar kesan lêdana herî zêde dixwar.

Yên ku li wir diman êdî ji vê bêzar bibûn. Carînan ci guhertin çêdikirin. Îşev yên li wir mabûn dîsa firar kiribû. Cihê wan vale bû.

Necmî got:

"Hevalno, em çar kesên destpêkê di piyasê de nînin? Kî îşev li vir bimîne, ji gel min du cixare ji wan re heye, dema ku Necmî wisa got daxwaz zêde bû. Li ser vê Necmî got: Ka rawestin dema daxwaz zêde dibe hêjmara cixareyên ku ez bidim jî kêm dibe. Dîsa pirsî got, yanê bê cixare yê ku dixwaze bidil bimîne heye?"

Eşref got:

"Ez û Mahmûd em ê bisekinin. Lê tu yê cixareyên me bidî Halo."

Necmî:

"Baş e ez qebûl dikim. Êde ka, wê demê biçin ciyê xwe. Hêjmar wê bê girtin."

Eşref û Mahmûd çûn ciyê xwe. Hêjmar hat girtin. Gardiyan û subay derketin çûn.

Gardiyan dema çû got: "Bila piştî xwarinê her kes winda bibe. Piştî pênç deqîqeyek din ez bêm divê yek tenê jî li ser lingan nebînim."

Wiha şeveke din jî daketibû nava girtîgehê. Rûniştibûn çong dabûn hev. Girtî di nava nîqaşa

giyanên dilxweş de bûn, bêyî ku bizanibin ev şev ji hemû şevendin cudatir e… Nîqaş bi awayeke du koman cuda biêbû. Ma bê cixara û çay tama nîqaşê heye. Lê di girtîgehê de girtîbûn. Neçarbûn her tiştî sebir bikin. Ji ber ku xwe dabûn ber hostahiya zorê. Ji tiştên biçûk zêdetir kêfxweşiyên mezin diafirandin şoreşgerên afirêner. Bila çay nebe, bê çay jî tê jiyîn; bila xwarin nebe, bêxwarin jî tê jiyîn.

Lê bê şeref, bi temamî teslîmê dijminbûyîn nedihat jiyankirin. Ji jiyaneke wisa re jiyan nedihat gotin. Dibe ku ji bo hinekan ji vê re jiyan bê gotin, lê ev ji bo şoreşgeran ne jiyan bû, mirinek bû. Tê dîtin, tê dîtin dema mirov dixwaze, digere dipirse çareya her tiştî tê dîtin.

Çi gotine? “Yê bigere wê mewlaya xwe û belaya xwe jî bibîne.” Bila. Mane jixwe ya girîng, lêgerîn e. Ha te Mewla dîtiye, ha bela. Ma ya girîng ne hewldana lêgerinê û bidestxistinê ye? Piştî ku giyaneke me hebe em bavêjin nava agir. Ferhat, bi wan çavên xwe yên şîn, bi cesteyê xwe ya narîn, bi jîriya xwe ya ku ji yekê dikir deh, ji dehan dikir sed hevalên xwe dişopand.

Îşaret da Merwan. Merwan, yan fam nekir yan jî xwe li nefamkirinê danî. Ev Merwan bû. Dema ku cixare li

gel kesê nedima li gel wî peyda dibû. Dema ku Ferhat zanî Merwan îşaretên wî ji nedîtîve tê, got:

"Merwan giyan ka wan cixareyan bîne em vexwin."

Merwan:

"Ev jî ji ku derket? Ev sê roje bê cixarem e."

Ferhat:

"Wisa neke dostê min. Yê her kesî xilas bibe, lê yê te xilas nabe. Biçe ji wî tûrikê (zulandan) xwe yekî derxe."

Piştî ev qas israr şûnde Merwan, neçar ma biçe pakêtekê derxe li hemû hevalan belav bike. Cixareyên Merwan anî hatin pêxistin. Nîqaş germtir bû. Bi giştî navaroka nîqaşan bûyerên rojane bûn. Ferhat jî car caran ji bo hevalên xwe şad bike hinek henek dikirin. Bi pêkenok û bîranînan navend di nava kêfxweşiyê de dihişt. Di navberekê de Ferhat got, "ger hûn bixwazin dikarim ji Cigerxwîn meseleyeke rastî ji we re bêjim. Begumanbi mercekî. Ger Merwan qebûl bike. Ya rast heke bîne cî."

Merwan:

"Tamam bira, tu bêje ez ê pêkbînim."

Ferhat:

"Temaşeke yek tenê na. Duduyan dixwazim. Yek ji bo min, yek jî ji bo Halo."

“Bi rastî jî cixareyên min xilas bûn. Ji niha pê ve bila kes ji min cixare nexwaze.”

Ferhat serê xwe hejand got:

“Piştî behnekdin em ê bibînin.”

Ferhat bi ew Kurdiya xwe ya xweşik re dest bi meseleyê kir:

“Dema ez li derve bûm min pirtûkeke bi navê Reşo û Reşê xwendibû. Tiştên di bira min de maye dixwazim ji we re jî bêjim. Reşo, Kurdekî merd, wêrek û dirûst bû. Reşê jî keçeke Kurd a gundî bi xweşikbûna xwe destana li ser zimana ye. Reşo û Reşê, zewicîne gihiştine miradê xwe. Lê Silêman Axa çav berdabû kêfxweşiya wan…” Dema ku Ferhat digot hevalên wî ji dil guhdarî wî dikirin. Wisa ketibûn nava çîroka Reşo û Reşê dema Ferhat çîrok xilas kir, her kesî wisa dizanî ku wê hîn bidomîne. Ferhat di dawiya çîrokê de şîroveya xwe kir. Û derbasî mijarên din bû.

Reşit jî çûye ser cihê Mahmûd , li wir rûniştibûn nîqaş dikirin. Mahmûd , ji hevalên xwe yên ku bi hev re hatibûn girtin qala bîranînên xwe yên berê dikir. Di nava axiftinên xwe de pirsî got, “tê bîra te dema em hatin girtin li ser min qemîsek hebû?”

Reşit bersiv da got: “Rast e tê bîra min. Te ji wî qemîsê (gomlek) xwe pir hez dikir.”

Mahmûd :

“Rast e min gelek jê hez dikir. Ji ber ew qemis hevalê Cuma Tak dabû min.

Ew qemîs ji bo min gelek bi qîmet bû mîna ku ji Cuma parçeyek li gel min mabe. Lê ev parçeyê bi qîmet didim te. Begumanbi mercekî didim te. Tu yê soz bidî min ku nedî kesî.”

“Madem bîranîneke Cuma ye li gel te maye, ez ê çawa ji te bigirim? Yek jî qemîsên min ji yên te zêdetirin.” Mahmûd xistibû serê xwe qemîs bide wî. Wî yê qemîs bidaba Reşit. Çar sal bû wî qemîs diparast û bi ti awayî dil negirtibû li xwe bike, derxist. “Ha ji te re, bigire çi li gel te bimîne çi jî li gel min ferq nake. Min neşkîne, bigire.”

Reşit nikarî xwe li ber israra wî bigire qemîs ji dest girt…

Eşref, li Amed zivirî got, “ Dostê min qemîseke min ku bidim te nîne. Lê dema em li qawûşa sêyemînbûn birayê Kemal pênûsa Şafer dabû min yanê li gel min tenê ew pênûs heye. Heya niha min ji hemû tiştî

parastiye nehêlaye bikeve destê gardiyanan. Ger tu soz bidî ku biparêzî ez ê bidim te."

Amed:

"Yahu çi bi we hatiye? Yek qemîs, yek jî pênûs dide…"

Mahmûd û Eşref li hev nêrîn.

"Ji dilê me tê ji ber wê didin te. Herduyan got ma ji bo tiştek bidin hev divê îleh tiştek çêbibe?"

Li ser vê Eşref pêwîst dît ku mijar bide guhertin û got:

"Hûn dizanin ez çi difikirim? Gelo tiştên îro li vir dibin wê rojek bê bi awayeke vekirî di dadgehan de bê gotin? Ev wehşiyeta li ser me didin meşandin gelo wê ji gel û partiya me re bê ragihandin? Dixwazim yên ku li vir sax bimînin tiştên li vir bûye û dibin di dadgehan de bînin ziman."

Ednan, bêyî ku li benda Eşref bimîne axiftinên xwe xilas bike got, "ev wê bibe erka me ya bingehîn."

Eşref li Amed zivirî û got,"Dostê min, hûn difikirin gotina dawî ya di dadgehê de çi bêjîn?"

"Ez qet nefikirîm. Hîn ji roja biryarê re gelek heye. Heya wê demê em ê sax bimînin nizanim.

Lê ger ku sax bimînim ez ê soza xwe ya bi serkeftin, partî û kesên ku di vê oxirê de bêyî ku dudiliyek jiyan bikin bidim. ”

Ferhat dema bi bêdengî gotinên Amed guhdar dikir got:

“Wê bibe sozeke dawî ya herî xweş.”

Eşref jî gotina wî ecibandibû. Gotinên ku amede kiribû ku di dadgehê de bêje ji bo bala Amed jî bibe ser got, “Ka li ya min guhdar bike. Ger ku ez sax bimînin ez ê vê bêjim: Tabî ger tu bixwazî, dikarî bêjî ev wesiyeta wî bû.”

Amed:

“Na, ma tişteke din yê te nîne? Ma ez warîsê te me? Yek jî li gorî tu yê bixwe jiyan bikî çi pêwîstî heye ez bêjim?”

Ednan:

“Sozeke çawa ye. dibe ku ez bêjim.”

Eşref:

“Qaxiz û pênûsa xwe derxe binivîsîne. Ji ber tu yê nikaribî di serî xwe de bigirî.”

Amed:

“Yaho hevalê min, yê te ne soza dawî ye ez bawer im roman e.”

Ferhat jî bi xwe nikarî axivî got:

“Te tiştek çawa ameder kiriye, bendeke(dörtlük)?”

“Na bira. Gotineke ayîdî Filistiniyekî ye ku min di demên borî de di rojnameyan de xwendiye. Gotin wisa despêdike. “ Em di nava şerekî dene, em ê vî şerî qezenc bikin, ji ber ku em arasteya hestên gelê Kurd diyar dikin. Ne tenê ji bo yên ku dijîn, ji ber ku em dê bibin hêviyên zarokên hîn newelidîne; em ê vî şerî qezenc bikin!” Vaye gotina min a dawî ev e.!

Her kesî ecibandibû ev soz.

Ednan:

“Ev soza xweş tu bi xwe bêje.”

Ferhat:

“Hevalê ku ev soz bêje divê bide diyarkirin ku ev soz aîdê kê/î ye. Ji lihevanîn bi vî rengî zêdetir divê tiştên xweser bên dîtin. Temaşekin soza ku Fidel Kastro di dadgeha xwe de gotiye:

‘Edalet, dişibe keçeke bakîre (pakîze). Ger pê bê lîstin wê ti cudahiyeke wê ji orospuyeke ku di kolanan de şûr dihejîne nemîne.’ Ma hûn dikarin vê sozê di dadgehan de bikin malê xwe bêjin? Bêguman nabe.”

Ferhat dema li ser sozên dawî diaxivî, dît ku Necmî hat pirsî got, “te çi kir?”

Necmî: “Ew kar temam, min dewr girt. Ji niha şûn ve karê nobedariya şevê ez ê li ser bisekinim.”

Dema ku Mahmûd  bihist Necmî got ji niha şûnde karê nobedariyê ez ê li ser bisekinim ji hevalan re got: “ Hevalno hûn çima alûce, xiyar û firîngiyên xwe naxwin?”

Necmî got: “Ka hûn destpêkê yên xwe derxinin em xilas bikin. Piştre em ê bi dorê bixwin. Ma ne wisaye birayê Ferhat?”

Ferhat:

“Çikûsiyan nekin. Çi yê we heye bixwin. Cilên xwe yên xweşik jî li xwe bikin. Hûn dizanin di vê girtîgehê de ewlahiya tiştekî nîne. Hûn sibe temaşe bikin, hemû tiştên we yên xwarinê û lixwe kirinê di bin potînan de perçiqandin û çûn.”

Mahmûd  tiştên di bin ranzê de derxist danî holê.

“Werin hevalno, bixwin.” Ev rewş li ecêba girtiyan çûbû. Yek jî Mahmûd  berpirsyarê komê ye, divê bifikire ku wê sibe koma wî çi bixwe. Lê weke ku Cigerxwîn jî gotî ‘selam her tim li sofreyê heye (Sofraya her zaman selam var)”gotin û xwarina heyî hemû xwarin. Ferhat got, “Abid ji nexweşxanê hatiye ez ê hinek biçin gel wî û bêm.” Ferhat jî beşdarî ev karwana

tişt dayînê bibû. Qemîsê xwe danîbû ser cihê Abid û vegeriyabû gel hevalên xwe yên din. Seata xwe jî dabû Celîl. Ji Celîl re gotibû ger tu derfetek bibînî vê rêke derve.” Ev helwesta Ferhat bal kişandibû. Îkram ev li gorî xwe şirovekir û xwe nêzî Amed kir. “Yaho bira ev çi dikin? Hemû tiştên xwe belav kirin. Bi quran di vir de tiştek heye. Tu çi dibêjî?”

Amed:

“Tu dixwazî were em biçin bi birayê Ferhat re baxivin.”

“Bi rastî jî ew li kî derê ye?”

“Temaşeke li gel cihê xwe rûniştiye tiştna dike. Deka em biçin gel.”

Dema ku Ferhat dît herdu diçin gel wî kenî.

“Got ka werin, werin.”

Hîn nerûniştin Amed û İkram bi hev re gotin:

“Bira em tiştek ji van tiştên dibin fam nakin. Ji êvarê ve qemîs belavkirin, lênûs dayîn, herî dawî jî te seata xwe da. Ev hemû ji bo çi ne?”

Ferhat mîna zarokeke biçûk bi şermokî dikeniya:

“Tiştek nîne. Tenê ji bo îhtîmala ku min bibin hûcreyê min seata xwe da Celîl. Ez gelek ji wê seatê hez

dikim. Diyariya bavê min e. Ger ku tu derfet bibîne ji bavê min re bişîne ez ê kêfxweş bibim.”

Êdî hinek girtiyan jî fam kiribûn ku ev şev ji hemû şevêndin cudatir e. Lê ma dibe çi bibe? Wiha ti girtî vê nedizanî. Hemû axiftinên şeva çaran yên xwatir xwestinêbûn. Piştî xwarina êvarê sofreyên nîqaşê ku ava bibûn destpêkê din bû. Her ku demjimêr pêşde diçû ev hêjmar çû çaran. Her çar heval li gel komek heleqeyek ava kiribûn. Berê jî sohbetên bi vî rengî çêdibûn, lê ya îro gelek cudatir bû. Ne kes radiza ne jî ji nîqaşê teng dibûn. Bi taybet ew gotinên xweşik ku ji nav lêvên Ferhat derdiketin berdin jê teng bibin, kesî nedixwest ji vê nîmetê kêm bimîne. Dema ku Amed li Ferhat guhdar dikir kûr çûbû, dema di 8’ê Adara 1981’ê de teslîm bibû û axiftinên xwe yên ku di cihê hewakêşanê de bi Ferhat re kirî hatibû birê.

Ferhat wê demê çi digot? “Ji me zêdetir kes nikare me ji vê wehşiyet û teslîmyetê derxine. Ev jî encax bi berxwedanî kirin û dana domandinê dikarin bikin.” Di ser wê axiftinê de salek derbas bibû lewra heman Ferhat axaftina xwe ya nîvî mayî temam dikir. Ji dema ku Ferhat li qawûşa 37’an dîtî, roja ku pê re axivibû heya wê şevê mîna şerîda filmekî anî ber çavên xwe.

Muhasebeyek kin û zû kir.

Di navbera axiftina Ferhat ya destpêkê de û ya îşev dike de sedî sed mîna hev bûn. “Ez bawer im bingeha vê heskirin û rêzdariya li hember vî mirovî ji hevgirtîbûna fikrê wî û biryarbûna wî ya di pratîkê de tê. Lê ma dilê min hinek neşkestiye? Dibe ev qusura ku dibînim ji bo min be, ji ber wê min nedixwest bibînim. Ji ber mirovek gelek hêja bû. Carnan di hûndirê xwe de “dibêjim çima, yek jî di hundirê dadgehan de helwesta xwe ya siyasî jî raber bikiriba bes bû.”

Li gel wî ne tirsa ceza hebû ne jî ya dil. Lê dîsa dibêjim çima û ji tirsîn û vê pirsê ji xwe zêdetir nikarim bi kesî re parve bikim.”

Ev qusura ku dibînim dibe ji ber min be.” Dema ku Ferhat dît Amed kûr çûye pirsî got, “çibû Amed tu tiştên gavadin difikirî?” Mîna ku Amed li ser sûc hatibe girtin dema serê xwe xist ber xwe, Ferhat jî axiftinên xwe domand:

“Tiştek nabe, nefikire, wê zêde dirêj neke, sibe yan jî çend rojçn din tu yê hemû tiştî fam bikî.”

Ferhat weke fermandarekî ku dizane hest bilind bûne û şertên heyî kontrolkirinê pêwîst dike, xwest gumanên Amed vegerîne aliyek din.

Piştî vê nîqaşa navber şûnde Ferhat, dîsa vegera ser nîqaşa xwe. Axiftinên Ferhat hemû girtî bandor kiribû girtiyên komên din jî hêdî hêdî dihatin beşdarî koma wî dibûn. Bi vî rengî bibûn yek kom, yek nîqaş, yek kulm û bi vî rengî nîqaşa şevê didomiya.

Ferhat got:“Tenê rêyek heye em ji vê navendê xilas bibin ew jî rêhevalê me Mazlûm Doxan nîşanî me kir. Heke mirinê bidin ber çav em ê ev perdeya ku diçe îxanet û îşkenceyê bi hêsanî biqetînin, yan na ev riya ku diçe îxanetê xwe îsbat kir ku berevajîkirina wê dê zehmet be. Hûn dizanin sedema herî mezin ya teslîmnebûna me çi ye?

Ji ber dema cihê wê tê em nizanin bimirin. Lewra pêwîst bû dema ku ciyê wê hat me bizanîba bimirin. Wiha kêmehiya me ya herî mezin dîsa Mazlûm fêrî me kir. Ji bo em di girdaba vê îxanetê de nefetisîn û destûr nedin ku doza me di kesayeta me de bidin fetisandin divê em riya Mazlûm bidomînin. Him jî em dengê xwe bi awayeke hîn xurttir bilind bikin, bi giyana xwe ji ev riya diçe îxanetê re bêjin bisekine.”

Mijara ku beriya niha Eşref anî ziman Ferhat pêwîst dît ku carekdin bal bikişîne ser:

“Pêwîst e hinek heval merc çi dibin bila bibin tiştên li vir diqewîmin di dadgehan de bînin ziman. Mercên

heyî zehmetin, dibe ku hîn zehmetir bibe. Lê divê rastiyên li vir gel û partî bizanibe.” Ferhat bi van gotinan axiftinên xwe qedand.

Eşref çû paketek cixare anî li yên rûniştî belav kir. Li ser vê Ferhat li Merwan zivirî got: “Textîkên te îflas kir. Ka temeşeke li gel hinekdin jî tek tûk derdikevin. Hîn paketên ku nehatin vekirin hene.”

Merwan:

“Bira tedbîrên mirov her tim hebin baş e.” Li cihê ku Ferhat wan lê rûniştîbûn dema dît Necmî tê, mîna ku leza wî hebe got, “ez ji tiştek naêşim ji bo ku min di dadgehê de partiyê neparastiye diêşim. Lê ez ji vê jî bawer im. Ji bo ku min parastin nekiriye wê gel û rêxistin min efû bike. A rastî ez bawer nakim ji bo me parastin nekiriye kes me tewanbar bike.”

Mahmûd :

“Tiştên tu dibêjî rast in.”

Necmî:

“Mahmûd sankî te bikiriba tu yê biçûbayî jor(şaha). Sankî di min de kêmbûnek heye.”

Ferhat jî beşdarî axiftina Mahmûd û Necmî bû. Di mijara parastina rêxistinê kirin de hûn nêrînên min yên 1981’ê dizanin. Wê du hevalan parastina giştî

bikiriba. Yên ku ceza bigirtan jî wê li gorî rewşa xwe yên endem, sempatîzan û alîgir helwestên xwe danîban. Lê mercên me ji vê re dest neda. Niha jî di dadgehan de li partî û gel xwedî derketin bûye erkek. An ku pirsgirêk jî kêm cezagirtin, derketin û ji bo partiyê sûdmentirbûyînê zêdetir, li vir jî peywîrek şoreşgerî li pêşiya her kesê disekine.

Wiha di vê derbarê de ji gûmanên kesî dûr, hevalên me yên ku bi berpirsyariyeke mezin ev erk tênin cî hene. Di vê mijarê de bawer im ez dereng ketim. Dema me birin pêşberî îtirafkaran min ê bi Eşref re bikiriba." Got lê… sekinî.

Îkram li Merwan zivirî got:

"Ez bawer im wê birayê Ferhat li hember îtîrafa Yildirim Merkit parastinek xweş bike."

Merwan:

"Ez zêde bawer nakim. Lê dîsan dibe."

Merwan ji xwe re digot "na nabe, ev daxwiyanî ji bo parastinek tenê nabe." Kolombo Îsmet yê ku ji êvarê de qet neaxivîbû got:

"Bira hûn ê sibe biçin dadgehê. Divê bi awayeke baş tif li rûyê Yildirim Merkit bikin. Me ew qes nirx ji wî re da. Herî dawî me bi kevçiyek nîsk firot. Ez bi wî re

nemame. Yên ku bi wî re mabûn digotin, di berxwedaniyê de wî her tim di tuwelêtan de vedişartin.

Ji dema ku min ev bihîstiye heya niha ez ji Merkit nefret dikim.

Dema ku Îsmet vê tanî ziman, qehra xwe ya li hember îtiraf û îtîrafkaran tanî ziman. Ev axiftinê Îsmet Ferhat hestyar kir û li Îsmet zivirî got:

“Ber nakeve mirov tifî rûyê mirovên wisa bike. Li her ciyî ev mînakên wisa xirap derdikevin. Dozên mezin mîna ku her tim mirovên xwedî îradeyên mezin derdixin holê, yên îxanetkar û çivok jî derdixe holê. Girtîgeha Amedê arenaya ku qehreman û îxanet li hev dikevine. Di vê arenayê de yê ku ji şexsiyeta xwe tawîz nede, mirovê mezin e.”

Kolombo Îsmet got: “Bira mirovên mîna Yildirim Merkit sibe dusibê rewş baş bibe wê dîsa bên navenda me ne wisa?”

Ferhat: “Pirseke xweş e Îsmet. Ez bersiva pirsa te wisa bidim: Bêguman dijmin wê destpêkê hewl bide pêşengên tevgera me tine bike…. Vê him di warê fikir de him jî di warê fizîkî de dike. Ji bo dijmin armanca herî mezin di warê siyasî de xilaskirina pêşenga ye. Bi vî awayî wê bi demê re wan li hemberî partî û gel bidin

bikaranîn. Yên ku di vê pozîsyonê de ne wê îxaneta wan mezin be. Em dizanin cezayê îxanetê çî ye. Weke te jî gotî dema sibe navendên xwezayî ava bibin, bi mîsogerî yên mîna wî neyên efûkirin. Yek jî kadroyên rêxistinê hene. Îfadeyên wan hene.

Heke qadroyên rêxistinê di dadgehan de îfadeyê didin, rewş çi dibe bila bibe ev jî îxanetek e. Wiha navenda ku tu qal dikî divê ev bi ti awayî di navenda rêxistinê de neyên qebûlkirin. Li vir dijmin tenê ser pêşeng û qadroyên rêxistinê de neçû, li gel van ji partîzan heta yên alîgir li gor pozîsyona wan îşkence û zext dan meşandin.

Rêyek tenê danîn pêşiya her kesî. 'Dibêjin hûn ê îxanet bikin.' Di vê navendê de yên ku li hember îşkenceyên dijmin stûyê xwe ditewînin û tiştên dizanin ji dijmin re dibêjin alîgir yan jî yekî sempatîzan, ji bo tiştên kirî divê mîna yên din bi sûcdariyeke mezin re neyên destgirtin. Cezayê wan çibe bê dayîn.

Lê di dema pêş de unsurên mîna vî, heke karî di nava pratîka girtîgehê de xwe îsbat bike pêwîst dike di nava refan de bê girtin. Dema demjimêre zengilê kêliyên dawiyê yên şemiyê lê dixist, demjimêr, xulekjimêr û çirke yekparebûn.

Saet 24.00’bû. Şev jî kêliyên xwe yên herî tarî dijiya. Cî bi cî nîqaş didomiyan. Cixare yan ji hêla Eşref ve yan jî ji hêla Ferhat ve dihat belavkirin. Necmî karê nobetê çareser kiribû. Saet 1-3 Eşref û Mahmûd , ji 3-5 Ferhat û Necmî bû. Girtî hêdî hêdî diçûn ser ciyê xwe. Her çar heval jî çûn ser ciyê xwe, lê wê nerazaban. Li bendê bûn naveng hinek bêdeng û aram bibe. Yê ku herî dawî bêdengiya şevê parçe kir û dawî lê anî Eşref bû. Dema ku girtî bi vê muamayê razan bandora dengê stranên Eşref dihat guhê wan. Beriya ku saet bibe 01 Eşref û Necmî ji bo nobedariyê hatin. Ji hevalên xwe yên şiyar re gotin, “hevalno êdî hûn jî razin. Wê sibe karê we çêbibe. Em nobedar in.” Çend girtiyên mabûn jî çûn ser cihê xwe da ku razin. Her du hevalên nobedar çûn gel hevalê Ferhat. Necmî jî li wir bû.

Ferhat:

“Hevalno min rewşa belavokê ya dawiyê dayê. Guhdar bikin ez ê bixwînim.

Hersê hevalên ku mabûn di wê wexta şevê de li Ferhat guhdar dikirin.

Dema ku Ferhat xilas kir pirsî got: “Çawa çêbûye.” Hersê hevalan jî gotin “pir xweş e. Ji vê xweştir çênabe.”

Lê Ferhat, “divê em vê derbazî paqijiyê bikin. Ji ber em ê ji hevalên xwe re bihêlin. Yek jî em sernivîsek deynin.”

Necmî:

“Bila sernivîs ji hevalan re bimîne.”

Hemû tevlî vê nerînê bûn.

Ferhat:

“Bila Necmî û Eşref belavokê bavêjin paqijiyê. Ez û Mahmûd jî em ê amedekariyên din temam bikin.”

Dema ku demjimêr ji yek ber bi didu ve rêdiket amedekarî hema hema xilas bibû. Belavoka ku Necmî û Eşref derbasî paqijiyê dikirin ber bi xilasbûnê ve diçû. Ferhat û Mahmûd nîqaş dikirin.

“Çibû Mahmûd , hemû tişt temam in?”

Mahmûd :

“Rast e bira, min tiner û neft jî derxist. Hemû tiştên me temam in.

Hemû di hûcreya me de ne.”

Dema ku Ferhat ber bi cihê ku Necmî û Eşref lê bûn ve dihat, êdî wan jî xilas kiribûn, dikirin rabin.

“We çikir? Ma we hîn xilas nekiriye?”

Necmî:

“Xilas xilas.”

Ferhat:

“Di binî de navên me jî binivîsînin, em îmza bikin. Zû bikin.

Saet tê 4’an.”

Saet di 4’an de çar heval, di navbera çar dîwaran de, ji çar giyanên dilxweş wêdetir rûniştin. Wê rewşa dawî binirxandiban. Wê cara dawî bihatibana gel hev.

Ferhat:

“Hîn wextê me heye. Heke bixwazin, hinek tişt bînin em bixwin.

Ev çalekî, çalekiyek zehmet e. Divê bihêz û zîrekî be.

Ne tirseke me, ne jî eceleyeke me heye. Got bila eceya (ölüm ecesi) mirinê bi vê bifikire.”

Hevalên wî yên din mîna bêjin ku, “Ferhat mafdar e” hema hinek tiştên xwarinê anîn. Parçeyeke nan, çend piç penîr û yek jî nîv paketa cixareya wan hebû. A rastî dikarin ji vê re bêjin bermahiya bingê cixaran. Heke tiştên din yên xwarinê bidîtiban û dema wan ya xwarin xwarinê hebûya, hemû girtiyan wê vê bikiriban.

Bêguman nediyare wê sibe çi bibe, ev ji bo biçik xwarin jî derbasdar e. Carna ev bicika xwarinê, di çavê girtî de dibe xwezineya herî mezin.

Mîna her carê Ferhat dîsa ferman dabû. Mîna leşkerên bi bawerî ku ti caran fermana xwe şaş nakin sekinîbûn; gêrîlayên întîharê yên ku bikevin nava Îsraîlê bûn û gêrîlayên K...' bûn wê girtîgehê ronî bikiriban.

Necmî, Eşref û Mahmûd , bi qomîta Ferhat li ser lingan bûn.

Mîna xencera nikulkêr ya Kurd riprast, mîna rim bûn…

Eşref wê şevê gotina bira gelek xweş bilêv dikir, ji Ferhat pirsî û got:

“Bira ez belavokê deynim kî derê?”

“Bibe deyne bin serê hevalek. Bi awayeke ku bibîne deyne.”

Her tişt temam bû. Girtîgeh bêdeng e, girtîgeh goreke zindiye. Ger ku mêşek di hundur de bifire dengê tiv tiva wê bi kîlometreyan bê bihîstin. Yê ku ev deng bibihîstiba jî mîna helîkopteke biçe serdegirtinê bizanîba. Dema ku hevalên wan westandina rojê bi xewê derbas dikirin, çar stêrkên li asîmanan li van çar mirovan temaşe dikirin. Sankî her stêrkek mîna dedektîfan wan dişopandin. Rabûn. Serê wan bilind, bi gavên ji xwe bawer meşiyan.

Di vê girtîgehê de ti caran wisa bi zewq û coş nemeşiyabûn. Meşa wan, meşa wan û bi sekin û tevgerên xwe re tama gava ber bi azadiyê ve tavêtin derdixistin. Kesê bi qasî wan bêriya azadiyê nekiribûn. Ew biqasî di ber azadiyê de bimirin evîndarê jiyanê bibûn. Ew her çar stêr evîndarên jiyankirinê bûn, dergistiyên azadiyê û bi mirinê re jî marhkirîbûn. Ev marhkirin, ev dawet, mihrîcana herî xweşik ya azadiyê bû.

Kêliya şikestina girtin û radestbûnê, derbeyek mezinbû li îxanetê.

Dema ku pelên taqvîman mîna dema dara peyîzê pelên xwe diweşand û xwe bi dîroka 16-17'an re nû dikir, ev çar mirov, ciyên xwe di hûcreya azadiyê de, li bin tencereyê rûniştin li gel şehîdên Gulanê heleqeyeke din zêde kirin û wanê bi bedenên xwe qazan helandiban. Ev, berxwedaniya şeva her çaran bû. Ji çîçekên meha Gulanê yên renge reng û hêcana wê serenatek bû. Di hûcreya azadiyê de çar giyan rûniştin. Ji mirinê re gotin silav û çong dan hev. Tu li kî derê yî. Tu li kî derê yî, ma wisa bêwefatî dibe? Ma li derve şerê me bi te re hindik hebû bira? Carna te dida pey me carna jî me dida pey te. Ji ber em, li cihê ku dimirin ji nû de bêmirinan diafirînin. Lê ger tu bi vê kêliyê re rû

bi rû hatî tu yê belengaz û biçûk bibî. Her ku tu biçûk bûyî, em ê mezin bibin.

Ev qas sal, ev qas qehr, piştî ev qas îşkence û şûnde em her tim li te geriyan. Nepenî nebe neçe; navê te, di nava mirinên mêrxas de sucek bû. Tu ha hatî, ha bihatibûya. Lê min got ya, li gel bêwefabûna te ew çend bêbextiya te jî heye. Dema ku te bi hatina bi vî rengî naza xwe dikir, me dizanî bi çengê te bigirin bênin jî. Em mîna dosteke çil salan nêzî te bûn me te girt ser sofreya xwe. Me got keremke rûne. Me got tu bi xêr hatî ey mirin. Yanê tişta dixwazim bêjim, me dîsa da pey te. Me te girt û anî. Ev lirasthatina me ya bi te re, ne ya destpêkê ne jî di ya dawî de bû. Şerê me yê bi te re ji ezîz Prometheus heta Spartakus, ji Bruno heta Che Guevara, ji Kawayê Şoreşger heta Kawayê Hemdem, ji Delîl heta Huseyînan tê. Li hemberî te sonda me her tim berxwedan bû.

Ferhat, dibin ronahiya findên tarîbûna mirinê ronî nedikirin de bi wan çavên xwe yên şîn ku yaqût (yakutu) li bîra mirov dianî li hevalên xwe temaşe kir. Çav bi çav, dest bi dest û mil bi mil bûn. Ziman sekinîbûn, çav diaxivîn. Îfadeya herî baş destlêdan (dokunmaydı) bû.

Cewherên polayê bûn ku amadebûn di potayakê de bihelin.

Şikefta dev qelişî di nava dabeşbûna zimanê xwe de. Erdhejbû zimanên Ferhat ên zuhabûyîn:

“Em temam in heval?”

Dilê hersê dilxweş û giyanan mîna seata herî bi rêkûpêk kar dikir.

“Em temam in, tu dikarî pê bêxî.”

Ferhat, şixate girte destê xwe, çar zilik derxist, her çar anîn gel hev, destpêkê zilikan hêdî ser şixatê ve bir. Bi destên xwe yên vala piyên hesin ên li bin qazanê hembêz kirin. Li tifriyê xistina Ferhat a şixatê, çirûskên belavbûn, tînera pêketî, şewitî û dengê neftê…

Agir… Teqandin... Di nava pêda dûxanan de çar giyanên mêrxas lingên xwe dan berhev… Rêwîtî destpêkiribû, di kurahiya valetiyê de. Ev îşlema paş ve jimartina rêwiyên bi biryarbûn biçin gel stêrkên ku li wan temaşe dikirin bû.

ZAROKÊN ŞAD ÊN DÎROKÊ

Di hejdeyê gulanê de

Di quncika binê zîndanê de

Pêt bi çermê wan ketiye

Dişewitin zindî zidî

Zarokên şad ên dîrokê
mêrxasên gelê min
Şelaqên zîndanvan
Diêşand jan bi jan
Her dilopa xwîna diherike
Havênê rojên xweş e
Zarokên şad ên dîrokê
Lehengên gelê min
Di girtîgeha Amedê
Di riya diçe azadiyê de
Ferhat,Necmî,Eşref, Mahmûd
Derdikevin tabut bi tabut
Zarokên şad ên dîrokê
Qehremanên gelê min
Pîr Kemal rêheval Xeyrî
Di berbangek sipîsor de
kelepçêyên di milan de
Dê ji hev bikevin yek bi yek
Zarokên şad ên dîrokê
Qehremanên gelê min

## 17 Gulana 1982'an Duşem

Razan, nîvê mirinê ye. Kêliya behnvedana bedenê ye. Heta tundiya teqandinê jî hinek girtiyan şiyar nake. Yên ku pê bihesin jî guman nakin ku di nava qawûşê de ye. Bibe bibe, wê hinek bêjin di van nêzîkane de teqandinek çêbûye. Lê dema duxan pêt bi pêt hate hûndir, hinek girtiyan gotin rabin, şiyar bibin bomba avêtine qawûşa me!" Yên ku li ser qada yek û diduyan ya ranzeyan raketibûn, xwe bi awayeke bê zanebûn avêtin erdê. Girtiyên ku şiyar bûn çûn cihê ku agir pê ketibû. Girtiyan di nava qêrîn û feryadan de dikirin Hawar! Hawar! Hawar!

Li beramberî wan dîmenan mîna şêtan dizivirîn. Mîna hîşê wan ji serê wan biçe, bi tevgerên xwe yên sersem, bezîn çep û rastê xwe. Hêjmarek ji girtiyan bi kulm û mistan li derî dixistin. Dengek cuda ji pişt derî nedihat, hêjmarek bêyî ku bikevin ferqê û bifikirin ku sûc dikin cam dişkandin. Hêjmarek din jî di destê wan de bîdonên avê hewl didan agir bitefînin. Her ku agir vemirî, pêtên agir kêm bû û her çar mirovên ku di nava agir de mil dabûn milê hev hatin dîtin. Di carek de veciniqîn (îrkîldîler). Navenda mejiyê wan taxrîb bû. Hizirîn kete sekteyê. Ma dibe tiştek wisa dibe? Mirovên

di nava agir de mil dana milê hev, ma dibe? Yan na gelo ev kabûsek e? Hevalno qurincikan li min bidin qurincik. Yan jî gelo ez di xew de me? Ma ev kabûseke e? Rica dikim min xilas bikin ji nava vê kabusê, alîkariya min bikin, xirap dibim ser hişê xwe diçim. Ji nava agir dengek hat deng wiha bû, "avê pê de nekin…Agir pêxin…Agir…"

Di vê sedsala 21. ya heyv, merîh û gerstêrk hatî parçekirin, di sedsalek ku fetihkirin lê desthilatiyê dike de hinek mirovan keramet didît. Agir diaxivî. Agir ez im mîna te, mîna wî, mîna vî yanê bi dengê mirovan diaxivî agir. Agir digot; "min venemirînin. Min gûr bikin. Ez sedama jiyankirina we me. Ger ez vemirim, wê ocaxa we jî vemire. Ger ez vemirim û bêdeng bibim wê mirovahî jî bimire. Vê bizanibin. Digot, rondikên cavên xwe paqij bikin û li gorî wê nêz bibin." Lê ev ne asayê Musa yê deryayan diqelêşe, ne efsûna Mihemed ya çavan vedike, ne jî bi çarmixbûyînê bilindbûna Îsa ya asîmanan e. Ev mirov bûn. Ev zarokên nifşek yên ku di sofreya Zerdûşt a bi bereket de hewîbûn. Bawerî û ewlehiyên xwe, mirovatîbûyîna xwe ya bi agir re ji Kawayan girtibûn. Mirov bûn, mirov. Him jî yên mîna wan dikenin, digirîn û êş dikişandin bûn. Lê dema agir axiftinên xwe didomand, girtî mat û ziwa bibûn. Her

yek mîna îskeletekî sekinîbûn. Nedikarîn biryarê bidin, destnîşan bikin ku ev mirov kîne? Kîjan hevalên wan bûn? Gelo em avê pê de bikin agirê li ser bedena wan vemirînin yan jî em agirê bedana wan gûr bikin? Kêliya dudilbûnê bû. Kêliya dudilbûna, kêliya herî xirabe. Dema ku Salih yên di nava agir de nasî hema pê re slogana “bimire metîngerî avêt.” Çend girtiyên din jî dengên xwe bi wî deng re bilind kirin. Lê tişta serwerbû li ser wê kêliyê panîk bû. Kesê zêde guh neda ew deng. Di berbanga sibehê de dûmaneke reş ji qawûşa 33’an bilind dibû û ji girtiyan re agahiya xebera reş dida. Girtiyên ku bi bîdonên avê sekinîbûn bi feraseta em hevalên xwe xilas bikin avê bi agirê ku pêt bi pêt bilind dibû de dikirin.

Yên di nava agir de êdî fam dibû ev kîjan hevalên wan in. Ev Ferhat Kurtay yêdin Eşref Anyik

Ev jî Necmî Oner û Mahmûd Zengin in. Yên di nava agir de hîn qîr dikirin digotin. “Agir pêxin, agir, avê pê de nekin. Bese êdî, agir pêxin, yê ku avê pê de bike xayîn e. Hevalno me bi awayeke zanebûn xwe şewitandiye. Ev, çalekiyeke siyasî ye. Lewra çalekiyê neşkînin!”

Pêtên agir vemirîbûn. Bîna goştê mirov yê şewitî hundirê qawûşê tijî kiribû. Derxistina van çar mirovan

ya ji nava agir dîmeneke tirsnak bû. Rûyên wan di nava şewatê de bû. Goştê wan ji canê wan diket.

Lê destên wan hîn bi hev ve şidayî û bi hesinê qazanê ve zeliqîbûn. Girtiyan nedikarîn li rûyê hevalên xwe temaşe bikin, lewra hîn şeva din sohbetên herî xweş bi van mirovan re kiribûn. Hestiyê tasa serê Eşref, mîna abîdeyên xezîneyeke binirx di holê de bû. Girtiyan wan ji hev vekir xistin nava bateniyan. Anîn cihê beşa xwaringehê. Li wir danin ber hev. Mahmûd, bi qasî ku dikarî baxive, biqasî ku dengê wî derdiket dûrişmeya, "bimire mêtîngerî" tavêt. Di rewşa Eşref de diyar bû dixwest baxive, lê nedikarî baxive. Necmî tenê got ji min re balkiyek bînin." Ferhat di kêliyên rêwîtiya xwe ya dawî de jî, bi zanistiya pêşengatiya xwe ya şoreşgerî got, "ji min re bangî Ednan Yilmaz bikin."

Ednan li ber serê wî bû. Rûniştibû ber serê wî, bi bêdengî û ji kûr ve digiriya. Got, "ez li virim bira bêje. Çi emrê te heye bêje ez ê guhdar bikim." Ew destê xwe yê hemû şewitî mîna miroveke piştî salan ji gorê rabe li destê Ednan da û got, "destê xwe bidin hev, li hev xwedî derkevin. Hevalên xwe tenê nehêlin..." Girtiyan hîn nedizanin wê çi bikin. Hîn jî yên şoqa bûyerê ser xwe neavêtin mîna dînan li holê digeriyan.

“Yaho çi bûye? Kê bomba avêtiye qawûşa me? Kîjan heval mirine? Kîjan heval birîndar bûne...” Nihayet zebaniyên qawûşê û girtîgehê hêdî hêdî dihatin. Jixwe dema ku girtiyek bi awayeke xwezayî bikuxîba ev zebanî dihatin bi awayek tund ceza li wan dibirîn, lê îro ev zebanî derketibûn meşa kîso. Yek ji gardiyanên ku deriyê kuna mazgalê vekir got, “çibûye kuro? Hûn çi dixwazin? Ev duxan ya çî ye kuro? Yek jî hûn çima wisa komî ser hev bûne?” Girtiyê li ber derî got, “qomitan çar kesan xwe şewitandiye.” Gardiyan got “biçe ji xwe re tu çi dibêjî!”

Girtî, “welleh ez rast dibêjim qomitan.” Gardiyan got, “ji min re bangî berpirsyar bike.” Girtî got, “wî jî xwe şewitandiye qomîtan.” Gardiyan, deriyê mazgalê girt û çû. Ji ber bandora teqandinê, dûxan û piştre dengê qêrîna mirovan girtiyên li Bloqa D diman derketibûn ser şebakê, hewl didan tiştên ku bûye fam bikin. Gardiyanên ku ev rewşê dîtin. Gotin: “Dakevin xwarê kuro s…m, ez ji we re dibêm. Gardiyanan gotin, qawûşa 27. hûn yên ku çûne ser wir em ê sibe dayîka we s……me bikin. Dema ku gardiyan çû girtî, dîsa çûn ser şebakê, îdare ancex seat di 5.30 de hat. Li ber deriyê kuna mazgalê bi girtiyan re diaxivîn. Destpêkê newêrabûn bikevin hundir. Esat Oktayê Deccal ku di

bin venêrîna dehan gardiyan de hatibû, Got, “yên ku xwe şewitandine kî ne? Wan bînin vir.” Girtiyan hevalên xwe yên ku xistibûn nava beteniyan anîn ber derî.

“Onbaşî, we li hûndirê qawûşê temaşe kir?”

Onbaşî:

“Min temaşe kir qomitan.”

Yûzbaşî:

“Di destê wan de tiştek hebû?”

“Nebû qomitan.”

Yûzbaşî nedikarî tirsa xwe veşêre. Bi her awayî tirsa xwe dida derve.

Carekdin li onbaşî û çawûşan ziviri got, “kurê min carekdin jî li hûndir binêrin, karê van diyar nake.”

Piştî ku onbaşî carekdin di mazgala derî re li hundir temaşe kir şûnde got, “tiştek nîne qomîtan.”

Yûzbaşî:

“Baş e, wê demê tu û hûn herdu pêşî bikevin hûndir. Hûn jî li gel min bimînin. Yê ku nêzî min bû bêyî ku çavên xwe bigirin lêbixin.”

Gardiyanan gotin; “tu emir dikî qomitan.”

Yûzbaşî:

“Haydî şêrên min. Ez we bibînim.”

Deriyê qawûşê di carek de vebû. Onbaşiyê ku destpêkê ket hûndir got; “bila her kes bikeve cihê beşa razanê.”

Di pişt wan re Esat Oktay û askerên ku pê re bûn ketin hundir. Piştî ku li girtiyên nîv mirî yên di nava bateniyê de mêze kir şûnde, ji onbaşî re got, “kurê min ka bangî çend kesan bike bila van bibin cihê revîrê.”

Onbaşî bangî çend girtiyan kir batanî nîşanî wan kir got, “zû van bibin cihê revîrê.”

Yûzbaşî got:

“Bila gardiyanê 33. bê.”

Gardiyan:

“Emirke qomitan.”

“Kurê min, evên ku xwe şewitandine kî ne?”

“Yê destpêkê Ferhat Kurtaye qomitan.”

Piştî ku yûzbaşî cixareya xwe pêxist şûnde got:

“Demek wiha  ha.. Ferhat Kurtay. Min texmîn kiribû. Wê derketiba. Lê min rewşa wî derxist holê.Vê carê jî rabû xwe sotand. Deka em biçin.”

Derî girtin çûn. İkram, xwe nêzî Ednan kir bi awayeke bêdeng got,“birayê Ferhat belavok ji me re hiştiye.”

Ednan:

“Ka li kî derê ye?”

“Yê esasî di berîka çakêtê Eşref de ye. Piştî ku fitbolvan çav avêt belavokê şûnde got, “wext kême em vê çawa bidin xwendin? Em nikarin vê bi awayeke giştî bixwînin.”

Îkram:

“Tu zû bixwîne. Bide yên din.”

Ednan: “Her kesî belavokê xwend. Ji partîzanan em ji Mîthat re jî bixwînin.”

Amed:

“Heke hevalên me yên ku pêwîst bûn bixwînin hemûyan xwendibe bi wî jî bidin xwendin.”

Dema ku Mîthat belavok xwend da Ednan, hestên xwe anî ziman û got, “li hemberî van mirovan ne gengaze ku mirov li hemberî van çar kesan bi rêzdarî bejna xwe netewîne.”

Ednan:

“Ev belavok ji bo me nivîsandine, lê dem û cî nîne. Gelo em tine bikin yan jî deynin ser cihê birayê Ferhat?”

Amed:

“Tu dizanî. Lê ger ji bo me nivîsandiye, nekeve destê dijmin wê baştir bibe.”

Ednan çû tuwaletê belavok şewitand.

Belavok li ser du pelên lênûsa mezin ya kare hatibû nivîsandin.

“JI HEVALAN RE”

Di beşa belavokê ya destpêkê de ku sernivîs li ser bû bi kinahî, rewşa cîhan, herêm û nirxandinên li ser welat hebûn. Di vê beşê de, bi kinahî dîroka Kurdistanê, rûdanên ku ji Dersimê heya roja me ya îro qewimîne, avakirina Partiyê, têkoşîna wê, bi 12’ê Îlonê re berxwedaniyên li girtîgehan, 21’ê Adarê, çalekiya heval Mazlûm ya di Newrozê de hatibû nivîsandin. Di beşa dawî de jî qala armanca çalekiyên xwe, şoreşa Kurdistanê, girîngî û bandora ku li girtîgehê bide avakirin kiribûn.

Dibêjin ji bo zext, îşkence û hemû nêzîkatiyên li dij mirovahiyê ji holê rabe pirotesto dikin, divê mîrasê çalekiya hevalê Mazlûm li pey xwe hiştî bê domandin û

ji bo domandina vê bi erka zanabûna berpirsyariya vê re em çalekiya siyasî lidar dixin. Di dawiyê de jî nivîsa“Bimire(…), Bimire Emperyalîzm, Bijî (…), Bijî (…) Têkoşîna me hatiye nivîsandin. Di dawiya wê de jî nav û îmzaya wan heye.

Epikurüs, “mirin, ne ji bo yên dimirin ji bo yên dimînin felaketeke” a rastî ev soza wî li vir girîngiya xwe dide nîşan. Ev felaket, ji bo vê girtîgehê guncav dikeve. Ji ber di têkoşîna şoreşgeriyê de her mirovê ku dawî li jiyana xwe tîne, hemû nekokiyên wî/ê yên bi jiyan û li hember serdestan bi dawî dibe. Ev pêvçûn û nakokiyên êşên jiyanê yên bêrehm ji hevalên xwe yên dimînin re dihêlin, bi başî, nebaşî, xweşî û êşên wê re. Ji bo ku îdarê destpêkê vê mîna pertekek da dest lewra nerm nêzî girtiyan bû. Usteymen Ali Osman Aydin hat qawûşê her girtiyek qaxezekê da dest. Got: “Tiştên we dîtî bi hemû ziraviyên wê re binivîsînin.” Piştî ku girtiyan bûyer û navên xwe nivîsandin şûnde îmzayên xwe jî li binî danîn. Hinek girtiyan sloganên ku hevalên wan avêtibûn jî nivîsandibûn. Hinekan jî nenivîsandibûn.

Ali Osman got: “Yên ku slogan nenivîsandine bila binivîsînin û derket çû.”

Seat di 9.00’de Yûzbaşî Esat Oktay bi dozgerê leşkerî re hat ket hûndir. Piştî li qawûşê geriya li pencereyên şikestî temaşe kir şûnde dozger li yûzbaşî zivirî got:

“Na, na ger ku van ev cam neşikandiban wê hemû bifetisîban.”

Esat jî got:

“Ev bi temamî îsyanek e.”

Dema ku dozger hat ciyê ku her çar girtiyan xwe şewitandin bi dareke texte ew qutiyên boyaxê, neft û qutiyên tiner yên vala li hev da.

Di vê kêliyê de awirên wan li ser ciyek asê mabû. Dema ku parçeyên goşt yên bi hesinên li bin tencereyê ve mabû dîtin çend deqîqe wisa lê temaşe kir.

“Dema ku van xwe şewitandin çi digotin?”

Yek ji girtiyên ku li wir rawestiya bû got:

“Digotin bimire îşkence!” û ‘Dawî li zextê!”

Dozger, xwe bi xwe re diaxivî mine minê dikir di-got:“Ev mirovên çawan in?

Ev mirov xwedî îradeyeke çawan in? Got ez ji îradeya di van mirovan de şaş dimînim,” yanê li ecêb-mayîn û heyraniya xwe ya li hember vê çalekiya zêrîn veneşartibû. Dema ku dozger ji qawûşê derket got: “Li

cihê Ferhat binêrin tiştek heya an na: Çend kesên li gel wî dirazan jî bînin. Ez ê îfadeya wan bigirim.”

Li her derê cî hat nêrandin. Lê tiştek nehat dîtin. Yên ku çûbûn gel dozger ku îfadeyê bidin dema vegeriyan hatin îfadeyeke çawa û bi çi şêwazê dane dozger ji yên li qawûşê re mabûn digotin.

Digotin; “dozger ji wan re gotiye Ferhat wan dema vê çalekiyê kirin hûn nizanin tiştek hêlane yan na?” Wan jî bersiv bi vî rengî dane û gotine: “Em jî nizanin me tiştek nedîtiye” ji hevalên xwe re digotin.

Ber bi êvarkî ve gardiyan hat qawûşê gotin:

“Tiştên Eşref Anyik kom bikin bixin torbeyekê.”

Ji vê gotina gardiyan girtiyan hema fam kir ku Eşref jiyana xwe ji dest daye. Yek du girtiyan tiştên Eşref kom kirin xistin torbeyekî. Çawûşê blokê dûbare deriyê mazgalê vekir got: “Du kesên ku baş Eşref dinasin bila bên.”

“Siyamed, Riha, emirke qomitan.”

Çawuş got:

“Dema destpêkê te dît tu yê bikarî bêjî ev Eşref e?”

Siyamed:

“Rast e qomitan, heke ez bibînin ez ê binasim.”

Çawûş got:

“Baş e wê demê tu were.”

Çawûş Siyamed bir û çû. Dema Siyamed piştî seatek şûnde hat hemû girtî li dorê kombûn gotin.

“Çibû?”

Siyamed:

“Min di pişt deriyê derve de li cîbeke kirin. Min raste rast birin nexweşxana morga leşkerî. Eşref nîşanî min dan. Pirsîn gotin ‘Eşref ev e?’ Min jî got ‘rast e, ev Eşref e.’

Ez bawer im jiyana xwe nû ji dest dabû.”

Girtiyan pirsî gotin:

“Te yên din jî dîtin? Pirsên xwe li ser hevdu bê navber pirsîn û gotin birayê Ferhat jiyan dike?”

Siyamed got:

“Min yên din nedîtin.”

Êvarê karavanaya xwarinê tijî hat. Di pişt vê çalekiyê re di hatina xwarinê de guhertinek çêbibû. Lê tenê yek girtî kevçiyek tenê jî li xwarinê nedidan. Xwarin mîna dihat wisa dihat rijandin. Piştî hêjmar girtinê şûnde bêdengiyek ya mirinê di qawûşê de didomiya. Her kes çûbû ser cihê xwe, xwe dirêj kiribûn.

Bi awayeke xemdar û xemgîn difikirîn. Ji derveyî nobedarê 7-9, kes li ser lingan nebû. Rojeke bi tevger

derbas kiribûn. Di qawûşa 120 kes tê de cî digirt dengeke biçûk tenê jî dernediket. Fikirandina hemûyan li ser yek xalê bû tirs, bêçarebûn û teşqeleya wê çi bibe bû. Piştî Ferhat û hersê rêheval çûn û şûnde yekî ku alî bide girseyê, ji girseyê re pêşengatî bike hîn kes derneketibû. Deriyê qawûşê ji nîşka ve vebû. Hêjmareke zêde gardiyan ketin hûndir. Bi jop û kalasên di destê xwe de sekinibûn. Diyar bû hatine îşkenceyê bikin.

Çawûş got: “Bila her kes li cihê xwaringehê kom bibe.”

Di nava deqîqeyek de hemû girtî di nava rêk û pêkiyekî de kom bûn rêza xwe girtin.

Çawûş got:

“Bila nobedar derkevin pêş. Ka bêjin, kî ji we êvarê camên pencereyê şikand û got ‘bimire leşkerên Tirk yên faşist’ û ji wan re xeber kir?”

Ji kesî deng derneket. Girtiyên ku bersiv nedidan li pêşiya xwe temaşe dikirin.

Çawûş dûbare qêr kir got:

“Kuro ez cara dawî dipirsim kî ji we camên şebakeyê şikand? Kê ji we qêr kir got ‘askerên Tirk yên faşîst?”

Deng dîsa nebû. Girtiyên ku bersiv nedan vê carê ji nava rûyên xwe kulman xwarin… Ev car kalas, jop, pehîn, kulm li her deverê girtiyan diket, mîna cuya avê li ser bedena wan diteqiyan. Demjimêra lêdanê ya wê şevê bi vî rengî bi dawî bibû. Hîn êşa beriya seatek derbas nebûyî ev car Asteymen bi ekîbek nû hat ket hûndir.

Dîsa heman pirs dipirsîn digotin:

“Kê gotiye ‘askerên Tirk yên faşist’ û kê şebeke şikandine? Ka bêjin.

Yan na ez dizanim ez ê çawa bidim gotin.”

Dîsa deng ji kesî derneket.

“Baş e madem hûn di neaxiftinê de israr dikin wê demê hûn dizanin.”

Asteymenê li gardiyanan zivirî emrê êrîşê da û got:

“Êrîş bikin!” Di pişt re, fermana “xwe dirêj bikin!” hat dayîn.

Girtiyên dirêjkirî bi awayê serî li ber ji her aliyî ve lêdan li wan hat kirin. Asteymen li girtiyên ser hişê xwe çûbûn temaşe dikir, tenazê xwe bi wan dikir dikeniya û got:

“Li hundir çiqas bîdonên avê yên tijî hebe ji min re bînin.” Bîdonên avê yên tijî bi ser girtiyan de hatin

valekirin. Ti caran ev qas av li ser qawûşê xerc nekiribûn. Ev av rijandina ser girtiyan, bibû amûreke îşkencê ya li ser girtiyan.

“Got kes bila ji cihê xwe nelebite. Bîstek din ez ê dîsa bêm” bi gardiyanan re derket çû.

Ew şev cihê girtiyan av, balîfa wan jî beton bû. Gardiyanan di kuna mazgalê re her tim wan dişopandin. Serî her deqîqeyek bangî nobedar ango navê yekî digotin li wan dixistin.

Gardiyan cardin bangî hinekan kir got:

“Heyder, Mardîn emirke qomitan.”

Destên xwe dirêj kir, êşa jop di dilê xwe de dibihîst. Lê Heyder care yekem mînakeke xirap dida nîşan. Li hember lêdana gardiyan jovanî dida nîşan. Girtiyeke nêzî derî da nîşan got:

“Ev axivî qomitan.”

Girtiyê ku destnîşan kiribû nerazîbûna xwe da nîşan got:

“Ez neaxivim, rast nabêje!”

Gardiyan got:

“Bêdeng be kuro, yek jî înkar dike. Ka dirêjke destên xwe.”

Îşkence heya nîvê şevê domand. Şev seat di 02.00’de ji wan re emir hat ku betaniyan li erdê dirêj bikin rakevin.

## 18 Gulanê 1982, Sêşem

“Bi qomîta hatî dayîn re!”qawûş rabû. Di nava pênc deqîqeyan de ketin rêza hêjmartinê. Piştî hêjmargirtinê şûnde çend girtiyan qirêja hundir birin derve.

Yên ku qirêjê dibirin deh çûn, neh hatin. Di seriyê her kesî de heman pirs hebû:

Gelo ev zilam birin kî derê? Gelo tiştek wisa bike? Ev pirs di serî girtiyan re diçû dihat. Ednan jî bi yên ku çop biribûn derve re bû. Amed, bangî Merwan û Îkram kir, xwest rastiyê ji wan re bêje:

“Dema ku me çop bir Huseyîn jî bi me re bû. Piştî ku me qirêjê danî şûnde di vegerê de xwest bi gardiyan re baxive. Ez bawer im gardiyan jî wî bir xurfeya li gel revirê. Gumanên xwe anî ziman û got bila li gorî vê her kes tedbîrên xwe bigire.”

Bi çûyîna Huseyîn re jixwe moralê qawûşê nebû, ev car jî zêdetir qirab bibû. Her kes li ser lingan li benda hêjmar girtinêbû. Her ku guman mezin dibû tirs jî zêde dibû. Piştî du seatan şûnde Huseyîn anîn qawûşê. Li ser

lingan jê pirs kirin ku ka biribûn kî derê. Huseyîn got: “Dema me çop bir ez jî li dawî bûm. Gardiyanan min girtin birin xurfeya gel revirê. Li wir îşkence bi min kirin. Herî dawî jî li ser min jop dan bikaranîn. Min nikarî li ber xwe bidim lewra min hinek tiştan got.”

Îkram ku çavên wî ji hêrsan tijî xwîn bibû jê pirsî got:

“Te çi got? Wisa sergirtî naxive. Hêrsa xwe da raberkirin û jê re got “te çi gotiye bi awayekî vekirî bêje”

Huseyin:

“Li ser pirsa komîn heye an na gelek îşkence kirin. Min jî nikarî li ber xwe bidim û min got. Yek rewşa qawûşê, beriya çalekiyê kê çi dikir, di çalekiyê de kê slogan avêt û şebeke şikand hemû pirsîn.

Serê xwe xist ber xwe û got min hinek tişt gotin.”

Amed hinek din nêzî Huseyin bû, “te tiştên mîna çi got? Te navên kê/î da?”

Huseyin: “Min komînê got û min got yê ku slogan jî avêtiye Salih e.”

Merwan:

“Te xeletiyek mezin kiriye.”

Ji nîşka ve deriyê qawûşê vebû. Çawûşê blok û hêjmareke gardiyan bi jop û kalasan ve ketin hûndir.

Çawûş qîr kir got:

“Bila her kes nasnameya xwe bi xwe ve bike!”

Di nava deqîqeyek de girtî nasnameyên xwe bi xwe ve kirin û ketin rêza hêjmartinê. Gardiyanan nasnameyên girtiyan yek yek qontrol dikirin.

Li ser agahiyên ku Huseyin dayî hewl didan girtiyên navên wan dayî binasin.

Ev girtî hemû, berpirsyarên komên komînan bûn. Yek ji gardiyanan li çawûş zivirî got:

“Çawûşê min, min îbneyek dît. Ha yê din jî li vir e.”

“Çawûş got, “ka bînin vir.”

Gardiyan di nava rêza girtiyan de bi yaxa Amed û Ednan girt bir gel çawûş.

Çawûş got:

“Berê xwe bidin hevalên xwe.”

Herduyan bêre xwe dan girtiyan û sekinin. Piştî ku çawûş hinek çû û hat şûnde got:

“Ka bêjin, Atatûrk mezine yan jî Lenîn?”

Ednan got:

“Herdu jî mezin in. M. Kemal welatê xwe, Lenîn jî welatê xwe xilas kiriye.”

Çawûş li Amed vegeriya got:

“Ya ma tu dirazî kuro?”

Bi kalasê di destê xwe de Amed dehfand.

Amed got: “Herdu jî li gor serdemên xwe mezin in qomitan”

Çawûş:

“Kuro madem hûn dibêjin herdu jî mezinin, wê demê hûn çima her tim dijberî Atatûrk diaxivin? Li qawûşê her tim propagandeyan dikin ‘hûn dibêjin bawerî bi tiştên îdarê dibêje nekin, ev her wisa nameşe,’ yek jî hûn qala Lenîn dikin. Kuro ew….zarok hûn wisa dizanin ku agahiya me nîne? Ji bûyereke herî biçûk jî agahiya me heye.”

Gardiyan emir da got: “Wan rût bikin!” Dema ku kontrola nasnameyan û bûyara lêdanê xilas bû şûnde “gotin di rêza hêjmardayînê de bimînin em ê bêhnek din bên,” wisa derketin çûn.

Dûbare dema ketin hûndir Asteymen got:

“Yên di rêza pêş de bila gavek werin pêş!”… Amed û Haydar li kêleka hev bûn. Dema dor hat wan berê li Amed xistin. Piştre yek ji gardiyanan bi herdu destên

xwe bi qirika Haydar girt. Dema ku çawûş vê dit pirsî got:

“Çibû onbaşî?”

Onbaşî got:“ A... Ko...m ev min mîna keçikan dihesibînî çavê xwe li min dişkîne.”

Çawûş:

“Vay ibne vay. Lêdaneke baş lê bikin.”

Dema ku tiştên Haydar di serê xwe de plan kiribû hev negirt, êdî neçar ma ku rastiyê bêje got:

“Qomitan min bibin, ez dixwazim ji vir derkevim.”

Onbaşî got:

“Bêdeng be, tu yê çi baxivî? Jixwe rastiya te tê zanîn. Biçe cihê xwe, di rêza xwe de bisekine.”

Dema ku derketin derve Saatçî jî bi xwe re birin.

Got “di rêza hêjmarê de bisekinin em ê niha bên” derî girt û çûn. Bi girtina derî re dengê qêrînan hat. Bala girtiyan hemû çû ser wir. Tiştên dihatin axaftin bi awayeke zelal dihat bihîstin. Her pirsa ku ji Saatçî dikirin bersiv dida û digot:

“Ez nizanim, têkiliya min bi kesî re nîne.”

“Ka ew jop bide onbaşî.”

Piştre zarezara Saatçî carekdin hat bihîstin. Dema ku avêtin hundur di rewşeke tazî de bû.

Ew roj sax girtî li ser lingan dan sekinandin. Di navbera her deh deqîqeyek de lêdan li wan dihat kirin. Zext û îşkence gihiştibû asta herî jor. Tirs û panîk hewirdor dorpêç kiribû. Bêçaretî di rûyên wan de dihat xwendin. Kêliya ezminîna(sinanma) girtiyan bû. Bi şîyarbûna hinek girtiyan re dîsa li hember nirxên şoreşgeriyê biyanêbûn hêdî hêdî dihat dîtin. Hîn duh ew kesên ku xwe wisa didan nîşan ku ji doza xwe venagerin, îro berevajiyê xwe diketin. Bi binpêkirina nirxên şoreşê re namînin, li ser her çar mirovên mêrxas ku giyanên xwe feda kiribûn jî daxivin. Ev ezbûnek bû û di vê bihata qutkirin, di vê ezmûnê de têkoşîna berxwedanvan û teslîmkaran ya li hember dijmin heman bû. Yek jî herêmên ku pevçûnên herî germ lê tê meşandin Rojhilata Navîn e. Heke nîvê dilê Rojhilata Navîn Filistîn be nivê wê yên din jî ev deverin yanê girtîgeh in. Hêjmareke zêde ya berxwedanî û pevçûnan di qawûşa 35’an de dihat domandin, li aliyek din yê girtîgehê heman tişt di qawûşa 33’an de jî dihat meşandin yanê berxwedanî û pevçûn. Mînaka herî berbiçav ya şoreş û dij şoreş di van deran de bû.

Ji ber di aliyek de îradeya mirov û baweriya wî/ê di aliyê din de jî şêwazên îşkenceyê yên cur be cur û zextên herî dijwar li vir dihat meşandin. Beriya hêjmartina êvarê yên ku çûbûn dadgehê hatin. Lê Fikrî venegera bû.

Bahrî got:

"Dema em ji dadgehê vegeriyan hatin ber cihê îdarê Fikrî xwest baxive li ser wê Asteymenê kinik jî wî girt û bir. Bila her kes li gorî wê tevbigere. Tiştên ku dizane wê hemû bêje."

Piştî niv seat şûnde Fikrî anîn qawûşê. Dema ku jê hat pirsîn ku tu çûyî kî derê û te çi kir, bersiv da û got "ez ê çima ji we re bêjim ez çûme ku derê û min çi kiriye?" Êdî ev zelalbû ku Fikrî derbasî nav hêza teslîmkaran bûye. Hîn zerarên Huseyîn dabû wan ji ser xwe neavêtibûn. Agahiyên ku wî jî dabû girtiyan li ser wan agahiyan xistibûn ber lêpirsînê. Girtiyên derbazî rêza hêjmartinê bûn hatina Asteymenê kinik jî dîtin. Piştî ku hêjmar girtin şûnde Asteymenê kinik got:

"Huseyin kî ye, bila derkeve pêş."

"Huseyin Riha emirke qomitan."

Kinik ango minik:

“Piştî got zarokê a....a.... k......mun!” çend zille lê da şûnde emir da got, “çawûş vî bibin hûcreyê. Lewra ev lihevkirinek şêwîrdaninê bû. Huseyîn berê radest bibû û ji îdarê re soz dabû.

Huseyin, li navçeya Birecik ya Riha yê hatibû dinê di nava balmateke feqîr de mezin bibû. Debara xwe li ser hemaltiyê derbas dikir. Di sala 79’an de li hember PKK’ê sempatî dibîne weke tawanbarê çalekiyên li vê herêmê hatine meşandin tê girtin.

Piştî ku dikeve girtîgehê şûnde li gel PKK’yî yan dima, di berxwedaniya 81’ de teslîm dibe wî tênin qawûşa 33. Xîzan bûyîn û cihê jê hatî bibû sedem ku li hember şoreşgeran hîn zêdetir sempatî bide nîşan. Di hûndir de naskirina wî ya ji Marksizmê re di nava şoreşgeran de baweriya di dema pêş de bibe keseke baş dabû avakirin.

Heta di nava vê de komîneke biçûk jê re hatibû dayîn. Piştî çalekiya li qawûşa 33’an şûnde ew jî beşdarî karwana yên ku teslîm bibûn dibe. Ne karî bû taybetmendiyên xwe yên çînî biparêze, ne jî bi nirxê ku jê re hatî dayîn girêdayî mabû. Wî, xwestibû meseleyê bi qurnaztiyên xwe yên gundîtî re îdare bike. Dema ku çop dibin derve bi awayeke zanebûn li dawî dimîne û bi îdarê re planeke wiha çêkiribûn. Piştî ku hemû tiştên

dizanî ji îdarê re îtîraf kir şûnde bi vê re jî nemabû, li hember şoreşgeran aqil dabû îdarê û ev pêşniyar ji wan re kiribû: “Qomitan ger ez niha biçim qawûşê wê ji min gumanan bikin. Min bibin, lê dema hûn hatin we hêjmara êvarê girt navê min bêjin û “bêjin ev îbne bibin bixin hûcreyê. Piştî ku ez hatim hûcreyê ez ê her tiştî ji we re bêjim û binivîsînim.”

Asteymenê kinik jê re got, “aferîn kuro serê te gelek dixebite. Bi rastî tu yê gelek kêrî karê me bêyî!” Wiha ev perdeya yekem a lîstîka şêwîrdaniyê bi awayeke zindî li ber çavê girtiyan dihat lîstin. Piştî ku Hûseyîn çû şûnde, gardiyan qîr kir got “ji rêza xwe dernekevin wisa di rêza xwe de bisekinin!” Girtî bi gotina gardiyan ya ku emir kir û got, “xwe dirêjkin ûlan!” Hemû girtî li ser betona xwaringehê dirêj bûn. Ew şev betona cemîdî ya mîna bûzê doşeka wan bû, destên wan jî balîfên wan bû û ji dêla lihêfê bi germahiya laşê hev xwe nêzî hev dikirin wisa li wan dibe sibeh.

## 19 Gulan 1982, Çarşem

Sê roj sax li berxwe didan, bê av û bê cixare. Bêyî ku li karwana gardiyanan a dihat ser wan temaşe bikin li ber xwe didan. Qawûşa 33’an berxwedan dikir. Tevî her tiştî berxwedan dikirin, li ber xwe didan. Sibaha 19

Gulanê çend girtiyan biribûn dadgehê. Yên ku mabûn jî heman tişt li ser wan didan domandin lewra nedixwestin bikevin nava gîrdabeke meçhûl ku dawiya wê nayê. Piştî nîvro saet di navbera 15.00'an de Esat Oktay hat qawûşê. Ev car di destê wî de dosyeyek hebû. Piştî ku li dosyayê temaşe kir şûnde li ber Haydar sekinî got:

"Tu ha, ka tu zilamê min bûyî? Kuro te yê tiştên di qawûşê de diqewîme ji min re bigotiba?" Bi tenazî çend zeleyan li bin guhê Haydar xist. Piştre cardin vegeriya pozîsyona cidîbûna xwe ya berê û got: "Zarokîno, min her tiştî derxist holê. Piştî behneke din ez ê sucdaran ji nava we bibim. Cezayê ku ew heq dikin wê bigirin," piştî van gotinan kir şûnde bi leşkerên xwe re derket çû.

Yên ku çûbûn dadgehê Çetin û Xalis hatibûn berdan. Di demeke wisa de hatina berdan tişteke qet nedihat bawerkirin bû.

Girtî, bi berdana hevalên xwe gelek kêfxweş bibûn. Eşkereye ku yên herî kêfxweş bibûn ew bi xwe bûn. Hinek car hene ya mirov di xewna xwe de dibîne ku mirîye, mirineke bêwext, wê demê mirov gelek pê aciz dibe. Bi vê xemgîniyê yek wî ji xew şiyar dike û dikeve ferqê ku nemiriye, jiyan dike. Wê demê gelek kêfxweş

dibe, coşeke mezin dijî. Vaye Xalis û Çetîn jî ji ber ku dê ji vê dozexê xilasbibûna ewqas kefxweş bûn. Wê jiyana xwe ya ji niha şûnde bi awayeke herî baş binirxandiban.

Gardiyan got:

“Tiştên xwe komkin, ji qawûşê derkevin.” Bi derketina wan re Esat û ekîba xwe ketin hundir. “Yûzbaşî qêr kir got, yên ku di nava komînê de bila hema derkevin pêş,” dema ku dît kes derneket pêş bi tenazkî dest bi axiftinê kir got:

“Tiştên xwe yên şexsî bigirin li beramberî min bisekinin. Berpirsyarê koman wê li pêş bin. Berpirsyarê koma 1. Amed, yên girêdayî wê, Ednan û Nafiz…” Dema ku navê Nafiz hat gotin Nafiz got, “qomitan ger hûn destûr bidin ez dixwazim tiştek bêjim.”

Yûzbaşî:

“Tu yê çi bêjî, ka bêje?”

Qomitan ez ne PKK’yî me. Dema ez li derve bûm min tecrît kiribûn. Agahiya min ji komînê nebû. Heke hûn ji min bawer nakin ji Amed bipirsin.”

Yûzbaşî got:

“Ka were Amed, agahiya vî zilamî ji komînê hebû?”

“Na qomitan nînbû. Tenê ne ew, yên ku di koma min de agahiya kesî jê nebû.”

“Çima nebû? Ma bi te re wan jî pere ji bo komînê nedirazandin?”

“Rast e qomitan, me bi hev re tişt digirtin.”

“Baş e, te çima ji wan re negot?”

“Ji bo wisa pêwîst dikir min negot.”

Yûzbaşî bi aweyeke bihêrs ser Amed de çû got:

“Ulan ibne. Te pereyê xelkê digirt dixwar ne wisa?

Çend zele li ser hev li rûyê Amed da. Dema ku hêrsa xwe derbas nekir, bi yaxa Amed girt avêt ber Asteymenê kinik.

Yûzbaşî xwendina navan domand. Dema ku dor hat Çetîn got:

“Ka ev zilam?”

Çawûş:

“Hat berdan qomitan.”

Yûzbaşî, ji çawûşê blok re got, “biçe kurê min wan bigire bîne, hîn derneketine. Kes wisa bi hêsanî ji destê min dernakeve.”

Piştî pênc deqîqan şûnde Çetîn û Xalîs anîbûn

Yûzbaşî got:

“Kuro îbneyan, hindek mabû hûn ê bihatiban berdan. Çetîn ka tu biçe koma xwe.”

Dema vegeriya Xalis dengê tekmîlê bilind bû: “Xalis, Riha emirke qomitan.”

Piştî ku yûzbaşî li herduyan baş temaşe kir şûnde ji Xalis re got, “ev zilamê ku dibînî Şervan yê di qawûşa 35’an de dima di Îstihkamê de îşkence li te kirîne. Cezayê van ez bidim, yan jî tu dixwazî tu bi xwe bidî?”

Xalis:

“Hûn bidin qomitan.”

Yûzbaşî çend zelan li Tahsin xist..

“Biçe ciyê xwe, em ê piştre cezayê te bidin. Çawûş kurê min, îşlemên Xalis xilas bikin bila biçe.”

Firat, Mêrdin ji malbateke dewlemend bû. Bavê wî, bi qasî dewlemendiya xwe ewqas jî welatparêz û miroveke girêdayî nirxên netewa xwe bû. Bi gundiyên xwe re ji nêzîkatiyek feodaltiyê zêdetir mîna birayek nêzî wan dibû. Gundiyên ku li gel wî diman ji bo li gel zilameke wisa dixebitîn dua dikirin.

Bavê Firat di warê exlaq de keseke dirûst bû. Firat hemû taybetmendiyên bavê xwe girtibû. Piştî mirina wî şûnde dema ku têkoşîna şoreşgerî pêş dikeve, Firat jî ji vê bandor dibe û gundê xwe ji şoreşgeran re vedike

di warê madî û manevî de alîkarî dide. Ji ber ev alîkariya ku dida çend caran hatiye girtin û îşkenceyên herî giran dîtiye. Ne mîna yekî feodal mîna şoreşgerek berxwedanî dikir. Firat jî mîna her kesî gelek ji Ferhat hez dikir. Gotineke Ferhat nedikir dudu. Li hember zext û îşkenceyan li ber xwe da û li gel berxwedanvanan cihê xwe girtibû. Dema ku Ferhat teslîm bibû, dîsa wî bi tenê nehêla bû. Ferhat li kî derê bûya Firat jî li wir dibû. Wî ji birayê xwe zêdetir hez dikir. Bi kesayet û exlaqê xwe ve ji hawirdora xwe rêzdariyek mezin bidest xistibû.

Ew duristî û girêdana di wî de, di ti keseke ku di pozisyona wî de bû nedihat dîtin. Di lêgerîna gardiyan ya sibehê de nêzî 15 hezar lîra li gel Firat tê dîtin. Gotin, “ji bo ev pereyê komînê ye lewra Firat ji bo wî pere birin hûcreyê. Li ser wî hemû şêwazên îşkenceyê bikar anîn. Lê wî, ti caran di warê kesayet û onura xwe de tawîz neda. Dema ku îdarê dît bi van rêbazên îşkenceyê nikarin Firat teslîm bigirin wî birin xistin nav girtiyên bi waremê ketîn. Ev jî şêwayeke din yê îşkenceyê bû. Mirovên sax bi awayeke zanebûn dibirin dixistin nava yên werem girtî ku ew jî pê bikevin. Li ti cihê ku komara Tirkiyê lê desthilatî kirî û lîreyên wê

bûyîn akçeyên derbasdar di qawûşa 33. de qasî wê rojê rezîlbûyî li cihek din ewqas rezîl û riswa nebûbû.

Belê her kesî hewl dida xwe ji pereyê li gel xwe xilas bike. Êdî ew pere di wê kêliyê de ji amûra guhertinê derketibû, bibû belayek û bibû amûreke îşkenceyê ya li ser girtiyan. Ji webayê revîn li gel reva ji pereyan ne tiştek bû. Her kesî yan pereyê xwe tavêtin cîna yan jî dişewitandin. Yan jî li rêya bi hinek din dayîna xwendinê digeriya. Di navbera vê teslîmbûn û berxwedaniyê de pere tenê nirxê xwe winda nedikir. Mirovan jî guhertineke çawanî derbas dikirin. Hinekan di warê başî de pile kom dikirin, hinekan jî di warê nebaşî de pile kom dikirin û bêkesayet dibûn.

Alîkarê berpirsyarê qawûşê jî ketibû ber lêhiya helandinê. Dema ku em bi awayeke giştî dîroka girtîgehê tênin ber çavê xwe dibînin ku alîkarê berpirsyarê qawûşê Fethî, her çendî di nava îspiyonciyan de ne yekem jî bû hewl dabû di rêza duwem de cihê xwe bigire.

Hemû mirovên qawûşa 33. yên ne rewa her yek ji wan ji çavkaniyên cuda hatine, ji çêbûna xwe heya roja îro mezin bû, geş bû û pêş ket. Êdî ji zarokê nerewabûnê xilas bû. Di serdema xwe ya herî berhemdar de fêkiyên xwe yên herî xweşik jî da. Lewra

dara ku fêkî bigire wê kevir lê bê xistin. Ya ku xweşik e, wê her tim bi êrîşan re rû bi rû bê, di vê cîhana girtîgeha nexweşik de. Fêkiyên herî xweşik, di serdemên xwe yên herî xweşik de xwe ji şoreşê re nezîr(adama)dike, di berxwedaniya burcên girtîgehê de mîna ala sor hejiyan, kuytuyên(kuytu) tarî hukmê xwe dimeşand, di şeva herî xweşik de her yek ji wan dibin meşxele.

Yên ku riya xwe şaş kiribûn bi çirûska ku ji Mazlûm girtin re agir bi bedenên xwe xistin. Bibûn agireke bi pêt. Ma Necmî çi digot: "Em beşeke ji parçeyê artêşeke nû ya ku binketine."Lê ev beşa ku binketibûn û darbe xwaribûn qêrîneke berxwedaniyê wisa bi hêz ji wan derketibû ku, çalekiya wan moraleke pir mezin dabû him aliyê bin ketin him jî aliyê berxwedanê dikir. Aliyê ku berxwedanî dike derketina gavavêtinên wan yên mêrxazî xwezayî tê pêşwazîkirin. Ya herî giring di nava şepalek de bihûşt dana avakirine. Loma ev cî ciyê ku şepal û tirs hikmê xwe lê dida meşandin bû. Jîrbûna bexçevan vekirina gulên sor bû, wiha wan di ciheke qet nebe de, bûyîn dabûn çêkirin. Lê wê xesar û diyetek ya bilindbûnê heba, yanê wê windahiyek wê çêbûba. Jixwe gelo ma me negotibû di vê girtîgehê de her kêliyek jiyanê bi risk û windahiyan re tijî ye. Heke

mirov ji bo gavek ber bi pêş ve ne di nava tevgerê de be, gelo ma wê kî hesabê zayiatê bike?

Belavkirina qawûşa 33. bi fermana Deccal Esat re ber bi koç, mişextîbûn û ezmûnên nû ve dibir. Dixwestin di girtîgeha Amedê de navê qawûşa 33. tine bikin yanê ti naveke wî nebe. Bi awayeke dil şikestî di destê girtiyan de cilên wan hebû, lê bi wê seknên xwe yên bi onur rêwîbûn. Li ser qawûşêndin dihatin belavkirin, wiha mirov di vê girtîgehê de şimaya diheleye bû. Di kêliya helandinê de ji welat, gel û partiyê re bibe germahiyek û ji mirovahiyê re dibe ronahî, tê maneya kêfxweş û serkeftinê.

Navê serkeftinê di nava vê cendereya wahşetê de her tim mîna çalekbûyîna bêşik li ser lingan mayîn e. Carna mîna xencereke tûj, carna jî mîna rimek li ser lingan mayîn pêwîst dike. Bi vî rengî gavên xwe avêtin. Li cihê xerîzeya teslîmyetê vexwarin,(37'an) berpirsyarên komên wan birin qata 4 xistin nav yên bi veremê ketin. Esat, dixwest ew di demeke nêz de bimirin. Lewra verem, tê maneya hêdî hêdî mirin e. Esat Oktay dîsa derewan dikir. Di serî de Amed û hemû berpirsyarên koman birin qata 4 xistin hûcreya yên bi veremê ketîn. Yên bi veremê ketîn xistibûn hemû hûcreyan. Girtiyên mabûn jî li qada yek bi cî kiribûn.

Amed, li qata 4. di hûcreya 2’an de bi awayeke kin mûhasebeya çûyînên xwe yên wir kir. Beriya 14’rojan bi komeke 99 kesî re çûbûn qawûşa 33. Îro 53 kes şûnde hatibûn. Yên din 4 şehîd, 4(îspiyoncî û hemû tiştên îdarê qebûl kirin), 20 kesên ji derveyî me, yên hatine berdan, yên neketibûn nava jiyana komînê, yên ku li wir mayî jî li ber çav re derbas kir bi qasî bêjî zaîyat(windayî) nîne kêmbû. Ev jî wî gelek kêfxweş dikir. Wiha em dîsan bi te re ne ey qawûşa 37’an. Em dîsan bi te re ne, tişta ji destê te tê bike, ger ez li pêşiya te bejna xwe bitewînim namerd im. Amed (benda ji çar rêzan pêktê) fikirî:

Ji bahozên herî dijwar re çeperin bedenên me

Ji çewisandinên herî dijwar re pêlşîkînin singên me

Ji mirovatiyê re soseke pêtên me

Em carekê tewiyan

Carek din qet!

Zarokên ji dayîk nebûyîne şopvanên me

Dema ku Amed kur û dûr çûbû, bi sîmayên nas re rû bi rû hat, di heman kêliyê de tiştên dibû bilêv kir. Ne carek çend caran hêjmar girtin.

Yûzbaşî di jêr de bang kir: “Temam in kurê min?” Gardiyan,

“Komîtanê min 53 kes...”

Yûzbaşî got: “Deriyan bigirin, dakevin jêr!”

Amed, tiştên ku bilêv dikir xilas kiribû. Tişteke di serê wî de mabû û wî tangav dikir hebû. Ev jî nebûna hinek kesan bû. Gelo çî ji wî hatibû? Dibe kî be? Gelo bû îspîyoncî? Yan jî… Bi van pirsa ku di serî Amed re çû dihat bêguman Esat Oktay û hemû îdarê di cihê xwe de nedisekinin û di nava tevgerê de bûn. Wan jî nedidîtin. Yek kêm bû lê kî? Tevî hemû lêgerînan wî nedîtibûn. Ma gelo erd qelişî ev zilam kete navê? Esat hema digot, “ew…gelo ew… yanê ev gotinê li ser hev dûbare dikir. Her ku disekinî har dibû ew Deccalê devgilîz. Ger ev “nexwa” yanê naxwayên wî di dilê wî de lê didan. “Naxwayên (yoksa) wî ” ji rewînan xirabtir bû. Çalekiyeke mîna ya Mazlûm û Ferhat li bîr dianî. “Ma wê her yek ji van zilaman li ser serê min bibin Mazlûm û Ferhadek?”

Fesîhê dişibiya bilxûrê, bêyî bi çavên dost û dijminên xwe bê dîtîn bi bejna xwe ya dirêj û bedena xwe ya lewaz bû sir û winda bû.

Fesih, hîn li derve bû bi nexweşiyekê ketibû. Ji bo jiyankirinê li hember ev qas eziyet û îşkenceyê li ber xwe dabû. Êdî jiyan derî li giyana wî dida. Ne kêr, îşkence gihiştibû hestî. Fesîh dema ku nav hatin

xwendin navê wî nebû gelek qehirî. Dema ku her kes ketibû hêcana komkirina tiştên xwe yên kesî, lewra pirsgirêkeke Fesih wisa nînbû. Permatîkek ket ber çavên wî. Weke ku permatîk zindî bûye û jê re dibêje "ey Fesih, ka temaşeke her kes tiştên xwe dikişîne, amedekariyên xwe dikin, başe tu yê çi bikî?" Fesih fikirî. "Bi rastî ma dikarim çi bikim? Divê çi bikim?" Fesih mîna di valetiyekî de be. Diket dikir bikeve. Li gel wî yekê ku bi destê wî jî bigire nebû. Fikirî. Di dawî de biryara xwe da got.

"Li pêşiya min du rê hene; yan ez ê riya bê şerefiyê hilbijêrim hemû tiştên ku dibêjin bikim, yan jî ez ê mîna wan her çar mirovên pîroz ku riya ji bo xwe esas girtîne bingeh bigirim û di riya wan de bimeşim. Na, na bêşerefbûn jiyankirin her roj mirin e.

Yek car mirin, bi şeref bibîranîn ya herî xweşik e." Bi vê fikirandinê permatîk rakir. Bi bejna xwe ya mîna şimşalek zirav ket bin ranzeyê. Teştek jî girt gel xwe. Permatîk li destê xwe yê çepê da. Destpêkê xwîn hindek jê hat. Piştre carek din... Carekdin lê da. Xwîn, hêdî hêdî hat xwarê. Her ku herîkî çavên wî tarî bû, xew ket çavan. Bêavbûneke gelek zêde hîs kir. Lê Fesih tevî van hemûyan jî tiştên dihat axiftin seh dikir.

Carek Alî Osman ketibû qawûşê. Yên di qawûşê de mabûn xistibû ber lêpirsînê, yên mabûn yên ku çûbûn sucdar dikirin. Fesih her ku wan dibihîst nefret dikir û ev nefret hêla ku biryarbûna wî ya çalekiyê hîn bihêztir bibe. Li wî digeriyan. Lê nedidîtin. Fesih, van di cihê xwe de bi koma hevalên xwe re tecrît di nava tecrîtê de jiyan dikirin.

"Refik bi qomîta "35, li paş bizivire!"temaşeyî jor kir. Yên ku dihatin hebûn. Refik bi xwe re axîvî got,"dîsa askerên Tirk yên êrîşkarên dagirker vegerane." Dema ku gardiyan hatin ber hûcreya wî emrê li pişt vegere dan. Derî vebû. Dît ku du kes ketin hûcreyê. Yek ji yên ketinê Çetîn bû. Refîk û Çetîn berê bên girtin hevdu dinasîn. Demek Refîk berpirsyartiya Çetîn rakiribû. Ji hevdu hes dikirin û kêfa wan ji hev re dihat. Çetîn miroveke wêrek bû. Dema nû hatibû hûcreyê hema Refik naskiribû. Çetîn got, "way ev dostê min Refik e." Hevdu hemêz kirin û maçî kirin. Bi salan bû Refik mîna topa pînponê di navbera qawûşa 37-35'an de diçû dihat. Ne ji bo qawûşan, pêwîstiya wî bi keseke nû hebû.

Refik got: "Êêê, ka bêje. Bi salan e me hev nedîtiye. Ka ji min re bêje. Tu li kî derê bûyî? Tu ji kîjan qawûşê hatî?

Çibû?”

Çetin, yek yek got. Her tiştî bi hemû ziraviyên wê danî holê.

Refik got; “dêmekî Ferhat jî çû?” Lê helal be. Ez ji çûyîna wî şaş nemam. Ez her tim li hemberî wî xweşbîn bûm. Ez qet nefikirîm ku Ferhat li pey hesabên biçûk biçe. Ez hevalên din jî dinasim. Dema em li qawûşa 7’an bûn, min Mahmûd  Zengîn dem dem didît. Lê niha rûyê wî qet nayê ber çavên min. Biranînên min yên bi Eşref û Necmî re yê di Nola 1 de gelek xweş hene. Neyse ez wan pîroz dikim. Bi rastî jî çalekiyek bi onur û şan lidar xistine. Lê we çalekiya Mazlûm şaş bihîstiye. Mazlûm xwe neşewitant, daliqand.”

Êdî dora ecêpmayînê ya Çetin bû:“ Te çi got? Te got Mazlûm xwe daliqandiye?”

Yên di hûcreyê de hemûyan li wan temaşeyî dikir. Refik got, “niha dema me nîne ez bêjim.” Behneke din ji bo xwendina sirûdê wê bên. Ez ê şev di bin bataniyê de ji te re bêjim. Em ji ber çavdêrîkirina qada duwemîn nikarin serê xwe bixwerînin. Hemû kêliyan me dişopînin.” Lê dema Çetîn îsrar kir, Refik got “ê de başe ez ê vebêjim. Bi rastî ew taybetmendiya te ya meraqdar qet nehatiye guhertin. Wê demê guhdar bike: Sibeha 21 Adarê weke her carê em zû rabûn ser

xwe. Xwarina me li qata caran belav kirin. Mazlûm di qada 4 hûcreya 9 emin yanê qata hema li ser me re bû. Saim di destê wî de karavana li ber derî hûcreya wî sekinî çend dengan bangî Mazlûm kir.

Me jî dengê wî dibihîst. Deng ji Mazlûm derneket. Li ser vê Saim, bangî Kambur çawûş kir got, “qomîtan ez bangî Mazlûm dikim lê bersiv nade.” Destpêkê dengê lingê Kambûr hat. Axiftinên Saim mîna me hemû qawûşê guhdar dikir. Kambûr çend dengan bang kir got, “Mazlûm…Mazlûm.” Dîsa deng derneket. Mazlûm bersiv nedida. Li ser vê Kambur çawûş ji Saim re got “başe kurê min tu xwarin li yên din belav bike. Mazlûm nexweşe bersiv nade.”

Kambur, bi lez û bez çû gel îdarê. Piştî çend deqîqeyan deriyê Mazlûm vebû. Ji hûcreya Mazlûm deng dihat. Mazlûm girtin birin. Lê me nedizanî çi bûye. Tenê me dizanî Mazlûm tiştek kiriye. Dema me li dîrok û rojê temaşe kir, jetonê min ket. Wê demê ez piştrast bûm ku, Mazlûm di 21’ê Adarê yanê Newrozê de yan zendên xwe jêkiriye yan jî xwe daliqandiye. Lê min îtîmala daliqandinê nedidît. Ji ber ban gelek nizmbû. Şêwaza çalekiya ku yekem dihat bîra min zendên xwe jêkirin bû. Di navberê de hîn çend seat derbas nebûbû çawûşê ku me jê re digot “zarokê

xwişkê"(abla çoçugu) got, "sirûd qut kin!" Dema ku dest bi axiftinê kiribû tam li beramberî me pala xwe dabû kaloriferê û rengê rûyê wî zer bibû.

Got: "Baş li min guhdar bikin. Ez ê xebereke xemgîn bidim we. Hevalê we yê Mazlûm Doxan yê di qata 4' an de dima xwe daliqandiye. Jixwe di wê qawûşa bêdeng de ti teng dernediket. Çawûş, cixareyek pê xist û axiftinên xwe domand û got: "Helal be. Zilameke wêrek û merd e. Li pişt xwe nivîs jî hêlaye. Gotiye 'şoreşger nikarin xwe li jiyaneke wisa bêonur rabigirin. 'Gotiye şoreşger xwe li ber jiyanek wisa bêrûmet ranagirin. Bêguman hinek tiştên din jî nivîsandiye." Piştre dîsa sekinî. Girtiyan şopand. Dema ku derket tiştek axivî.

Got; "Oruç, behnvedanê bide kurê min."

Piştre bi qasî ku me zanî di navbera Xeyrî û Mazlûm de li ser van mijaran gelek axiftin û ji hev re nivîsandin kirîne. Niha jî em detayên wê nizanin. Lê şeva Newrozê Mazlûm, piştî ku hemû amedekariyên xwe kir şûnde li aliyê ku Xeyrî wan lê dima sê ziligên şixatê pê dixe di elûng(parmakliktan) re derdixe nîşanî wan dide.

Ev jî weke bîranîna nûnerî ya kevneşopiya agirkirina Newrozê ya sembolîk e. Pêxistina van hersê zilêkên şixatê zaniye ku Mazlûm xwe şewitandiye. Bûyer, bi kinahî bivî rengî ye. Di navendeke wiha de agahiyan bi

şêwayeke cuda bihîstin xwezayî ye. Berde ji qawûşek agahî dayîna qawûşeke din, bûyerên ku di hûcreyên hema li gel me diqewîmin de piştî çend mehan şûnde dizanin.

Bihar û qawûşa 35...ma wê qawûşa 35 çi ji biharê bike? Ji ber bihar bêyî ku bigihe van hûcreyan bihar biharbûna xwe winda dike. Girtî nakevin ferqa bedewbûna biharê ya herî xweşik; ne dikarin hinek rûyê asîman, ne hinek hewaya çiyan, ne jî dikarin bîna gulan bikin…Ev dîwarên beton nêzî meha Hezîranê germ dibin. Ji bo germbûna girtiyan hîn gelek heye…

Wê di demeke meha Hezîranê de Amed derketiba mehkemeyê. Kêfxweş bû. Di nava vê kêfxweşiya dijwar de, du serî dihat dîtin, seriyê yekî, soza ku dabû Ferhat wê banîba cî û ji bin bareke giran derbiketiba. Seriyê duwem jî, piştî salan, wê bi hevalên xwe yên ku bi salan bû hebûna wan di dilê xwe de hîs dikir li cîhê dadgehê bidîtiba.

Wê nebidestxistina ev kêfxweşiya bi salan bû didomiya şikandiba, bi Kemal û Xeyriyan re. Wê mizgîniya çalekiya Ferhatan bidabana wan. Dadgeh didomiya. Xidir Akbalik rûniştibû, îfadeya wî guhdar dikir. Wê hinek din li hember girtiyên ku îfadeyê li ser wan dayî cuda baxivîba. Dê tiştên ku gotî biparastiba.

Xidir, ji derveyî rewşa xwe ya ji rêzê ya îtîrafkariyê tevdigeriya û nûneriyek dijşoreşgeran a har dikir. Behsa îflaskirina sosyalîzmê dikir.

Yê ku bersiva herî xweşik dida wî endamê KOMÎTEYA NAVENDÎ A PKK'ê M. Xeyrî Durmuş dida û digot: "Sosyalîzm ti caran îflas nake. Xidir Akbalik bi xwe îflas kiriye." Piştre girtiyên parastina partiyê dikirin yek yek axivîn. Her ku Xidir li erdê didan di şexsê Xidir de kursiyê dijşoreşê jî têk diçû. Û tiştên ku duh Ferhat digot yek bi yek dihatin cî û dibû dîrok. Li hemberî her îtirafkarek ne yek-du, sê-çar kes derdiketin pêş. Dor hatibû Amed ku nedikarî di cihê xwe de bisekine. Heyecana ku kêliyek beriya kêliyek soza ku dabû bêne cî jiyan dikir.

Emrullah Kaya:

"Belê Amed, tiştên ku Xidir Akbalik ji bo te gotin te bihistin.

Tu li ser vê çi dibêjî?"

Amed got:

"Beriya ku bêm ser îfadeya Xidir hinek tiştên ji bo min gelek girîngin dixwazim bêjim."

Emrullah Kaya:

"Em guhdar dikin!

“Min heya niha negotiye ez sempatîzanê partiyê me. Sedema negotina min heye. Lê ev destgirtina min a sempatîzaniyê, bi mîsogerî bi îtîrafên Xidir re ti eleqeyeke xwe nîne. Ez beriya niha miroveke welatparêz bûm û min taybetmendiyên netewî diparast.

Naskirina min a ji fikrê şorşeşgeriyê re, bi naskirina min a PKK’ê re çêbû. Mîna sempatîzanek çi erka ku ket ser milê min ez jê nerevim. Min baweriya xwe ya ku xweseriya welatê Kurdistanê û rêya ku gelê Kurd bibe azadiyê di nava têkoşîna PKK’ê re derbas dibe her tim parast, jê bawer kir.”

“Xidir ji bo te dibêje endam e. Tu yê ji bo vê çi bêjî?”

“Ez endam nînim. Ger ku ez endam bûma, min ê bi onurek mezin bilêv bikiriba. Heke tevî ez ne endamim bêjim ez endamim, lewra ez ê li endamên PKK’ê bêmafî bikim, loma vê jî nakim. Bi bûyeran re eleqeya min nîne. Xidir, ji bo tiştên dozger dibêje piştrast bike îdanemeyê girtiye van nivîsandiye. Ez Xidir baş nas dikim. Ti carî wî bi fikrê şoreşgeriyê bawer nekiriye. Niha jî ji bo ku ketiya derdê canê xwe wê hemû derew û îtîrafan bike.

Tiştek din bêjim nîne,” û bivî rengî rûniştî cihê xwe. Amed, çawa ku gihişt hûcreya xwe cixareyek pê xist. A

rastî soza ku dabû Ferhat anîbû çî. Lê bêaramiya wî didomiya. Ji ber ku çalekiya wî di dadgehê de neanîbû ser ziman. Ji girtiyên di hûcreyê de pêşkevtin û rewşa helwest girtinê gotibû. Ednan jî li pişt wî destûr xwest bi hêcana erka xwe bîne cî rabû ser xwe. Piştî demeke şûnde dema ku Amed dît girtî di navbera xwe de nîqaş dikin, xwe nêzî Ednan kir û hêdîka: "Rast e me erka xwe anî cî. Lê me ya herî girîng nekir."

Ednan:

"Kîjanî?"

"Ma wê kîjan bibe? Ravekirina çalekiyê." Wê demê Ednan serê xwe xist ber xwe."

"Tu rast dibêjî, lê tu mercên heyî jî dibînî. Me gaveke din baş avêt. Lê yê din hîn birisktir e. A rastî em tirsiyan."

Amed:

"Tu rast dibêjî. Ez jî tirsiyam. Tirs tişteke şerm nîne. Yek jî ya di pirşt vê re bibe heye. Li gorî nerîna min dema ku mirov gava xwe ber bi pêş ve diavêje divê ya li pişt jî bifikire. Heke gavek pêş, duduyan paşve bavêje ya herî rast kes di cihê xwe de rûne ye. Lê divê hinek cesaret bikin bi mîsogerî ev çalekî bide ravekirin. Yan na ez ê her tim bêaram bim." Ednan bêyî ku tiştek bêje

wî erê kir. “Tu rast dibêjî, me bi parastinkirinê re gavek ber bi pêş avêt. Lê ez dizanim îdare li ser yên parastinê dikin îşkenceyek taybet dide bikaranîn.

Ji bo parastinê em dikarin îşkenceya ku li me bike rakin. Yanê em di wê astê de ne ku li ber xwe bidin. Jixwe ji bo me parastin kiriye wê îşkenceyê li me bikin, lê di vê rewşê de heke em çalekiya Ferhat wan jî bêjin, ji bo îtirafkirinê jî wê îşkenceyek taybet bidin meşandin, loma divê em vê jî bifikirin.

Heke em li hember îşkenceyek bi vî rengî xwe, yanê kesayeta xwe ya şoreşger neparêzin wisa derbikevin wê ev ji bo me bibe rewşek nebaş. Gumana min tenê ev e. Yan na mîna kes lêdana ez bixim û îşkenceyên bibînim nîne…”

Piştî çalekiya 33’an şûnde sê heval dabûn hûcreya Yilmaz. Îro di vegera dadgehê de emrê ku gardiyan dabû dûbarebûna emrê ku hatibû dayîn bû. Dîsa dema hevalên wî emîr dûbare kirin, Yilmaz pêwîstî bi axiftinê dît û got:

“Hevalno, ji dema hûn hatin vir heya niha di hinek mijaran de min dixwest bi we re baxivim. Lê ji ber hûn di hûcreya yekem de diman lewra min fersend nedît bi we re parve bikim. Em her tim di bin venêrîna gardiyanan de ne. Di destpêkê de em li vir, yanê

qawûşa 35’an hinek quralên em pêk diênin û hinek yên ku pêk nayênin hene. Her tiştê ku gardiyan dibêjin em nakin. Ji derveyî teslîmyeta fizikî li vir tiştek din heye.

Mînak em dibihîsin ku girtî di qawûşan de zeleyan li hev dixin. Xwestin li gel me jî vê bikin. Lê bi mîsogerî me ev nekir. Em dibihîsin ku di qawûşan de girtiyan mîna keran didin zirîn. Xwestin li vir jî bidin kirin. Lê ji bo hevalên me nekirin cezayê 30 rojan xwarin nexwarinê dan wan. Di qawûşan de sepandineke bi zimanê xwe erdê alastin jî didin meşandin. Li vir jî xwestin xwarina rijayî erdê bi hevalek bidin alastin. Ji bo ku heval nekir çeneya wî şikandin.

Hîn gelek sepandinên li qawûşên din dikin, lê nikarin li vir bikin hene. Bêguman hinek sedemên îdarê yên bitemkîn bi ser me de tê hene. Ya yekem pêşengên me hemû li vir in, ya duwem jî, liberxwedayîna me ya demdirêj e. Yanê em teslîm nebûne. Teslîmbûyîn cuda, teslîm girtin cuda ye. Em teslîm hatine girtin. Lê ev teslîm girtin bi ti awayî di warê fikir û kesayetê de nehatiye jiyîn. Tenê em neçar mane ku hinek quralên didin meşandin pêk bînin. Ez ji vê bawer im, heke hûn jî li vir bûna, we yê jî heman nêzîkatî raberkiriba.”

Amed û Ednan, maf dan Yilmaz û gotin ji niha û şûnde hemû sepandinên ku ew nekin wê ew jî qebûl nekin.

Bi vî rengî girtiyên nû hatîn quralên qawûşa 35'an nas kirin. Merwan ne li qawûşa 37'an bû, ketibû qawûşa 35. gel hevalekî xwe yê bi salan bû hevdu nedîtibûn. Dema ku wî dît him kêfxweş bû him jî xemgîn. Xemgîn dibû, ji ber dema hevalên wî berxwedan dikirin wî wan hêlabû çûbû teslîm bibû. Kêfxweş bû ji ber dîsa li gel hevalên xwe bû. Merwan jî mîna hevalên xwe yên din pêwîstî û hewcedariya çalekiya hevalan di dadgehê de bê gotin didît. Yên ku beriya wî çûbûn kesî qala çalekiya hevalan nekiribû. Xala hemûyan ya hevbeş heman tişt bû:

Tirs! Di girtîgeha Amedê de wateya vê gotinê tê çi maneyê kesî biqasî girtiyan nedizanî. Rêzdariyeke wan a mezin li hember hevalên xwe yên çalekiyê kirin hebû. Lê tirs û guman, tirs û gumana wê piştre çi bibe, mîna goga maça maseyê lihev didan. Dema ku Merwan dît kesî vê nekir got, "di rojên pêş me de dadgeha koma Riha yê heye. Divê ez di vir de bînim ziman. Lewra ev erka dîrokî jî ji min re ma.

Di koma Amedê de ez li bendê bûm Amed û Ednan bêjin. Wan jî nekir. Di komên din de jixwe kesekî ku

bêje nîne.” Merwan biryara xwe dabû. Digot, “çi dibe bila bibe divê ez çalekiya hevalan bêjim. Çalekiyek bi vî rengî divê di navbera çar dîwaran de nefetise û nemîne. Ev pirsgirêka me tenê nîne. Divê her kesê ku dibêje ez mirovim û hinek nesîbê xwe ji mirovbûnê girtibe vê peywir bi cî bîne.” Dema ku kirarî (işlem) dewam dikir ew bi vî fikir û baweriyê her bi vê difikirî. Hemû enerjiya xwe dida ser heman mijarê. Sipindar, di seyareya cenazeyê de ji Merwan re got divê tu bûyera 33’an di dadgehê de bêjî. “Heke tu nebêjî em ê bêjin.”

Merwan li pişt xwe zivirî lê temaşe kir. Hema di carek de di ew çavên şînokî de bîranînên hevaltiya bi salan zindî bibû. Her weke ku ji wan çavan derketibûn, herdu bi hev re li gundekî şîn ê Hîlwanê, şev di bin roniya heyvê de, ji çemê tijî marmasî digirtin, bîranînên bi jan û şîrîn yek bi yek zîndî bûn. Çendî xweşbûn ew roj; Ji jiyanê re bi azadî qîrkirin. Niha jî di bin mengeyên îşkenceyê de têkoşîna jiyanê didin. Lê wê rojek bi têqezî bigihiban rojên azad û bextewer. Ew nebînin jî wê dost û heskirıyên wan di xaka azad de jiyan bikiriban.

Ji bo wan dê rojên herî xweş ew roj bûna. Dema ku dengê frêna seyarê hat Merwan ji nava xewnên bîranînên xwe şiyar bû. Rastiya êşên jiyana bêrehm li

pêşiya wî bûn, van derbaskirin gava jiyanê ya yekem bû...

Heyeta dadgehê hemû formalîte yên xwe temam kir. Hêrs û qehra wan di tevgera wan de diyar dibû. Heya bêjî mafê axiftinê didan îtîrafkaran, lê girtiyên ku partiyê diparastin her tim dihatin bêdengkirin. Ev ji bo Merwan dibû kêliyek hîn zehmettir. Ji bo qedandina dadgehê çend deqîqe mabûn. Di kêliya dawî de 3-4 girtiyan destê xwe rakirin. Di nava van de Xayrî û Merwan jî hebûn. Niyeta serdozger nebû ku mafê axaftinê bide wan.

"Got tê çi bêjî Xeyrî?"

Xeyrî:

"Ez ê hinek mijaran ronî bikim."

Emrullah Kaya:

"Bila bimîne Xeyrî, bila bimîne. Dem nîne. Tu yê çi bêjî Merwan?

Tu jî berdana xwe dixwazî?"

Merwan:

"Na ez ê jî mijareke hemû girtîgehê eleqedar dike vekim.

Dadgeran, di guhê hev de pist pirst kirin piştre gotin"

"Bila bimîne piştre tu yê bêjî..."

Heta ku girtî hatin korîdora girtîgehê nêzî wan nebûn. Lê di korîdoran de kelepçe vebûn. Dema ku girtî wê li qawûşên xwe belav bibûban çawûş Kambûr got: "Merwan tu bimîne."

Piştî demek şûnde yûzbaşî û Asteymenê kinik hatin gel Merwan.

Yûzbaşî got:

"Te yê di dadgehê de çi bigotiba?"

Merwan:

"Qomitan minê bigotiba yên li ser min îfade dane direwan dikin."

Yûzbaşî got:

"Min baş guhdar bike. Heke tu bûyera li qawûşa 33'an çêbûyî bêjî xwe mirî bizane. Ez ê te bi gunên te hilawêsim. Kes jî nikare tiştek bike. Temam kuro?"

Merwan:

"Baş e qomitan."

Yûzbaşî got: "Çawûş, ev zilam bibe qawûşa wî. Zilamê min e, baş lê mêze bikin û derket çû.

Kambur got:

"Bimeşe kuro."

Dema ku hatin qorîdora biçûk a qada yek Kambûr bang kir got:

“Merwan kuro, yûzbaşî çima ji te re got zilamê min e?”

Merwan:

“Nizanim qomitan.”

“S....m kuro, te xwar.”

Merwan henaseyeke kur hilda ket hûcreyê. Hevalê wî yê hûcreyê Buroktat bû.

“Êêê deka bêje. Çima te dereng anîn ”

Merwan:

“Welle minê di dadgehê de bûyer bigotiba. Lê nebû. Ez ê sibe bêjim.

Yûzbaşî û kinik min bi mirinê tehdît kirin. Lê ez ê bi awayekî bêjim. Çi dikin bila bikin.”

Burokrat:

“Tu bêjî baş e. Lê divê tu her tiştî bidî ber çav.”

Merwan:

“Ê, ka bila bibe sibe, em ê mêze bikin.”

Weke ku di navberê de ne rojek mehek derbas bibû. Merwan ew şev tim fikirî.

Di serê xwe de pîlanan çêkir. Yek çêdikir yê din xira dikir.

Di serê xwe de pîlanek çêkir û got “ez ê ji vê neyêm xwarê.”

Di rêza xwe ya dadgehê de bi kelecan bû. Destê xwe rakir. Mafê axiftinê xwest.

Emrullah got:

“Tu yê çi baxivî?”

Dema ku Merwan got: “Ez ê di derbarê hinek çalekiyan de nerînên xwe bêjim,”Emrullah Kaya, texmîn kir ku Merwan hinek tişt îtiraf bike û piştre bi hakimên li gel xwe re pist pistê kir şûnde got, “ka were Merwan.”

Dema ku Merwan meşî çû, ew riya kin her ku çû dirêj bû. Merwan fikirî, ji hêcanê zêdetir tirsê xwe li bedana wî alandibû. Ji aliyekî ve daxwazên hevalên xwe, ji aliyê din ve jî tehdîtên yûzbaşî serê wî tevlî hev dikir.

Dema ku Emrullah Kaya got, “belê Merwan em li te guhdar dikin,”Merwan hat ser hişê xwe got.”

“Beriya qala bûyeran bikin dixwazim hinek tiştan rave bikim.”

Emrullah Kaya:

"Bila bi kinahîbe!"

Merwan:

"Ez şervaneke PKK'ê me. PKK komeke mirovên ku bidil li gel hevdu kom bûne. PKK, di demek rêgeza tûndiyê derbasdarbû de, partiyek siyasî ya ji nişka ve hatî pêkanîn e. Heval Ferhat Kurtay, Eşref Anyik, Necmi Oner û Mahmûd  Zengin li hember komplo û zextên tên meşandin protesto bikin agir bi bedena xwe xistin. Ez weke şervanekî PKK'ê, çi di koma me de, çi jî di komên din de yên îtîrafan dikin wan weke îxanetkaran dibînim. Difikirin ku têkoşîna me xilas bûye. Lê têkoşîna PKK' xilas nebûye. Têkoşîn, wê bi rizgariya Kurdistan û Rojhilata Navîn re xilas bibe."

Emrullah Kaya got: "Merwan ev der dadgehe. Ne ciyê propaqan dê ye. Di derbarê dadgehê de baxive. Derbazî bûyeran bibe."

Merwan:

"Li Hilvanê ji bo ewleyiya gundiyan biparêzin ez bi heval Îsmet Cotkar yê ji Siverekê bû dixebitim."

Emrullah Kaya:

"Çeka ku we bi kar anî çibû?"

"Me çeka G-9 bikar tanî. Li gel bomba û şerît."

Mîna ku li ser bareke pir giran rabûbe rehet bû. Lê aliyeke din yê mijarê hebû. Rewşên ku Merwan di girtîgehê de rû bi rû bê. Tiştên ku Merwan xwestibû bêje gotibû, yanê ka ji afir firîbû. Di nava meseleyê de mirin hebe jî hêjayî gotinê bû. Ma yên dimirin ne kurên dayîkên xwe ne? Her yek ji wan serokek bû.

Rêber wekî roj, weke heyvê,

Xeta û xêrên wî/wê jî mezin in,

Rêber bi xwe li pêş

Yê/ya dil di destan de ye

Dema tê dem

Dema ferz dike neyar

Di dema kêşana cigareyekê de

Sing vedike ji mirinê re

Merwan ji bo her tiştî amede bû. Şîara wî li ser zimanê wî bû. Wê bi qêrîn ser mirinê de biçûba. Wê bigotiba: "**Ne ji bo mirinê, çi şadin yên ji bo jiyanê dimirin!**"

Merwan, bi edaya fermandarekî serkeftî û bi serbilindî peywira xwe pêk anî, meşî. Di vê meşa xwe de li hember derbeyên ji rast û çep, pêş û paş ve bên amade bû. Kevanek vekişiyayî bû. Tarî dayîka tîrsan e. Rûpêşeke ku celad rûyê xwe pê vedişêrin.

Mazlûm, di şeva Newrozê de çirûska ji nikoreyê (Örsünde) Kawa difirî girtibû, ji bo mizgîniya vê bide bihîstin bedena xwe wekî alayeke sor kişandibû asîmanan. Di girtîgehê de destpêkê çar giyanbûn ên dilê wan pê ketîn. Û ev di serî de di hemû cemserên dilan pê xistibû. Merwan, wekî bezvanê maratonekê bi meşxeleyek ji agirê vê cemserê agahî gihandibû gîrtîgehê. Ev agahî biêş bû, bi mirin bû. Lê ji her dilekî dişewîtî re dibû melhemek, baweriya bêmiriniyê digihand mirinê. Di serî de Qowûşa 35. hemû dilên di girtîgeha Amedê de rabûbûn çargaviyê bi vê agahiyê. Çavkaniya berxwedan û baweriya girtîgehêbû qawûşa 35. Çavkaniya tûjkirina girseyan, hesîna hêza berxwedanê, di demên herî zor de stûna li ser piyan girtinê bû. Bi cewherî, qawûşa 35. qibleya berxwedan, şoreş, bawerî û jêhatinê ye. Ji ber agirê di dilê van dilan de qet ne tefiya bû.

Bandorek pir mezin a berxwedan û paşê radestbûnê ya li ser vînê heye. Her carê di axaftinên di navbera pêşengan û subayên dijmin de dueloyên gotinê yên xencer li îxanetê dixistin çêdibûn. Dema dilan ev guhdar dikirin, dilê wan radibûn û rûdiniştin di qefesên singên wan de. Bi gotin û îmgeyên Pîrê me, belengazê sermezin û dilbîçûk ê jê re Esat Oktay dihat

gotin, bêyî li pişt xwe binêre direviya ji wir. Carekê Esat Oktay got; “çibû Kemal, ka tu generalbûyî? Vaye tu binketî.”Pîrê me got “erê ez binketim, lê ger di artêşa min de kesek rabe ser xwe yê duwemîn ez im.”

Dema Esat Oktay bi wan diranê xwe yên kirêt ve keniya û got “ ez bi masiyên biçûk re mijul nabim, ez bi masiyên mezin re mijûl dibim” Rêheval Pîr hinek din hizirîbû û pêngavek din ya dikuje avêtibû. “Baş bihizire, dasiyên masiyên mezin jî mezin in. Wê di qirika te de asê bimînin, di mîda te de neçin xwar.” Carek din dîrok dibû ya yên ku fetih dike, serdikeve, yên bin diketin dê bireviyan û winda bikiriyan. Li ber serê hevalê Kemal, hevalê Xeyrî bersivên wî bi dilxweşiyek ji hundir guhdar dikir.

Demek dirêj bû tiştên Xeyrî dihizirî hebûn. Di sekn û nêrînên wî de ev yek dîtîn gengaz bû. Ji ber wî ti carî ew hesta mezin a berpirsyartiyê îhmal nekiribû. Ew sê zilikên şixatê yên Mazlûm nîşê dayîn û pê xistîn di reşikên çavên wî de wekî stêrka şîmalê dibiriqî. Lê Xeyrî bi qasî ku bikare kevirên sebrê biteqîne bi sebir bû. Bi agirê Mazlûm pê xistî û çaran kirî pê dişewitî. Û didît ku bi vê nûçeya mirinê nedigirin, li xwe nedixistin, şîn nedigirtin û reş girê nedidan. Diviya xwe

bavêje nava mirin, berxwedan û têkokoşîn ê. Coş û kelecanek bû, xwînek nû bû ji bo qawûşa 35.

35'hêza motora dîroka berxwedana li girtîgehê û dagirtina valahiya textîka partiyê ya jêvegerînê bû. Navenda fermandariya girtîgeha 2 NO ya Amedê û dilê wê yê bênavber lê dida bû qawûşa 35. Dergûşa kadroyên rêber, mirovên egîd û xwedî dil bû. Keleha tirsê ya ku îdare bi serde diçû, qelş lê vekirî, lê ti carî bi temamî fetih nekirîbû. Dîrok tijî tesadûf e. Carna mirov van tesadûfan wekî şans jî şirove dike. Lê ger tesadûf bi awayekî baş bên bikaranîn, şans rast diçe, bi awayekî rast jê sûd neyê girtin jî xirab diçe.

Îro 14'ê Tîrmehê ye. Roj geştir, dil bi coştir û germ in. Ji ber kêliya şerkirina pêşengên demek dirêje derketin serenomiya mirinê ye. Xeyrî, bi bejna xwe ya zirav û dirêj û awirên xwe yên baweriyê didin re temaşeyî hemû rêhevalên xwe yên dîl dikir. Dixwest di bahozên hûndirê xwe de ji wan re biqîre. Lê di demek ku derfeta di kêliya di guhên dostan de piste pist kirin nebû de dixwest qêrî eniya neyaran bike. Çend çaran hewla vê dabe jî, her hatibû astengkirin.

... Û vaye kêliya bênvedanêbû, derfata ku dîrokê pêşpêş kiribû. Ji wê jî zêdetir şansek bû. Sazûmana dadgehê wekî ya her car bû. Şandên rûniştin birêved-

ibirin heman şandbûn. Disa bê sinor wext didan îtîraf-kar û îxanetkaran. Wan jî biqasî ku dikarîbûn diaxivîn, biqasî ku diaxivîn jî hewl didan xwe bi wan bidin qebûlkirin, bi qasî xwe didan qebûlkirin jî xwe didan pêxweşkirin.  Xeyrî, destê xwe yê çend roj bû bênavber bilind dikir cardin rakir. Êdî ti egerên astengkirinê yên şandê û yên Emrullah Kaya jî nemabûn. Bêyî dilê xwe got, "Were Xeyrî" paşê jî jê pirsî " tê çi bêjî?"

Xeyrî, ji nava hevalên xwe meşiya. Bi çavên xwe yên çalbûyî, weke ku mizginî û baweriyê bide hevalên xwe li nav çavên wan dinêrî. Weke ku dê şerekî bide destpêkirin, yekem agirdêrê peyvêbû. Ew, Spartakûsek bû.

Weke Spartakusê bi hêrs di arenayên Roma de disekinî û temaşe dikir, li hemberî Neronên ku îşareta bikuje dida şûrê xwe bi hêrs û baweriyê hejandibû.

Bi wê gotina xwe, di ser serdeman re ji Bastil ê li Amedê agirê îsyanê pê xistibû: “Me heta niha pir caran cih cih tiştên bi me hatîn kirin anîn ziman. Ji van hemûyan re jî çareserî nehat dîtin. Ez niha jî bawer nakim ku bên çareserkirin. Ji ber darizandina me bi helwestek polîtik tê kirin. Polîtîkaya li ser me tê meşandin, polîtîkaya dewletê ye. Polîtîkaya leşkerîkirinê ya piştî 12'ê Îlonê anîn girtîgehan, li ser

bingeha bêkesayetîkirin û îxanetkirinê ye. Ji ber ku em li vir, li hemberî we ramanên xwe diparêzin rastî îşkence û çewisandinên nayên hişê mirovan tên. Em heta niha ji bo bikarin ramanên xwe biparêzin, li hemberî pir tiştî bêdeng man.Lê êdî ew jî ji destên me tê girtin, îxanetê datînin pêşiya me. Jixwe ji bo Mazlûm vê bi dawî bike, dawî li jiyana xwe anî. Ferhatan ji bo protestokirina van kiryaran xwe şewitandin. Êdî wateyek ya jiyankirin û darizandina me jî tineye. Ez ji bo vê diçim greva mirinê. "

Îro 14'ê Tîrmehê ye. An ku di ser serdemê re ji Bastîlê ji bo Amedê; 14'ê Tîrmehê, roja yekem ya maratona rojiya mezin a mirinê ya di pêşengiya Xeyrî Durmuş û Kemal Pîr de ye.

## Beşa Heftemîn:

Ferhat Kurtay gotibû "dê tiştên îro tên jiyîn hemû bibin dîrok." Bi rastî jî wisa bû. Bi gotin û çalakiya duh ne tenê derbasî dîroka şoreşa welat û girtîgehê bûn. Wan bi awayekî mafdar cihê xwe di rûpelên bi şeref ên dîroka mirovatiya cîhanê de jî girtin. Dê navên wan tenê ne li gel şehîdên şoreşa welat, li gel navê Bruno, Spartakus, Kawayê Şoreşger û Kawayê hemdem Mazlûm Doxan jî bê bibîranin. Vaye bi kurtî be jî, em hewl bidin kurteçîroka van mirovan, tevlîbûna wan a têkoşîna şoreşgerî, asta têkiliyên wan ên bi partiyê re û jiyana wan a partiyê, rastiyên girtîgehê bi çend hevokan be jî hewl bidin vebêjin:

## Ferhat Kurtay:

Li gundê Gorsê yê Qoserê hatiye dinê. Bavê wî meleyê gund bû. Bi Ferhat re sê kur, du keçên wî hebûn. Yê herî mezin Dawid bû. Pişeya bavê xwe dewam kiribû. Lê dema meletiyê têra debara wan nekir, hat Qoserê û ket nava ticaretê. Mele Hesen Ferhat şandibû dibistanê. Dibistana seretayî, navîn, amadeyî xwendibû, zanîngeh qedandibû. Ferhat, beşa endazyarî û Mîmariyê ya Trabzonê qedand û ket nava jiyanê.’

Ji ber Ferhat ji Mêrdînê, yek jî li Qoserê mezin bibû, vê bi awayekî xwezayî bi xwe re welatparêzî û girêdanek hişk a bi nirxên nîştîman re jî anîbû. Ji ber Mêrdîn navendek girîng a herêmê bû, ti caran ev teybetmendiyên wê venemirîn. Ferhat mînakek zindî ya hezkirina welat û girêdana bi nirxên gel re bû.

Ferhat, di salên dibistanê de ji tevgerên ciwanên şoreşger ên cîhanê û Tirkiyê bandor bibû. Welatparêzî û girêdana bi nirxên gel ve hêlabû li gel hevnaskirinê, di demek kurt de xwedî li van ramanên şoreşgerî derkeve. Di heman salan de bi kadroyên damezirêner ên PKK'ê re ketibû nava têkiliyê. Lê ev têkilî heta sala 1978'an asta amatoriyê derbas nekiriye. Piştî wê dîrokê û şûnde têkiliyên cidî û fermî saz kir.

Di pêşketina partiyê ya li herêma Mêrdînê de, Ferhat yek ji wan kesên serekeye ku ji nêrîn û ramanên wî sûd tê girtin. Rêgez, bîrdozî û bernameya partiyê di dema herî kurt de fêm kir. Di rêxistinbûna partiyê ya li herêma Mêrdînê de, avakirina komîteyên demî yekser erk girt. Beriya bê girtin, berpirsê Eyaleta Hêlîn ya ji Amed, Mêrdîn û Sêrtê pêk tê bû.

Li gel vê jî wê di cihbûn rêxistinkirina weşana partiyê ya navendî ya li herêmê erk wergirtiba. Jiyana wî ya partiyê kurt, lê heta dawiyê dagirtî bû. Lê, girtina

wî ya bêwext, ji bo partiyê û herêmê windahiyeke mezin bû.

Di sala 1979’ an de di encama îhmalkarî û lewaziya hevalekî xwe li Qoserê, li mala welatparêzekî li gel Xeyrî Durmuş hatin girtin. Di lêpirsîna polîsan û êşkencê de helwestek layîqî endambûna partiyê raber kir. Li Dozgeriyê, dadgeha girtinê, di dadgehan de heman helwesta xwe dewam kir.

Di girtîgehê de perpirsyartî girt û ferman û talîmatên partiyê pêk anî. Dema hemû girtî li N 5 hatin komkirin, Ferhat di qawûşa 9. de li gel Mazlûm Doxan kovara Hewar derxist. Mazlûm, sernivîskarbû, Ferhat jî edîtoriya kovarê dikir.

Di wê demê de çîroka Ferhat nivîsî ya bi navê "Şoreşgerê Bê Nav” pir zêde tê ecibandin. Piştî hatina 12'ê Îlonê û zêdebûna çewisandin û îşkenceyan û şûnde cihê xwe bi awayekî çalak di nava berxwedanê de girt. Di dîroka 5'ê Adara 1981'ê de radest bû. Ev radestbûn weke neyêniyekê jê re hat nivîsin. Lê wî ti caran di asta raman û dil de radestbûn nepejirand. Em ji vegotina vî aliyê wî zêdetir, piştî xebat û faliyetên wî bi çalakiyên wî ve nirxandinê ji we re dihêlin. Ji ber rêya herî baş a vegotina vî mirovî, dem û mercên tiştên

kirî û çalakiyên wî li pêş çavan girtin û wisa nirxandin dikare bê destgirtin.

## Eşref Anyik

Eşref, li Wêranşarê wekî zarokê malbatek jiyana xwe li ser karkeriyê pêktîne ji dayîk dibe. Ji ber xêzan in, Eşref tenê dikare dibistana seretayî bixwîne. Ji ber neçarbû alîkarî ji bo debara malbatê bike. Li Edenê li gel malbata xwe palehiyê dike, li metrapolan di karên herî ji rêzê de jî dixebite. Eşref beriya naskirina xwe ya bi şoreşgeran, li Rihayê li gel mutehîdekî kompresoriyê dike. Bi malbatî xizanin, lê di aliyê taybetmendiyên welatparêzî û gelêrî de dewlemend in. Ji ber malbata wî endamê eşîra Milî ye, rihê wan ê berxwedêr pêşketî ye. Ev taybetmendî ji kalikan wekî mîrate derbasî bav, ji bav derbasî kuran bûye di malbata Eşref de. Bi têkoşîna li gelemperiya welat û Hîlwanê re Eşref cihê xwe di nava refên PKK de digire.

Di pevçûnek li gundekî Hîlwanê pêk tê de tê girtin û dikeve lêpirsînê. Eşref di lêpirsînê de û li gel polîsan dikeve nava hinek lewaziyan. Ev bûye rewşek ku di tevahî jiyana xwe de nekariye bipejirîne û nerihetiya xwe ya ji vê her daye derve. Lê di girtîgehê de li gel mijarên bîrdozî û teorîk, ji ti xebat û berxwedanan paş

nemaye. Rexnedana şoreşgerekî ya herî xweşik gavên wî di pratîka xwe de avêtîne. Eşref mînakên vê ya herî bedew di girtîgehê de, di jiyana xwe ya berxwedanê de daye nîşan.

## Mahmûd Zengîn

Mahmûd, bi eslê xwe ji Sîweregê bû. Bapîrê wî li Hîlwanê rûdinişt. Mahmûd ji zarokatiya xwe ve her diçû Hîlwanê û dihat. Rewşa malbata wî xêzan dihat hesibandin. Li gorî mercên welat, wekî zarokê malbatek rewşa wan navîn mezinbû. Mahmûd, dibistana seretayî û navîn li Hîlwanê qedand. Li gel xwendewariya xwe, bi wêrektiya xwe jî dihat nasîn. Li Hîlwanê bi destpêkirina têkoşîna şoreşgerî re Mahmûd jî cihê xwe yê di nava van refan de girt. Destpêkê beşdarî xebatên qada ciwanan bû. Paşê jî, wekî şervanekî çekdar li gel Cuma Tak û rêhevalên xwe yên din li herêmên çiyayî ev xebatên xwe domand. Di pevçûnekê de, dema hevalên xwe rizgar dike tê girtin. Di çalakiyê de li ber xwe dide û dawiyê dîl tê girtin. Li gel polîsan jî helwestek layîqî şoreşgeran raber dike. Beşek mezin ji kesên di wê demê de tên girtin, vê helwesta Mahmûd ji xwe re mînak digirin.

Di jiyana xwe ya girtîgehê de jî bêyî ku bikeve nava ti neyêniyan heman xeta xwe domandibû. Bi ketina rojevê ya çewisandin û îşkenceyan re, di qawûşa pêncan de berpirsyartiya qawûşê dike û cihê xwe yê di berxwedanê de digire. Ji ber êşkencê û çewisandinan piyek wî seqet maye.


## Necmî Öner

Necmî, li navçeya Çêrmûgê wekî zarokê malbatek dewlemend mezin bû. Malbata wî weke binyat xwedî ramanên paşverû bû. Heta ku mamê wî di wê demê de serokê navçeyê yê AP yê bû. Necmî di salên dibistana amadeyî de ramanên şoreşgerî nas kiribû. Bi taybet ji ber xebatên Ahmet Kurt û Huseyîn Durmuş PKK'yiyan nas kiribû. Di demek kurt de ramanên wan dipejirîne û ji xebatên DDKD’ê cuda dibe. Di demên destpêkê de di nava refên PKK’ê de di xebatên ciwanan de cih digire. Beriya bê girtin, di xebatên komîteyên xwecih de dibe berpirsê ciwanan.


Ji ber bûyerek li dibistanê tê girtin. Li gel polîsan û di lêpirsînê de helwestek layîqî şoreşgeran raber dike. Di girtîgehê de xwe di warê bîrdozî de pêş dixe. Cihê xwe yê çalak ê di berxwedan û çalakiyan de her tim diparêz e. Wekî jiyana xwe partiyê ya li derve, ya di hundir de jî

kêm dajo. Li gel hatina 12'ê Îlonê, li gel Ferhat bi awayekî radest di qawûşa 33. de jiyan û têkoşîna xwe dewam dike.


# Her Çar Heval




**Ferhat Kurtay**



**Eşref Anyık**



**Necmi Öner**



**Mahmut Zengin**